Arşîva Bîra Kurdan: Ji Chris Kutschera; Berûdistana kurd - Lawazîya berxwedaneke parçebûyî - 2 (Îlon 1980)

LE MONDE diplomatique kurdî

Nîsan 2011 - Hejmar 17 www.lemonde-kurdi.com • info@lemonde-kurdi.com 24 Rûpel

Georges Corm
Raperînên ku cîhana ereb dihejînin gelo dê bi tawîzên desthilatdaran lawaz bibin yan jî dê wek ku li Fasê qewimî, tawîzên melîk li ser xwepêşandanan tesîr çênekin?
▶ R. 6

Rachid Khechena
Gelo dê sozên reformên radîkal ên destûra bingehîn, banga hilbijartinên azad û derxistina qanûnên nû bikaribin rê li ber tevlîhevî û pevçûnên li Lîbyayê bigirin yan na?
▶ R. 9

Alain Vicky
Parzemîna reş, ji bo pêşvebirina aborîyê ji Enqereyê re perspektîv û derîyên çawa vedike? Tirkiyeyê kengê û çawa biryar da ku derkeve ser sehneya aborî ya welatên afrîkî?
▶ R. 14

Harry Harootunian
Piştî xela, şewb, fûrîna çîyayên volkanîk, baranên meteorîk niha jî tsunamî, erdhej û karesata nukleerî Japonya serûbin kir. Japonya dê çawa birînên xwe bikewîne?
▶ R. 16

Evelyne Pieiller
Rola hunerê divê li gor bikêrîya wê ya siyasî yan jî exlaqî bê nirxandin? Çawa dê bê pejirandin ku bi krîterên derveyî pîvanên hunerî nirxê berhemeke hunerî bê dest nîşan kirin?
▶ R. 21

Nasname û Netewe

Prof. Dr. Ilhan Kizilhan *

Wisa dixuye ku di salên dawîyê de li serzemîna polîtîk li Kurdistan û dîasporayê derbarê *Nasname û Netewe* de veguherîneke paradîgmaya polîtîk dest pê kiriye.

Rêya kurdan ya nasîna wan wek netewe ku heta niha hîn pêk nehatiye; rêyeke karesat, şer, penaberî û nefikirina dijwar e. Têgeha neteweya kurd tijî hestdarî, hîn ferqnedar e û ji alîyê aktorên polîtîk yên ji salên 60ê bi şûn ve bi enflasyonan xerc bûye û beş bi beş jî xirab hatiye bi kar anîn. Dîrok û neteweya kurd halêhazir di rewşeke gelek zehmet de ne: Heta salên nodî têkoşîna danîna hîmekî netewî û mafê serxwebûnê hertim mijara gengeşeya polîtîk ya partî û ronakbîrên kurd bûn, îro li serzemîna mafên federalî di nav çarçoveya sînorên dewletî yên heyî de, mafê otonomî û çandî zêdetir mijara axiftinê ne. Veguherînên polîtîk yên cîhanî tesîrê li ser aktorên kurd jî dikin ku ev rewşeke gelek xwezayî ye, lê rewşa Kurdistanê bi giriftdarîya xwe, bi hîn tewanebûna hîmdanîna neteweyî û nasnameyên cûrbicûr (etnîkî, dînî, herêmî, zimanî ûwd.) gengeşeyeke bingehîn dixwaze ku pêdivîya ronakbîran jî pê heye.

Ji ber vê yekê divê bi maneya Habermas pirs bê kirin; gelo civaka kurd ya bigirift dikare nasnameyeke maqûl pêk bîne? Bê ku em bikevin naveroka şeklî ya vê pirsê, dîsa jî pirsa, li gor derfetê eceb û çawa civak dikarin nasnameyekê pêk bînîn, dimîne. Hema li ba yek bi yek kesan ger mirov pêkanîna pêvajoya nasnameyê bişopîne yan jî têbigihîje, kêm pirsgirêk nayên holê. Hema em li ba kurdan li têgeha nasnameya grupî binêrin, em ê bibînin ku ev yek me ber bi dijwarîyeke nezelal ya civaka kurd û hewldanên wê yên pêkanîna neteweyî ve dibe ku ev jî, bi wê yekê ve têkildar e, ka ew li dîaspora, li Tirkiye, Iraq, Iran, Suriyeya îroyîn dijîn, yan jî ka ew sunî, mesîhîç, êzdî, elewî ne û gelo di nav qaîdeyên eşîretî de dijîn, asta perwerdeya wan çi ye û di çi şertên aborî de ne. Têgehên gel û netewe bê zelalî qet nikarin bi têgeheke ferqnedar wek nasname bên bi kar anîn. Nasnameya grupî hertim ne ji nasnameya pirr kesan tenê tê afirandin û otomatik dibe Netewe. Nasnameya kesane û ya kolektîv veneqetbar in, di nav têkilîyeke beramberane de ne û bi vî awayî ji hev feyde werdigirin.

Divê aktorên polîtîk û ronakbîrên kurd serê xwe bi van pirsan biêşînin: Di rastîyê de çi feydeya nasnameya kurd yan jî avakirina "neteweya kurd" heye? Bi "neteweya kurd" re û bi dîrok û civaka wê ve çi şans û pirsgirêk girêdayî ne? Gelo mirov dikare di van demên civakên agahînas de behsa "neteweya kurd" bike? Gelo dê xewna kurdan ji bo neteweyekê, dewletekê û nasnameyekê di dema globalîzmê û geşedanên Rojhilata Navîn de bibe xewnereşk?

Sînor û nasname

Sînorên berbiçav, parçebûna Kurdistanê hertim mîna pirsgirêkekê li pêşîya nasname û pêkanîna neteweya kurdan dibîne. Derveyê dîroka kurdan ya hevpar mînak di dema ***Împaratorîya Osmanî*** de, pêkanîna nasnameyeke hevbeş ji sînoran wê de jî mimkun e, yan jî sînorên dewletî yên fermî di serê mirovan de bi heman awayî girîng in? Baş e, bi sînorên din yên nedîtbar (Cohen, 1985) yên ku di derheqê Kurdistanê, di serê kurdan de dijîn, çi dibe? Bicîkirina van sînorên fikirane di serên kurdan de heta roja me ji bo hebûn û neteweya kurd roleke girîng lîst. Beramberî sînorên dewletî yên îroyîn kurd dîsa jî, kêm zêde bi hev re di têkilîyê de man û bi alîkarîya dîasporayê dîsa xwe peyda kirin. Ew hikûmet jî dizanin ku di serên kurdan de bi tenê yek Kurdistan heye. Bi vî awayî nasnameya kurd ji bo wan babeteke bitirs e. Şerên li dijî kurdan feyde dide wan ku xwe ji tirsa xwe xilas bikin, bi şer û terora li dijî kurdan hewl dan ku ne-nasnameyekê bidin kurdan. Hevîya wan ew bû ku bi rêya sirgunê û bi têkilîya grupên din yên etnîk, nasnameya kurd ji holê rakin.

▶ R. 3

Di Warê Nasnameya Etnîkî û Berxwedanê de Kurdên Kirmanc (Kird, Dimilî, Zaza)

Nasname û Herêm

Munzur Çem *



Ismet Polatli: **Kena asîmên**, boyaxa rûnî li ser kartonê, 50 x 70 cm

Kurdên ku kirmanckî (zazaki) diaxifin, li bakûrê Kurdistanê dijîn. Ji ber ku di resmîyetê de qedexe ye, wek temamîya kurdan, li ser hejmara kurdên kirmanc (zaza) jî îstatîstîkên ku meriv pê bawer be tunene. Lê dîsa jî meriv dikare li ser hejmara vê grupê texmînî hinek tiştan bibêje. Li gor qenaeta min hejmara kurdên ku kirmanckî (zazakî) diaxifin digihîje 3-3,5 mîlyonan.

Herêmên ku kirmanc (zaza) tê de dijîn; **Çewlig** (Bingöl), **Dêrsim** (Tunceli), **Erzingan** (Erzincan), **Erzirom** (Erzurum), **Barbut** (Bayburt), **Qers** (Kars), **Mûş, Xarpêt** (Elazığ), **Diyarbekir**, **Ruha** (Urfa), **Semsûr** (Adıyaman), **Bedlîs** (Bitlis) û **Sêrt** (Siirt) e. Dîsa, li hinek bajarên Tirkîyê, wek **Qeyserî** (Kayseri), **Nigde**, **Gümüşhane** û **Sêvazê** (Sivas) ji mensûbên ve grûpê hene. Di van herêman de kirmanc tenê li **Dêrsim** (Tuncelî) û **Çewlig** (Bîngöl) ê piranî ne, li cîyên din ji kurmancan kêmtir in.

Kurdên ku lehça wan kirmanckî (zazakî) ye, ji alîyê olperestîyê de jî du beş in: Misilman û Elewî yan jî Kizilbaş. Meriv ku riya ototmobîlê ya Xarpêt û Mûşê esas bigire, başûrê wê xetê misilman, bi gotina xelkê "sunî", bakurê wê jî elewî ne. Yek îstîsna **Bongulan** (Solexan) a **Çewlîgê** ye. Qismek ji vê qezayê li bakûrê xetê ye û sunî ye.

Wek ku tê zanîn, herêma ku kirmanc (zaza) tê de dijîn bêtir çîyayî ye. Ji bo jîyanê şertên tebîetê gelek giran in. Di alîyê din de, dema osmanîyan bidin alîyekî, di dema Komara Tirkîyê de li herêma kirmancan (zazayan) serhildanên mezin pêk hatine û ev jî bûye sebeba teroreke mezin, cîh û warên wan ji alîyê hêzên dewletê ve hatine şewitandin, hatine talan û wêran kirin û xelkê heremê bi nefîyên mezin ra rû bî rû maye. Wan şertên wisa jî birçîtî, belengazî û koçberî bi xwe re anîne.

Kurdên ku bi kirmanckî (zazakî) diaxifin, li her herêmê, xwe bi eynî navî bi nav nakin; cuda-cuda navên etnîkî didin xwe û zimanê xwe: ***kirmanc, kird, dimilî û zaza***.

Çiqas kurdên ku ji xwe ra ***kirmanc*** û ***kird*** dibêjin, hejmara wan ji mensubên her du grupên din gelek zêdetir e jî, kesên bîyanî, ji wan ra ***zaza***, dereca dudiyan de jî ***dimilî*** dibêjîn. Dîsa kurdên ku bi kurmancî diaxifin, ew jî van her du navan (*zaza û dimilî*) bi kar tînin.

Mensubên vê grupê, yanê ***kirmanc*** (zaza), lehceya xwe jî li gor nasnameya etnîkî, bi navên cuda bi nav dikin:

▶ R. 4

Almanya: 4,50 €
Awûstûrya, Belçîka, Fransa, Holanda: 5,00 €
Brîtanya: 4 £, **Danîmarka:** 40 DKK, **Norweç:** 40 NOK,
Swêd: 50 SEK, **Swîsre:** 6,50 CHF, **Tirkiye:** 7 TL

4 1 9 1 7 6 4 2 0 4 5 0 9 1 7

www.lemonde-kurdi.org

JI ÇAPEMENÎYÊ

Newroz, Berxwedan û Azadî

Di 21ê adarê de Edîtorîya Rojnameya The Guardian nivîseke bi serenavê 'ji bo pêsindana Newrozê' weşand. Rojnameyê bi bîr xist ku Newroz li Rojhilata Navîn û li Asyaya Naverast ji alîyê gelek gelan ve tê pîroz kirin, ku li cem îranîyan wateya wê biserketina ronahîyê ya li hember tarîtîyê ye. Sebaret bi pîrozkirina Newrozê ya ji alîyê gelê kurd ve rojnameyê weha nivîsiye: *"Herweha di çanda kurdî de jî Newroz, ku tê wateya serkeftina li dij tîranê kujer Dehak, ji Stenbolê heta Californiayê wekî roja azadîya neteweyî û nîşaneya berxwedanê tê pîroz kirin. Newroz dawîlêhatina zivistanê ye, ku dê azadbûna ji zexta sîyasî jî bi xwe re bîne."*

AKP, pirsgirêka kurd û hibijartinên giştî

Rojnameya Yeni Ozgur Politikayê di 7ê adarê de hevpeyvînek digel sosyolog İsmail Beşikçi weşand ku ji alîyê ajansa nûçeyan a Dîcleyê ve hatibû amade kirin. Beşikçi di hevpeyvînê de dibêje her çend merhelaya ku pirsgirêka kurdî gihîştiye, ji 40-50 sal berê gelek pêşketîtir e jî, li gor berdêlên giran, ku gelê kurd heta îro dane, destkeftî gelek kêm in.

Di şûna Xweserîya Demokratîk de Kurdistana Xweser a Demokratîk

Li ser pirseke derbarê projeya Xweserîya Demokratîk a Kongreya Civaka Demokratîk, Beşikçi diyar dike da ku gelek statuyekê bi dest bixe, divê ev yek ji alîyê dewletê û civaka navneteweyî ve bê qebûl kirin. Beşîkçi herweha diyar dike ku projeya ***Xweserîya Demokratîk*** ne zelal e û statuyekê nade kurdan, lewma pêşniyar dike ku di şûna wê de ***Kurdistana Xweser a Demokratîk*** bê xwestin, ku pêk were, statuyekê dide kurdan. Beşikçi weha dirêjî bi gotina xwe dide: *"Ev proje di 18-19.10. 2009ê de di konferansa DTK de li Diyarbekirê hat ragihandin. Lê belê çima ku nivîskarên tirk, ku di konferansê de beşdar bûbûn, got ku ev projeyeke cudaxwaz e, BDP jî diyar kir ku ew xelet hatine fam kirin û mebesta wan ne cudaxwazî ye. Ocalan jî rexne li DTK û BDP girt û got ku wan proje baş venegotine. Ev yek nîşan dide ku hin gav paş de hatine avêtin. Lê belê li hember rexneyên ji çapemenîya tirk û nivîskarên tirk, diviyabû ku bi biryardarî piştgirîya projeyê bihata kirin. Siyasetmedarên kurd li pişt projeyê ranewestîyan. Ev yek aşkere ye."*

Hevdîtina digel Ocalan dikare pirsgirêka PKKê çareser bike, ne ya kurdî

Sebaret bi hevdîtinên di navbera serokê PKKê Abdullan Ocalan û rayedarên dewletê de Beşikçi diyar dike ku ev yek pêşveçûneke erênî ye, lê belê dewlet-hikûmet wekî heyetekê diçe seredana Ocalan ku kes pê nizane ka kî tê de beşdar in. Ocalan jî bi tena serê xwe ye û kes li cem wî nîne ku pê bişêwire, divê li cem wî jî hevalên wî hebin ku bi hev re gotûbêjê bikin. Beşikçi weha dirêjî dide gotina xwe: *"Li vê derê tiştekî tewş heye. Ez bawer dikim ev yek ne erênî ye ku Ocalan bi tena serê xwe van hevdîtinan dike. Ev muzakereyên digel dewletê ji bo çareserîya pirgirêka PKKê hewce ne. Ji bo bidestxistina mafên xwezayî yên kurdan pêwîstî bi van hevdîtinan nîne. Dewlet dikare wan bi îradeya xwe ya yekalî pêk bîne. Helbet divê rewşa Ocalan a girtîgehê bê baştir kirin, lê belê ne rast e ku pêkhatina hevdîtinan bi vê yekê re bê girêdan. Divê rewşa hemû girtî û zindanîyan bê baştir kirin."*

Parastina Hikûmeta Herêmê wezîfeya her kurdekî ye

Sebaret bi rûdanên vê dawîyê yên ku li Rojhilata Navîn diqewinin, Beşikçi dibêje êdî xelk doza bêhtir mafan û herweha rewşeke baştir a aborîyê dikin. Beşikçi lê zêde dike ku nerazîbûna xelkê Kurdistanê ya li hemberî gendelî mafdar e û helwêsta tevgera Goran jî rast e, lê belê rêbaza ku tê bi kar anîn, ne rast e, êrişa bi ser şaxên KDP yên li Silêmanîyê ne rast e. Ji ber ku rêbazên weha derfetê dide muxaberatên bîyanî ku dijminahîya kurdan dikin, ji wan re bingeh ava dikin. Lewma, dema ku li dij barzanîyan û Parlamentoya Kurdistanê muxalefetê dikin, divê ji bîr nekin ku hêzên bîyanî ji vê yekê sûdê werdigirin. Beşikçi herweha bi bîr tîne: *"Statuya yekane ku kurdan bi dest xistiye Hikûmeta Herêmî ya Kurdistanê ye û divê ev yek wezîfeya her kurdekî be ku vê hikûmetê biparêze û pêş ve bibe".*

Hikûmet dixwaze bi fenan kurdan bixapîne

Beşikçi ji têkoşînên neteweyî yên cîhanê mînakan dide û radigihîne ku têkoşîna li Cezayîrê 6-7 salan ajotîye û ya Vîetnamê jî her weha. Ên kolonîyên li Afrîkayê jî dora 2-3 salan ajotine, lê belê têkoşîna kurdan ev 27 sal in ku berdewam e û di sedsala 19ê de jî serhildan pêk hatibûn. Ew wekî din dibêje ku dema çareserîyê ji zû de hatiye û heta derbas jî bûye û divê kurd serê xwe pê biêşînin û bifikirin: Her çend ew doza mafên xwe yên xwezayî dikin û têkoşîneke girseyî dimeşînin jî, ka çima çareserîyek pêk nayê.

Hizrên nû li ser koçberîyê

Smain Laacher

Pirsa koçberîyê" yek ji mijarên bingehî ya rojeva hemû civînên navneteweyî ye ku van heyamên dawî têne rêkxistin. Rehendên wê yên serekî ku têne behskirin: wergirtina koçê, koçberîya asayî, koçberîya bi dizî, pena xwastin û penaberî. Gelek caran, kesên ku di asteke bilind de berpirsên "birêvebirina" van diyardeyan in, bes xwedanê boçûneke bilez û siyasî ne, tew carinan bes yeke siyasetmedaran e. Digel vê, xebatên kûr û berfireh qet kêm nabin ji meydanê, ku aloziya diyardeyan, meyla wan a berdewamkirinê, û herwiha rûyê wan ê gerdûnî nîşan didin bi rengekî cuda ji şiklên serbixwe ku tê heye li dem û heyamên cuda û li cihên cuda bêne dîtin.

Gilda Simon (1), ku tehlîlên wî hem li Bakur û hem jî li Başûr di asteke bilind de têne nirxandin, bala xwe dide vekolîna binecihbûna diyardeya koçberîyê wek hêmanekê di proseya cîhanîbûnê de. Ji pêwendiya meydanên deverî û gloabal, an jî ji pêwendiya prêzeyên tak bêtir, hewl dide babetên kêmtir destxweş vekole, *"bo numûne wek mekanîzmayên girêdayî nirxên rastî û nirxên xeyalî"*. Lê herçend hereketa komên xelkî *"kêşeya tertîba koçberîya di rista cîhanî de"* dixuliqîne, lêkolînên hûrtir û bêtir binecih di zeman û mekanî de dikarin hem têgihiştina cîhana îro hêsantir bikin û hem jî hindek fikrên wergirtî yên baw û belave daşikînin.

Philippe Rygielê (2) dîroknas dide dû vekolîna gaveke gelek muhîm a dîroka Ewropayê: dîroka koçên ku ji nîvê sedsala 19ê heta nîvê sedsala 20ê li Amerîkaya bakurî û li Ewropayê, bi taybetî li Ewropaya bakur-rojavayî. Nivîskar, piştî berpêşkirina kurteyeke edebiyata li ser mijarê ya bi zimanê îngilîzî, mentiq û hêmanên koçberî û koçwergirtinê di nava çarçoveya cîhana rojavayî de (ku ew jê re dibêje "koçberîya spî") li dora *"du veguherînên bingehî yên serdema hevçerx, anku endûstriyelîzasyon û avabûna netewe-dewletan"* bi cih dike, *"ne tenê ji ber ku diyardeyên koçberîyê berhemê van du guherînên hevçerx in, belku herwiha ji ber ku hêmanên wê yên avaker in jî"*.

Herçend ev du pêvajo bi awayekî hem temamker û hem nakok karîger bûbin di hereketên geriyan û cîguhastina serbest a kom û birrên xelkan de, îro rewş nema wisa ye. Îro netewe-dewlet bi aşkerayî "amraz"ê bingehî ye ji bo rêkxistin û diyarkirina reng û qaîdeyên koçberîyê û, her ji ber vê yekê jî, diyarker û biryarder e ji bo azadiya cîguhastina kesan û ya komên xelkan.

Ev e xala ku antropolog Michel Agier (3) bi rengekî qet'î dixe bîra me. Lewre nivîskar ji me re dibêje ku bi taybetî li Rojavayê, yasa, asteng, dîwar û kamp rê li ber bi sedan hezar kesan digirin da ku nekevine nav meydaneke eminî û ewleyiyê de. Herwisa nivîskar dest nîşan dike ku dîsa li *"van deverên 'heterotopîk' e ku 'nexwastiyê cîhanê' li rex têgihiştineke nû ya 'biyanî'yî diyar dibe û şikl digire"*.

1 Gildas Simon, *La planète migratoire dans la mondialisation*, Armand Colin, Paris, 2008

2 Philippe Rygiel, *Le Temps des migrations blanches*, éditions Publibook, Paris, 2010, 155 rûpel, 23 euro

3 Michel Agier, *Le Couloir des exilés*, éditions du croquant, Bellecombe-en-Bauges, 2011, 117 rûpel, 13 euro

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn

DAXUYANÎ

Wergêrên ji zimanên din ji bo wergerandina zimanê kurdî

IKMG (Independent Kurdish Media Group), ji bo weşanxaneyeke nû ku ji gelek beşan ava dibe, ji hemû zimanên cîhanê li wergêrên bo zimanê kurdî; ji bo beşên wêje (roman, helbest, çîrok, lîstikên şano ûwd.), lêkolînên zanistî (civak, felsefe, polîtîka, psîkolojî ûwd.), yên akademîk, perwerde (dibistan, zarok, dê û bav, lîstik) ûwd digere.

Di destpêkê de hewcedarî bi wergêrên îngilîzî, fransî, almanî, spanî (zaravên Latîn Amerîkî), rûsî, îtalî, çînî, japonî, portekîzî, erebî, tirkî, farisî, norwecî, swêdî, danîmarkî, fînî, polonî, îbranî ûwd heye. Herweha ji bo zaraveyên kurdî di nav xwe de.

Kesên dixwazin, dikarin bi nivîskî CV, nameya şexsî, dîplome, sertîfîka û minakên hin xebatên xwe bişînin navnîşana li jêr.

IKMG
INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP

Navnîşan
IKMG GmbH
Carnotstr. 4
10587 Berlin - Germany
Fax: 0049-30-330 990 429
Email: info@ikmg.org

Le Monde diplomatique kurdî
Ji aliyê Independent Kurdish Media Group GmbH ve tê weşandin

INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH

Carnotstr. 4
10587 Berlin / Almanya

Lijneya Weşanê
Murad Satik
Riza Dînç

Le Monde diplomatique kurdî

Redaksiyona Zimanî
Mahmûd Lewendî
Remzî Kerîm

Alîkarên vê hejmarê
Yado Ciwan
Semra Polat
Ergün Yetkiner
Celîl Kaya
Nedîm Baran

Revîzyona Wergeran
Luqman Guldivê
Simko Destan

Berpirsê Hunerî
Hasan Huseyîn Devecî

Designer
Fabio Biasio

Web Developer
Erhan Yekta

Tel: 00 49 (0)30 330 990 420
Fax: 00 49 (0)30 330 990 429
info@lemonde-kurdi.com
www.lemonde-kurdi.com

ABONETÎ
Independent Kurdish Media Group GmbH

Berliner Volksbank
Konto: 2284 123 010
BLZ: 100 900 10
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 00
BIC/SWIFT: BEVODEBB

Abonetiya Salane:
Almanya: 50 €
Derveyî Almanyayê: 60 €
Abonetiya dîjîtal: 20 €

Le Monde diplomatique

Damezrîner
Hubert Beuve-Méry

Birêveberê giştî
Serge Halimi

Sernivîskar
Maurice Lemoine

Cîgirên Sernivîskarî
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

Redaksiyon
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal

Birêveberê hunerî
Alice Barzilay

Dokumantasyon
Olivier Pironet

Sekreter
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris, France

Nasname û Netewe (Dewama rûpela 1)

Bi rastî jî, bi rêya întegrekirina grup û çandên din yên etnîk li Kurdistanê pêvajoyeke guherbar hat holê. Di heman demê de endustrîzekirin, bajarvanî, navendîkirina bazaran, pêşketina livgerî, penaberî ûwd. guhertineke çandî pêk anî. Strukturên nû yên girse û yekane-çandî yên ereb, tirk û faris eşkere hatin wergirtin, lê beş bi beş bi maneyên kevnenaverok yên kurd hatin dagirtin. Bi vî awayî civaka kurd hebûna xwe ya xwezayî û nasnameya xwe parastin. Mînak; maneyeke cuda ya Newrozê ji ya gelên îranî yên din heye. Pîrozkirinên Newrozê yên fermî li Tirkiyeyê gelek bi awayekî aşkere polîtîk tên bi rê ve birin û hewldan hene ku naveroka pîrozkirina roja neteweyî ya kurdan wek cejna berxwedan û yekîtîyê bê guhertin.

Divê hema bê gotin ku avahîya nasnameya neteweyî û neteweperestî ne wek hev in: Neteweperestîya radîkal, mîna ku em li Tirkîyeyê ji kemalîzmê dinasin, formeke neserkevtî ya pêkanîna nasnameyê ye, ew girtîgeheke tesîr û îşaretên tehdîtkarane ya bêbawerîya bi xwe ye. Ev li min wisa dixuye ku di pêkanîna nasnameya neteweyî ya kurdan de ne weha ye. Mirov ji nêzîk ve bişopîne, dibîne ku kurdan ji xwe re neteweperestîyeke radîkal nekirîye armanc. Ew hêvîya xwe ji bo "daxwaza nasîna wek grupeke etnîk" diparêzin. Li gor nêrîna min zelal dixuye ku partî û rêxistinên kurd li Tirkîyeyê li ser pêkanîna nasnameya neteweyî, ne xwedîyên armanc yan hewldanên zelal in. Dirûşm û daxwazên polîtîk ji bo kurdan têrî geşepêdana dewamî ya nasnameyeke kurdî neteweyî nakin û pir caran bi berjewendîyên polîtîk yên rêxistinan ve girêdayî ne. Geşepêdanên polîtîk di partî û rêxistinên kurdan de û îndîrekt wergirtina îdeolojîya dewleta tirk ji hêla de, rê li ber sazîyeke sereke digire, mînak wek ***kongreya neteweyî*** yan jî ***lîga kurd*** ku hemû grup û sazî ji giş herêmên Kurdistan û dîasporayê temsîlîya xwe tê de bibînin. Helbet divê mirov avakirina kongreyeke neteweyî, bê naverok û di dema globalîzmê de mîna çareserîyeke mutleq nebîne.

Globalîzm, Nasname û Netewe

Tesîr û peywendîya forma global ji 30 salan zêdetir e ku eşkere diyar dibe, ev yek nasnameyên neteweyî û şexsî diguherine ku ev li Kurdistanê jî encamdar e. Bi têgeha globalîzmê bi piranî berfirehkirina serdestîya çand û polîtîkaya DY-Amerîkayê tê bîra mirov. Vê forma globalîzmê Tirkîye jî, ji bo xwe mînak digire û hewlê dide ku hikumdarîya aborî û polîtîk ya grupên etnîk li Tirkîyeyê û di heman demê de gelên din yên tirk werbigire ser xwe. Neteweya xwe datîne pêş neteweyên din û ji wan berztir dibîne. Salixdanên din jî zû tên peyda kirin: Hin ronakbîrên kurd û tirk hewl didin ku pêkanîna neteweyî ya kurdî, yan jî, "pirsa kurd" di bin sazûmanîya neteweya tirk de bi cî bikin. Mîna delîl jî wiha dibêjin ku *neteweya tirk* ne wek binavkirineke etnîk, lê coxrafîk bê fêm kirin û bi vî awayî jî, nasnameya kurd wek grupeke din ya *netewa tirk* e (bide berhev: Özüyilmaz, Samanyolu Haber, 12.02.2008, Habertürk, 19.03.2011).

Hertim gava kurd dikevin hewldana bidestveanîna nasnameya xwe, ev şemaya basît ya "neteweya tirk" hem ji alîyê aktorên polîtîk hem jî, ji alîyê partîyên tirk tê rojevê. Ev şemaya "neteweya tirk" ji alîyê medya û gelek nivîsên ronakbîran jî tê berfireh kirin û divê ji avahîya alîkarîya îdolojîk derkeve, pirmane û dorfirehtir bê plan kirin. Neteweyek, pircûre grupên etnîk, heman dîn û berjewendîyên aborî li cem xelkê kurd belawelabûnê çêdike. Lê armanc eşkere ye: Geşepêdana "çandeke girseyî ya tirkî". Heman malên çandinî, heman awayê xerîdar ji alîyê giş ciwanan li Tirkîyeyê, heman mode, mûzîk, bernameyên televîzyonê, kurdî yan tirkî, divê bigîjin hemû kurdan heta gundên herî dûr yên çîyayî ji bo ku çandeke yekpare biafirînin. Berepêşdeçûna vê "çanda girseyî" li Kurdistana Başûr zelal dixuye. (1)

Heta ronakbîrên kurd jî dest pê kirine ku cudahîya xwe ya neteweyî nedin der, weha ku profîla çanda kurdî ya xurt her ku diçe şolî dibe. Li hember vê yekpareya çandî bi heman tundîyê wek reaksîyon kurd xwe bi bermayîyên patrîarkal-feodal yên kevnedem û edetên kevnar (kujerîya ji ber namûsê, zewaca bizorê, xwekuştin, zêdebûna kiryarên krîmînal li herêmên kurdan, radîkalîzebûna partîyên kurdan di nav xwe de ûwd.) girê didin.

Ji ber vê yekê bi çavên rexneyî binêrim, ew danûstandina li ser zêde maf ji bo kurdan û grupên din yên etnîkî ku wek vekirina demokratîk dixuye, ji min re mîna xeleka xelasîya çandî û polîtîk ya nasyonalîzma tirk tê ku hewl dide bingeha pirsgirêkên kurdan li ser nasname û neteweyê veşêre.

Li ser pirsgirêkên kurdan yên nasname û perwerdeya neteweyî li Tirkîyeyê heta roja îro gelek sedemên girift hene. Pêşdefirehbûna netewperestîya tirk û şidet li dijî yên Ne-Tirk li Tirkîyeyê pir caran wek reaksîyona li dijî *ramanên biyanî* mîna komunîzm, demokrasîya girseyî yan tirsa avakirina dewleteke kurdî hatiye nirxandin. Lê rewşa rojane ya kurdan li Tirkîyeyê bê nasîna projeya neteweperestîya Tirkîyeyê nayê fêm kirin. Ew ne projeyeke xweparêzîyê ye, ew li vê derê projeyeke hêrişkarîyê ye: Bi vê yekê ve girêdayî pirs avakirina mantiqa dewleteke pirdengî li ser bingeheke etnîkî ye. Nasname û perwerdeya neteweyî ya kurdî li ser rêya vê projeyê asteng e.

Helbet parçebûna Kurdistanê di avakirina nasnameya kurd de, di heman demê de têkoşîna hebûna jîyanê, înkara kurdan li Tirkiyeyê heta salên 90ê, kemalîzma tirk, bi gelemperî rewşa agresîv ya li Rojhilata Navîn û di dema şerê sar de şerê îdolojîk yê DYA û Yekîtîya Sovyetan roleke girîng dilizîn. Wan rê li ber avakirina nasnameyeke maqûlane ya neteweyî girt. Dîsa dewama mekanîzmaya berterafkirinê di danûstandina dîroka çanda kurdî de heta roja me dorpêçîyeke berdewam e. Li ser kevneşopîyeke neteweyî heta vê demê jî, bi bingehîn nehatiye gengeşe kirin. Dewleteke neteweyî ya kurd heta niha çênebûye û nehatiye jîyin.

Helbet ne pêwîst e ku mirov sedîsed xwe wek netewe ava bike, lê dîsa jî dikare bibe xwedîyê nasnameyekê. Çanda kurdî ne boxçeyeke pînekirî ye ku kontrola wê ji derva tê kirin. Di civaka kurdî de kevneşopîya dûredirêj, baş û demajo heye. Ji bo rewşa heyî, divê mirov ferqê bixe nav beşên ku çanda tirkî di hemû parçeyên Kurdistanê de xetarnak êrişkar û amade ye. Divê kurd jî di wê rewşê de bin ku çanda xwe bi erênî xurt bikin daku nifşên nû vê yekê bi dilxweşî di nav xwe de biguncînin û berepêş bibin. Ji nû ve afirandina çandeke yekpare ya neteweyî ji sedema parçebûnê, kêmbûna medya kurdî û kêmasîya alternatîfan ji alîyê kurdan gelek dijwar e. Kurd heta kîjan derenceyê dikarin Mem û Zîn û klasîkên kurd yên din, mûzîka gel, Newroz yan jî "peyv û raman"ên zimanê kurdî di jîyana rojane ya girseya gel de bi cî bikin. Li ser vê yekê divê ronakbîrên kurd helwest nîşan bidin û planan bînin holê. Divê ev jî bê gotin ku giş civakên nûjen di nav dijwarîya parastina çanda xwe de ne. Lê li ba kurdan pirs hebûna nasnameya wan e, ji ber ku ew ne xwedîyê dewleteke neteweyî ne ku belkî ji alîyê wê ve bên parastin.

Piştî ku gelek kes reviyan çûn Ewropaya Rojava bûn pênaber, xuya bû ku çanda kurdî ya li Ermenistanê çi zû dest bi windabûnê kir û ev yek ne îşareteke baş e. Çanda kurdî ya pêşketî ya li Ermenistanê, li dîasporayê winda dibe û wisa dixuye ku rê li ber vê windabûnê nikare bê girtin. Heta kîjan radeyê dîaspora li ser parastin û geşepêdana nasname û perwerdeya neteweyî rol dilîze, pirseke girîng e. Mînak almanîya bilind ya ku herkes fermî diaxive li Pragê hat bi pêş ve birin. Zimanê cihû yê îro li Îsraîlê fermî tê axiftin li Ewropa hat bi pêş ve birin. Ev û gelek mînakên din şanî me didin ku ji bo pêşketina nasname û perwerdeya neteweyî dîaspora çiqas girîng e.

Ronakbîrên Kurd û Netewe

Netewe rastîyeke raman, ziman û xwestek e. Ger mirov jê bi zanebûn haydar be, bîne zimên, arzû yan daxwaz bike, bi cî tê. Mîna ku hin kesên romantîk wisa bawer dikin, netewe madeyeke kolektîv ji kurahîya gîyana gel nîne. Netewe herdem ji aliyê hinek mirovan tê afirandin û ava kirin; ji ronakbîran, helbestvanan, fîlozofan, dîrokzanan, zimanzanan û hunermendan. Heta niha kurdan hêz û vîzyona xwe di nav desthilatdarîya dewletê de nedîtine, lê di rabirduyên xwe yên azarkêşî de dîtine; nasnameyeke bindest û berxwedanê. Avahîya neteweyî û pê re girêdayî parastina nasnameya kurdî, dikare bi ser bikeve, tenê ger di çarçoveya ziman û çanda kurdî de civakeke peywendekare siftê bê bi pêş xistin (di vê mijarê de roleke girîng li ser şanê Başûrê Kurdistanê ye). Ger civaka zanist, livger û bazarê dernekeve holê, dê valahîyek peyda bibe. Dibistan, peywendîya zanîngehî heta derveyê sînorê, medyaya neteweyî, pirtûk, kovar, alîkarîya gelê kurd dikin ku xwe bi heman têgehan bide fêm kirin. Kampanyaya zimanê kurdî ku ji derveyê û ji ser hemû sazîyên polîtîk tê meşandin û hêvî dikim gelek cidî tê girtin, ji bo geşepêdan û entegrekirina zimanê kurdî di jîyana rojane, perwerde, zanist û aborîyê de gaveke girîng e. Mekanekî serborîyên hevbeş yê gelê parçebûyî û jihevbelavbûyî ji bo pêkanîna nasnameyeke neteweyî gelek manîdar e.

Kurd çiqas jî, gilêyan ji rabirdûyên xwe bikin, mirov hew dikare rabirdûyê bi paş ve vegerîne. Tevgerên goya "bi paş ve" ber bi kevneşopîyê ve, xwe bi nirxên kevin girtin û spartina veşare jî, pirsê çareser nake. Ev dikare tevgera kurdî ya heyî hîn jî marjînal bike. Hin partîyên polîtîk dikarin veguherin rêxistinên wek terîqatan ku mafê xwe li ser mafê gelê kurd bibînin.

Partîyên Kurdan di dîrokê heta îro risteke mezin ji bo afirandin û çêkirina Netwa kurd neleyistine. Ev bixwe di vê baweriyê de ne. Lê, yên bi rastî roleke mezin ji bo afirandin û çêkirina Netwa kurd leyistine keç û lawên kurd yên ronakbîr, hunermend, nivîskar û mirovên xwedî fikir in.

Kurd nikarin li derveyê dinyayê bijîn. Pirs naskirina nasname û neteweya kurd e. Ger em rexne li xwe bikin, ji bo nasîna yên din, divê ronakbîrên kurd bixwe di nav xwe de zexim bin. Nasnameya kurdî ya bixwe divê wisa zexim be ku em di maneya modela **Kant** de bibêjin, ronakbîrên kurd xwe mîna zanabûna xwe azad hîs bikin û bi xwe re yek bin. Wekî din ew di rastîyê de azad nabin, ji ber ku ew bixwe bi xwe re ne yek in û bi xwe re belawela, nezelal, guherbar dibin, di wê rewşê de dibin ku nikarin li dijî fişara hundir û derva ya pirsgirêka kurdî zexim rawestin. Dê di rastîyê de xwedîyên ne-nasnameya bi xwe û netewa xwe re bin. Di vî awayê fikirandinê de şansek jî, ji bo nasnameya kurdî ya pirsgirêkbar heye. Şansê wan heye ku tesîreke berbiçav li ser nasname û perwerdeya neteweyî bikin û şekil bidinê. Wezîfeya ku dikeve ser ronakbîrên kurd ev e ku bixwe ji xwe re li ser rola xwe ya azadkar û ronakdar kevneşopîyan şanî bidin û hertim bi çavekî rexneyî bi vê kevneşopîyê re bidin û bistînin û bi vê yekê ve girêdayî bibin muxatabên vekirî û rêzdar yên çand û polîtîk ji bo partîyên polîtîk yên kurdî û civakên din.

Girîng e ku pêvojoyeke ronakdar li Bakûrê Kurdistanê û danûstandin li ser pêşveçûnên civakî li serzemîna mîkro û makro di çarçoveya pêşveçûnên polîtîk de bên kirin. Nasîna nasname û neteweya kurd û serxwebûna Kurdistanê û pê re pêkanîna mafê çarenûsî divê êdî ne mijarên bi tabû bin. Bihevgirêdan û derbasedema mafên çand, sivîl û herêmî heta perwerdeya neteweyî divê ji alîyê zanist û civakê ve bê tayîn kirin û bi heman awayî bikeve jîyanê. Lê ji bo vê yekê di civak û polîtîkayê de guherîna paradîgmayê girîng e.

Sembol, wêje û hişmendên dîrokî yên kurdî, bingehek ji bo perwerdeya neteweyî anîne holê. Di dema globalîzmê de pêşvebirina vê çand û nasnameyê, li hemû parçeyên Kurdistan û dîasporayê û cardin vegerandina rûmet û şanazîya gelê kurd ku ev yek gelek zêde heq kiriye, xebateke mezin û wêrekî ye ku hîn jî li benda ronakbîrên kurd e.

* Ji Enstîtuya Lêkolînên Aşitîyê, Konstanz

1 Bi nêrîna sosyal-polîtîk awayekî tayînkirî ya jîyan û îdolojîyê wek çand tê şanî dan, girse yan xelk wekî din bi rêya fîlm û televîzyonê, tîyatro, çapemenî ûwd. ji bo hikumraniya bijarteyekê tê amade kirin. Ev bazara îdolojîyekê ye wek rêya hikumranî û hevahengîyê (Fromm, 2005). Bi rêya hilberîna girseyî (mînak: film, rêzefîlm, çîrok ûwd.) hemû wek hev in û herî zêde cudahîyên biçûk di nav wan de hene. Hemû ditewsînin nav şemayekê û daxwaz ew e ku xelk van nêrînan werbigire û xwe li gor wan bilivîne (Horkheimer, Adorno, 2006)

Adorno, Theodor W.: Negative Dialektik (*Dîalektîka Neyînî*) Frannkfurt/Main, 1975

Assmann, A.: Arbeit am nationalen Gedächtnis. Eine kurze Geschichte der deutschen Bildungsidee (*Xebat li ser bîrdarîya netewî. Kurtedîrokeke perwerdeya ramanî ya alman*) (Edition Pandora 14), Frankfurt am Main / New York, 1993

Besikci, I.: "Ulusların Kendi Kaderini Tayin Hakkı ve Kürtler". (*Mafê çarenûsîyê û kurd*) http://www.turkeyinfonet.com/2011/03/uluslarin-kendi-kaderini-tayin-hakki-ve-kurtler-ismail-besikci/

Cohen, A.: The Symbolic Construction of Community.(*Avahîya sembolîk ya Civakê*) London, 1985

Erikson, E. H.: Identität und Lebenszyklus). (*Nasname û Dewredaîma Jîyanê*) Frankfurt/Main, 1997

Fromm, E.: *Vom Haben zum Sein*, (*Ji hebûnê ber bi bûnê ve*) Ullstein, 2005

Habermas, J.: Die postnationale Konstellation und die Zukunft der Demokratie, (*Hevgirêdekên post-netewî û dahatuya demokrasîyê*)in: ders.: Die postnationale Konstellation. Politische Essays, Frankfurt/Main, 1998

Habermas, J.: Geschichtsbewußtsein und posttraditionale Identität. Die Westorientierung der Bundesrepublik, in: ders.: Eine Art Schadensabwicklung, Frankfurt/Main, 1987.(*Zanabûna dîrokê û post-kevneşopîya nasnameyê. Berbirojavabûna Almanya Federal*)

Habermas, J.: Können komplexe Gesellschaften eine vernünftige Identität ausbilden, in: ders.: Zur Rekonstruktion des historischen Materialismus, Frankfurt/Main, 1982. (*Gelo civakên girift dikarin nasnameyeke maqûl pêk bînin, di heman: Jinûveavakirina materyalîzma dîrokî*)

Horkheimer, Max; Adorno, Theodor W.: Dialektik der Aufklärung. Philosophische Fragmente. Frankfurt a.M: Fischer Verlag 16. Auflage 2006. (*Dîalektîka ronakdarîyê. Bermayîyên felsefîk*)

Kizilhan, I: Die Gegenwärtigkeit der Gegenwart, Berlin, 2008. (*kêlîka têdeyî ya nihoke*)

Mitscherlich, Alexander und Margarethe: Die Unfähigkeit zu trauern. Grundlagen kollektiven Verhaltens, Frankfurt/Wien/Zürich, 2007. (*Netewa şîngirtinê. Bingehên helwêsta kolektîv*)

Müller, E. W.: Sozialethnologie. In: Hans Fischer (Hg.), Ethnologie. Einführung und Überblick; S. 149-185. Berlin, 1992. (*Etnolojîya civakî*).

Özüyilmaz, Ö.: Kürtler de aslında Türk... http://www.samanyoluhaber.com/h_180744_kurtler-de-aslinda-turk.html. (*Ya rastî kurd jî tirk in*)

Polanyi, K.: The Great Transformation. Politische und ökonomische Ursprünge von Gesellschaften und Wirtschaftssystemen, Frankfurt/M., 1978. (*Transformasyona mezin. Bingehdestpêka polîtîk û ekonomîk ya sîstemên civakî û aborî*).

Robins, P. J.: Turkey and the Kurds. Missing another opportunity? In: Abramowitz, M. (Ed.): Turkey's transformation and American policy, New York, 2001 (*Tirkiye û kurd. Firsendeke din ya kêm / Veguherîna Tirkiyeyê û polîtîkaya Amerîkayê*)

Wergera ji almanî: Hüseyin Kartal

Wênesazê vê hejmarê



Ismet Polatli

İsmet Polatlı, di sala 1965ê de li gundê Abrenk* a li ser navçeya Tercan ya Erzinganê hatiye dinê. Dema hîn zarok bû malbata wî berê xwe daye Almanyayê. Di biçûkatîya xwe de mêla wî li ser amûrên muzîkê gelekî hebûye. Dikare 6-7 amûrên muzîkê lê bide. Ji bilî muzîkê, hunerên din yên bedew jî bala wî kişandine û yek ji wan jî wênesazî ye. Ji xeynî muzîk û helbestê, ji sala 1988an ve dest avêtiye wêne û peykertiraşîyê û vê yekê hîn didomîne.

Polatli, kurdbûn û helwesta şoreşgerî wek felsefeya jiyana xwe digre dest û di berhemên xwe yên hunerî de vê yekê bi awayeke balkêş nîşan dide. Hunermend, bêyî ku dest ji dilniznîyê berde ji xwe re kiriye armanc ku xizmeta çanda kurdî bike.

Heta îro li gelek pêşangehan berhemên xwe pêşkêş kirine û girîngîyeke mezin dide projeyên hunerî. Îro xebatên xwe bi hevkarîya şaredarîyên alman re dimeşîne û di van xebatan de cih dide konseptên cuda yên çandî. Ji bilî gelek bajarên Almanyayê, li welatên wek Fransa, Awusturya û Holandayê jî bêşdarî pêşangehên şexsî bûye.

Di sala 2009an li Festîvala Çandî ya Munzur a Navnetewî de, bi kevirên ji Munzurê derxistî û bi alîkarîya zarokan enstalasyonek mezin a dîwaran çêkir. Ev enstalasyon, wek mozaîkeke qerase bû û Dêrsim ji gelek waran ve dida nasîn.

Hunermend Polatli, herweha di sala 2007an de katalogek wêneyan jî derxist û navê "Rengên ên din" lê kir. Di demên dawî de giranîya xwe dide xebatên li ser çanda qizilbaşan. Hunermend, dê di demeke nêzîk de vê xebatê jî bi hunerhezan re parve bike.

Ji bo zêdetir agahîyên li ser hunermend, binêre: www.ismetpolatli.com bitikînin

* *Abrenk hatiye vala kirin û îro kes lê najî.*

www.kurdishpedia.org

Nasname û Herêm (Dewama rûpela 1)

kirmanckî, kirdkî, dimilkî, zazakî.

Çiqas ku niha rewş hatiye guhartin û ciwan ji xwe re zaza dibêjîn jî, dêrsimî ji vî navê "zaza" hez nakin.

Çiqas ku niha rewş hatiye guhartin û ciwan ji xwe re ***zaza*** dibêjîn jî, dêrsimî ji vî navê *"zaza"* hez nakin. Gava ku ji wan re *"zaza"* bê gotin, hema qet dudil nabin û dibêjin: *"Em zaza nînin, em kirmanc in, zimanê me kirmanckî ye"*. Dêrsîmî *peyva "zaza"* piçûk dibînin, vê peyvê ji bo kirmancên (zazayên) misilman (sunî) bi kar tînin.

Lê di vê babetê de xaleke giring jî ev e ku, kurdên ku wek ***kirmanc*** tên bi nav kirin, bi tenê ne kirmancên (zaza) derdora Dêrsimê ne. Li gelek deveran kurdên ku bi ***kurmancî*** û bi ***soranî*** diaxifin, jî nasnameya xwe ya etnîkî bi peyva ***kirmanc*** îfade dikin. Li hinek herêman jî ***kirmanc*** rewşeke sosyolojîk îfade dike. Kesên ku mensubê eşîrê nînin yan jî cotkarên feqîr in, xizmetkar in, ji wan ra ***kirmanc*** tê gotin.

Li başûrê Kurdistanê eşîreke *êzîdîyan* heye û bi kurmancî diaxife, lê navê eşîrê *dimîlî* ye.

Kirmanc (zaza), ji kurmancan ra ***kirdas*** dibêjin ku li gor hinek çavkanîyan ev peyv di mana piçûkkirinê de tê gotin. Lêkolîner **Kemal Badillî** yek ji wan e. (1)

Ehmedê Xanî, di *Mem û Zinê* de her du peyvan, yanî ***kirmanc*** û ***kurmanc*** di eynî manayê de bi kar tîne.

Şaîr û dîroknasa bi nav û deng **Mestûre Xanima Erdelanî**, di pirtûka xwe ***Tarîxa Kurdistanê*** de peyva ***kirmanc*** wek ***kirmaç*** dinivîse.

Di vê xalê de tiştekî pir balkêş jî ev e ku ew 4 navên ku li herêmên cuda kurdên kirmanc (zaza) li xwe dikin, navên nû yan jî navên çêkirî nînin. Ew her çar nav jî xwedî bingeh û dîrokeke kevin in. Ji ber ku çîroka wan piçek dûr û dirêj e, ez naxwazim di vê maqaleyê de yek û yek li ser bisekinim.

Zîya Gokalp ku eslê wî kurd e, ji bo kurdên zaza bi kurtahî weha dibêje: *"... Ew ji xwe re **kirt** dibêjîn , ji kurmancan re jî **kürdasî** yan jî **kirdasî** dibêjîn..."* (2)

Hinek kesên biyanî yên ku li ser zimanê kurdî lêkolîn çêkirine, wek **Karl Hadank** û **Arthur Christiansen** îdîa kirine û gotine ku ***dimilî*** û ***goran*** di eslê xwe de ne kurd in, ew ***deylemîyên*** ku ji başûrê rojavayê Deryaya Xezarê hatine, ev in. Li gor îddîaya **Christiansen** peyva ***dimilî***, piştî cih guhartina hinek herfan ji peyva ***deylem***ê peyda bûye.

Li gor dîtîna min ev dîtin ji du alîyan ve bêbingeh e:

1) Xwedîyên vê dîtinê, navên din ên ku ev grup xwe pê dide nasîn (*kirmanc, kird, zaza*) ku di pratîkê de ji ***dimilî*** firehtirin, ji ber çavan dûr xistine, bi tenê peyva ***dimilî*** ji teza xwe ra kirine bingeh.

2) Dîsa wan nivîskaran, nêzikî 20 varyantên peyva ***dimilî*** yên ku di zimanê me de dijîn, danê alîyekî, teza xwe li ser varyanteke ***dimilî*** formule kirine.

Nivîskarê kurd Mamîsanij li ser vê babetê disekine û weha dibêje:

*"... Ew kesên ku îddîa dikin û dibêjin ku **dimilî** ji gotina **deylem**ê peyda bûye, peyva **dunbulî** çi ye, çi tişt e nikarin îzah bikin. Bi qenaeta min peyva **dimilî** ji guhartina **dunbulî** yan jî **dunbelî** peyda bûye."* (3)

3. Dîsa xwedîyên vê dîtinê, di der heqê peydabûna peyva ***dimilî*** de dîtinên din ên ku hene, negirtine ber çavan.

Di alîyê din de, îro gelek kes hene ku gotina *"zazakî ne kurdî ye"* bi armancên polîtîk bi kar tînin. Xwedîyên vê îddîayê, bixwazin nexwazin, ziman dikin tenê krîtera miletbûnê. Yanî meriv gava ku li tezên wan dinêre, bi rehetî dibîne ku esasê dîtina wan ev e: *"zazakî ne kurdî ye û loma zaza jî ne kurd in."* Gava ku armancên polîtîk bi vê toreyê ketin rojevê, cuda fikirîn, lêkolîn û niqaşkirin ji holê radibe û dogmatîzm şûna wan digire. Îro di civaka me de hin kes hene ku di jîyana xwe de paragrafeke ***kirmanckî*** (zazakî) nexwendine û nenivîsandine, lê dîsa jî wek zanayên pirsê gotinan dikin.

Şik tuneye ku ziman di miletbûnê de krîtereke bingehî ye, lê ev krîter tenê bi serê xwe têrê nake. Gere ev û hin kriterên din bi hev re bin ku meriv bêje *"falan grûp yek milet in!"* yan jî *"na"*. Wekî din gere meriv bêje *"ziman yek e, netew jî yek e, ziman cuda ye, netewe jîi cuda ye."* Lê aşkere ye ku formule kirineke wisa rast nîne, şaş e.

Bi taybetî jî di bin bandora kolonyalîzmê de rewşeke wisa peyda bûye ku neteweyek dikare zimanên cuda qise bike yan jî neteweyên cuda dikarin yek zimanî biaxifin.

Der heqê nasnameya dimilîyan de çend çavkanîyên dîrokî

Gava ku meriv bi çavê dîroknasan li pirsê binêre, bi rehetî dibîne ku nêzikî temamîya çavkanîyên dîrokî nîşan didin ku ***kirmanc, kird, dimilî û zaza beşekî*** kurdan in, yanî kurd in. Em ji wan çavkanîyan çendan wek nimûne bidin:

Malmîsanij, der heqê vê babetê de *"Yek ji dîroknasên kevintirin ku behsa qebîleya kurd, **dinbilî** dikin, wek ku em dizanin, **Mesudî** ye. Li gor agahdarîya **Arşak Poladyan**, Mesudî (sala 956ê p.z. miriye), dinivîse ku qebîleya **Dababile** (Dunbilî) li Suriyeyê dicive..."* (4)

Dîsa li gor dîroknasan **Ereb Îbnul Esîr** (1160-1234) û ***Yaqûtî*** jî ***dimilî*** kurd in. ***Yaqûtî***, di esera xwe ***Mu`cemu`l Buldan*** de (Ev eser di sedsala13ê de hatiye nivîsandin), wisa behsa dimilîyan dike: *"Kelayên wan gelek saxlem in. Kelayên **Beşnewî**, **Bohtî** û **Zewazan** bi hevdu ve girêdayî ne. Kurdên ku ji eşîrên dimilîyan in, li ser bilindtirîn çîyayan dimînin..."* (5)

Necmeddin Yaqub Fîruzabadî (1329-1414), di ferhenga xwe ya bi nav û deng ***El Kamusu'l Muhitê*** de, der heqê peyva ***dimilî*** de dibêje ku *"şeklê vê peyvê yê rast **dunbul** e û ev nav, navê eşîreke kurdan e ku di dema bihurî de li dorûbera Mûsilê civiyaye..."* (6)

Gerokê dema osmanîyan ê navdar **Evlîya Çelebî**, gava ku qala kurdên Çîyayê Bingolê dike wisa dibêje:

*"...Xelkê zozanên Bingolê; **Zaza, Îzol, Lolo, Haltî, Çevkanî, Sekaxî, Kîkî, Bîsyanî, Murkî, Yezîdî** ne, û bi sedan hezar heywanên xwe ve derdikevin ser çîyayê Bingolê, li vê derê jîyaneke teze dijîn, ji bo zozanan bacê didin Wezîrê Erzurumê..."* (7)

Ewliya Çelebi gava ku zaraveyên zimanê kurdî rêz dike jî, ***zazakî*** dixe cihê yekemîn.

Wek navê kurmancan peyva *zaza*.

Balkêş e ku peyva ***zaza*** wek nasname, li her derê Kurdistanê ji bo eynî grupê nîne. Ev nav, li rojhelat û başûrê Kurdistanê, navê kurdên ku bi kurmancî diaxifin e jî.

Wek nimûne, **Muhemmedî Xal**, di ferhenga xwe ya ku bi kurdî ye û bi navê ***Ferhengê Xal*** da ***zazakî***, di maneya ***kurmancî*** de îzah dike. Yanî di ***Ferhenga Xal*** da navê lehçeya ***zazakî***, navê lehceya ***kurmancî*** ye. Ew ferheng, di 1960ê de li bajarê Silemanîyê, Kurdistana Başûr hatiye çap kirin. (8)

Li Kurdistana rojhelat **Muhemmed Teqî Îbrahîmpur** jî di destpêka ferhenga xwe ya ***Farisî-Kurdî*** de dibêje ku lehçeya ***Behdînan***ê ya ku navê xwe ji herêma Behdînanê (Badînan) digire, di nav gel de bi peyva ***zaza*** tê bi nav kirin. (9)

Çend sal berê ku ez çûm Kurdistana Başûr, min ev rewş ji hinek rewşenbîrên herêmê pirs kir. Wan jî teyîd kirin ku niha êdî nayê gotin, lê heta 15-20 sal berê ***zaza*** navê kurdên ku bi kurmancî dipeyivin, bûye.

Di warê genetîkê de lêgerîneke balkêş

Çend sal berê Max Blank Înstîtuta Leipzigê (bajarekî Almanyayê), Unîversîteya Îlîm û Teknolojîyê ya Norveçê û London HGI DNA Refernece Laboratory, National Blood Service, bi hev re, di warê genetîkê de li ser rewşa kurdan lêkolînek çêkirin.

Piştre jî, lêkolînvan **Ivan Nasidze, Dominique Quinque, Murat Öztürk, Nina Bendukidze** û **Mark Stoneking** di maqaleyekê de encama vê lêgerînê da nasîn. Maqale bi navê *"mtDNA and Y chromosome Variation in Kurdish Groups"* (Di Grupên Kurdan de Guhartina MtDNA û Varyasyonên Kromosoma Yyê) hat amade kirin. Li gor agahdarîyên ku di destpêka maqaleyê de tên dayîn, lekolîn li ser kurdên ***kurmanc*** û ***kirmancên*** ku di nav sînorên Tirkîyeyê de dijîn û kurdên Gurcistanê ku dîsa bi kurmancî diaxifin û li ser êzîdîyan, hatîye çêkirin. Di beşeke vê maqalê de wisa tê gotin:

*"Danêrên ku di destê me de ne, bi wan gava ku meriv grupên kurdan û grupên ewropîyan, grupên kafkas, rojava û Asyaya navîn dide ber hev, dibîne ku hem ji alîyê **mtDNA** hem jî ji alîyê **cromosoma Y** yê de, grupên ku kurd jê herî nêziktir in, grupên rojavayê Asyayê; ên jê herî dûrtir in jî grupên Asyaya Navîn in. ... Dîsa netîceya ku me bi dest xistîye, nîşan dide ku, dîtinên ku, koka grupa bi **zazakî** dipeyivin, bi bakurê Îranê ve girê didin, ew jî rast nînin. Di warê genetikê de ew (grupa ku lehçeya wan **zazakî** ye, M.Ç.) û grupên kurdan ên din li hev çûne..."* (10)

Çend nîşanên dîrokî yên din

"Li gor agahdarîyên **Papazyan**, kurê **Ehmed Xan El Dunbulî Rustem Xan**ê ku ji kurdên dunbulîyan e, di pirtûkên xwe de "***Îşaretu`l Mezahîb***" û "***Îşaretu`l Edyanê***", **Ebdurrezaq Îbn Necef Qulî Xan Dunbulî**, jî di pîrtûka xwe ***Tarîxê Denabîl*** (Tarîxa Dunbulîyan) a ku 1850ê de hatiye çap kirin, ji bo dimilîyan, kurdên dunbulî yên ku bi bawerîya şîîtîyê ve girêdayî ne dibêjîn. (11)

Malmîsanij, di broşûra xwe ya jorîn de, di heqê aynî grupê de, ji **Dr. Blau** van gotina neqil dike:

"Dunbelî...qebîleyeke kurdan e ku îro ji taîfeya kizilbaşan tên hesibandin. Hemû bi tirkî qise dikin... Li wîlayeta Xoyê dijîn." (12)

V.F. Minorski yê ku wek bavê kurdolojîyê tê nasîn, li hember dîtinên ku kirmancan (zazayan) kurd nahesibînin, derdikeve û gelek eşkere ronî dike û dibêje ku ew kurd in û wan bi şiklekî din bi nav kirin ne rast e. (13) Dîsa kurdologê bi nav û deng **Bazil Nikitin** jî, gava ku behsa kurdên dor û bera Xarpêtê dike, weha dinivîse;

*"... Hewce ye ku meriv bêje ku li wîlayeta Xarpêtê, li herêma Dêrsîmê gelek kurd dijîn û di nav her du beşên Firatê yên jorîn de, li gor gelên din 8 caran zêdetir in. Ew kurd lehçeyeke cuda (zazakî) diaxifin û girêdayîyê mezhebeke din (**Ali Îlahî**) in. Lê çi heye ku ji ber vê sebebê meriv nikare van ji komela kurdan cuda bike."* (14)

Kesên ku li ser ve babetê disekinin, ji wan yek jî rojhelatzan **E. B. Soane** e. Di derheqê kirmancan (zazayan) de **E. B. Soane** weha dibêje:

*"..Zazayên ku li der û dora Diyarbekir û Erzinganê dijîn, şik tune ku kurd in. Ew kurdên ku bi piranî li herêmên çîyayî dijîn, bi cesûrbûna xwe tên nas kirin. Serê wan gulover û hestîyên wan mezin in. Ev lehçe li **mukrî** û lehçeyên din neçûye."* (15)

Mehmet Ali Ünal, profesorekî tirk e ku dokumentên osmanîyan ên sedsala 16ê esas girtîye û li ser Dêrsimê (Sencaqa Çemîşgezekê) pirtûkek nivîsandîye. **Prof. Dr. Ünal**, di pirtûka xwe de navên hin grupên kurdan ên wê demê dide. Li gor agahdarîya wî, di ***Defterên Tehrîrê*** de behsa 17 grupên kurdan ên nekoçber tê kirin û navên wan tên nivîsandin. Di nav van grupan de ***"Ekradı Dımılı", „Ekradı Disimlü"*** ji derbas dibe.

Di vir de tiştê ku herî zêdetir me elaqadar dike, wek kurd binavkirina ***dimilîyan*** e. Dîsa ***"Ekradı Disimlü"*** jî navê grupeke eşirên Dêrsimê ye. Di nav xelkê de eşîrên mensubê vê grûpê "***Eşîrên Dêrsimî***" ne. Ew grûp li rojhelata Dêrsimê dijîn û lehceya wan jî ***kirmanckî (zazakî)*** ye.

Di dokumentên osmanîyan de jî kurdên ku kirmanckî (zazakî) diaxifin, li dervayî "***ekrad***" yanî "***kurdan***" bi peyvek din nayên bi nav kirin. Bi gotineke din, osmanîyan gava ku behsa nasnemaya wan a etnîkî kirîye, her tim gotine ***ekrad***. Wek tê zanîn ***ekrad*** bi erebî pirhejmara peyva ***kurd*** e.

Em bibêjîn ku padîşahê Romê (Osmanî), 29ê çileya 1782yê der heqê cezakirina kurdên Dêrsimê de fermanek derxistiye. Di vê fermanê de *"Ekradı Şey Hasanlu ve Dersimlü ve Güvanlü"* tê gotin. (16)

Çend îstîsnayan ku meriv bide alîyekî, wek arşîvên ereb û farisan, di arşîvên Ewropa û Rûsyayê de jî kurdên ku kirmanckî (zazakî) qise dikin, her tim wek ***kurd*** cîh digirin. Wek nimûne, rapora ku di 1863yê de bi navê ***Kurdên Dêrsimê*** li ser dêrsimîyan hatiye amade kirin û di arşîva ***Çarîtîyê*** da ye, cî dide 5 grupên kurdan. Ew grûp; ***Dêrsimî, Balabanî, Çarakî, Şeyh Hasanî û Kureşî*** ne û hemu jî bi kirmanckî diaxifin.

Li alîyê din di arşîvan de wek herêm jî navê **Dêrsim**ê Kurdistan e. Li gor agahdarîyên ***Şerefname***yê, bi sedan salan gotina Kurdistan tenê ji bo herêma Dêrsimê hatiye bi kar anîn. (17)

Di Têkoşîna Neteweyî ya Kurdan de Rola Kurdên Kirmanc (zaza)

Di vê babetê de niqteya herî muhimtir, xwe ifadekirina vê grupê bixwe ye. Meriv nêrîn û gotinên biyanîyan bide alîyekî, gelo ewên ku *kirmanckî* an jî *zazakî* qise dikin di dîrokê da xwe çava bi nav kirine? Wek ku di destpêka nivîse de ji hatiye gotin ev grup di nav civakê de ji xwe re ***kirmanc, kird, dimilî û zaza*** dibêjin. Lê gava ku bi zimanên din dîtinên xwe anîne ziman, ji xwe re li dervayî ***kurd*** tiştekî din negotine. Di nav kurdên ku kirmanckî diaxifin de, kesên ku xwe kurd, lehçeya xwe jî kurdî nabînîn, cara yekemîn piştî 1980yê derketin holê. Berî vê di dîroka me de nimûneyek jî tuneye.

Dîsa niqteyeke pir giring jî ev e ku helwêsta ***kirmancan*** (zazayan) ne tenê ew e ku "ji xwe ra gotine kurd", vê grupê di doza gelê kurd de roleke gelek giring lîstiye. Bi taybetî jî di berxwedana gelê me ya sedsala 20ê de rola wan, di warê kulturî, sosyal û leşkerîyê de gelek giring e.

Mela Ahmedê Xasî sala 1899ê de bi navê ***Mewludê Kirdî*** mewludek amade kir. Ji bo çi **Xasî** ev eser bi zimanê xwe yê dayikê amade kir? Ji ber ku wek kurdekî welatperwer, qiymeta zimanê zikmakî baş dizanî û loma jî ev gava birûmet avêt.

Dezgeha polîtîk a yekemîn a ku kirmancên Dêrsimê tê de cîh girtine, li 16 çileya 1968ê hatiye damezrandin û navê wê jî ***Xol*** danîne. Ev komîte, komîteya kurd û ermenîyan bi hev re bû, azadîya her du gelan ji xwe re kiribû armanc ku bavê **Seyid Riza, Seyid Îbrahîm** jî piştdarê wê bû.

Di sedsala 20ê de dezgeha milî ya yekemîn a ku kurdan bixwe damezrandine ***Kurdistan Azmî Kavî Cemîyetî*** ye. Kesên ku ev sazîya milî damezirandin, ji wan yek jî **Kurdîzade Ahmet Ramîz** bû û lehça wî kirmanckî (zazakî) bû.

Dîsa kurdên ku kirmanckî diaxifin, di ***Kurd Talebe Hêvî Cemîyetîyê*** de jî aktîf cîh girtibûn. Wek nimûne; **Dr. Fûad, Teyyîb Alî** û **Şadîyê Paloyî**. Ev komel 1912yê de hatibû saz kirin. Ew her sê kurdên welatperwer di 1925ê de li Diyarbekirê hatin bi dar de kirin.

Dr. M. Nurî Dêrsimî di bîranînên xwe de behsa ***Kurdistan Muhîban Cemîyetî*** dike. Wek sazger navên ku Dêrsimî dinivîse, nîşan didin ku ev sazî jî alîyê kurmanc û kirmancên herêmê ve bi hev re hatiye saz kirin.

Operasyonên leşkerî yên ku Împaratorîya Osmanî di destpêka sedsala 20ê de li hemberê dêrsimîyan pêk anîne; kurmanc, kirmanc ferq nake, li dijî hemû kurdên Dêrsimê bûn û gelê herêmê jî bi hev re bersiva wan da.

Gava ku Şerê Cîhanê yê Yekemîn di 1914ê de dest pê kir, li herêma Bêdlîsê kurd li hemberê osmanîyan rabûn. Ev serhidan jî serhildaneke neteweyî bû û kirmanc û kurmanc bi hev re tê de bûn. Gelek kesên çavdêr yên dema Şerê Cîhanê yê Yekemîn, dûr û dirêj behsa helwêsta kurdên Dêrsimê dikin. Wek nimûne, **M. Nurî Dêrsimî**, generalê tirk **Kazim Karabekir** (Qumandarê Qolordîya Erzurumê), Walîyê Erzinganê **Ali Kemal** û nivîskarê tirk **Şevket Süreyya Aydemir**…

Agahdarîyên van hemûyan nîşan didin ku:

1) Di destpêkê de di navbera kurdên Dêrsimê û leşkerê rûsî de şer dest pê kiriye, lê demek şûn de lihevhatin çêbûye û şer hatiye sekinandin .

2) Dêrsimî gelek eşkere nîşan dan ku ew bandora osmanîyan naxwazin, dixwazin hikûmeteke kurdan hebe û di bin îdareya kurdan de bijîn. Ji ber vê yekê avêtine ser dezgehên osmanîyan û piranîya wan ji Dêrsimê jî derxistine.

3) Dêrsimî ji bo damezirandina hikûmeteke kurdî bi rûsan re hevdîtin pêk anîne, heta qismek serekeşîran jî, ji bona vê armancê ji Çarê Rusyayê re name nivîsandine û alîkarî xwestine.

Bi taybetî jî General **Kazim Karabekir** hem der heqê van hevdîtîn û muraceatan de, hem jî li ser têkilîya kurd û tirkan agahdarîyên pir balkêş dide.(17/29)

Ew behsa serekê eşîra ***Arêzan,*** **Hesen Axayî** dike û wisa dibêje:

"Di nîsana 33yê de (1917 M.Ç.) *gava ku min avêt ser dijmin* (mebesta wî rûs in. M.Ç.), *wî got "Em qanûna tirkan nizanin, em li gor qanûna kurdan hereket dikin" û eşîr li hemberî me tahrîk kirin."* (18)

Serhildana 1921ê a ku Kurdistaneke azad ji xwe re kiribû armanc; serhildaneke muşterek bû. Mensubên her du grupan; kurmanc û kirmancan, mil bi mil di vê bûyerê de li ber xwe dan..

Piştî damezrandina Komara Tirkîyê, rewşa gelê kurd meriv dikare bêje ku li gor dema osmanîyan xirabtir bû. Siyaseta nîjadperest û qirêj a kemalîstan, bû sebebê alozî û berxwedanên nû. Ji 1925ê heta 1938ê, yanî panzdeh salan, li Kurdistanê rojek bê şer, bê talan û wêran kirin derbas nebû. Di van operasyonan de dagîrker lehçe û

www.kurdishinfo.com

bawerîyên dînî dan alîyekî û temamîya kurdan kir hedefa terora xwe.

Qismek ji van bûyeran bi tenê li herêma kurmancan yan jî li ya kirmancan pêk hatin. Ji ber vê yeke jî çend berxwedan tenê yên kirmancan yan jî yên kurmancan bixwe bûn. Di serhildana neteweyî ya 1925ê de ***kirmanc*** û ***kurmancan*** bi hev re cî girtin, lê ***kirmanc*** pirtir bûn. Operasyona dewletê ya 1926ê a ku li başûrê roj***avay***ê Dêrsimê, li der û dora ***Gelîyê Alî*** (Ali Bogazî) pêk hat, li dijî kurdên kirmanc (zazayan) bû û serhildêrên vê çalakîyê jî tenê kirmanc bûn. Dîsa operasyona 1930ê a ku li bakûrê rojhilata Dêrsimê, li hêla Plemurîyê û Erzinganê pêk hat, di eynî çarçoveyê de bû.

Serhildana 1926-30ê a ku wek ***Serhildana Agirîyê*** tê bi nav kirin, bi tenê ya kurdên kurmanc bû. Jixwe li vê heremê kurdên kirmanc (zaza) najîn.

Di bûyera 1937-38ê de her du grupên kurd jî hedef bûn. Dewletê kurmanc û kirmanc negot, jenosîd li hemberî her du alîyan pêk anî.

Jixwe gava ku meriv li belgeyên dewletê dinêre jî, bi reheti dibîne ku dewletê qet ferq nexistiye navbera her du grupan, wek kurd her du alî jî di eynî dereceyê de ji xwe re kiriye hedef û zulm û neheqî li hemberî her duyan pêk anîye.

Piştî jenosîda Dêsimê, di tevgera rizgarîyê de, kirmanc û kurmanc, kurdên welatperwer bi hev re xebitîne, ji bo lehçeyan tu caran di nav wan de nakokî peyda nebûne. Ew ji bo pêşketina dozê bi hev ra xebîtîne, di dezgeh û sazîyan de bi hev ra cî girtine. Di sala 1959ê de ***49 kurdên*** ku hatin girtin û dadgeh kirin, elewî-sunî, kirmanc-kurmanc hemû bi hev re bûn. Di dema terora cuntaya 1960ê de jî rewş weha bû.

Piştî 1960ê dîsa di tevgera kurdî de vê rewşê devam kir. Bawerîya olî û lehçe çi dibe bila bibe, kurdên welatperwer, di doza gelê xwe de mil bi mil meşîyan. Kurdên ku ***kirmanckî*** diaxifin, li ser vî esasî, di dezgehên welatperwer de aktîf xebitîn, heta serokatîya van organîzasyonan kirin. Wek nimûne, Sekreterê Giştî yê **PDK** (KDP) **Sait Elçi û Faik Bucak**, Sekreterê Giştî yê PDK-T (TKDP) **Sait Kirmızıtoprak**, kurdên kirmanc (zaza) bûn.

Komelên ciwanên kurd ên ku di dawîya 1960ê de hatin damezirandin û jê re **DDKO**: Ocaxên Kulturî yên Soreşgerên Rojhelatê (Devrimci Dogu Kültür Ocaklari) tê gotin, di bin şemsîya xwe de bêyî ferqîya dîn û lehçe, kurdên demokrat û pêşverû kom kiribû.

Îdîaya "zazakî ne kurdî ye, zaza jî kurd nînin" çawa ket rojevê?

Ev gotin, yanê gotina *"zazakî ne kurdî ye", "zaza kurd nînin",* di dîrokê de cara yekemîn li dor dawîya 1980ê ket rojevê. Wek ku dokument û pratîk jî tîne ber çavan, di dîroka kurdan de û di nav kurdan de berî van salan, meriv rastî gotineke wisa nayê. Ev îdîa heta vê rojê, bi tenê ji alîyê hinek biyanîyan va hatiye îdîa kirin.

Baş e, gelo meriv vê helwêstê çava binirxîne? Bi gotineke din di warê dîrok, etnîsîte û zimanzanîyê de guhartinên çawa çêbûbûn ku gotinên weha ketin rojeva civaka me?

Şik tune ku di van alîyan de qet guhartinek, yan jî çavkanîyeke nû tuneye. Jixwe ew kesên ku di van 25-30 salên dawîyê de îdia dikin ku kirmanckî (zazakî) ne kurdî ye û kirmanc (zaza) jî kurd nînin, heta îro, li ser îdîa û dîtinên xwe lêkolîneke bi rêkûpêk dernexisitine holê, sebebên ku meriv cidî bigire, nedane pêş.

Baş e, eger rastî, yanî çavkanîyek tuneye, em dikarin çawa sebebên vê guhartinê îzah bikin. Bi qenaeta min bo kesên biyanî na, lê ji bo kurdan 2 sebebên vê rewşê yên bingehîn hene:

1) Meriv gava ku li darbeya leşkerî ya 1980ê dinêre, bi rehetî dibîne ku du hedefên wê yên sereke hene. Yek ji van pelixandina hêzên çep û demokratîk, a din jî jiholêrakirina neteweperwerîya gelê kurd e. Mixabin, cunta, li dijî hêzên çep û demokratîk gelek zû bi ser ket, lê kurd wisa nebûn. Hem li derva hem jî li hundirê welêt, berxwedana kurdan berdewam bû, roj bi roj bilind bû û di dawîyê de bû pirseke cîhanî.

Ji alîyê din eger meriv li dijî gelê kurd, polîtîkaya dewletê bi tenê wek zor û şidetê binirxîne, dikeve nav şaşîtîyeke mezin. Şik tune ku ji bo dewletê giringîya propagandaya mêjîşûştinê tu caran ji zor û şidetê kêmtir nebûye û îro jî ne kêmtir e. Heta di rewşa îro da herî girîng e.

Dema ku meriv bi hûrgilî bifikire, dewletê di warê propagandayê de hinek gavên nû avêtin ku ji wan ew her du gelek muhîm in:

2) Heta vê rojê di dokumentên dewletê yên resmî de tu caran qala elewîyan nehatibû kirin. Lê eynî dewletê, li dor nîvê sala 1980ê guhartineke şeklî çêkir û hebûna elewîyan îtîraf kir, lê di çarçoveya *"Senteza Tirk-Îslamê"* de.

Yanî: *"Elewîtî îslam e, lê îslama tirkan e"* yan jî *"Elewîtî kultura tirkan e û elewî tirk in",* bi gotineke din *"Elewî ne kurd in, meriv nikare hem elewî û hem jî kurd be"*.

Bi kurtayî dewletê bi vê polîtîkaya nû xwest ku:

a) Elewîyan bikişîne nav çarçoveya sîstemê, parçe bike, elewîtîyê bihelîne, daxwazên elewîyan pûç bike, bixeripîne.

b) Elewîyan ji kurdan, bi taybetî jî ji doza wan bi dûr xe. Bi vê metodê kurdan parçe bike û hêza wan kem bike.

3) Sebeba duyemîn guhartinên civakî, guhartinên psikolojîk û sosyal bûn.

Di jîyana komelayetîyê de qeydeyek civakî heye; gava ku li ser grupek yan jî civakekê teror û zulim zêde dibe, di vê civakê de tenê dendikên berxedanan hêdî hêdî şîn nabin, pasîfbûyîn û stuxwarî jî derdikeve holê. Di îdeolojî û nasnameyan de guhartin çêdibin. Bi gotineke din, pêlên guhartinên ku di lîteraturê de wek ***"Sendroma Stockholmê"*** tên bi nav kirin, bilind dibe.

Bi taybetî jî di nav çep û demokratên Tirkîyê de guhartinên gelek tûj û xwar peyda bûn. Gelek kesên ku bi salan behsa marksîzm-lenînîzmê kiribûn û şoreşa sosyalîzmê dabûn pêşîya xwe, pişta xwe dan dîtînên berê û ketin xizmeta kapitalîzmê. Ên ku berê cûntaya leşkerî bi şev û roj behsa enternasyonalîzmê û biratîya gelan dikirin, dîsa qismek ji wan bûn nasyonalîstên tirkan, ketin nav tora şovenîstîyê.

Di nav wan grupan de grupa herî mezin ya ku îddîa dike ku ***"zaza ne kurd in",*** ew kes in yên ku ji grupên çep bi dûr ketine û di valayîyê de mane.

Ji ber ku berê cûntaya 12ê îlonê, di nav tevgera kurd û grupên çep de cudatîyên îdeolojîk gelek tûj bûn; grupên çep neteweperwerîya kurdan bi piranî wek paşverûtîyê li qelem didan, ziman, kultur û nasname muhim nedidîtin. Kurdên ku di nav wan grupan de cî girtibûn, ji têkoşîna milî, ji ziman, kultur û dîroka xwe bi dûr ketibûn. Meriv dikare bêje ku ew hîs di dilê wan de hatibû kuştin.

Gava ku pêrgî rastîya jîyanê hatin û şkestin, bêhêvî man û ji dezgehên xwe



Ismet Polatli: **Razber I**, boyaxa rûnî li ser kartonê, 30 x 50 cm

yên berê bi dûr ketin, lê nikaribûn di nav tevgera kurdî de jî cî bigirin. Di nav wan da gelek kes hebûn ku biserneketina tevgera xwe ya berê, biberxwedana kurdan ve girêdidan, kurd wek sucdar didîtin. "Zazatî" bi gotineke din gotina *"zaza ne kurd in"* û *"elewî kurd nînin"* ji bo wan bû du şemsîyeyên nû.

Ji alîyê din, eşkere ye ku li ser axa Tirkîyeyê kurdbûyin tiştekî hêsan nîne. Kurd, ji ber ku kurd in êşkence, ceza, nefîkirin û qirkirin jî tê de, zulim û neheqîyên mezin dîtine. Bi taybetî jî piştî cuntaya leşkerî ya îlona 1980ê, kurdbûyin û li kurdayetîya xwe xwedî derketin, wek dema destpêka Komarê, yanî dema **Mistefa Kemal** bûbû sûcekî mezin. Ji ber vê yekê jî, di eynî demê de ji vê nasnameyê revîn û xwe vêşartin jî zêdetir bûbû.

Gotina Dawîyê:

Wek gotina dawîyê, hewce ye ku meriv bi kurtayî behsa çend xalên esasî bike:

1) Li ser gelê me yê ku bi kirmanckî (zazakî) diaxife: Ne li ser nekurdbûna wan, ne jî wek bi kurdî binavkirina lehçeya wan, tiştekî nû tuneye. Ev nirxandin û binavkirina wekî kurd û bi kurdî, bûyereke dîrokî ye, kevin e.

2) Ev binavkirin jî alîye hêzek polîtîk ve nehatiye dayîn, wek ku dokument û berxwedan jî nîşan didin, gelê me bixwe, ev nav li xwe kiriye.

3) Di nav eşîrên kurdan de tevlihevîyeke wisa heye ku meriv nikare axaftevanên her du lehçeyan ji hev du cuda bike. Ji eşîrên me, beşekî gelek mezin, girêdana wan a bi dîn û mezheban cuda ne û dîsa lehçeyên wan jî hevdu nagirin. Eynî eşîr, li herêmekê bi kirmanckî diaxife, li herêma din bi kurmancî; li herêmekê elewî, li herêma din sunî ye.

4) Meriv gava ku li dîrokê dinêre, bi rehetî dibîne ku di komela kurdan de şerê navxoyî cîyekî gelek taybetî digire. Kurdan av, zevî, zozan, tekilîyen eşîrtî, keçrevandin û gelek tiştên din kirine sebeb û şerê hev kirine. Lê di dîroka kurdan de yek nimûne tuneye ku, meriv bêje cudabûna lehçeyan bûye sebebê alozî û şerekî usa.

5) Di dîroka kurdan de nakokîyên ku destê dewletên dagirker tê de ne, beşekî gelek mezin in û ên herî dijwar in.

Îro jî ev polîtîkaya dewletê nehatiye guhartin, berdevam e. Rêjîma Îranê dixwaze ku ***kakeyîyan*** (***Ehli Heqan***), ereb dixwazin kurdên ***feylî***, ***kakeyî*** û ***êzîdîyan*** ji kurdan bi dûr xin. Ermenistan eynî tiştî ji bo kurdên ***êzîdî*** dike. Li Tirkîyeyê jî ev lîstik hem di warê dînî, hem jî yê lehçeyan de di rojevê de ye. Nasyonalîzma tirkan berê bi dehan salan îdîa kir ku kurd tunene, kurdî ne ziman e. Piştra gava dît ku ev sîyaset êdî nameşe, kes bawerîya xwe pê nayîne, wê gavê jî dest bi gotina ***"zaza û kurd"*** kir. Di van 25 salên dawîyê de slogan ên wek ***"Elewîtî Kultura Tirkan e,", "Elewî tirk in"*** bi gotineke din *"kurdên elewî tunene",* û *"zaza ne kurd in"* di propagndaya li dijî kurdan de gotinên sereke ne.

Bê guman kesên ku lehceya wan kirmanckî ye û xwe kurd nahesabînin, meriv nikare bibêje ku ew hemû girêdayî dewletê ne. Nirxandineke wisa rast nîne. Lê divê meriv lîstikên kolonyalîstan jî bibîne.

* Nivîskar, zimannas

1 Kemal Badıllı,Türkçe Izahlı Kürtçe Grameri (kurmancca lehçesi), 1965, s.6., Malmisanıj, Kird, Kirmanc, Dımılı veya Zaza Kürtleri,Weşanên Deng , Istanbul, 1996, 8

2 Ziya Gökalp, Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler, Komal Yayınları,Ankara, 1975, r. 51

3 Malmisanıj, Kird, Kirmanc, Dımılı veya Zaza Kürtleri, Deng Yayınları, Istanbul, 1996, r. 34-35

4 Malmisanij, b.j. (Berhema li jor), r. 35

5 Yaqutî, Mu`cemu`l Buldan, Chapa Mısırê, Cilt 4, r. 415, Kovara Kulturî Vate, 2002, Hûmara 16, r. 49

6 Malmisanij, b.j. , r. 36

7 Evliya Çelebi Seyahatnamesi M. Zillioglu, Zuhur Danışman Yayınevi, Istanbul, 1973, r. 119, Seyyid Kekil, age. S. 244)

8 Malmisanij b.j. , r. 61

9 Malmisanij b.j. , r. 61

10 Ann. Hum. Genet. 2005 Jul; 69 (Pt 4): 401-12

11 Malmisanij, b.j. , r. 37

12 Malmisanij, b.j. , r. 44

13 V.F. Minorsky, kurdi: Zametki i Vpeçatliniya, 1915, Petrograd, r. 4-5

14 B. Nikitine, Kürtler, Örgün Yayınevi, Istanbul, 2008, r. 94-95

15 M. Emin Zeki, Kürdistan Tarihi, Beybûn Yayınları, 1992, Ankara, r.157

16 Necat Birdogan`dan aktaran Mesut Özcan, Öyküleriyle Dersim Agıtları, Kalan Yayınları, 2002, Istanbul, r. 76)

17 Şeref Han, Şerefname, Türkçeye çeviren M. Emin Bozarslan, Deng Yayınları, 1998, Istanbul, r. 145

18 Kazım Karabekir, Kürt Meselesi, Emre Yayınları, 2004, Istanbul, r. 102

Yekîtîya gelên ereb ya ji nû ve hatî peyda kirin

Herêmeke ku dikele

Georges Corm *

Raperîna ku cîhana ereb dihejîne lawaz nabe û li welatên nû belav dibe, bi taybetî jî li Sûriyê. Li Fasê tawîzên melikî xwepêşandan bêtesîr nekirin (Ignace Dalle, rûpel 10). Ev serhildan hemû berê xwe didin elîtên xwe di ser dewletê re bi cih kirine û welatê wan talan dikin (Samir Aïta, rûpel 11). Li Lîbyayê Albay Qedafî petrola xwe pêşkêşî şirketên rojavayî kir û dema ev dikir jî xelkê Lîbyayê ditepisand (Jean-Pierre Séréni û Rachid Khechana, rûpelên 8 û 9ê). Destwerdana leşkerî ya ji derve rewşê tevlîhevtir bike jî (Serge Halimi, rûpel 20), herêm pêvajoyeke nû ya dîroka xwe dijî û weha xuya ye ku ji nû ve bi Nahda ya ("ronesans") sedsala 19ê ve hatiye girêdan (nivîsa li jêr bixwîne)

Ji 18ê kanûna 2010ê –dema ku **Mihemed Bûazîzî** xwe li bajarekî piçûk ê navenda ***Tûnis***ê şewitand– û vir ve, aktorekî ku weha xuya bû ku ji ser sahneya siyasî ya ereban ji dehsalan û vir ve winda bûye, xwe ji nû ve da der: pankartên ku li ***Tûnis, Qahîre, Bexda, Manama, Bingazî, Sana'a, Rabat, Cezayîr*** û li deverên din bi sedhezaran xwepêşandêr li ba dikin, daxwaza "gel" nîşan didin. Ya ku heta îroj me bi pozbilindî jê re "rêya erebî" digot, veguherî "gel", tevahîya çînên civakî û tevahîya nifşan di nav hev de. Daxwaz hêsan û zelal in, dûrî tevahîya jargonên îdelojîk û meylên demagojîk, dînî û partîkularîst [serxwebûnxwaz] in. Bi zimanekî bê alî û yekser, sloganên xwedî wateyeke bi cewher li her deverî tam cihê xwe digirin: Li alîyekî daxwaza azadîya siyasî, dorguhertina desthilatdarîya siyasî, dawîlêanîna bertîlxurîyê, jihevxistina sazîya ewlekarîyê; li alîyê din daxwaza rûmeta civakî û helbet derfetên kar û mûçeyên dikarin werin qebûl kirin.

Gelo ev "bihara erebî" ya nû ye, ku demeke dirêj e, ji dema serketinên li dijî hêzên kolonyalîst ên brîtanî û fransî ve mirov li bendê ne? Van hêzên kolonyalîst bi Îsraîlê re êriş birin ser sembola berxwedanê ku hingê di 1956ê de Misira **Cemal Ebdulnasir**ê dij-emperyalîst û parêzvanê dunyaya sêyem bû. Ev serdem bi awayekî dijwar sala 1967ê bi şikestina artêşên ***Misir, Sûrî û Urdinê*** li hemberî ***Îsraîl***ê bi dawî bû û paşê lîderê karîzmatîk Nasir berîya wextê xwe di îlona 1970ê de mir. Di navbera 1975 û 1990ê de, Libnana ku kete ber destê kaosê û şîddetê veguherîbû yekemîn welatê mînaka neyênî, tevî hebûna zêde ya milîsên çekdar û artêşên bîyanî û herweha dagirkerîya îsraîlê. Rewşên din ên pir xwîn di wan de hat rijandin ên li ***Cezayir*** û ***Iraqê*** jî diviyabû biqewimin. Vê yekê destûr da rejîmên heyî weke misogerîya îstîqrara siyasî derkevin holê û xwe her diçe bêhtir otorîter nîşan bidin. Fantoma "libnanbûn" û paşê "iraqbûnê" li her deverî peyda dibû.

Bûyerên din ên mezin li ser civakên ereb weke risasê giran bûn. Îdeolojîyên nasnamexwaz ên xwe dispêrin Îslamê şûna neteweperestîyên dij-emperyalîst û laîk girtin. Heke mirov li koka wan bigere, divê mirov li teşwîqa pir çalak a selefîzmê binihêre, ku mîrnişînên petrolî yên Kendavê û bi taybetî jî *wahabîzma* suûdîyê ew belav kir. Neteweperestîya ereb weke dayika tevahîya xirabîyan hat gunehbar kirin û hevgirtina pan-îslamî jî weke çareserîya tevahîya xirabîyan hat nîşan dan. Ya ku Rêxistina Konferansa Îslamî (RKÎ) hewl da di salên 1970yê de pêk bîne ev bû. RKÎ bi pêşengîya Erebistana Suûdîyê û Pakîstanê hat damezrandin. Wê dê Tevgera Bêalîyan û herweha Lîga Dewletên Ereb a ku ji ber lihevnekirinan tevizîbû, di bin sîya xwe de bihişta. Ber bi dawîya dehsalê ve ji ***Riyad*** û ***Îslamabadê*** hat ku beşên ciwanan di cîhadîzma li dijî artêşa sovyetî li ***Afganîstan***ê seferber bike. Vê cîhadîzmê wê paşê berê xwe bidaya ***Bosna***yê, piştre ***Çeçenîstan***ê û herî dawî ***Qafqasya***yê. Beşek ji vê tevgerê wê veguherîya *takfîristan* ango wê li dijî misilmanên ku weke bê îman [kafir] tên dîtin,çalak bibûya. Lehengê wê yê entelektuel wê **Seyid Qutb** (1) bûya; lehengê wê yê eskerî û şervan jî **Osama Bin Ladin**.



Ismet Polatli: **Rûxîn I**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 80 x 120 cm

Di vê rewşa tarî û maskekirî de, me çawa dikarî pêşbînîya serhildanên gel ên di vê astê de bikira?

Îdeolojîyeke din a nasnameyî, ya şoreşa îranî jî wê bandor li cîhana ereb bikira. Bi rengê xwe yê şîa û qebûlkirina hin têgihên destûra bingehîn ên hevdem ew ji wahabîzmê bi gelekî cihê ye û xwe weke mîrasgira dij-emperyalîzmê û sosyalîzma serdema bihurî nîşan dide, lê belê bi zimanekî îslamkirî. Xisleteke wê ya din jî dij-sîyonîzmeke pir hişk e. Şerê ku **Sedam Huseyn** li dijî Îranê sala 1980yê ji bo kêmkirina bandora nû ya Tehranê, li Rojhilata Nêzîk daye dest pê kirin, veguherî lebikandineke din a mezin ku heta îroj dewam dike. Di encamê de wê kir ku ***Kuwêt*** ji alîyê Iraqê ve sala 1990ê bê dagîr kirin, ji alîyê koalîsyoneke eskerî ya rojhilatî ve bê azad kirin, piştre, duwanzdeh salan paşê sala 2003ê kir ku Iraq were dagîr kirin. Civaka iraq ji hingê ve di navbera civatperestîyeke pir hêrs rabûye, bertîlxurîyeke bi gelek rengan û dêstrukturasyoneke [ji destdana yan jî xirakirina strukturan] bi şîddet de diçe û tê, li ba dikeve.

Paşveçûna nasnameya dînî li gelek welatên cihê ên ereban bû sedema alozîyên xurt. Bûyera herî radîkal wê bibûya ya Cezayîrê, ya di navbera 1991 û 2000ê de. Li her devera cîhana ereb, reşeyê îslamperest desthilatdarîyên heyî û hêza mutleq a polîsê wan xurt dike. Dewletên ewropî û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê baş bi wan re li hev dikin. Êrişên bi bandor û xwînrij ên li ***New York*** û ***Waşîngton***ê yên ku berpirsiyarîya wan li **Bin Ladin** û rêxistina wî ***El Qaîdeyê*** tê bar kirin, yên îlona 2001ê lebikandineke mezintir afirand. Van êrişan kir ku rejîmên weke "nerm" tên dîtin, xurt bibin. Heke siyaseta van rejîman a derve biherike birkê tirs û hêvîyên ewropî û herweha amerîkîyan û xwe ji her şêwaz rexnekirina şiddeta îsraîlî ya li dijî filistînî û libnanîyan bidin paş, hingê weke "nerm" tên dîtin. Yekane hedefa dîplomasîyên rojavayî dibe tewereya îran-sûrî; ev tewere ji bo Waşîngtonê serîhildêr e û destekê dide du berxwedanên li dijî Îsraîlê: ya Hizbullaha li Libnanê û ya Hamasa li Filîstînê. Di vê rewşa tarî û maskekirî de, me çawa dikarî pêşbînîya serhildanên gel ên di vê astê de bikira?

Dewlemendîyên pêk tên bi berhemdarîya qels a aborîyên van welatan re hîç li hev nake

Korbûna çavdêrên li cîhana ereb û herweha li Ewropa û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bi tevahî li ser pirsgirêkên aborî û civakî bû. Heta ku şirketên mezin ên pirneteweyî dikarîbû karên pir pere dianîn, pêk bînin di çarçoveya her diçe bêhtir serbestkirina aborîyên ereb de, ya ku ji sê dehsalan ve dewam dike û heta ku birêveberên herêmî û hevkarên wan karîbû dewlemendîyên pir mezin kom bikin, ya ku bi kêrî îndustrîya malên luks a li Ewropayê û deverên din û herweha bi kêrî bazara milk a li paytextên mezin dihat; ma mirovî dikarî ji çi gazinan bike? Dogmayên nûlîberal yên tetmînkirî, karsazên nû yên ereb, mîlyardarên ku encama destbelavîya karê petrolê ye, yên di qesrên hukûmetan de hatine xwedî kirin, weke nîşanên herî baş ên "hevdembûna" aborîyên ereb dihatin dîtin. Kevnemilîtanên ereb ên neteweperest û marksîst diqulibin nûlîberalîzm û nûmuhafezekarîya bi terzê amerîkî. Pereyên ji petrolê tên li ser çapemenîyên erebî serdest in.

Her tiştê mayî, hat paşguh kirin: Statîstîkên bêkarîyê yên ku li defa hewarê dixist yên ji rêjeya navincî ya dinyayê zêdetir, nexasim jî di nav ciwanan de, koçberîya mejî, tevgerên koçberîyê yên her diçe zêde dibin, hebûna hejmarên mezin a nexwendewarîyê, kevîyên bajaran ên pir mezin û xizan, di nav tebeqeyên pir mezin ên civakê de hêza kirînê ya ji lawazê jî xirabtir, di heman demê de tu misogerîya civakî ya van beşên civakê nîne, bertîlxwarina giştîbûyî û jimoralketina xelkê, dilxelîn û bêzarîya çînên navîn, û birêvebirîya anarşîk a beşa taybet ku bi xwe bertîldêra mezin e û çawa ku li ***Tûnis***ê jî weha bû, pirî caran hedefa êrişan kesên herî payebilindên desthilatdarîyê ye. Li piştî rêjeyên van salên dawîyê nisbî zêdebûyî û reformên ku armanca wan ew bû ji sazîyên malî yên navneteweyî û Yekîtîya Ewropayê notên baş bistînin, rastîya civakî û aborî bi tevahî guhertî ye. (2)

Sermayeguzerîyên taybet ên herêmî yan jî yên mîlyardarên ranta petrolê xwe davêjin sektorên milkên luks yan jî tûrîzmê û herweha ji belavkirina bazirganîyê heta bi

banka û telekomunîkasyonê ku gelek taybetkirin lê pêk tên (*nivîsa Samir Aïta ya di rûpela 11ê bixwîne*). Borsa û bûhayên milk û xanîyan pir zêde dibin, bi vê jî komên taybet yên malbatî û muşterîperest [aborîya ku berjewendîyên nas û dostan li pêş digire] hê dewlementir dibin. Dewlemendîyên pêk tên bi berhemdarîya qels a aborîyên van welatan re hîç li hev nake; ji potensîyala van aborîyan yan kêm sûd hatiye wergirtin yan jî qet sûd nehatiye wergirtin. Sermayrguzerîya di çandinê, pîşesazî yan jî sektorên nirxê wan ê lêzêdebûyî pir (înformatîk, elektronîk, lêkolîn û pîşesazîyên tibbî, enerjîya tavê, çopan, jîngehê, birêvebirina avê û hwd.) de gelekî kêm e. Laboratuwarên lêkolînê û pêşketinê di sektora taybet de hema bêje nînin; sektora taybet pereyan bi tenê li çalakîyên aborî yên nirxê wan ê lêzêdebûyî kêm radizînin ku kara wan pir e û rîska wan a malî nîne.

Gelo bihara ereb wê pîştî Tûnis û Misirê bisekine? Gelo Lîbya wê veguhere mînakeke neyênî...

Kalîteya beridîna aborîya rastî tu cara bala hukûmetên herêmî yan jî dewlet û sazîyên ku alîkarî da wan, nekişand ser xwe. (3) Koçberî weke çareserîya zêdebûna serjimarê û bêkarîyê tê teşwîq kirin. Tevahîya nivîsên rêxistinên navneteweyî pesnê wê didin weke ku çareserîya mucîzeyî ya pirsgirêka xizanîyê be, tevî ku tu delîl nînin yên ku tesîra vê koçberîyê ya erênî ya li welatên karkeran dide derve, piştrast bike. (4) Mirov pê razî ye ku mîkro-kredîyan bide; hemin ev kredî ji bo bipêşketina xizanîyê rawestînin, bi kêr tên, lê belê tu cara ji wan nehat ku bikin xizanî bi awayekî ciddî kêm bibe.

Pirs ew e ku mirov zanibe, çawa tevgerên niha heyî dikarin xwe li ber her şêwaz ji nû ve xurtbûnê û heta dij-şoreşan bigrin. Riya cîhana ereban ber bi azadî û rûmeta ji nû ve peydakirî ve, wê hem li qada hundir û hem jî li ya navneteweyî dirêj û zehmet be. Tepisandin mumkin e dijwar bibin û tehlûke heye desttêwerdanên ji derve jî zêdetir bibin, çawa ku li Lîbya û Bahreynê qewimî, li her du welatan jî dîmenên şerê navxweyî xwe didin der. Gelo bihara ereb wê piştî ***Tûnis û Misirê*** bisekine? Gelo ***Lîbya*** wê veguhere mînakeke neyênî ya ku wê bike mirov ji şerên navxweyî yên dirêj û desttêwerdanên ji derve yên mezin bitirsin?

Tehlûkeya pêşî ya ku li pêşîya van destpêkên şoreşan kemîn vedayî, daxwaza ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Ewropayê bi rengekî xurt îfade dikin, ya pê re pêkanîna reformên demokratîk xwe dide his kirin. Wateya "pê re pêk anîn" li vir bi alîkarîya dolar û euroyan bi dest xistina mişterîyên nû ye. Ma nexwe êdî ne wext e ku gelên dest bi meşê kirin bi xwe çarenûsa xwe bigirin dest, bêyî ku rê ji wan re bê nîşan dan û mirov têkilî nav karên wan bibe? Ji salên 1820ê û pê ve bi rêya nivîsên cihê yên entelektuelan, mirovên dînî yên rohnîbûyî, mîlîtanên destpêkê yên mafên mirovan, têgihên komarxwazî û welatîbûnê yên ku encama şoreşa fransî ne, di nav elîtên cîhana erebî de belav bûn. Tevahîya mirovên fikr ên vê ronesansê di danasandina pêşketinên azadîyê yên li Ewropayê pêkhatî de xwedî par in. Di bin banê mîrnişînîyê de li Misirê jîyaneke parlemanter a zindî hebû, Iraq jî bi heman rengî bû û berîya ku sûbayên baasîst desthilatdarîyê bigirin destê xwe li Sûriyê jî. Baş e, em ji bo Tûnisê çi bibêjin ku entelîjensîya wê ji sedsala 19ê ve bi awayekî xurt destek da danasîna têgihên destûrên bingehîn ên modern? Êdî karekî lezgîn e ku mirov ji bo îhtîmam û dahênana wan, malavahîyê li ewropî û amerîkîyan bike.

Dînamîzmeke nû ya aborî dikare rê li ber dubendîyan bigire

Tehlûkeya duyemîn di lawazîya aborîyên herêmî de û di girêdana wan a piralî ya hilberînên xwarinê û pêdivîyên sereke de ye. Nakokî ew e ku kêmasîya yek aborîyê ji van nîne ku pereyan li dînamîkeke nû ya aborî xerc bike; li hemberî vê, ji bo ku ev dînamîk bê pêk anîn şert e ku kokên aborîya ranta nirxê wan ê lêzêdekirî qels e, bibe hedef, ev rant li her deverî serdest e. Ji bo ku mirov derbasî aborîyeke bi tevahî berhemdêr bibe, ya ku ji çavkanîyên heyî yên xwezayî û mirovî sûdê werdigire, divê dînamîka aborî ya nû bê bi cih kirin. Ji lêgerîna alîkarîya ji derve bêhtir, divê mirov gelek jîr û jêhatîyên li derveyî welêt bikişîne ku dema hêzên xwe bi hêzên li welêt mayî re bikin yek, hingê dikarin pêşîyê li birêveberîyeke nû ya siyasetên dewletê veke ku wê îlhamê ji siyasetên pilingên asyayî bigirin û bi alîkarîya ji derve hîç şert li ser nehatibin danîn. (5)

Tehlûkeya sêyem di navbera çînên navîn ên bajarî û tebeqeyên xelkê û xizan, gundî û bajarî de derketina nakokîyên civakî ye, ku yekîtîya heta nuha biserketina tevgerên daxwazdar bû. Koalîsyoneke berjewendîyan ya di navbera komên aborî yên taybet û çînên navîn de ji bo kêmkirina hêvîyên çînên herî xizan –mûçegir jî di nav de– dibe ku bi taybetî bi tehlûke be. Bi hevkarîya bi berjewendîyên siyasî û aborî yên ji derve re ew dikare bibe sedem ku hêdî hêdî tevahîya destketîyên heta nuha bi vegera ser dika siyasî ya gel re hatî bi dest xistin, ji dest biçin. Daxwazên adil ên mûçeyan divê bê guman bên razî kirin, lê belê ew dikarin dîsa jî ewqasî baş bin, heke sazîya hilberînê bi lez ji aborîya rantxwarinê ya kêm berhemdêr û nirxê wê yê lêzêdekirî kêm e bi dûr bikeve û berê sermayeguzarîya dewletê û ya taybet ber bi sektorên nûçêker, lêkolîn û pêşketinê, piralîkirina aborîyê li derveyî sektora milk, malî û bazirganîya belavkirinê ve bê guhertin. Divê pergala bacê bi awayekî ji serî heta binî were sererast kirin da ku ne bi tenê wekhevîya adil a bacê pêk were, belê herweha berîya her tiştî ji bo wekhevkirina rêjeya kar ya di navbera sektoran de weke hev bike; sektorên bê rîsk û nirxê wan ê lêzêdekirî kêm û sektorên ji bo wan divê mirov rîskê bigire, lê belê îmkanên wan ên lêkolîn û pêşxistinê hene.

Tehlûkeyeke dawîyê jî ku tevahîya serokdewletan xwest heta niha siyasetê li ser bimeşînin ev e: Herêmperestî û eşîretperestî, heta dubendîya di navbera sunî û şîiyan de yan jî di navbera xirîstîyan û misilmanan de. Ev meylên li dor navendê, bêhtir encama nearamîya ji ber bipêşketineke aborî û civakî ya newekhev e û ne ji ber muxalefetên nasnameyî ne ku ji ber xwezaya antropolojîk û esensîyalîst têk naçin. Di vê qadê de jî, bi tenê dînamîzmeke nû ya aborî bê pêk anîn, tevahîya hewldanên bikaranîna wan dikarin bên pûç kirin.

* Aborînas û dîroknasê Rojhilata Nêzîk; nivîskarê pirtûkên Proche-Orient éclaté [Rojhilata Nêzîk a Teqiyayî], weşanên Folio/dîrok, Paris, 2010 û Le Nouveau gouvernement du monde [Birêveberîya Nû ya Dinyayê], weşanên La Découverte, Paris, 2010.

1 Birêveberê Birayên Misilman ên misirî, li ser fermana Nasir sala 1966ê hat bi dar vekirin

2 "L'aggravation des déséquilibres et des injustices économiques au Proche-Orient" [Xirabbûna Newekhevî û Bêdadîyên Aborî li Rojhilata Nêzîk] bixwîne, *Le Monde diplomatique*, îlona 1993ê

3 Binihêre li "L'ajustement structurel du secteur privé dans le monde arabe : taxation, justice sociale et efficacité économique dans le monde arabe" [Sererastkirina tevnî ya sektora taybet di cîhana ereb de: Ferzkirina bacê, edaleta civakî û bibandorbûna aborî di cîhana ereb de], in Rémy Leveau (birêveber), *L'Economie de la paix au Proche-Orient [Aborîya Aştîyê li Rojhilata Nêzîk]*, berg II, Maisonneuve û Larose, Paris, 1995

4 Binihêre li *Le nouveau gouvernement du monde. Idéologies, structures et contre-pouvoirs [Birêveberîya nû ya dinyayê. Îdeolojî, tevn û dij-hêz]*, La Découverte, Parîs, 2010

5 Di navbera 1970 û 2000ê de hatinîya koçberan bi tenê ji bo welatên ereb ên li peravên Derya Sipî 359 milyar dolar bûn û alîkarî jî bi qasî 100 milyar dolaran (alîkarîya eskerî jî di nav de) bû. Çavkanî: Bingeha daneyên Bankeya Cîhanê li ser koçberîyê û bingeha daneyên CAD-OECD

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Cezayîr

Tedbîrên aborî û civakî

-Veqetandina 20 mîlyar euroyan ji bo tedbîrên civakî yên cur bi cur, nemaze ji bo deynên ciwanan yên faîza wan % 0.

-Devjêberdana hemû tevdîrên kontrolkirina bazirganîya nefermî.

-Meaşê profesorên zanîngehê nêzî çar qat bilind bû, ji 50 000an gihişt 200 000 dînaran (ji derdora 500 euroyan gihişte 2 000an). Soza alîkarîyên rasterast ji bo ciwanên bêkar hat dayîn. Wekî din, 120 000 jinên malê yên mezûnbûyî wê ji kredîyên sazkirina şirketan feydayê wergirin.

-Zabitnivîs, ku li sibatê di grevê de bûn, zêdebûneke meaşî ya % 110ê bi dest xistin.

-Li gor wezîrê karên hindûr, ***Daho Ould Kablia***, ji çardeh daxwazên zêrevanên şaredarîyan (ku hevkarîya cendirmeyan dikin) heşt hatin bi cih anîn, bi taybetî zêdebûna meaş û prîman û dana pereyên betlane û saetên xebata zêde.

-Bacên li ser şekirî kêm bûn.

-Sermaye guzarîya binesazîyê ya ku wê bi qasî 112 mîlyar euroyan lê bê xerc kirin, wê dest pê bike.

Tedbîrên siyasî

-Rewşa awarte ya ji 19 salan ve heye, betal bû.

-19ê adarê serokdewlet **Bouteflîka** bêyî ku agahîyên kite bi kite bide, "reformên siyasî yên berfireh" îlan kirin.

Erebistana Suûdîyê

Tedbîrên aborî û civakî

-Planeke pêşî ya 25,6 mîlyar euroyan li sibatê hat diyar kirin. 18ê adarê, melik planeke duyem îlan kir, ku dê bi dehan mîlyar dolaran bibe mal (bêyî ku em karibin tedbîrên li sibatê xuyakirî ji yên adarê veqetînin): Prîmên bi qasî meaşê du mehan didin hemû memûran; alîkarîyeke 375 euroyan ji bo hemû bêkaran; bilindkirina meaşê asgarî yê welatîyan ji bo 560 euroyan; veqetandina kredîyan ji bo înşakirina 500 000 lojmanan; zerfeke 3 mîlyar euroyî ji bo beşa tenduristîyê.

-Avakirina komîsyonekê ji bo têkoşîna li dijî bertîlxurîyê.

-Îstîhdama 60 000 nûmemûrên polîs.

Tedbîrên siyasî

-Tunene.

Bahreyn

Tedbîrên aborî û civakî

-% 25ê kêmkirina mîqdara paşvedana deynan ji bo beşdarên bernameyên lojmanê (35 800 malbat).
-Wezîrê karên hundir peydakirina 20 000 karan îlan kir, melik subvansîyoneke 1 790 euroyî ji bo her malbatê diyar kir. Herweha, 120 mîlyon euro dê ji bo alîkarîya malbatên herî xizan bên veqetandin.

Tedbîrên siyasî

-Azadkirina bêhtir ji sê sed girtîyên siyasî.

-Vegera surgûnîyê herî navdar, **Hassan Muşayma**.

-Ji karderxistina pênc wezîran ji ber suîstîsmala desthilatê.

-Mîrê waris, **Salman Bin Hamad El-Xelîfe**, bingehên guftûgoya di gel muxalefetê weke "*parlamentoyeke pirhêzî*" û "*hikûmeteke ku temsila gel dike*" qebûl kir.

Taloqkirina tedbîrên wek rewşa awarte û 15ê adarê hatina leşkerên suûdî û yên welatên desteya Hevkarîya Kendavê.

Lîbya

Tedbîrên aborî û civakî

-Serifandina subvansîyoneke 324 euroyan ji bo her malbatê û zêdekirina % 150 ya meaşên hin kategorîyên sektora dewletê.

-Betalkirina bac û mafên gumrikê yên li ser berhemên xwarinê.

Kuweyt

Tedbîrên aborî û civakî

-Dana xerciyeke 2 647 euroyî ji bo her welatîyekê/î.

-Belavkirina belaş a xwarinê ku buhayê wê yê liserhev 600 mîlyon euro ye.

Urdun

Tedbîrên aborî û civakî

-Zêdekirina meaşê xebatkarên qada sektora dewletê û leşkeran.

-Peydakirina 21 000 karê sektora dewletê, 6 000 polîs û cendirme jî di nav de.

-Kêmkirina bacên li ser benzîn û berhemên xwarinê.

-Zêdekirina kredîyên ji bo projeyên bi armanca pêşdebirina herêmên herî xizan veqetandî.

Tedbîrên siyasî

-1ê sibatê, melik Abdullahê Urdunê, **Marûf Bexît** weke serokwezîr wezîfedar kir, da ku şûna **Semîr Rifaî** bigire -Yê ku xwepêşandêran dixwest îstîfa bike.

-20ê sibatê, li hember berfirehbûna tevgera protestoyê, wî bang li hikûmet, parlamento û dadgerîyê kir ku "*reformên siyasî yên rasteqîn*" pêk bînin, "*guftûgoyeke giştî*" bidin dest pê kirin û li dij bertîlxurîyê têbikoşin.

Fas

Tedbîrên aborî û civakî

-15 mîlyar dîrhemên zêde (nêzî 1.5 mîlyar euroyan) dê ji bo kaseya berpirsa subvansîyonên malên kiryarî, nemaze petrol û gazê, bê veqetandin. Budceya vê sazîyê weha nêzî du qatan zêde dibe.

Tedbîrên siyasî

Di axaftina xwe ya 9ê adarê de, melik **Mihemed VI** pêkanîna reformeke destûrî diyar kir, li gel xurtkirina statûya serokwezîr, dewleta hiqûqê, serxbixweyîya dadgerîyê û di destûra bingehîn de qebûlkirina elemanê berber amazîgh.

Uman

Tedbîrên aborî û civakî

-Siltan **Qabûs** soz da ku dê 50 000 kar bên peydakirin û alîkarîyeke mehane ya 350 euroyî wê ji bêkaran re bê veqetandin.

-Zêdekirina meaşê asgarî ji 261 euroyan bo 373 euroyan.

Tedbîrên siyasî

-Deh wezîr ji kar hatin avêtin. Ji wezîrên nû, çar ji Desteya Şêwirmend a Hilbijartî tên.

-Wî her weha îlan kir ku hin îmkanên qanûnçêkirinê veguhêzîne desteya duodeyî (odeyeke ji van ne hilbijartî ye), berfirehîya van îmkanan dê bi riya madeyekê li Destûra Bingehîn zêdekirî diyar bibe, ya ku komîsyoneke di bin çavdêrîya siltan de wê binivîsîne.

Sûrîye

Tedbîrên aborî û civakî

-187 mîlyon euro ji bo xelkê xizan hatin veqetandin. Wekî din, alîkarîya mehane ya mazota malê wê ji 14.70ê bo 23.50 euroyan zêde bibe: Ji 2001ê ve, cara yekem e zêdebûneke weha pêk tê.

-Kêmkirina bacên li ser qehwe û şekir.

-Kêmkirina mafê gumrikê li ser berhemên xwarinê.

Tedbîrên siyasî

-Rakirina qedexeyên li ser torên civakî ***Youtube*** û ***Facebook***.

- Kêmkirina sê mehan ji dema leşkerîyê.

Yemen

Tedbîrên siyasî

-Serokkomar **Elî Abdallah Salih** diyar kir ku ew ê 2013ê di hilbijartinê de nebe namzed û ew ê desthilata xwe teslîmî kurê xwe neke.

-Heta dawîya 2011ê dê referandumek li ser Destûreke Bingehîn a nû pêk were û rê li ber rejîmeke parlementer veke.

-Kabîneya serokkomar 20ê adarê fesih bû.

www.kurdishmonde.org

Şerên ji bo kontrola vê çavkanîya stratejîk û şêwazê ku pê şirketên rojavayî li Lîbyayê qesrên xwe ava kirin, di tevahiya dîroka petrolê de xuya dikin.

Libya

Petrola Lîbyayê dest diguherîne

Jean-Pierre Séréni *

Di destpêkê de, ne mumkin e mirov vê yekê îzah bike. Hevkarên wî yên kêm ew weke yekî mirov jê bêhêvî, bêîstiqrar û bikaprîs didîtin. Di 1986ê de, Serokê amerîkî **Ronald Reagan**, berî ku fîloya xwe ya şeşem ji bo bombebarankirina Lîbyayê bişîne û ambargoyeke petrolê ya dijwar li ser wî ferz bike, ew weke *"kuçikê har ê Rojhilata Nêzîk" (1)* nirxand. Mêrik hîn wê demê bûbû sîmayekî jê nehez. Û tevî wê jî, serheng Mûamer Qedafî bi ser ket, piştî bîst salan, şirketên petrolê yên mezin ên amerîkî jî di nav de, wî welatê xwe kir yek ji îxrackarên serekî yên petrola xam a bikalîte. Mêrxasîyeke wiha çawa pêk dihat?

Bêşik "Qedafîyê petrolfiroş" ji înîsîyatîfên siyasî yên hundir an derve bêtir, belkî wê di birêvebirina karên sektora xwe de aqilekî hîn selîmtir nişan bida. Bêgûman, dîsa, petrolfiroşên hemî dinyayê hîn bûne baştir bijîn –û bêtir pere qazanc bikin, gelek pereyî ji derdora Libyaya bitaybetî bêîstikrar, heta dijmin feyde bikin. Lê belê dîsa jî nediviya wisa be..

Paradoks ji mêj ve ye. Di 1951ê de, Libya, demeke dirêj bi navê *"qralîyeta valahîyê"* hate bi nav kirin û di nav tunebûneke mezin de xwe gihand serxwebûnê. Ew meyweyê anakronîk ê di navbera emperyalîzma brîtanî ya ketî û terîqeteke misilman a sahrayî ya bi navê Sanoûsiyyayê bû (ku qral bixwe jî ji wê bû). Îxracata wê ya bitenê hesinê xurde yê ji meydanên şerê cîhanê yê duwem hatibû berhev kirin bû.

Di pênc salan de rojê pênc mîlyon varîl

Xebatên jeologê îtalî ku di salên 1930ê de pêk hatibûn –û ji alî bisporên eskerî yên artêşa emerîkî ve hatibûn taqîb kirin- hebûna petrolê di bin erdê fireh a welêt (1,7 milyon km²) de dest nîşan dikirin. Qanûna petrolê, ya di 1955ê de hate pejirandin, mohra xwe li devjêberdana şertê "li her welatekî petrolfiroşek; weke li Îranê ***Anglo-Iranian***, li Erebistana Siûdîyê ***Aramco*** û li Iraqê ***Petroleum Company***, ku li Rojhilata Nêzîk li kar bû", da. (2) Berevajîya vê, li Libyayê, firotin bi dema (pênc salan) û bi herêmê bisînor bû. Dema petrol derket, tercîh jî mentiqî bû.

Lêgerîn bi deh şirketan (kompanya) bi xurtî dest pê kir. Piştî şeş salan, di 1961ê de, Exxonê termînala Mars-El-Brega vekir: Û kargoya pêşîn hate bi rê kirin. Di nav pênc salan de, hilberînê rojê milyon varîlan derbas kir, ku heta wê gavê tiştê wiha nehatibû dîtin. 1962yê neh, deh şirketên weke ***Exxon, Shell, BP, ENI*** dixebitîn, 1968ê jimara wan gihişt sî û nehê. Modeleke nû ya hilberîna petrolê derket holê, ku hêdî hêdî dê xwe li ser welatên din jî ferz bikira.

"Şêxê sor" şirketan li dijî hev bi kar tîne

Ji destpêka hatina ser desthilatê –piştî darbeya eskerî ya 1ê îlonê ya 1969ê- Qedafî înîsîyatîf girtiye destê xwe. Ew dixwaze ji bo petrola xam fîyatekî pir bilind bi dest bixe. Wezîrê pêşîn ê Petrolê yê Siûdîyê, **Abdullah Tariqî**, ku jê re "şêxê sor" jî tê gotin (ji alî qiral Faysal (1964-1975) ve ji ber wêrekîya xwe ji kar hate derxistin), şirket yek li dijî ya din bi kar dianî, berî ya herî mezin, ***Esso***, derxist hemberî yeke piçûk a serbixwe ya rojavayî; bi awayekî otoriter hilberîna wan a rojane dadixist nîvî da ku dahata xezîneyê zêde bike. Ya pêşî dikare petrola xam a herêmî hilberîna xwe bi ya li welatên din re biguhere. Ya diwem ku ji xeynî Libyayê li cîyekî din tiştekî wê tuneye, bi nisbet yên serekî, her heft şirketên herî mezin ên dinyayê, xeleka lawaz e (3), naxwazin jê re varîlekê jî bihêlin. *"her tiştê wî bi hev re di tehlûkeyê de ye"* gotûbêjkerên libyayî di bin simbêlan re dikenin. (4) Şirket fermana xwe bi destê xwe îmze dike. Kanala Suweyşê girtî ye, Kartel (5) di îlona 1970yê de teslîm dibe**,** fîyat û baca wê bi carekê de ji % 20ê zêde dibe.

Ev yek li pêş çavên welatên din ên ku petrolê îxrac dikin pêk tê: Şûna yekê bi tenê, baştir e ku mirov bi gelek operatoran re di têkilîyê de be û bi biaqilî mîzanîya hebûna şirketên mezin ên navneteweyî bi cih bike; ango yên serekî, bi şirketên din, yên hîn mitewazîtir, bêçavkanîyên alternatif têxe mîzanîyê. Şirketên serbixwe û yên dewletên ewropî jî di qada navneteweyî ya petrolê de hemleyên xwe dikin.

Muamer Qedafî û Konseya xwe ya Şoreşê, tam dane ser şopa serokê misrî **Cemal Abdul Nasir** û bi biryardarî dixwazin dewlemendîyên xwe yên neteweyî bi şûn de bigirin. Lê wan gelek karên qirêj jî plan kirin: Bûyera serokwezîrê îranî **Muhamed Musadiq** ê ku bi sedema êrişî Anglo-îraniyan kiribû, ji alî CIAyê ve, di 1953yê de, ji ser desthilatê hate daxistin; Her weha ya serhengê cezayirî **Huwarî Bûmediyen**ê ku, piştî netewîkirina rezervên şirketên fransî, di 1971ê de, rûbirûyî ambargoyeke giran bû.

Hîn îro jî, ***Trablûs*** li bela xwe digere. Di çileya pêşîn a 1979ê de, eskerên îranî yên şah giravikên ***Tumb*** û ***Ebû-Mûsa*** yên li Kendavê, di êvara roja valakirina yekîneyên îngilîz de dagîr kirin. ***British Petroleum*** (BP) hate netewî kirin. Mahne derket, lê rîskên mezinahîya wê: BPyê piranîya rezervên Sarirê ku girîngtirîn rezervên welêt in, girte destê xwe. Piştî şerekî dijwar ê hiqûqî, peymanek hate girêdan: Libyayê ji nû ve kontrola hemî rezervan girt destê xwe...

Bi bikaranîna zorê, senaryo nehat guhertin, teknîsyenên bîyanî eziyet dîtin, xebat li ser platformê giran bû û vê yekê zirar li hilberînê kir :

Şirketên ji vê rewşê aciz yên wek ***Gulf, Philips, Amoco, Texaco, Socal*** û yên din li pey hev, dev ji rezervan berdan (û terka welêt kirin). Şirketa dewletê, ***Libyan National Oil Company*** (LNOC), ku li gor ekola amerîkî ava bûbû, bêdijwarî ji nû ve dest bi hilberînê kir. Di deh salan de, hatinîya welêt pênc caran zêde bû û di 1979ê de, dahata serê mirovî gihîşt 10 000 dolaran.

Dijwarî dê ji alîyê siyasî de bên. Di çileya pêşîn a 1979ê de, Wezareta Karê Derve ya DYAyê lîsteya xwe ya pêşîn a dewletên ku piştgirîya terorê dikin belav dike. Libya, bi taybetî jî ji ber piştgirîya xwe ya ji bo tevgerên filistînî yên radîkal, di serê lîsteyê de cih girt. Piştî wê bi demeke kurt, ***Washington***ê balyozxaneya xwe ya li Trablûsê girt, paşê jî kirîna petrola xam a libyayî li hevwelatîyên amerîkî qedexe kir. Di encamê de, di hezîrana 1986ê de, hemî bazirganîya bi *Cemahîrîyê* re (pêyva nû ya ji du peyvên erebî pêkhatî, komar û girseyên gel) neqanûnî îlan kir.

Xewna riyeke sêyem a gerdûnî, Lockerbie û ambargo

Di 21ê çileya pêşîn a 1988ê de êrişa li dijî ***Boîngeke 747*** a ***Panama*** li ser ***Lockerbie***, paşê di çirîya paşîn a 1989ê de li dijî ***DC10*** a şirketa fransî ***UTA***, bû sedema mueyîdeyên navneteweyî ku dê tesîra xwe li senaîya petrolê ya libyayî bikira. Ev jî dikeve ser dijwarîyên din ên weke kêmbûna kûrê navneteweyî yê petrola xam, giranîya şantîyeyên weke yên dema Feraûn an jî ber bi xerabûnê ve çûna rewşa aborî ya netewî, ji ber pêkanîna tawsiyeyên *Pirtûka Kesk* -namîlkeyeke anarko kolektivist a kûr û dirêj ku ji alî rêberê şoreşê ve hatibû amade kirin û di navbera kapîtalizm û marksîzmê de xewna *riyeke sêyem a gerdûnî* didît.

Ger LNOC ji bo ku li şûna bazarên jidestçûyî yên ji ***Atlantîk***ê wê de bi cî bike, bi hêsanî bazarên nû li Ewropa, li Tirkiye û Brezîlyayê dibîne, ambargo zextê dixe ser planên wê yên pêşketina di warê keşfa petrokîmya û gaza xwezayî de. Ji ber neşiyana ber bixwevekişandina sermîyanên rojavayî, teknolojî, kabîlîyeta karkirinê û techîzatên "malê amerîka", projeyên mezin rawestiyan. Ji bo di ser Tûnis û Misirê re pûçkirina ambargoyê şebeke tam bi cî bûne, lê divîya bihayekî mezin ji bo fêlbazên ehlî kar bihata dayin ku li her du peravên derya spî jî peyde dibûn. Bihayê civateya herî piçûk li gor yê berî 1986ê pênc şeş caran zêdetir bûye. Her ku diçe rezerv kêm dibin û ger mirov bixwaze xwe ji helîyana hilberînê biparêze, ji nû ve peydekirina petrolê karekî zarûrî ye.

Perîyoda 1992-1999ê bi taybetî jî dewreke biêş û azar e. Mezinbûna aborîyê dihele (salane % 0,8) û dahata serê mirov jî % 20 dadikeve. Dengê kesên ji vê rewşê nerazî her ku diçe bilindtir dibe, serhildan bi taybetî jî li ***Cirenayk***ê dest pê dike û handanên hilweşandina rejîmê qat bi qat zêde dibin. Ji bo serheng **Qedafî** êdî ji desthilanîn ketiye. Şerm û fedîya wî nema ye, merivên xwe yên bi êrişa ***Lockerbie***yê hatine tawanbar kirin, teslîmî desthilata birîtanî dike, heqê xwîna du sed û heftê qurbanîyên vê bûyerê qurûş bi qurûş dide (heqê sed û heftê qurbanîyên DC10 d'UTAyê hinekî ji yên navbihurî kêmtir dide). Piştî 11ê Îlona 2001ê, Trablus bêqeydûşert li pişt Washingtonê radiweste û di nav partîzanên li dijî terorîzma îslamî de cihê xwe digire. Di encamê de, **Muamer Qedafi**, di 2003yê de, piştî yekîneyên zirxî yên amerîkî dikevin Bexdayê, li hemberî raya giştî diyar dike ku dev ji projeya çekên nukleer berdaye.

% 10ê petrola Yekîtîya Ewropî ji Lîbyayê tê

Di 13ê çirîya paşîn a 2003yê de, mueyîdeyên dawîn ên navneteweyî radibin û ji bo ji nû ve destpêkirina hilberîna petrolê rê vedibe. Qedafi dixwaze bilez hilberînê duqat bike, wê derxe mistewaya rojê ji sê milyon varîlan bêtir, ku ev yek bi rastî ji bo Îran û endameke xwedî giranî ya Rêxistina Welatên Îxracker ên Petrolê (OPEC), kartela ku nirxê zêr ê reş diyar dike jî heq e. Di tebaxa 2004ê de, LNOC panzde ruxsetên lêgerînê derxistin mazatê. Herkesî "xwe avêtiyê". Sed û bîst şirketan ji daxwaza kirînê diyar kir, ku piranîya wan dêwên amerîkî û brîtanî bûn û di 1986ê de, hergîz bêyî ku netewî bibin, Libya terk kiribûn. Ji 15an, 11 "parçên mezin" bûn para amerîkîyan (Occidental, Amerada Hess, Chevron Texaco). Tevî ku dema mueyîdeyan pitşgirîya wê jî kiribûn, desthilatê, li dijî berjewendîyên şirketên ewropî yên weke ***Total***ê, careke din ji bo senaîya xwe pêşikî da lihevkirina bazirganên petrolê yên ji Atlantîkê wê de(6).

Ji alîyê xwe ve, tevî ku şert dijwar in jî –dema îmzekirinê 133 milyon dolar hewale, bi kêmanî 300 milyon jî ji bo mesrefên derxistinê divê- şirketên navneteweyî bi bêsebrî û ji bo karekê mutewazî di cîyê xwe de diqepiçîn. Di rewşa herî baş de, ji wan re dê % 38,9ê hilberînê bimîne, lê bi awayekî misogertir bi zorê % 10,8.

Ev heyranîya berdewam ya dil ji bo dil a di navbera şirketên ji yên herî piçûk ta bi yên herî mezin, û welatekî weke Libyayê ji bo wan ewqas zehmet, ji bo çi bû? Miheqeq, kalîteya petrola wê ya xam pir baş e û rezerv nêzîkî navendên rafînekir yên ewropî, yên herî girîng li dinyayê ne. Halê hazir petrola libyayî li dora % 15ê serfîyata giştî ya Fransayê û % 10ê kêmtir a Yekîtîya Ewropayî pêk tîne.

Lê, bi taybetî jî dengeya hêzê, di maweyê nîv sedsalê de serûbin bûye. Di sala 1960ê de, şirketên serekî, ku piranîya wan anglo-sakson bûn, para herî mezin a hilberîna nekomunîst kontrol dikirin. Îro, şirketên netewî yên welatên xwedî petrol şûna wan girtine (7). Ji îro pê ve xwedîyên petrola bin erdê, heta ku pêdivîya wan ji bo demeke bingehîn a çalakîyên petrolê bi şirketên navneteweyî hebe jî, gîhiştina wê her ew bixwe kontrol dikin: Her weha dîtin û ruxsetkirina rezervên nû jî.

Li petrolê geriyan karekî bi rîsk e, li mirov biha dibe mal, sermîyanên mezin û kapasîteyên teknolojîk ên bilind jêre divên.

Şirketên neteweyî ji herduyan jî bêpar in; ne sermîyanê wan ne jî teknolojîya wan heye. Pereyê ku ew qazanc dikin, bi awayekî giştî ji derveyî senaîya petrolê ya neteweyî, li cîyên din tê serf kirin (malbata Qedafî –5 kur û keçek- ji para xwe bêtir distîne) û herêma wan a çalakîyê bixwe jî sînorên wan derbas nake. Ji derkirin, şoreş û netewîkirinan wê de, Qedafî hebe jî û nebe jî, bivênevê yek wê rastî ya din bê.

* Rojnamevan

1 CNN, 21ê nîsana 1986ê

2 Ruth First, *Libya, the elusive revolution* (Lîbya, Şoreşa ku Zehmet e Mirov Fêm Bike), Penguin Books, Londres, 1974, rûpel 187

3 Ji her 7 xuşkan re her weha "Majors" jî dibêjin, ku ji çar şirketên amerîkî yên li Erebistana Siudîyê di nav Aramco (Exxon, Mobil, Chevron et Texaco) de ne, li gel Gulfa amerîkî û Shell û BPya brîtanî

4 Daniel Yergin, *The prize, the epic quest for oil, money and power* (Buha, li Petrolê Gerîna Epîk, Pere û Hêz), Simon & Schuster, New York, 1991, r. 578

5 Di navbera 1929 û 1932yê de hatiye ava kirin ji bo ku para bazara cîhanî ya di hilberîna petrola xam û belavkirina berhemên petrolê de bicemidîne, Kartel ji alî Standard Oil (Exxon), Shell, Anglo-Iranian (bû BP), Socony (Mobil, Gulf, Atlantic û Sinclair ve hatiye ava kirin. Wê destûr da ku bihayê petrola xam heta destpêka salên 70yê bê cemidandin

6 Dirk Vandewalle, *A Modern history of Libya* (Dîrokeke modern a Lîbyayê), Cambridge University Press, 2006, r. 189

7 "Dewlet dev ji çekê petrolê berdidin" bixwîne, Le Monde diplomatique, adara 2007ê

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademîr



Ismet Polatli: **Şerm û bizdan**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 50 x 70 cm

LIBYA

Şoreşa li dijî bedewînokratîyê û lîderê wê

RACHID KHECHENA *

Serhildana Lîbyayê hema bi carekê weha ji ber xwe ve rû neda. Bi qasî însîyatîvên wêrek ên mîlîtanan, ewqas jî bi hewldanên reformê yên rejîmê jî hatibû amade kirin.

Di hevpeyvînekê de bi kanala televizyonê El-Erebiyayê re, 19ê sibatê kurê **Mû'emer Qedafî**, **Seyf el-Îslam** da zanîn ku bi alîkarîya bavê xwe ew plan dike ku reformên cidî yên pergala siyasî pêk bîne. Wî herweha da zanîn ku hefteyekê bi destpêka serhildanê re, "rêber" bi hin muxalifan re rûniştiye û soza reformên radîkal yên destûra bingehîn, banga hilbijartinên azad û derxistina qanûnên nû daye wan. Ya ku **Seyf el-Îslam** ji bîr kir bibêje ew bû ku pêşîlêvekirina ku wî bixwe hewl dabû sala 2003ê pêk bîne, sala 2008ê bi bin ketibû. Berîya heşt salan, Seyf el-Îslam projeyeke reformên destûra bingehîn pêşniyaz kiribû. Ji bo pêkanîna van reforman jî demek diyar kiribû: Yekê îlona 2008ê. (1) Li gor tedbîrên wê pêk bihatana, bîst û yek qanûnên bingehîn wê bihatana derxistin, di nav van qanûnan de yek li ser sermayeguzarîyê û qanûna cezayê bû, yeke din li ser prosedurên sîvîl û bazirganîyê bû. **Seyf el-Îslam** digot, ev reform di çarçoveya hewldanekê de pêk tên; hewldana xelaskirina Lîbyayê ji tecrîdbûna wê ya navneteweyî. Ya ji vê jî çêtir, wî ev înîsîyatîv li banga damezirandina civakeke sîvîl anî ku wê her şêwazê rêxistinên serbixwe bi pêş kevin: Sendîka, federasyon, lîg, komeleyên hiqûqî û yekîtîyên pîşeyî. Armanc ew bû ku rewabûneke destûra bingehîn bide rejîmê, ku wê şûna rewabûna şoreşgerî û eşîrî ya ku **Albay** xwe ji dema bûye desthilatdar ve dispêriyê. Bi her halî, ev qanûn tu caran ji alîyê parlemanê ango Kongreya Gel a Gişti ve nehatin qebûl kirin. Ya rastî, weha xuya ye ku yekane fonksîyona vê înîsîyatîvê ew bû ku manovrayekê pêk bîne. Armanc? Bidestxistina demê û avakirina îmajeke baştir a rejîmê li paytextên rojavayî. Dadgerê ku erka wî nivîsandina destûra bingehîn bû da zanîn ku wî têra xwe ji çavkanîya "pirtûka kesk" –pirtûka piçûk a fikrên rêberî– vexwariye û bi îhtîmam îşaret pê dikir ku erka wî ne guhertina xwezaya rejîmê bû... lê belê ji nû ve dabeşkirina deqên fermî yên ji berê de heyî wezîfeya wî bû. Rêz ji mohleta dawî ya ji bo lidarxistina hilbijartinan û çêkirina destûreke bingehîn –di 1ê îlona 2008ê de– re nehate girtin.

> Dema ku Sûbayên Azad 1ê îlona 1969ê bûn desthilatdar, % 75ê Lîbyayê ji Bedewîyan pêk dihat

Ji bo fêmkirina vê paşvexistinê, divê em li dîrokê binihêrin û hîmên fikra **Albay Qedafî** fêm bikin. Dema ku Sûbayên Azad 1ê îlona 1969ê bûn desthilatdar, 2.5 milyon mirov li Lîbyayê –ya di warê petrol û gaza xwezayî de gelekî dewlemend- diman, civakeke eşîrî ya ku % 75ê wê ji Bedewîyan pêk dihat. Bi tenê sê bajar derdikevin pêş: ***Trablus, Bingazî û Mîsurata***. Guhertinên sereke yên ku birêveberên nû kirin, bidawîkirina monarşîyê, damezirandina komara ereb û bi rêya kongreyekê erêkirina "desthilatdarîya gel" bû ku adara sala 1973ê çêbû. Ji 1972ê ve qanûna hejmara 17ê pirpartîtîya siyasî û avakirina partîyên siyasî qedexe dike, çawa ku slogana hanê îşaret pê dike: "*Her endamê partîyekê xayinek e.*" Yekîtîya sosyalîst a ereb –ku nuha "Tevgera komîteyên gel" – êdî hestîyê pişta pergalê pêk tîne û bi awayekî nakokane tevî ku **Albay Qedafî** xwe lê datîne ku li "*rêyeke sêyem*" ya di navbera kapîtalîzm û sosyalîzmê de dikole, şaxên meyla xwe ya sosyalîst berdide jêr. Li gor lêkolînerê tûnisî **Tewfîq Mestîrî**, hizirmendê fransî **Jean-Jacques Rousseau** (2) bandor li Qedafî kiriye: Qedafî ji bo li Lîbyayê "bedewînokratîyê" saz bike, xwe spartiye wî. Pergaleke bi vî rengî bi nebûna dewletê, serokdewlet ("rêber" şûna wî digire), partî (komîteyên gel yên îdareyê bi rê ve dibin, dikevin şûna wan) cihê dibe û li hemberî vê komîteyên şoreşger (herweha komîteyên kontrolê yên ku ji bo newekhevîyên komîteyên gel û komîteyên şoreşê li hev bike, derketine holê) tên bi cih kirin. Xebitîna van sazîyan bi tevahî zelûl û qels dimîne, tu kes nizane ka endamên wan çawa tên wezîfedar kirin. Qedafî timî ji alîyê eşîra xwe ***El Ghdedfa*** ve hat parastin. Bi vî rengî, dema ku Albay diçû derveyî welat jî konê xwe yê bi nav û deng bi xwe re dibir, sedema wê ew bû ku bi bîra eşîra xwe bixe ku li derveyî welêt jî, wî tu caran dev ji wan bernedaye. Ev kar dibe ku folklorîk xuya bike, lê ew peyameke xurt e ji Bedewîyan re, yên ku ew ne weke serokkomar, belê weke lîder hilbijartin.

> Di dema desthilatdarîya xwe de Albay Qedafî ji erebîzmê ber bi neteweperestîyê û eşîrperestîyê ve çû û li ber şaristanîya bajarî rabû

Ev statuyek e ku her cara **Qedafî** rave dike ku nabe ew ji desthilatdarîyê were xistin, behsa wê dike. Di dema desthilatdarîya xwe de **Albay Qedafî** ji erebîzmê ber bi neteweperestîyê û eşîrperestîyê ve çû û li ber şaristanîya bajarî rabû. Wî ji *xeymayê* (kon, xêm) mala xwe çêkir û tevahîya wezîrên bajarî li derve hiştin. Wî sala 1977ê birêveberîya hevkaran fesih kir ku xizmeta ***Konseya Birêvebirina Şoreşê*** (KBŞ) dikir, KBŞyê sala 1969ê desthilatdarî girtibû destê xwe. Wî ne bi tenê muxalifên pêşverû, îslamperest û neteweperest tesfiye kirin, lê belê wî herweha yeko yeko hevalên xwe yên eskeriyê, subayên azad jî li derve hiştin. Fermandar **Abdessalim Celûd** di dema darbeya eskerî ya 1969ê de kesê herî girîng ê duyemîn bû, ji sala 1993ê û vir ve xwe spartiye eşîra xwe ***El-Mhergua***. Fermandarên bi navê **Muhemed Necîb** û **Muxtar Karûî** yên pêşî bûn ku sala 1972yê weke nîşana protestokirina redkirina dana sîvîlan a desthilatdarîyê, ji KBŞyê îstîfa kirin. Heman salê **Albay Muhemed El-Meguerîf** di şert û mercên pir tarî de hat ceza kirin. **Beşîr El-Hûadî** û **Yaûz Hemza** sala 1975ê hatin kuştin; **Omer Mehîşî** sala 1984ê hat kuştin. Ji çaryek sedsalê û vir ve **Abdelmonem El-Hûnî** ji hingê ve tevlî nav refên kesên ji rejîmê qutbûyî bû, -berîya demeke kurt– bi Albay re li hev hat, di encama serhildana sibata 2011ê de îstîfa kir. Ji 12 endamên KBŞyê sisê bi tenê man: **Abû Bekir Yûnis Caber** ê ku tevlî nav refên serîhildêran bû, fermandar **Xuîldî Hemîdî** û **General Mûstefa Xerûbî**. Her sê jî bi wezîfeyên marjînal ve hatibûn girêdan. Kurên Qedafî ketin şûna mirovên nêzî bavê xwe. Bi vî rengî wezîrê parastinê **Abû Bekir El Caber** bi tenê yekîneyên marjînal kontrol dike, belê hêzên baştir çekdarîkirî di bin birêveberîya kurên Qedafî ango **Saadî**, **Moatîsîm**, **Muhemed** û **Xamîs** de ne. Piştî binketina "pêşîlêvekirina" wî, Albay Qedafî herkes matmayî hişt dema ku wî kurê xwe **Seyf El-Îslam** çirîya pêşî ya 2010ê weke "koordînatorê hêzên gel" wezîfedar kir. Ev fonksîyon wî dike serokdewletekî xwedî hêza potansîyel a ku şaxên sereke yên desthilatdarîyê bi rê ve dibe: Kongreya Gel a Gişti (parleman), Komîteya Gel a Gişti (hikûmet) û hêzên ewlekarîyê. Dema vê înîsîyatîvê, rastî dema xerakirina girtîgeha Abû Salim ya li kevîya bajarê Trablûsê ya nîsana 2010ê hat. Armanc ew bû ku tevahîya şûnên qetlîamên li vê girtîgehê jê werin birin: Li gor rêxistinên derveyî hikûmetan (NGO) sala 1996ê li wir 1 200 girtîyên siyasî hatine kuştin. Armanca xerakirinê pûçkirina tevahîya hewldanên lêkolînên li ser vî gunehî bû. Di vê hewaya siyasî de ya ku bêhn li mirovan diçikand, fikra besît a lidarxistina xwepêşandaneke aştîyane jî dikir ku cezayên giran ên girtîgehê li xwedîyê înîsîyatîvê werin birîn. Dadgeha Ewlekarîya Dewletê her yekî dwanzdeh û panzdeh sal cezayê girtîgehê li milîtanên siyasî **Camel El-Hac** û hevalê wî **Frec Hûmîd** birîn, bi bahaneya tevî deh gunehbarên din bi rasthatina bibîranîna xwepêşandêrên di şerên bi şidet ên bi hêzên ewlekarîyê re sibata 2007ê de mirî, xwepêşandaneke aştîyane li Trablûsê plan kir. Vê dadgehê herweha sala 2007ê bîst û pênc sal cezayê girtîgehê li **Îdrîs Bûfayedê** muxalif birî bi bahaneya komploya li dijî desthilatdarîyê û sîxurîya ji bo welatên bîyanî, bi tenê ji ber ku têkilî bi dîplomatekî amerîkî yê li Trablûsê qebûlkirî re danî.

> Qedafî bi dest xistina tevahîya navendên biryardayînê û di sazîya eskerî de wezîfeyên stratejîk, dabeşkirina xelkê welêt û bêdengkirina çapemenîyê, derî li guhertinên aştîyane hemûyan girt û gel ber bi serhildanê ve ajot

Elîtên ku ji ber, belavkirina pereyan a bêedalet û nebûna azadîyê hêrsa wan rabûye, dest pê kir, dengê xwe bilind kir û bi awayekî aşkere dîktator, destikên wî û çeteya desthilatdarîyê rexne kirin. Di dema konferanseke tebaxa 2010ê li ser mijara "eşîr û eşîrperestî li Lîbyayê" li Bingazîyê pêk hatî de, doktora li beşa zanistên siyasî ya zanîngeha ***Gar Yûnisê*** (Trablûs) **Amel Laabîdî** giranîya girêdana eşîrî di qada siyasî de rexne kir. Ev yek çêkirina "Birêvebirîya gel a civakî" di destpêka salên 1990ê de nîşan dide; wezîfeya vê birêvebirîyê ew bû eşîrê weke dezgeheke fermî ava bike û bike alîyekî siyasî. Ji ber ku dewlet nîne, vê mijûlbûna eşîrî kir ku diyardeyên bertîlxwarinê, rêznegirtina ji qanûnan re û tehlûkeyên li dijî ewlekarîya dewletê derkevin holê. Kevneserokê baroyê **Muhemed El-Allaguî** li alîyê xwe îlona 2010ê rexne li deshilatdarîya mutleq a di destê komîteyên gel de girtin, xwest ew jî tabiyê qanûnê bibin û pirpartîtîya siyasî were saz kirin. Di heman demê de **El-Allaguî** li raya giştî vekirî, êrişî sekreterê karên yekîtî, sendîka û lîgên pîşeyî yê li kongreyê **Muhemed Cibrîl** (tam wezîrekî karê hundir e) kir û ew bi tesîrkirina li encamên hilbijartinên buroyên komeleyên sivîl gunehbar kir. Heman Cibrîlî li sendîkaya parêzeran a Bingazîyê havîna bihurî qedexe kir ku civata xwe ya giştî bicivîne. Ev civata giştî bi armanca hilbijartina konseyeke nû ya nîzama parêzeran wê biciviya ku dema wê ev salek bû bihurîbû. Di gotara 10ê îlona 2010ê ya rojnameya *Oyayê* de keça kevnewezîrê karê derve **Ezzat Kamil El-Maxûr** mafê welatîyan ê damezirandina sendîkayên serbixwe parast. Wê rexne li qanûna sala 2001ê girtin, ev qanûna li ser komeleyên sîvîl kontrola NGOyan ji dest çavdêrîya dadgeran derdixist û dida hêza birêveber. **Ezzat Kamil El-Maxûrê** ev qanûn weke "*kêm rêzê ji mafê mirovan re digire*" û "*li gor yên berîya xwe bêhtir hişk û çavtirsîner*" nirxand.



ISMET POLATLI: **Evîn, êş û jiyan II**, boyaxa rûnî li ser kartonê, 50 x 70 cm

Li hemberî vê kelkelê, desthilatdarî geh parçebûyî û geh yekbûyî ye, bi taybetî jî dema ku berjewendîyên wê di tehlûkeyê de ne, yekbûyî ye. Êrişkarîya di dawîya îlona 2010ê de li Bingazîyê ya li dijî rojnamevan **Muhemed Larbî Essarît** vê yekê têra xwe dersdar nîşan dide. Rojnamevanê bi nivîsên xwe yên rexnegir navdar, bi awayekî giran hatibû birîndar kirin û li nexweşxaneyê hatibû razandin, lê belê tevî vê rewşa wî jî polîs ji bo jêpirsînê ew bir. *Weqfa Qedafî ya Navneteweyî* ya ku **Seyf El-Îslam** wê bi rê ve dibe, bi rêya dengê komeleya xwe ya mafê mirovan bi lez û bez hewl da ku berpirsiyarîya hêzên ewlekarîyê ya di vê bûyerê de red bike. Vê otîzma [ber bi xwe ve girtî] deshilatdarîyê, ji alîyê malbata Qedafî bi dest xistina tevahîya navendên biryardayînê û wezîfeyên stratejîk di sazîya eskerî de, dabeşkirina xelkê welêt û bêdengkirina çapemenîyê derî li guhertinên aştîyane hemûyan girt û gel ber bi serhildanê ve ajot.

*Rojnamevanê El-Cezîreyê, berpirsiyarê Mexrebê

1 Helen De Guerlache, "Quand la Libye se reconnecte au monde (Dema Lîbya xwe ji nû ve bi dinyayê ve girêdide)" bixwîne, Le Monde diplomatique, tîrmeha 2006ê

2 Gotara Mu'ammar Kadhafi, Encyclopedia Universalis, Parîs

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

www.le-monde-diplomatique.com

Fas ne wek Tûnisê ye

Û melikê Fasê dikare bipeyîve…

Ignace Dalle*

Xalid Naciriyê berdevkê hikûmetê û wezîrê ragihandinê bi bêdudilî diyar kir ku *"Xelkê Fasê ji mêj ve ye fêrî derbirîna daxwazên xwe bûne, wan pêdivî bi nimûneya Misir an jî Tûnisê nîne"* (1). Lê coş û hewaya herêmê li ser xelkê welatê navbihurî karîgerîyeke berbiçav hebû. Bangên ji bo binecihkirina monarşîyeke destûrî ya rasteqîne û ne-berjewendîxwaz gelek zêdetir lêhatin, çi li ser torên civakî û çi ji alîyê çalakvanên rêkxistî yên ji hûrde-hizb û komên çepgir an jî ji îslamîyên El-Ihsan wel Edl (Dad û Xêrxwazî), ku ev hizba îslamî yeke serbest e û îdiaya du sed hezar endaman dike. Van hizban, piştî çend hefteyên bendewarîyê ji bo reaksîyon nîşandana beramber rûdawên li Tûnis û Misirê, "benalîkirin"a [anku mîna rejîma Tûnisa Ben Ali] rejîmê şermezar kirin û 20ê sibatê ji bo rêz û rûmeta gel banga beşdarîya meşa aştîyane kirin.

Tevî hewaya xerab, tevî dezenformasyona organên medyaya resmî, rêyên asêkirî û beşdarnebûna tu partîyeke resmî, bi kêmanî deh hezar kesan li Rabatê xwe pêşan da, ewqas jî li Agadirê, li *El-Hoceimayê* û *Marakechê* –ku li wê derê tundûtîjî kete nav xwepêşandanan– û qasî nîvê wê jî li *Casablanca*yê. Karbidestên bifikar, her nîveka sibatê biryar dan ku 1.4 milyar euroyên din terxan bikin ji bo qerebûkirina giranbûna bihayê pêdivîyên bingehî li ser bazara navneteweyî, ku ev meblax li 17 milyar dîrheman (1,5 milyar euro) dihate zêde kirin ku jixwe berê bi qanûna budceya 2011ê hatibû terxan kirin. Hukûmet herwiha naxwaze etar û dezgahdar û xwedîdîplom ên bêkar biazirîne, ku jixwe qewlê damezrandina [kar tehsîskirin] 1800 kesan ji xwedanên dîplomaya lîsansê dabû. Hewl dide dubendîyên civakî yên heyî ji hev belav bike û karîgerîya wan daxe, lewma xebatkarên şirketa Fasê ya Xwendinên Bisporî û Endustrîyel (SMESI) li *Khouribga*yê, vegerandine ser karên xwe û bi vî rengî daxwaz û dawakarîyên beşek ji dersdaran razî kirin. Hejmareke mezin a pirs û meseleyên bi salan asêkirî an jî hilawistî, heçko bi mûcîzeyan, têne çareser kirin an jî soza çareserîyê werdigirin...

Berpirsên qralîyetê têgihiştine ku ya ku bû sebebê fûrîyana kerbên tûnisîyan, bi aşkerayî rejîmeke mutleqîyetxwaz, gendelîyeke heta gewrîyê û bêkarîyeke berbelav bû, nemaze di nav kesên xwedîdîplom de. Welatê Fasê, pîçek cuda jî be, êşa heman derd û lenetan dikêşe. Fasîyan ji mêj ve ye bi terzê xwe beramber berbelavbûna gendelîyê, beramber suî-îstimala desthelatê, torpîlê, newekhevîya ku her zêdetir dibe, reaksîyona xwe nîşan dane. Van çend salên dawîyê, gelek *intifada*yên munferîd ên berteng li *Sidi Ifni, Sefrou, Nador, El Hoceima, Tinghir, Ben Smim, Jerrada* û hwd rû dan ku li ser hindek ji wan rengekî eşîrî hebû. Komên xelk berhev bûn da ku hêvîşkesta xwe bidine bihîstin, doza mafên xwe yên xizmetên tenduristîyê, perwerdeyê, kar, an jî gelek bi sadeyî doza rûmetê bikin.

Numûneya **Sidi Ifniyê**, hezîrana 2008ê, bêguman ji hemûyan bêtir sembolîk e. Piranîya nîştecihên vê bendera biçûk, ku ji eşîreta **Ait Baaram** in, xwe ji her

> Tevî reformên ku melik 9ê adarê ragihandin jî, li ser banga Tevgera 20ê sibatê bi dehan hezar fasiyên meyilên wan gelekî ji hev cihê, bi xwepêşandanan nerazîbûna xwe derdibirin. Wan herweha doza çûna şêwirmendên sereke yên melik û serokwezîr jî dikir.

îmkanan bêpar û vederkirî didîtin û lewma li dijî desthelata deverê rabûne ser piyan. Serê pêşî, rêveberîya deverê, ji Leşkerê Gerok ê Mudaxeleyê (CMI) qederê hezar çekdar şandin; yên navdar ku niha navê Komên Mudaxelekirinê (GIR) wergirtine, da ku xwepêşanderan bi rengekî tund serkut bikin. Lê belê, piştî salekê, dema hilbijartinên mehelî, karbidestan hişt ku amadekarên tevgerê, kontrola encûmena nû ya şaredarîyê bixine bin destê xwe.

Herwiha ev çend sal in *tansiquiyate* derhatine, an jî bi navekî din koordînasyon, ku li seranserê welatî ji bo têkoşîna li dijî giranîya bihayê tiştan û kêm û kurtîya xizmetên giştî, çalakîyên munferîd dikin. Hejmara wan di navbera şêst heta heştê kesan diguhere û jin tê de pir çalak in. Piştgirîya Çalakvanên Yekîtîya Fasê ya Mafên Mirovî (AMDH) an jî komên çepgirên tundrew (tûj/ekstrem) digel wan e. Li *Casablanca*yê koordînasyoneke bihêz li dijî giranbûna bihayan têdikoşe. Li welatekî ku meaşê herî hindik ji 2000 dîrheman (ji 200 euroyan hindiktir) kêmtir e, xwedîkirina malbatê meseleyeke pir zehmet e.

"Çavbirçîbûna cihê şermê" ya hin xizman

Herçend ev koordînasyon bi xwe dibin sebeb ku çalakî şêweyê tundûtîjîyê negirin, lewre di navbera gel û *makhzen*ê –navê ku ji bo dewletê dibêjin–, de navbeynkar in û karbidestên dewletê li hember wan qet germ û nazik nînin. Nemaze rika wan li AMDHê heye, ku bêguman yek ji rêxistinên herî çalak ên erebî ye di warê mafên mirovî de û yek ji meydanên dawî ye ku li dijî rejîmê muxalefeteke ciddî lê heye û endamên wê her gav têne teqîb kirin, nerihet kirin heta carinan dikevine ber lêdanên hêzên dewletê.

Lê belê, Fas ne wek Tûnisê ye. Cuda ji **Zeyn el-Abidin Ben Ali**, ku xelkê wî nefretê jê dike, xelefê **Hesenê II.** hezkirin û teqdîra tebeqeyên berfireh ên gel wergirtiye. **Muhammedê VI.** ne tenê serokê ruhanî yê fasîyan e –fermandarê bawermendan û ji eslê Pêxemberî–, herwiha ji tebayê wî, yên ku hazir in hemû şêl û tevgerên wî bi başî binirxînin gelek zêde ne. Ji başûr heta bakurê welatî her di serlêdanan de ye, çep û rast beşdarîyê di vekirina projeyan de dikin, ku piranîya wan projeyên hûrik in û divê wezîr an jî hilbijartîyên mehelî vekirina wan bikin. Berpirsekî pilebilind dibêje ku *"zêde qabiliyeta wî ya xîtabetê nîne, lewma bi vî terzî pêwendîyê saz dike"*. Herwiha, berevajî bavê xwe yê ku kêm elaqeya xwe dida ser pêşhat û projeyên rojane, **Hesenê II.** bala xwe dide ser rêveçûna gelek proje û meseleyan. Xelkê Fasê herwiha asayîş û aramîya li seranserê welatî wek kirina wî dizanin.

Lê belê pareke muxalefeta derveyî parlamentoyê û hejmareke rêxistinan bi rengekî xeşîm rexne û gazindan ji qral dikin. Payîza 2010ê ji bo monarşîyê saleke gelek zehmet bû: 15 rojan piştî hilweşandina xeşîmane ya wargehekî *Sehrawîyên Laayounê*, di navbera 29ê çirîya pêşî û 10ê çirîya paşî de, aşkerakirinên **Wikileaks**ê li ser çavbirsîtîya Qesra Qralîyetê di sektora emlakê de, wek bombeyekê ket nav rojevê û tesîra wê hem li nav û hem jî le derveyî Fasê gelek zêde bû. Kevnesefîrekî amerîkayî heta behsa *"pexîlîya kirêt"* a hindek kes û karên qralî kir. Lewre, li Fasê gava teşebuskarek bixwaze projeyeke mezin a emlakê bi rê ve bibe, mecbûr e şertên **Mounir Majidi** qebûl bike, ku kesê navbihurî karsaz û sekreterê taybet ê qral, yê **Fouad Ali el-Himma**, hevalê **Muhammedê VI.** û "mirovê bihêz" ê rejîmê û yê hukûmdarî bixwe ye. Sazîyên serekî û prosedurên dewleta Fasê di destê Qesrê de dibine amraz da ku fişarê saz bikin û bertîlan wergirin. Ku ev yek, bi ya dîplomasîya amerîkî, derbeke mezin li rêveberîya adilane dixe ku karbidest hewl didin pêş bixin.

Naşefafî û xumama herî qewî jî li alîyê serek û berpirsan e, bi taybetî li ser qelemên mal û samanên binemala hikûmdar. Endamên ji vê malbatê dikarin bi bihayekî erzan zevîyên destxweş ji bo avadankirinê bikirin û bi bihayê bazarê bifiroşin û bi vî rengî ser rihetîya xwe meblaxên bilind kar bikin. *"Em hema bi yekcarî bêçare ne"*, bi van gotinan karsazekî sektora endûstrîyê gazindan dike, çavên wî li parseleke li ser meydaneke 3000 hektaran li başûrê Casablancayê ye, ku Qesrê jê standiye û kiriye milkê xwe. Qralê ku di heman demê de xwedîyê mezintirîn zevîyan e, bi 12000 hektarên erdê xwe yê baş avdayî, bêyî tu munaqeşeyekê muafiyeta bacdanê heta sala 2014ê dirêj kir ku ev sî sal in cotyar îstifadeyê jê dikin. Ev tedbîra ku **Hesenê II.** girt, divê bi tenê bo heyamekê be.

Serê salên 2000ê, hingê, bisporê siyasetê **Rémy Leveau**, ku li dijî qralîyetê, muxalefeteke serûber dikir, ji ber rantxurîya qralê ciwan ketibû fikaran:*"Li sîstemeke ser rêya derbasbûna demokrasîyê, nabe qral bibe teşebuskar û karsaz; ew nikare digel teşebuskaran bikeve reqabetê. Di rewşa heyî de, divê rola xwe ya hakemîyê bihêz bike"* (1).

Ev qelemên berê tûj, êdî zimanxweş in

Bi ya ragihandina kovara amerîkî *Forbes*, yekûna samanê (serwet) **Muhammedê VI.** di navbera salên 2000 û 2009ê de pênc caran zêdetir bûye û gihiştiye 2,5 mîlyar dolaran. Şêl û reftarên wî û yên derdora wî her ku diçe serekên şirketan bêtir aciz dike; bi taybetî rêveberên şirketên di sektora emlak, xurekên ji çandinîyê, bankevanî û belavkarîya giştî de. Yek ji wan, bi şertê parastina nihênîya navê xwe diyar kir ku *"welatekî ku aktorên meydana aborîyê îtimadê bi dadwerîya welatê xwe nekin, welatekî seqet e. Li vir, kar*



Ismet Polatli: **Her der**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 80 x 100 cm

û kiryarên dadê ne diyar in, mirov nizane kengî dê çawa hereket bike, di demekê de ku me, serekên şirketan, her wekî sermayeguzarên bîyanî, pêdivî bi dadeke diyar û adil heye".

Dîplomasîya amerîkî herwiha pîjan di serheng **Aziz Bennani** de jî radike, ji ber çavbirçîtîya wî ya bo pereyan, ku Bennani fermandarê Beşê Başûrî ye (alîyê Saharayê ku li dora 120.000 heta 150.000 esker bo wê derê hatine şandin). Mîna pilebilindên din, Bennani jî, ku jixwe berê fermandar **Mahcûb Tobji** (2) ew tawanbar kiribû, îstifadeyê ji postê xwe dike da ku bi awayekî ne qanûnî gelek pereyan kar bike. Herçend hindek hewl û tedbîr ji bo kêmkirina gendelîya li nav mîralayîyan û li nav pileyên berjêrtir hebûne jî, ji bo generalan rewşeke wisa ne li dar e, ku piranîya generalan dema teqawidbûna xwe paş dixin da ku van xêr û bêran ji dest nedin.

Muhammedê VI. ê 48 salî, niha di şexsê xwe de ji salên destpêka hikûmdarîya xwe kêmtir nihênîyan dihewîne. Diyar e ku wî jî wekî selefên xwe tahma miqamê xwe kir û bi halê heyî şexsê navendî yê sîstemê ye. Yên ku li benda guhartinên giring ên destûrî bûn da ku giranîyeke zêdetir bikeve ser parlamentoyê, anku ser partîyên siyasî, beramber hewlên xwe tiştek bi dest nexistin. Ne tenê ku qralî yek vîrgûla axirîn reşnivîsa destûrî neguhart, ku panzdeh sal in li kar e, herwiha, bi navbeynkarîya hevalê xwe **Fouad Ali El Himma**, xêr û îmkanên zêde dane ber destê çîneke siyasî ku qet pêdivîya wan pê nebû. Partîya Resenî û Modernîyê (PAM) ku **El Himma**, sala 2008ê, bi armanca bêtesîrkirina tevgera îslamî ava kir, bi wergirtina %21,7ê kursîyan karî bi suîstimalan di hilbijartinên mehelî yên 12ê hezîrana 2009ê de bibe partîya yekem. Bi vî rengî kete pêşîya Istiqlala partîya serokwezîr **Abbas el Fassi** (%19.1), sosyalîstên Yekîtîya Sosyalîst a Hêzên Gelperwer (USFP) (%10,8) û îslamîyên Partîya Dad û Geşepêdanê (PJD) (%5,4).

Tebeqeya elîtên siyasî, qet nebe ewên di meydana Parlamentoyê de, li pêş çavên fasîyan pir girîng nînin, heta gelek caran xelk bi çavê xerabkeran li wan dinihêre. Ji bilî hejmareke wekîlên ji çepgira tundrew, bes îslamîyên Partîya Dad û Geşepêdanê (PJD)(3) xwe ji rezîlîya berbelav parastine, bi ser de jî dubendîyên di navbera rêveberên partîyan de dengdarên wan aloz dikin û îmaja partîyê lawaz dikin. Oportunîzma hejmareke hilbijartîyên hemû alîyan karê PAMê hêsan kir, lewre jê re qet zehmet nebû wan bi alîyê xwe ve bikêşe, heta çend kevnegirtîyên çepgira tundrew jî xistine nav refên xwe. Axirîn hedê abzûrdê: Berî hilbijartinên mehelî yên 2009ê, PAMê diyar kiribû ku di muxalefetê de ye. Ev *"hoqebazî"*, bi peyva rêveberê *Tel Quel*ê (4), dihêle em têbigihin ka çima ji sêyan duyê xelkê Fasê êdî dengên xwe nadin.

Li dijî daxwaza gel, şidet û tepisandin

Herwiha, welatê qralîyetê her ku diçe bêtir tirs û fikaran dixe nav rêxistinên neteweyî û navneteweyî yên berevanîya mafên mirovî dikin. AMDH gelek caran ji bo şermezarkirina paşketineke berbiçav di standardên mafên mirovî de dengê xwe digel dengê *Amnesty Internationalê* (AI) an jî *Human Rights Watchê* (HRW) dike yek. **Chakib el-Khiyariyê** serekê Yekîtîya Rif bo mafên kesan û alahilgira têkoşîna li dijî qaçaxçîtîya narkotîkê li bakurê Fasê, sala 2009ê ji ber *"heqareta li sazîyên destûrî"*bi sê salên girtîxaneyê hate ceza kirin. Li piştê vê tometê hêrsa karbidestan hebû, ku wî ew sebaret bi helwêsta wan a beramber qaçaxçîyên tiryakê (narkotîkê) şermezar kiribûn û ew bi xemsarîyê heta bi hevkarîyê tawanbar kiribûn. Acizîya berpirs û karbidestên hêzên aramî û nizamê ewqas mezin bû ku hewl dan û karîn di çileya 2011ê de asteng bikin ku Transparency Maroc xelata xwe ya salane bide rêzdar **Khiyarî** û **Abderrahim Berradaye yê** parêzerê **Abraham Serfatyê** kevnegirtîyê siyasî yê mijdara bihurî windakirî.

Seyr û ecêbeke din a dadê: Doza ku sala 2008ê, mîralayî **Kaddour Terhzazê** kevne numare-duyê artêşa hewayî ya Fasê bi 12 salên hepsxaneyê ceza kir. Piştgirîya AI, HRW û AMDHyê, herwiha daxwaznameyeke ku 157 wekîlên ewropayî di lehê wî de îmze kiribûn, tiştek ji rik û biryara desthelatê neguhart, lewre li pêş çavên hikûmetê **Tehrzaz** "xayîn" bû. Li vir jî dîsa sîbera general Bennani hebû, ku li gor hevalên mîralayî, Bennani tola xwe vedikir: Ji ber ku Bennani ji awayê ku mîralayîyê berpirsê pilebilind, kevnepîlotên fasî yên girtîyên Polîsarîyoyê parastibûn, pir aciz bûbû.

www.kurdiyaki.com

Dîsa bûyera **Zakariya Moumniyê** şampîyonê cîhanê yê *light contact* ê 1999ê jî, ku bi behaneya pûç ku wî bi kutekî ji namzedên koçkirî Ewropayê pere standine hê nû sê salên cezayê girtîxanê wergirt; rewşa dadê ya li welatî gelek baş radixe ber çavan. Li Fasê, biryareke qralîyetê heye ku her çi kesê di warekî de bibe şampîyonê cîhanê xelateke darayî werdigire. Zakariya Moumni jî doza îstifadekirina ji vî mafê xwe dikir. Rayedarên qralîyetê ewqas zivêr kiribûn ku îlona 2010ê winda dibe. Çar rojan bê xew di zindana îşkenceyê ya Temarayê -ku hêj jî heye- de dibihurîne, bê endaze lêdan û îşkenceyê dixwe, paşê jixwe bo sê salên cezayê girtîxanê tê mehkûm kirin. Parêzerê wî Abderrahim Cemai bi keser pê de diçe û dibêje *"heyfa min tê gava bi taybetî tê bîra min ku wî hergav red kir Fransayê temsîl bike da ku rengên Fasê li ba bike!"*.

Dadgehan herwiha mista xwe li çapemenîya azad jî giran kiriye, lewre êdî desthelat her ku diçe kêmtir tehemulî rexneyê dike. Cezayên diravî yên qerase û cezayên hepsê bûn sebebê girtina çendîn weşanan, ku ji wan bes çendek ev in: *Le Journal Hebdomadaire, Akhbar el Youm, Nichane, Al Jarida al Oula*. Di ber re, rejîmê çendîn qelemên bi navûdenj jî girtine ba xwe, ku ew kesên şareza, niha hemû şermê dadiqurtînin û bîr û boçûnên desthelatê lêdikin.

Xebatkarên medyaya derekî jî herwiha di nav lepên karbidestan de ne. Ev zêdetir ji salekê ye ku wezareta ragihandinê muracaata rojnamegerekî fasî ku ji bo Agence France-Presse (AFP) kar dike, akredîte nake. Ajansa Reuters jî bi rojnamegerekî xwe yê din tûşî heman kêşe û zehmetîyan bûye. Azadîya wijdanî ya van her du rojnamegerên ajansan, ku yek ji wan sernûserê *Journal Hebdomadaire*ê bû, li ber nezera servîsên asayîşê qabilî qebûlkirinê nîne. Rojnamegerên spanî ketine heyra wê hindê ka akredîtasyona wan dê bê nûkirin an na. Heçî *El-Cezîre* ye, karûbarên wê di dawîya çirîya pêşî ya 2010ê de hatine rawestandin, ji ber ku berpirsên qralîyetê bawer dikirin ku kanala Qetarê *"îmaja welatî reş kiribû". (5)* Her dîsa, sala 2010ê, Fasê zêdetir ji sed protestantên biyanî bi tometa "guhartina dînê hevwelatîyan", derêxistin. Herçend kar û kiryarên hindek ji evanjelîstan cihê nerihetîyê bû jî, rewşa bîstekên wan ku li Ain Leuhê, li Atlasa Navînî, qederê sih zarokên êtîm xwedî dikirin, dilê fasîyan û herwiha yê xelkê derve êşand. Ev zarok bi bêrehmane ji malbatên xwe yên ´hewîner [famille d'acceuil: malbata hewîner, malbata ku zarokekî ku ne zarokê wan e xwedî dikin] hatine cuda kirin ku ev malbat sî sal in li gor qanûnên welatî li Fasê dijiyan û zarokên êtîm li ser dînê Îslamê mezin dikirin. Diyar e desthelatdaran xwest pêdagirîyên hindek tundrewên îslamî bi cî bînin. Federasyona Protestantên Frsnsayê, sefîrê Dewletên-Yekgirtî û HRWyê ev dersînorkirin şermezar kirin.

Kanûna 1952yê, ji alîyê îstixbarata fransî ve kuştina **Ferhad Hachedê** sendîkavanê tûnisî li nêzîkî Tûnisê, tevahîya Efrîqaya Bakur bi taybetî li Casablancayê dabû ber bayê hêrs û agirê xwe. Piştî şêst salan, fasî hê jî bi dêhneke pir hişyar berê xwe didine guherîna rewşê li Mexreba mayî û li Misirê. Mehên çile û sibatê, gelek kesayetan, ku yên wekî **Abdellatif Laabi** jî tê de hebûn, dengên xwe berz kirin û ji **Muhammedê VI**. xwastin ku destpêşxerîyê bike ji bo *"derbasbûneke aştîyane, lê qet'î, ya ber bi demokrasîyê ve)"* (6).

Fouad Abdelmoumniyê rawêjkarê warê geşepêdanê û aborînas pê de diçe, *"ya ku li Tûnisê qewimî*, *delîlê wê yekê ye ku ziman bestin, zext û zor, gendelî û palpiştîya hêzên derekî bi tu awayî li ber vîna gelan nabe asteng"*. Bo gelek fasîyan, çawa guleya nerehetî û zivêrîyê ket nav "welatên dost" ku divê di pêwendîyên xwe yên digel qralîyetê de talebkartir û hesastir bin, her wisa jî ew gule êdî ketiye nav bereya hikûmranan jî, ku êdî divê têbigehin ku heyama monarşîya mutleq û mafê xwedayî yê hikûmranîyê nemaye. Herçend **Muhammedê VI**. hîn jî piştgirîyeke girîng ji xelkê werdigire, şert e ku herwiha bo reformên giring hazir be, bi taybetî ku niha derdora elîtên siyasî û zumreyên din yên adetî, wek sendîkayan, bi piranî pêbawerîya xwe ji dest dane û bes dikarin bibin amrazên peytkirina pozîsyona desthelatê. Tevî hemû rîskên ku vê valahîyê di nav xwe de dihewîne.

* Rojnameger, nivîskarê "Les Trois Rois. La monarchie marocaine de l'indépendance à nos jours..."

1 "Li Fasê salek piştî mirina Hesenê II. Axaftina di navbera Mounia Bennani-Chraïbi, Abdallah Hammoudi û Rémy Leveau de. Salnameya Afrîkaya Bakûr, cîld 38, ji rûpel 259 û wir de, ji weşanên CNRS. Parîs, 2002. Rémi Leveau nivîskarê *Le fellah défenseur du trône* e, ji weşanên fonda netewî ya siyaseta zanistî, Parîs, 1985

2 Mahjoub Tobji, *Les Officiers de sa Majesté*, Fayard, Paris, 2007

3 PJD sala 1998ê pêk hat, û desthelat dixwaze pareke îslamîyan bixe bin kontrola xwe. Ji hingê ve pareke endam û alîgirên PJDê zêde nelihev in digel desthelatê. Bixwîne: Wendy Kristianasen, *Le Monde diplomatique tebax 2007*

4 No 395, *Casablanca*, 24 Cotmeh 2009

5 Daxuyaniya wezirê ragihandinê M. Khalid Nauri, 4ê Mijdara 2010an

6 *Tel Quel*, 29 çile 2011

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn

Aborîya siyasî di dilê "bihara erebî" de

Serhildana ji bo bêhtir dewlet û kêmtir desthilatê

Samir Aïta *

Lawazkirina dewletê, lîberalkirina aboriyê û xizankirina civakê serhildanên ereban xwedî kirin.

Bingehên "biharê" ne bi tenê daxwazên azadîyên giştî û demokrasîyê ne. Jê bêhtir, divê em di aborîya siyasî de li sedemên redkirina vê "istisnaya erebî" bigerin, ya ku hişyarîya nû dixwaze wê ji holê rake: Ji salên 1970ê ve, desthilatên otorîter û bi istîqrar li van welatan serdest in. Li vê herêma dinyayê, desthilateke bilind (1) li ser serê dewletê û sazûmanên di dema serxwebûnê de çêbûyî, cihê xwe çêkir û îmkanên hebûneke domdar jî dane xwe; lewre jî, monarşî mutleq in û serokkomarên ji bo jîyanê (û peywirên bi mîrasê dewam dikin) komaran kilît dikin.

Ev rewş çawa çêbû? Jixwe, xizmetên ewlehîyê hene ku bi awayekî dîrekt di destê vê îktîdarê de bûn û tu çavdêrîya Parleman û heta hikûmetan jî li ser tunebû. Gelek caran, endamekî xizmetên ewlehîyê dê wezîrek biaziranda an jî biryarek li ser wî ferz bikira. Lê fînansmana van makîneyên pirşaxî jî, her wekî tevnên muşterîperest ên cihê li partîyên yekane an jî teslîmbûyî peyda dibin, pêwîst bû. Fon ne ji budceyên giştî weke yên polîs an artêşê, lê ji serkanîyên cuda dihatin.

Sala 1973yê bi pey firîna bihayê nefta xam re, hatina ji petrolê pir bilind bûbû. Di şebekeyên belavkirinê de û bi hevkarîya şirketên navneteweyî yên mezin, beşeke ji hatinan rasterast diçû kaseyên malbatên qralîyetê an "komarî", li şûna ku biçe xezîneya maliyeyê. Lê belê îqtîdarê bi tenê neft bi dest nexistibû. Piştî komîsyonên li ser peymanên giştî (sîvîl û leşkerî), ku ji ber kêmkirinên budceyê yên têkildarê "sererastkirina strukturel" hindik bûn, fersendên nû derketin holê. Li salên 1990ê telefonên mobîl ketin rojevê û pêla pêşî ya ferdîkirina sektora dewletê li gel "hevkarîyên giştî-ferdî" yên cihê (peymanên BOTê (2) dest pê kir. Bi taybetî di destpêkê de, dema ku mişterîyên wê li sinifên herî dewlemend ên xelkê peyda dibûn û wan dikarî bihayên giran bidin jî, telefonên mobîl qezencên mezin derxistin holê. Li nav operatorên navneteweyî yên mezin, karmendên herî bi bandor û desthilatên heyî, şerê ji bo bidestxistina van qezencan dijwar bû. Pirsgirêka li gel operatora ***Djezzy***, ya di navbera ***Orascoma*** misirî û leşkerên cezayirî de mînaka wê ye, her weke yê ku berê dîsa di navbera ***Orascom*** û ***Syriatela*** li Surîyê ketibû rojevê jî. Vî şerî, rabûna şirketên navneteweyî yên ereb ên pêşî bi xwe re anî, mîna Orascoma navbihurî an jî ***Investcom***a lubnanî.

Hemû desthilatdariyên ereb heyranî "mûcîzeya Dubayiyê" bûn û hewl dan wê ji nû ve biafirînin

Globalîya di zêdebûnê de ya aborîyên ereb, li gel mecburiyetên ji Fona Darayî ya Navneteweyî (IMF) -bi piştgirîya Komîsyona Ewropî ya ji bo welatên Deryaya Sipî re -, ev serdestîya desthilatê ya li ser aborîyê bi lez kir, nemaze piştî herifînên fînansî yên 1986ê (3): Kêmbûna sermaye guzerîya dewletê û lawazbûna peywira birêkûpêkkirinê ya hikûmetan; wergirtina rewşên monopol û olîgopol (karê çimentoyê, belavkirinê, hwd.) ji hêla hin şirketên navneteweyî ve, bi şertê parvekirina qezencan li gel giregirên desthilatê. Hemû rayedarên şirketên mezin yên global dizanîn ka biryar bi rastî li ku derê tên girtin û hevkarên herêmî yên ferzkirî ji bo sermaye guzerîya nû kî ne: ***Trabelsî*** û ***Materi*** li Tûnisê, ***Ezz*** û ***Sawires*** li Misirê, ***Makhlouf*** li Sûrîyê, ***Harîrî*** li Lubnanê, hwd. Wek mînak, Sawiresan di dawîyê de, berî "şoreşa" misirî, parên xwe yên di ***Orascom-Mobînîlê*** de firotin ***France Telecomê***, her weke parên xwe yên di kargehên çimentoyê de jî. Najîb Sawires niha dikare xwe weke leyistikvanê guherîna welatê xwe îlan bike. ***Najib Mîkatî*** yê ku jixwe Investcom firotibû grupa başûr-afrîkî MTNê, aniha peywirdarê hilbijartina hikûmeta nû ya Lubnanê ye.

Karê emlakê paşê hatiye. Bi xêra coşa giştî ya "mucîzeya Dubaîyê", hemû desthilatên ereb destê xwe di operasyonên emlakê yên bi heybet werda, da ku tevlihevîya berjewendîyên giştî û taybet binixumînin. Hin erd weke deverên feydeya giştî hatin îlan kirin ji bo ku bi fiyatên nizim bifiroşin pêşengên emlakê; navendên dîrokî yên bajaran berdan da ku *riyad* ên xwe bi veberhênerên heyranên "şîrînîya Rojhilat" bidin nû kirin. Taliyê, bihayên emlaka herêmî bi qasî fiyatên li Tokyo, Parîs an Londonê bilind bûn.

Çerxa esasî ya vê makîneyê, qada bankayî bû. Bi xêra bankayan, qezencên heyî hatin şûştin û ji bo operasyonên emlakî û ticarî jî dîsa hatin bi kar anîn. Ew jî di destê îqtîdarê de bûye aletek, ku bi alîkarîya kredîyên bankayan karî piştgirîyeke mayînde ji mutehidên herêmî misoger bike. (4)

Lê rûyê din vê pêşketina bê hempa jî, lawazbûna dewletê û xizmetên dewletê bû. Endamên hikûmetan ji hêla payebilindên dewletê ve dihatin hilbijartin; di rewşa herî baş de, ew teknokratên ji sazîyên navneteweyî yên mezin (bi taybetî Bankaya Dinyayê) bûn, ku rewatîya wan a hilbijartinî an jî bernameyeke hesabê wê dê ji wan bihata xwestin, nebû. Êdî dewlet weke burokrasîyekê dihat hesibandin. Heta artêş jî lawaz bû û hêzên pretorî yên baş teçhîzkirî û misogerên domdarîya îqtîdarê bixwe, cihê wê digirt. (5)

Awayê hikumdarîyê êdî ji yê piştî serxwebûnê, ku ceyran anîbû gundan û perwerdeya giştî berfireh kiribû, tam cuda bû. Weke raporên li pey hev ên Bernameya Neteweyên Yekgirtî ji bo Pêşketinê (UNDP) nîşan dabû, xizmetên dewletê av û av diçûn; ji ber taybetkirineke zêde ya ku li gor qezencên mihtemel dimeşîya. Heta li Erebistana Suûdîya zengîn, li Ciddeyê, ava kanîyê tenê hefteyê carekê heye û mîrekî hiştiye ku li ser gelîyan avahî werin lê kirin, bêyî şebekeya tehliyekirina avê, lewre jî du lehîyên kujer çêbûn.



Ismet Polatli: **Rûxîn II**
boyaxa rûnî li ser tûwalê, 80 x 120 cm

Her ku skandalek dide der, kampa-nyayên dijbertîlxurîyê tên dest pê kirin, lê zêde bi bandor nabin, çunkî ev ne tenê pirseke exlaqî yan jî dînî ye, ev talaneke pergalî ya li ser nirxa zêde ye, ku grûpeke rayedaran a êdî şikla kapîtala mezin girtiye, dimeşîne.

Li bingeha pîramîda civakî, rûmeta mirovî û nirxa xebatê tê înkar kirin. Nêzîkî ji sê paran pareke xebatkaran di qada nefermî de dixebite, qada "karên piçûk"; lê ew ji bo îstatîstîkên bêkarîyê nayên hesibandin -tevî vê yekê, ev îstatîstîk ji du dehsalan ve rêjeyeke bi du hejmaran nîşan didin. Ji sisiyan yeke din di beşa taybet ya fermî de dixebite; ew bi giranî ji xebatkarên serbixwe, an jî "xebatkarên meaşgir" pêk tê; bê peymana kar, sîgortaya civakî, mehaneya teqawîtê yan jî mafên sendîkayî yên rasteqîn... heta ku têgiha meaşgirî bixwe jî winda dibe (6), qet nebe li derveyî qada taybet û îdareyî. Li van qadan, mafên civakî parastî dimînin, lewra jî xelk û bi taybetî jin dixwazin lê kar bikin. Bes, fersendên bi vî rengî ji ber siyasetên "sererastkirina tevnî", ku kêmkirina mesrefên dewletê li şûna zêdekirina qezencên wê ferz dikin, hindik in.

Bazara xebatê ji ber hejmarên mezin ên koçberan li van welatan jî, hîn bêhtir dabeş dibe. Hin ji van koçberan (pênaberên filistînî, iraqî, sûdanî yan jî somalî ku ji şerê navxweyî reviyane) dixwazin bimînin, hinên din jî demî ne û li ser cudatîyên di navbera welatan de dileyizin. Ji bo wan, mafên aborî û civakî hîn xirabtir in û mêtinkarîya xebatê jî dibe mijarê wergirtina qezencê, ev qezenc carinan pir mezin e. (7)

Pêla ciwanên ***baby boom*** a ereb -bi çandeke nû re mezinbûyî- salên 2000ê ket temenê xebatê û li Tûnis û Misirê bingeha pîramîdê serê wê biriye. Li warên din jî, tevahîya tevna civakî hejîya. Hin kes ji ber zêdebûna daxwazên civakî yan qadî, ku li her derî dan der, matmayî dimînin, mîna ku sazkirina piştî serxwebûnê di aramîyê de derbas bûbû û vegera li rewşa asayî hêsan bû.

Jixwe, li welatên ereb, divê dewleta hiqûqê dîsa bê saz kirin. Dewleteke wisa ye ku bi desthilatên demî yên di bin çavdêrîya sazûmanan de -ne ku di ser wan re ne- dimeşe; dewleteke wisa ye ku qezencên îqtîdarê, herweha monopolî hemû yek bi yek ji hev bên xistin da ku enerjîya sazkirinê azad bibe. Dewleteke wisa ye ku azadîyên giştî û civakî ji her kesî re misoger in, da ku xebatkar bi rêya têkoşîn û muzakereyê mafên xwe bistînin. Dewleteke wisa ye ku lihevhatina civakî lê serdest e û divê ew hesaban bide jî. Ew ê hêsan nebe, ji ber ku li her derê dinyayê, Ewropa jî di nav de, rewş ber bi vî alî de naçe...

* Serredaktorê Le Monde diplomatique weşanên erebî, nivîskarê pirtûka "les travailleurs arabes hors-la-loi (Karkerên Ereb li Derveyî Qanûnê)", L'Harmattan, 2011.

1 Samir Radwan û Manuel Riesco, "The Changing Role of the State" ["Rola Dewletê ya Tê guhertin"], ERF, 2007

2 Build-Operate-Transfer: Cûrê peymana kirêkirinê ku imtiyazên demkurt dide veberhênerên sektora taybet

3 Daketineke tund a bihaya neftê Cezayîr û Surî xist rewşeke rawestiyana xerckirinê. Li 1999ê, heman diyardeyê xwe di asteke piçûktir de da der

4 Li anketa Beatrice Hibou ya li ser meseleya tûnisî binihêrin, *La Force de l'obéissance [Hêza Îtaetê]*, La Découverte, Paris, 2006

5 Bixwînin: Salam Kawakibi û Bassma Kodmani, *Le Monde diplomatique*, adara 2011ê

6 *Bnr. li* "Le travail et la question sociale au Maghreb et au Moyen-Orient" ["Kar û Pirsa Civakî li Mexreb û Rojhilata Navîn "], *Revue des mondes musulmans et de la Méditerranée*, hjm. 105-106, Edisud, Aix-en-Provence, 2005

7 Suhbeta li ser kotayên karkerên koçber li Erebistana Suûdîyê bixwînin; der bareyê pirtûka Steffen Hertog de, *Princes, Brokers and Bureaucrats: Oil and State in Saudi Arabia [Mîr, Simsar û Burokrat: Petrol û Dewlet li Erebistana Suûdîyê]*, Cornell University Press, Ithaca, 2010; li ser malpera www.economistes-arabes.org (bi fransî)

Wergera ji fransî: Simko Destan

www.arsivakurdi.org










Îlon 1980

Berûdistana Kurd

Lawazîya berxwedaneke parçebûyî (2)

Chris Kutschera *

Neteweya qedîm a tarûmarkirî li hemberî dewletan, ketiye nav hewldaneke mezin a parastina nasnameya xwe. Lê belê xewna "Kurdistana Mezin" nebû çîmentoya têkoşînê.

Avakirina Kurdistaneke serbixwe, di 1920ê de, bi peymana Sevrê hatibû rojevê. Piştî şêst salan, gelê kurd hê jî di navbera pênc welatan de parçekirî ne: Li Tirkiyeyê (6- 8 mîlyon, li Îranê (5,5 mîlyon), li Iraqê (2,5- 3 mîlyon) û bi hejmara herî hindik jî, li Sûrîye û li Yekîtîya Komarên Sovyetên Sosyalîstê, (li yekê 500 000- 800 000 û li ya din jî 300 000) (1). Ji hingê ve kurdan ji bo parastina nasnameya xwe ya neteweyî qet navber neda têkoşînê. Lê belê, eynî mîna xaka wan, tevgera wan a neteweyî jî parçe parçe ye.

Şerên birakujîyê li Iraqê

6ê adara 1975ê, li Cezayîrê, bi rasthatina civîna OPECê, Îran û Iraqê îmze diavêtin ser peymana lihevkirinê û pê, şah bi taybetî qebûl dikir ku ew ê nema alîkarîyê bide otonomîstên kurd ên başûr. Ev yek di nav kurdên penaber ên Iraqê de ku xwe li Nexedeyê (Îran) digirin, bû sedema alozîyeke mezin, ji ber ku wan wisa bawer dikir ku ew peyman dihat wateya hilweşîna tevgera kurdî. Di vê navberê de, ji 22yê gulanê ve hejmarek mîlîtanên çepê PDKya başûr, li hotela Mahabad civîyayî, Tevgera Sosyal Demokrat a Kurdistana Iraqê ava dikir û ew tevger wê pir bilez veguheriya ser Tevgera Sosyalîst a Kurdistanê. Di nav avakaran de: Elî Eskerî, Umer Debabe û Dr Xalid, ji 1964ê ve bi baskekî PDKê re bûn û serkêşîya vî baskî Celal Talabani û Ibrahim Ahmed dikir; û hin kesayetîyên hindiktir nas jî Taher Ali Wali û Resûl Mamend bûn.
Hema hema di heman demê de mîlîtanên çepê tundrew Komîteya Marksîst Lenînîst a Kurdistanê, bi gotineke din "Komala" ava dikir, "demokratên", weke Celal Talabani, Kemal Xoşnav û Kemal Fûad jî, lihevcivîyayî, li nav rêxistineke siyem a bi navê Liqa Gelemperî, Komîteya Amadekar a Yekîtî Nişтîmanî Kurdistan bi gewde dikir. Vê komîteyê jî amadekirina bernameyekê û lihevgihandina hemû rêxistinên demokrat û sosyalîst ên Kurdistana Iraqê ji xwe re dikir wezîfe. Gava ku 1ê hezîrana 1976ê, bi qasî çil mîlîtanên Komalayê yên ji Sûriyê dihatin, bi armanca jinûve dandestpêkirina şerê çekdarî li bakur-rojavayê Kurdistana Iraqê, ketin herêma Behdînan, yekîtîya van rêxistinên cihêreng hê saz nebûbû. Wisa xuya bû ku ev mîlîtan pir bêtedbîr û bilezûbez hatibûn şandin: Mehekê piştî hatina wan a Kurdistanê, fermandarê koma wan, Îbrahîm Azû hat girtin û înfaz kirin.

Piştî çend mehên din, rêveberên Tevgera Sosyalîst a Kurdistanê, Elî Eskerî û Dr. Xalid jî ketin nav xaka başûrê Kurdistanê; lê belê evên dawîyê li baregeheke xwe ya herêma ku wan baş nas dikir, li başûr-rojhilatê Kurdistana Iraqê, li qada Qeladiza Koysancaxê bi cih dibin. Di demeke pir kin de, bi qasî hezar pêşmerge li derdora Elî Eskerî kom dibin. Salekê piştî jinûve destpêkirina şerê çekdarî, rewş, ji alîyê eskerî ve, têra xwe lihevhatî ye ji bo di navbera 30ê tebaxê û 12ê îlona 1979ê de kongreya avakar a Yekîtîya Nişтimanî Kurdistan li hev kom bibe. Celal Talabanî jî di nav de 63 delege tevlî kongreyê dibin. Talabanîyê ji Şamê hatî, piştî demeke pir nêz, bi wî awayî, weke sekreterê giştî yê rêxistina nû tê dest nîşan kirin.

Celal Talabanîyê di 1933yê de li Koysancaxê hatî dinê û ji fakulteya huqûqê ya Bexdayê mezûnbûyî, weke yek ji "ciwanên radîkal" ên PDKa başûr pir zû bal kişand ser xwe. Di 1961ê de, li demeke ku piranîya rêveberên PDKê, muhtemelen hinek jî di bin bandora Partîya Komunîst a Iraqê de, ji bo şerê çekdarî her didin paş, Talabanî di nav partîyê de digihîje komeke piçûk a ku endamên wê pir dixwazin zûtirîn dem şer bidin dest pê kirin.

Celal Talabani hingê bi general Barzanî -ku îro êdî tine- re dikeve nav danûstandinên wisa nêz ku general jê re digot,"kurê min". Lê belê piştî agirbesta 10ê sibata 1964ê, ew dibe yek ji rêveberên PDK yên ku li gel Îbrahîm Ahmed, Omar Debabe û Elî Eskerî, navbera wan bi Barzanî re xira dibe û êdî wî weke "kesayetîyeke eşîrî " bi nav dikin û hetta, wî ji bo şoreşa kurd weke *"kesê herî xeter"* dinirxînin. Piştî berxwedaneke kurt, ew neçar dimînin li Îranê bibin penaber. Korbûyî, ji ber kîna xwe ya li dijî Barzanî, talabanîgir di destpêka 1966ê de bi Baasê re li hev dikin, yekîneyên ji du hezar mîlîsan "cahşan" pêk tên, saz dikin û heta îmzekirina peymana lihevkirinê ya 11ê adara 1970yê, ew ê şerê li dijî peşmergeyên general Barzanî bidomînin.

Celal Talabanîyê ku ji alîyê hevalên xwe ve weke "teorîsyenekî jîr û pêşengekî zîrek" tê dîtin, bi ehlîkêfî û xweşbêjîya xwe tê teqdîr kirin. Lê belê ji alîyê kesayetîya xwe ya siyasî ve serê mirovan tevlihev dike: Wî general Barzanî ji ber hevgirtina wî ya bi şahê Îranê re rexne dikir, lê belê ew bixwe jî, li gel kesekî din ê zilm li kurdan dikir, li gel serokwezîrê Suriyê general Hafiz Esad di nav danûstandinan de bû. Û Hafiz Esad dixwest wî ji bo bêîstîqrarkirina Iraqê bi kar bîne, wekî ku şahê Îranê jî Barzanî bi heman armancê bi kar anîbû. Bi rastî jî di 1976ê de, Şam bi çek û pereyên ku dide, ji bo tevgera kurd a başûr dibe navendeke girîng. Kongreya YNK ya îlona 1977ê buroyeke siyasî û komîteyeke navendî ya nûnerên sê tevgerên sazûmankar hilbijartin û ev slogan da pêş: *"Xweserî ji bo Kurdistanê, demokrasî ji bo Iraqê."* Ev formul û ya PDKya Îranê eynî ne. Sekreterê wê yê giştî ji bo me pozîsyona YNK ya der barê otonomîyê de wiha îzah kir: *"... Ez natirsim ku weke cidaxwaz werim bi nav kirin. Gelê kurd li welatekî bi awayekî sûnî parçekirî dijî. Em ne hindikahîyek, lê neteweyek in. Li gel vê yekê jî, em ji bo xweserîyê têkoşînê dimeşînin. Nifşê min bi qasî ku xuya dike, wê serxwebûna Kurdistanê nebîne."*

Partîya wî giranîyê dide stratejîya pêkanîna "lihevkombûna neteweyî ya Iraqê" bi gotineke din, komîteya koordînasyona dijberîya iraqî ku di nav de li tenişt YNKê, herwiha rêxistinên siyasî yên ereb ên weke Tevgera Sosyalîst a Ereb (ji nav Tevgera Neteweyî ya Ereb derket), Baasa çepgir (baskê alîgirê Sûriyê di nav Baasa Îraqî de), Fermandarîya Navendî ya Partîya Komunîst a Îraqê (ji nav PKIyê derket) û hin tevgerên xwe dispêrin îlhama nasirî: Partîya Kongreya Ayat Said Thabet, ku li Lîbyayê penaber e; Partîya Sosyalîst a Reşîd Mûhsîn, şefê berê yê Servîsên Saloxdarîyê yên Aref ku li Qahîreyê penaber e û Partîya Yekbûnê.

Celal Talabanî vê stratejîyê wiha îzah dike*:"Bi vî awayî, ti kes nikare me bi alîgirîya sîyonîzmê û ya emperyalîzmê tewanbar bike."* Tevî gumanbarîya li ser YNKê ya ji ber hebûna rêxistinên balkêş ên di nav "lihevkombûna neteweyî" de, divê ev jî neyê ji bîr kirin ku Celal Talabanî karibû li gel Şamê (bi rêya Baasa Çep) û Adenê (bi rêya Tevgera Sosyalîst a Ereb) danûstaninên pir baş bihûne û ji ber vê yekê techîza tevgera xwe misoger dike.

YNK bi qasî 3000-3500 pêşmergeyan di bin fermandarîya Elî Eskerî de kontrolê dike. Ji 1977ê û vir ve, di navbera wan û Yekîneyên Hewayî yên artêşa Iraqê de şerên giran rû didin. Lê belê sê mehan piştî kongreya wê salê, YNK li gel rejîma Bexdayê ketiye nav danûstandinan li bin tesîra filistînîyên ku, ji dema gera Sedat a Qudusê û vir ve, hêvî dikin ku Iraq jî xwe bigihîne enîya biryardarîyê. Elî Eskerî 23yê mijdarê li Bexdayê bi Sadam Huseyîn re rûdine. Hevdîtin li ser sê xalên esasî tên kirin: Pêkanîna statuya xweserîyê; rakirina qedexeyên li ser partîyan; nirxandina rewşa şerîda sînor a 20 km fireh ya ku gundên li ser giş hatine xira kirin û ji mirovan hatine vala kirin, gundî jî ji neçarî koçber bûne.

Serokê Iraqê di hevdîtinê de dibêje ku pêkanîna statuyekê wê bi xwe re gelek pirsgirêkan biafirîne, rakirina qedexeya li ser partîyan jî ancax dikare di çarçoveya enîya neteweyî de pêk were, ji bo xala der barê şerîda sînor de jî, îdîa dike ku derfeta guftûgokirina mijarê tuneye: Heman tedbîr li herêmên ereban jî hatin standin. Bi kurtî hevdîtin bi ser nakeve û çawa Elî Eskerî vedigere Kurdistanê, operasyon jî dîsa dest pê dikin.

Ji alîyê çepê kurd ve jinûve destpêkirina şerê li Kurdistana başûr, wê bi xwe re encamên nepayî bîne. PDK ya ku ji alîyê kesên nêzî general Barzanî ve jinûve biserûberkirî, dest bi berxwedanê dike. Çend hefteyan piştî peyamana Cezayîrê ya 6ê adara 1975ê, yek ji hevkarên nêzî general Barzanî, "serokwezîrê" keleha kurd, Samî, qebûl kiribû ku "tevgera çekdarî ya kurd qediyaye... Bi awayekî siyasî, ev ekîba rêveberan qediyaye ". Ekîba general Barzanî bi rastî jî bi awayekî ji awayan ji hev belav bûbû, hin ji wan li Îranê mabûn, hin ji wan xwe li Ewropa û Dewletên Yekbûyî girtibûn û bûbûn penaber, hinên din ên weke Hebîb Kerîm, ku sekreterê berê yê giştî yê PDK bû, ji bo ji efûyê sûdê wergire vegeriyabûn Bexdayê.

Lê belê general bixwe, çawa ku yekemîn komandoyên YNKê gihîştin Kurdistanê, bêyî ku dereng bimîne careke din zendûbendên xwe badan. General, di bihara 1976ê de ji kurê xwe Îdrîs dixwaze çar fermandarên berê yên eskerî yên Barzanî ji wan zehf piştrast bû, bişîne Kurdistanê: Arif Yasîn, Hemîd Efendî, Mulazim Yûnis û Mustafa Nerweyî bi wî awayî wê ji nû ve têkoşîna çekdarî bida dest pê kirin.

Di heman demê de, kurekî din ê general, Mesûd Barzanî, "reveberîyeke wextî " ya PDK saz dike û di nav de hin giregirên berê yên partîyê yên weke Sami, Alî Abdulla û Nûrî Şawes hene, lê belê bi taybetî kesayetîyên di plana duyemîn de û kadroyên berê yên Parastinê, servîsa saloxdarîyên veşarî, ku serokatîya wê Mesûd dikir, di nav rêveberîyê de zêdetir cih digirin.

Li pêşîya partîzanên general ên ku ji nû ve dest bi şerê çekdarî bikin, şert û mercên pir dijwar hene: Ji bo kurdên li Îranê di nav wargehên penaberîyê de dijîn, rewş pir xirab e, ji ber ku ew pir ji nêz ve ji alîyê SAVAKê ve tên kontrol kirin. Eger ew karibin ji wir birevin û bikevin nav xaka Iraqê jî, qasidên general, ên ji alîyê artêşa Iraqê ve tên şopandin, nikarin zêdetirî 24 saetan li heman gundî li benda wan bimînin.... Lê belê rejîma Baas siyaseteke wisa dijwar û sîstematîk a perçiqandin, erebkirin û surgunkirinê li ser gel dimeşîne ku ev yek şaşîyên general Barzanî yên berê bi kurdan pir zû dide ji bîr kirin –bi taybetî jî li Behdînanê, herêma ku şênîya lê dijî bi piranî û giranî ji eşîran pêk tê. Wekî din, bi xêra alîkarîya eşîrên kurd ên Tirkiyeyê û PDK ya Tirkiyeyê, zilamên Barzanî wê karibin di demeke pir nêz de bibin xwedî hêzeke ji sê hezar pêşmergeyî pêk hatî û ji deverên ku lê ne, ew ê karibin ji baregehên xwe yên li ser sînorê Tirkiye û Îraqê xwe bigihînin enîyên şer.

Nakokîya di navbera talabanîgir û barzanîgiran de êdî li ber derî bû: Bi kontrolkirina riyên Behdînan, mîlîtanên Mesûd Barzanî li pêşîya pêwendîyên mîlîtanên Talabanî yên bi Sûriyê re dibûn astengên dijwar û rê li ber anîna çekan digirtin.

Di bihara 1978ê de, Celal Talabani di bin fermandarîya Alî Askerî û Doktor Xalid de bi sedan pêşmergeyan dişîne seferê ji bo ku "Behdînanê paqij bikin" û ji Sûriyê çekan bi xwe re bînin. Destpêka hezîranê, li ser axa ku dikeve nav sînorê Tirkiyeyê şerekî mezin ê kujer di navbera hêzên YNKê û PDKê de rû dide. YNKyî tarûmar dibin: Alî Askerî, doktor Xalid û serokekî êzîdîyan, Şêx Huseyin, tên girtin û ji alîyê barzanîgiran ve tên înfaz kirin; bi qasî pêncî pêşmergeyên YNKê tên kuştin û du sed-sê sed pêşmergeyên wê yên din jî weke êsîr dikevin destê PDK û bi dehan pêşmergeyên din jî ji serma dimirin.

Di encama vî şerê giran de, Tevgera Sosyalîst a Kurdistanê dipelişe. Vemayîyên tevgerê ji Celal Talabanî vediqetin û dikevin nav komîteya amadekar a PDKê ya Dr. Mahmûd Osman, ê ku general Barzanî bi ti awayî nekarîbû kedî bike. Di tebaxa 1979ê de, Dr. Mahmûd Osman bi Resûl Mamend û Tahir Eli Welî re Partîya Sosyalîst a Yekbûyî ya Kurdistana Iraqê ava dike û bêyî ku bi YNKê re bikeve nav hevgirtinekê, hewl dide li nav baskê çepê yê PDKê de riyeke sêyem veke. Bêyî ti derfetan, bi tenê bi hevalbendîya çend kesên lawaz, Dr. Mahmûd Osman neçar dimîne ku hem li dijî eskerên artêşa Iraqê, hem jî li dijî mîlîtanên Celal Talabanî, bikeve nava şerekî dijwar tevî ku bi vê yê dawî re heta 21ê adara 1979ê di binê heman konî de jiyabû... Dema dora wî tê, ew jî ji bo guftûgokirina li ser naskirina statuya xweserîyê, destpêka cotmeha 1979ê, diçe Bexdayê û bi Sadam Huseyîn re dikeve nav danûstandinan. Lê belê hewldanên wî nagihîjin ti encamê.

Heman salê, du bûyerên hê jî girîngtir wê qada têkoşînê ya doza kurdên Iraqê yekcar serûbin bikin: Veqetîna Partîya Komunîst a Iraqê ji rejîma Sadam Huseyîn û şoreşa Îranê.

Sirra demeke dirêj parastî li cem komunîstên Iraqî, yên hewl didan îmtiyazên partîya xwe biparêzin –hebûneke hiqûqî, li gel du wezîrên di nav hikûmetê de, buro û rojname, -xirabûna têkilîyên navbera Partîya Komunîst û Baas, piştî weşandina raporeke komîteya navendî ya PKI li ser van têkilîyan, eşkere dibe: Di gulana 1978ê de, bi qasî sî kadroyên partîyê tên înfaz kirin. Piştî çend mehan, pevçûn mezintir û dijwartir dibe: 13yê gulana 1979ê, polîsê baasî dest datîne ser weşan û çapxaneya rojnameya Partîya Komunîst, Terîq el Şaab û çend rojan bi şûn de jî davêje ser navenda Partîya Komunîst û wê digire. Di tebaxa 1979ê de, rojnameya Terîq el Şaab bi dizî careke din derdikeve, hema piştî civîna komîteya navendî ya Partîya Komunîst ku biryarê dide hemû têkilîyên xwe yên bi Baasê re biqedîne, her cure guftûgo û danûstandinên li gel rejîma Sadam Huseyîn red bike û ji hemû endamên partîyê dixwaze ku heta Sadam hilweşînin li dijî wî şer bikin.

"Bere"yek li dijî Baasê

Di dawîya sala bihurî de, gelek endamên polîtburo û yên komîteya navendî ya PKI biryargeha xwe ya bingehîn li "Gelîyê Partîyan" saz kir, hem jî tam li teniştya Celal Talabanî, ku ji wê derê şerên xwe yên çekdarî li dijî rejîma baasê bi rê ve dibirin. Li alîyê din, PKI ji bo sazkirina "bereyeke demokratîk" bang li hemû rêxistinên iraqî dikir. Ji wir û şûn ve Baas wê êdî bi temamî bi tenê bihata hiştin.

Lê belê sazkirina "bere"yekê bi xwe re gelek pirsgirêkên hesas ên siyasî tîne. Ji ber ku bi vê banga xwe Partîya Komunîst di eslê xwe de di nav heman enîyê de PSYK ya Dr. Mahmûd, YNK ya Celal Talabanî û PDK ya Mesûd Barzanî ku hê jî li dijî hev di nav şerekî dijwar de ne, li hev kom bike. Şoreşa Îranê di vê navberê de wê bi xwe re encamên pir dijwartir bianîna. Heta rojên dawî yên şah, pêşmergeyên YNKê neçar mabûn li du enîyan şer bikin: Dema, di mijdara 1978ê de artêşa Îraqê êrişeke pir mezin dibe ser biryargeha giştî ya Celal Talabanî ya li "Gelîyê Partîyan", artêşa Îranê li alîyê din ê çem dikeve pozîsyona şer û hikûmeta Tehranê bixwe destûrê dide kolonelekî îraqî ku li xaka Îranê, li navsera yek ji çîyayên ku jê Gelî tê dîtin, ji bo ku operasyonan bi rê ve bibe: Baş bû ku berfa ji nîşka ve dest pê kir û bê navber bariya, bû sedemê rizgarbûna şervanên kurd û felçbûna helîkopterên artêşa Iraqê û ji ber sermayê mirina bi dehan eskeran. Ji şoreşa Îranê û vir ve, xaka Îranê bû starteha pêşmergeyên YNKê.

Xweragirîya li dijî desthilata îslamî ya li Îranê

Li Îranê, şoreş ji bo PDKê wê bibûya firseteke bêhempa da ku bikare du armancên xwe bi cih bîne: Xweserî li Kurdistana Îranê û demokrasî li Îranê. Lê belê rêveberên wê bixwe jî li xwe mikur tên ku bûyer bi lezeke zêde zû rû didin: Di demeke pir kin de, partîyeke îlegal a ku lava dikir ku ji her hezar rûniştevanan bi tenê kesekî ji xwe re bike endam (ango li seranserî Kurdistana Îranê pênc hezar endam), ji nişka ve neçar ma ku birêveberîya xakeke bi qasî ji pêncan yekê Fransayê, bixe destê xwe.

Di nav çend mehan de, rêveberên kurd êdî neçar bûn ku bi heqîqeta dijwar re rû bi rû bimînin: Hilweşîna desthilata şah demokrasîya ku wan hêvî dikir neanîbû Îranê û ji meha tebaxa 1979ê û pê ve, pêrgî êrişeke pir bêwijdan hatin. Careke din, her du lingên wan ketibûn solekê: Gava ku artêşê êrişa mezin da dest pê kirin, piranîya wan hê li Mahabadê li navenda giştî ya PDKê bûn û bi hewldaneke bêhempa vekişîyan çîyayan û li biryargeha xwe ya li "Gelîyê Partîyan " bi cih bûn. Gelek hefteyan sekreterê giştî yê PDKê, Ebdurehman Qasimlo, xwe spart stargeheke li quntarê çîyayekî asê yê ku berîya wî bûbû stara gelek şivanan....

Piştî saleke din, li pey bêhnvedaneke şer a zivistanî ya bi muzakereyan derbas bû, dîsa êrişeke nû dest pê kir. Li bin çavên heyretmayî yên gelek derdoran, derket holê ku, tevî êrişên topan û bombebaranên balafirên îranî jî, kurdên Îranê nehatin perçiqandin.

Berpirsiyar der barê birêxistina xwe ya eskerî de zêde bi tedbîr in û ti tiştî eşkere nakin, lê belê ew dîsa jî li xwe mikur tên ku wan pênc hezar esker şandibûne seferê. Biçekbûna wan? Gelek G-3; Çekên otomatîk ên malê amerîkî; Kalaşînkof; çend

www.wi-dl.org



Arşîva bîra Kurdan

Beşê yekem yê nivîsa Chris Kutschera di hejmara Adarê ya Le Monde diplomatique kurdî de derketibû. Em niha jî bêşê duyem ya nivîsê diweşînin. Kutchera lîstikên dewletên derdor û yên dagirkerên Kurdistanê û bi vê yeke ve girêdayî şerê kurdan li dijî hev, parçebûn û belavbûna wan anîbûn zimên.

Di berdewamîya nivîsa xwe de bi heman awayî rewşa serek û rêxistinên kurdan yên wê demê tîne zimên û rewşa belav û parçebûna wan bi kûrahî dest nîşan dike û şanî dide ku kurd ne tenê ji alîyê dijmin û ji alîyê şerê navxweyî lê her weha ji alîyê dostên xwe jî tên berdest, parçe û belavkirin; her kesek çawa di nav hewldanekê de ye ku sûd ji têkçûn û tevlîhevîya wan bigire û `dost´ çawa di rojekê de dikarin vegerin aliyê din û bikevin pey mafên xwe.

Dewletên derdor bi taybetî gelek dewlet û rêxistinên ereban, gelek komikên çep jî di nav de, hîç mafekî ji bo dîplomasî û têkilîyan nadin yên kurd û wan hertim bi sîxurî û berdevkiyên dewletên Amerîka û Îsraîl tewanbar dikin.

Belawelabûna rewşa hêz û rêxistinên kurd dibû sedema hêriş û bikaranînên wan û bêhêzketina têkoşîna gele kurd. Lê di rewşeke wiha de jî, çawa kurd di nav hewldanên xwekomkirina ber hev de bûne û çawa gelê kurd têkoşîna xwe ya jiyanê dewam kiriye û bi hemû lîstîkên kirêt re jî têk neçûye, di berdewamîya vê nivîsê de zelal diyar dibe.

LMdkurdî

tivingên Brno; RPG-7, ku çekên dijwar ên dijtank in; mîtrayozên Uzî (bi lîsansa îsraîlî li Îranê tên çêkirin). Hema hema ev çek giş li ser artêşa Îranê qeydkirî ne û gelek ji wan û li ser piranîya çekan bixwe ev dest nîşankirî ye.

Demeke pir hindik piştî şoreşê, kurdan garnîzona Mahabadê dorpêç kiribû; dû re, dawîya tebaxa 1979ê ya Serdeştê ku tê de dinyayek çek hebûn. Li Mehabadê, zêdetirî sê hezar tivingan û gelek çekên giran: RPG-7, "doçka" (mîtrayoz) lê belê topên 86 mîlîmetre û yên 105 mîlîmetre û hetta fuzeyên TOW. Heman tişt li Serdeşt jî ku li wir şervanên kurd dest danîn ser kewarên pir mezin ên qût û muhîmatên şer.

Qasimlo piştî demekê wê bi van gotinan li xwe mikur bê: "*Me dinyayek mesref kir, ji bo em bi kamyonan wan pêdivî û muhîmatan bibin cîyên bi ewle...*" Eger were zanîn ku li bazara reş a Îranê fiyeta Kalaşînkofekê ne kêmî 15 000 frankên fransî ye û guleyek jî 15 frank e, hingê mirov wê bi hêsanî bikaribe têbigihe ka desteserkirina wan her du garnîzonên îranî ji bo kurdan dihat çi wateyê. Kêfa Qasimlo ji dubarekirina vê hevokê re tê: *"ew têra me û pênc salan dikin."* Tevî vê yekê jî pirsgirêkên wan ên muhîmatê hene, ew ji çekên dijhewayî bêpar in, ji bilî îstîsnaya "doçkayan" û li hemberî êrişên balafirên şopajo û bi taybetî jî yên helîkopterên artêşa Îranê, bi temamî bêparastin dimînin.

Lîstika Bexdayê

PDKya Îranê gelek caran guman jê tê kirin ku ji Iraqê alîkarîyeke mezin a diravî û çekî werdigire. Sekreterê wê yê giştî bixwe tîne ziman ku ew alîkarîyeke bi sînor distînin. Qasimlo vê alîkarîya Iraqê wiha vedibêje: Vehewandina penaberên ku di dema êrişên hêzên iranî yên havîna 1979ê de ji bajarên kurdan reviyabûn û herwiha li nexweşxanên Iraqê dermankirina birîndarên giran ên li herêmên şer, kewandina birînên wan zehmet e. Qasimlo wiha dewam dike: *"Heta niha, me ji Iraqê ti çek nestandine. Eger di paşerojê de em alîkarîyeke Îraqê qebûl bikin, ev ê bi tenê di çarçoveya van şertûmercan de be:*

"Divê, di encama vê alîkarîyê de, ne gelê kurd ê îraqî ne jî gelên din ên iraqê zirarê bibînin –ev jî tê wateya ku em ê wek berdêla alîkarîyê ti êrişeke li dijî talabanîyan an jî barzanîyan qebûl nekin".

"Divê em hertim xwedî derfeta redkirina vê alîkarîyê bin; bi ti awayî divê em nekevin rewşa rêxistineke girêdayî".

Qasimlo vê jî li gotinên xwe zêde dike: *"Vê gavê, îraqî modeleke Brno ya bi navê "paraşut" ji me re teklîf dikin; pêdivîya me pê tuneye; em SAM-7, "doçka" yên malê Sovyetê dixwazin, da ku em bikaribin li dijî helîkopteran şer bikin…, lê belê ez bawer nakim ku îraqî wan bidin me.."*

Bi rastî, tiştê ku Iraq îro li rojhilatê Kurdistanê dike, berîya peymana 6ê adara 1975ê şahê Îranê heman tişt li başûrê Kurdisanê dikir: Tiştê Sadam Huseyin dixwaze bike, bêhtir tevdan û alozkirina Îranê ye, nexwe armanca wî ne ew e ku alîkarîyê bide kurdan da ku xweserîyê bi dest ve bînin. Ew dîsa bi armanca xurtkirina hêmanên derkontrolê, çekan dide giregirên eşîrên kurdên Caf ên li herêma Qesrîşîrîn. Wekî din, ew destekê dide general Oveîsî yê ku ji Bexdayê hewl dide eşîrên kurd bi çek bike û bixe nav tevgereke dijşoreşî ya ji alîyê derdora şahê berê ve tê fînanse kirin.

Herçendî rêveberên wê li pêşberî bûyerên rû didin hinek şaş û gêj bibin jî, PDK ji hemû rêxistinên kurd bêhtir xwedî pirojeyeke siyasî ya biserûber e. Mîlîtanên Komalaya Îranê (rêxistina maoîst, a bi taybetî xwe li herêma Merîwan û Senendej digire) gelek caran lîderên partîyê bi "demokrat" bûn û xwegirtina li welatên din ên weke Iraq û Ewropayê rexne dikin, li demekê ku ew bixwe li ser xaka welêt li dijî zextên şah têdikoşin.

Tevî vê çendê, endamekî polîtburoya PDKê, Xanî Bilûryan ku bîst û pênc salên xwe yên berîya jitextketina şah, li girtîgehan derbas kirin; sekreterê giştî Qasimlo jî di 1954ê de bû yek ji avakarên "Komîteya Mahabadê" ku bi awayekî jêdera partîya îroyîn e û di 1956ê de di yekemîn redaksîyona bernama partîyê de cih girt.

Ebdurehman Qasimlo ku bi kesayetî û çanda xwe ya siyasî di nav tevgera kurd a çaryeka dawî ya vê sedsalê de pir xuyayî û serdest e. Ji 1971ê ve sekreterê giştî ye, di 1930ê de li gundekî piçûk ê bavê xwe yê feodal ku li rojavayê gola Ûrmîyê ye, hate dinê. Di salên xwe yên pir ciwan de kete nav 'jîyaneke mîstîk' û wê demê Quran bi awayekî pir têkûz xetim kir û zimanê erebî jî baş nas kir. Lê belê wî dê xwe pir zû bida xwendina berhemên marksîst ên wê demê li Îranê di bin mantoyê xwe de bi xwe re digerandin û gava ew di 1949ê de ji bo perwerdeya xwe ya li zanîngehê tê Fransayê, serê wî bi ramanên şoreşgerî dagirtî ye. Ji ber tevlibûna civînên li dijî şah, hew dibîne ku ew ji bûrsa ku konsolosîyê didayê bêpar maye. Wî dê perwerdeya xwe li Çekoslovakyayê bidomanda.

Di nav jîyana xwe ya penaberîyê de sê serpêhatîyan mohra xwe li ramana wî ya siyasî da:

Sala 1953yê, di heyama Mûsadeq de, Qasimlo li Tehranê pir çalak e û li nav refên PDKya bi Tûdehê re ye. Ew ji neçarî, di hilweşandina tevgera Mûsadeq de dibe alîkar û piştî demekê ji ber ku ev rêxistin ji biryara berxwedanê vedigere; dawî li danûstandinên li gel Tûdehê tîne. Sala 1968ê, ew li Pragê ye û piştî bidestxistina doktoraya zanistên aborî, li zanîngeha Saint-Charlesê dersan dide. 20ê tebaxê, ew dibe şahidê ji alîyê tankên pakta Varşovayê ve perçiqandina "sosyalîzma rûçik mirovî" ya Dûbçek; Û herî dawîyê jî, ji sala 1970yê heta 1974ê, ew li Baxdayê ye û weke bisporekî li wezareta plansazîyê kar dike. Piştî îmzeya peymana 11ê adara 1970yê, ya ku pê ji kurdên Îraqê re xweserî tê nas kirin, ew dibe çavdêrê sistbûn û dûre jî xirabûna têkilîyên general Barzanî yên bi hikûmeta Bexdayê re; ew herwiha muzakereyên dawî yên têkildarî statuya xweserîyê yên berîya destpêkirina şerê adara 1974ê, pir ji nêz ve dişopîne. Bêhtirî hemû rêveberên neteweyî, ew dizane ku kurd dizanin şer bikin, lê nizanin di muzakereyan de qezenc bikin.

Dîsa di wê heyamê de, ew ji Bexdayê bi alîkarîya îraqîyan, hewl dide rêxistina xwe bi rê ve bibe û wê li Îranê ji nû ve bi rêk bixe. Ew şexsen rêveberên baasî nas dike û xwe bi xeyalên pir mezin jî naxapîne. Gava, di 1974ê de, Sadam Huseyîn jê dixwaze ku di rojnameya Kurdistan a PDKya Îranê de Barzanî şermezar bike, Qasimlo daxwaza wî red dike; ji ber vê yekê, Baas hingê weşandina vê rojnameyê qedexe dike. Qasimlo jî ji Iraqê vediqete.

Bi zanîna şeş an jî heft zimanan, hişekî xurt û qebîliyeta xwe ya mîzahî ya di her rewşê de bala mirov dikşîne. Ebdurehman Qasimlo wê têra xwe xwedî tecrubeya siyasî be jî, heta ku karibe ji welatekî weke Îranê mezin, xweserîyê ji bo herêmeke wê bixwaze. Dijberên wî çi dibêjin bila bibêjin, hê jî marksîst maye, ew dixwaze li Kurdistanê "sosyalîzmeke demokratîk" saz bike. Ew nêrîna tevgera xwe wiha tîne ziman*: "Em naşibin sosyalîstên mîna Kreisky, yê ku kapîtalîstîyê dike. Em sosyalîzmê dixwazin, eynî weke li Çekoslovakyayê, lê belê pê re jî demokrasîyê".*

Xweserî û cudaxwazî

Ji rojên pêşî yên bihara 1979ê ve, muzakereyên di navbera PDKya Îranê û Îmam Xumeynî de dîsa der barê xweserîyê de ne. Gava, di meha adara 1979ê de, heyeteke kurd memorandomeke biserûber a der barê "daxwazên gelê kurd" de didinê, Îmam bi awayê xwe yê şîlo bahaneyeke wiha dertîne pêş: *"Em hemû misilman in, divê em yekîtîya xwe biparêzin; di vê çarçoveyê de, em hemû em ê bibin xwedîyên heman mafan."*

Dema delegeya kurd îzaha van mafan jê xwest, Îmam Xumeynî, ev gotinên han li axaftina xwe zêde kirin: *"Ne pirsgirêk e, hûn ê bibin xwedî rê, dibistan, nexweşxane."* Delege careke din israr dike: *"Lê belê em mafên siyasî dixwazin, em xweserîyê dixwazin."*

Îmam jî hingê dipirse*: "Tiştekî wisa ne li dijî yekîtîya Îranê ye, ne wisa? Madem wisa ye, biçin vê rewşê li gel Bazargan" (serokwezîrê wê demê) bipeyivin".*

Lê belê gava delegeya kurd çû projeya xwe ya xweserîyê pêşkêşî serokwezîr kir, Bazargan wiha qîrîya: *"Tiştên hûn dixwazin, cidaxwazî ye".*

Baş e kurdên Îranê çi dixwazin? Yekê adara 1980yê, PDKê teksteke ku bi şeş xalan daxwazên kurdan bi kurtî derdibirî, radestî qasidekî serok Benî Sadr dikir:

1) Divê mafên neteweyî yên gelê kurd, di bin forma xweserîyê de di destûra bingehîn de bên nivîsandin;

2) Dema sînorên erdnîgarî yên Kurdistanê bên dest nîşan kirin, divê faktorên dîrokî û erdnîgarî û biryara piranîya şênîyên herêmên eleqedar li ber çavan bên girtin;

3) Kurdistana xweser wê bi rêya hilbijartinan konseyeke giştî tesbît bike;

4) Konseya Giştî ya Kurdistana xweser ji bo birêvebirina karûbarên aborî, çandî û îdarî komîsyonekê hilbijêre;

5) Zimanê kurdî jî li tenişt yê farisî li Kurdistanê wê weke zimanê fermî were qebûl kirin;

6) Yên ewlekarîyê jî di nav de hemû karûbarên hundirîn, wê girêdayî dezgehên xweser ên xwecîhî bin.

Tiştê ku serok Benî Sadr red dike, eynî weke Bazarganê berîya xwe, avakirina demûdezgehên xweser ên Kurdistanê ne: Lihevgihandina çar bajarên Kurdistanê weke yekpareyek, hilbijartina konseya giştî (ku kurd wê weke "Meclîsa Neteweyî ya Kurdistanê bi nav dikin ") û sazkirina komîsyoneke îcrakar (an jî "hikûmeta xweser a Kurdistanê"). Li himberî vê yekê, Sadr amade ye hin tawîzên civakî-aborî û desantralîzasyoneke firehtir bide.

Lewre pêkanîna yekparetîya xweser a kurd, li gor rêveberên niha yên Îranê, dibe ku derî li cidaxwazîyê veke. Wekî din, weke ku ew bawer dikin ku pêşengên tevgera kurd bi xeyala Kurdistana mezin dijîn û tiştekî wisa dikare sînorên li herêmê careke din bixe nav xeterê.

Tevî vê yekê jî, sekreterê giştî yê PDKa Îranê, di tevahîya karîyera xwe de, îspat kiriye ku daxwaza wî bi xweserîya Kurdisana Îranê sînorkirî ye.

1958ê, di vegera Bexdayê de, piştî şoreşa Iraqê, general Barzanî rojekê ji Qasimlo re gotibû: "Ji bo min, sînor tunene" û jê re pêşniyar kiribû ji bo kurdên Îran, Iraq û Tirkiyeyê partîyekê saz bike û bibe sekreterê giştî yê partîyê. Qasimlo pêşniyarê napejirîne. Piştî bîst salên din, di nivîsareke xwe ya der barê Kurdistana Îranê de (2), Qasimlo wê wiha binivîsanda: "Herçendî li hemû parçeyên Kurdistanê pirsgirêkên aborî, siyasî û civakî yên dişibin hev hene û "rengekî hevpar" didin hemûyan, lê dîsa jî divê ev taybetmendîyên hevpar neyên mubalexe kirin, ne tenê sînor in yên ku kurdên Tirkiye, Îran û Iraqê ji hev vediqetînin, lewre pêvajoya bi dehan salan, kurdên her parçeyekê li nav sînorên welatê ku dijîn, bi encamên cihêreng re rû bi rû mane." Bi van nêrînên xwe Qasimlo bi awayekî tezên rêxistina Ozgurluk a li Tirkiyeyê parve dike.

Li stargeha xwe ya li "Gelîyê Partîyan" sekreterê giştî yê PDK balê dikşîne ser karîgerîya demûdezgehên paşerojê yên Kurdistaneke serbixwe û wiha dibêje: *"Hikûmeta navendî wê ji bo xwe beşek ji hatinên petrolê veqetîne: % 30 heta % 40ê. Divê beşê mayî yê hatinên petrolê li gor rêjeya nifûsê li hemû herêman bê belav kirin. Eger hikûmeta navendî vê yekê red bike? Eger ew dixwaze Kurdistan di nav sînorê Îranê de bimîne, divê beşekê ji hatina petrolê bide me.."*

Di axaftineke de wê li ser hîpoteza têkoşîneke demdirêjkirî wiha bibêje: "Eger mirov demeke dirêj şer bike, mirov ji bo armanceke wêdetirî xweserîyê şer dike". Hasan El Hasan (yê ku peyameke PDK gihandibû Ayetullah) ev îqaz dayê: Di despêkê de me filistînîyan, ji bo ku em bikaribin li ser xaka xwe bimînin, me şer dikir. Dûre hejmara şehîdan zêde bû û êdî me yê doza desantralîzasyoneke îdarî bikira. Paşê, me daxwaza xweserîyê kir. Niha em serxwebûnê dixwazin..." Li gel vê yekê jî sekreterê giştî wê gotinên xwe wiha bidomînda: "Eger hikûmeta Îranê statuya xweserîyê ya ku Iraqê di 1974ê de nas kiribû, bide me -tevî hikûmet û parlemaneke xwecihî- em ê vê yekê derhal qebûl bikin…Helbet ne bi awayê ku ew li Iraqê hat pêk anîn."

Nakokîyên dijwar

Fersendeke dîrokî ya nepayî ji bo tevgera neteweyî ya kurd, şoreşa Îranê nakokîyên di navbera hin rêxistinan de hê dijwartir kirin. Di nav hewldana peydakirina destek û alîkarîyan de, Celal Talabanî, berîya têkilîdanîna li gel zavayekî Îmam Xumeynî, berî hertiştî destek da biçekkirina mîlîtanên Komala Îraqê. Dema artêşa Îranê êriş dibe ser pêşmergeyên kurd ên Îranê, ew weke navbeynkar derdikeve pêş. Berdêla vê navbeynkarîya ku li PDKya Îranê tê birîn: Li Libnan û Suriyê, qedereke mezin çek -bi taybetî çekên giran ên li dijî tank û helîkopteran- li benda anînê bûn û anîna wan di ser Tirkiyeyê re wê pir zehmet bûya. Çareya îdeal ew bû ku ji Îmam Xumeynî destûr bihata wergirtin û bi balafirê rasterast bihatana anîn. Dema li ser mijarê jê tê pirsîn, Celal Talabanî bi bişirîneke bi tesîr li xwe mikur tê: "Çima na? Ev wê bibûya berdêla navbeynkarîya min."

Her çi barzanîgir in, ew jî ketin nav lezûbeza sûdwergirtina ji derfetên ku hilweşîna textê şah pêşkêşî wan kirin: Piştî du hevdîtinên li gel Îmam Xumeynî, Mesûd Barzanî ji bo bi dehan hezar kurdên Îraqê yên hê jî li Îranê penaber bûn, destûra azadîyeke tam a liv û tevgerê stand. Xumeynî herwiha bi qasî 30 mîlyon frankên fransî, û du hezar jî çek dan wan -çekên ku pêşmergergeyên iraqî dema piştî peymana 6ê adara 1975ê derbasî alîyê din ên sînor bûbûn, radestî artêşa Îranê kiribûn...

Lê belê berdêla van danûstandinên nû yên ku Mesûd Barzanî li gel Îmam datanîn, pir diyar bû: Mîlîtanên wî wê bibûna "jandarmayên Kurdistanê ". Rêzeke bûyeran, vê rewşê radixin pêş çavan. Li **Şinoyê**, par di dema xwepêşandanekê de, pêşmergeyên PDK Îraqê gule reşandin ser gireseyê û şeş kes kuştin. Di dema sefera artêşa Îranê ya havîna 1979ê de, yek ji pêşengên kurdên Îranê, kurê Simko, Tahir Xan, ji bo kêmkirina zexta artêşa Îranê li ser Mehabadê, wê tevî eşîra xwe êriş bibe ser Rezaîyê (Ûrmîye). Mesûd Barzanî ji bo pêşî li vê êrişê bigire, hemû bandor û giranîya xwe bi kar tîne. Li Paweyê jî, pêşmergeyên PDKya Îranê dor li wezîrê parastinê yê Îranê girtin û dema bi hewldaneke dawî xwestin wezîr bigirin, muhîmatên wan qediyan: Partîzanên Mesûd Barzanî rêya muhîmat tê re dihatin, girt û nehiştin alîkarî bigihîje pêşmergeyên Qasimlo. Bi bîrxistina van bûyeran, Qasimlo gotinên xwe nacû û kurt û kurmancî dibêje: Mesûd Barzanî û partîzanên wî cahş in, bazirgan in û ji bo Îmam Xumeynî kar dikin. Di kongreya PDK ya Iraqê ya par di navbera 4 û 9ê mijdarê de li ser xaka Îranê, li nêzî Ziwayê pêk hat, Mesûd Barzanîyê ku tê de weke serok hat hilbijartin, wê hebûna danûstandinên taybet ên navbera tevgera xwe û rejîma Îslamê piştrast bikira.

Kurdên rojhilat êdî nikarin ti hêvîyê ji alîkarîya rêxistinên başûr bikin, lê belê yên bakur bixwe, ku doza serxwebûnê dikin, heta radeyekê destekê didin PDKya rojhilat. Tevî vê yekê bergeha teng a îdeolojîk a ku di nav de xwe asê dikin, nahêle ku ev rêxistin bikaribin bi nêrîneke berfirehtir li bûyerên dîrokî yên li ber derîyên wan rû didin, binêrin û têbigihîjin. Qasimloyê ji van xirûcir û pevçûnên wan haydar, xwe nade ber pêşniyara van rêxistinên bakur ên ku dixwazin şervanên xwe bişînin enîya şerê li dijî artêşa Îranê.

Baş e tevgera neteweyî wê nikaribe xwe ji vê rewşa kambax rizgar bike? Serhildana Kurdistana Îranê jî mehkûmî şkestin û têkçûnê ye, eynî weke ya general Barzanî ku berî pênc salan li Kurdistana Iraqê têk çû? Û siberojê wê çi bê serê Kurdistana Bakur eger ew jî dest bi şerê çekdarî bike? Niha li Kurdistana Bakur em dibin şahidên hişmendîyeke ku çepê tirk û deshilata Enqerêyê ji ber heman korîtîyê nikarin bibînin. Û ji alîyê rayedarên Tehranê ve redkirina venasîna xweserîyê ji bo kurdên rojhilat delîlek e ku têkoşîna vî parçeyî wê bidome. Û ji ber vê yekê, ev helwestên redkirinê dikarin bibin sedemên vêketina çirûskekê ku bibe destpêka meşeke ber bi yekkirina tevgera neteweyî ya kurd.

* Rojnamevan

1 Bi tevahî, 15-17 mîlyon. Gava statîstîk tunebin, ev reqem weke texmînên muhtemel ên kêmî ya rastîn, dimînin. Li Suriyê, kurd tenê ji % 10ê nifûsê pêk tînin û bi giranî li Cizîrê, Kurdagî ("çiyayê kurdan"), nêzî Helebê û li bajarên mezin in. Bi rêjeya xwe pir hindik in, ji ber vê yekê bi rola ku lîstine hertim li kevîyê mane; li gel vê yekê jî wan bi awayekî kevneşopî hertim kiriye ku kurdên Tirkiye, Iraq û yên Îranê ji "fedekarîya" Suriyê sûdê wergirin. Der barê kurdên Yekîtîya Sovyetê de, bala xwe bidin ser lêkolîna hêja ya Kendal Nezan a di nav berhema kollektîf, Kurd û Kurdistan de ku ji alîyê Mapero ve hat weşandin (Paris, 1978)

2 A.R. Ghassemlou, Kurdistana Îranê, 1976, 36 rûpel, weşanvan û cîyê weşandinê di berhemê de nehatine dest nîşan kirin)

Jêder

Kurd û Kurdistan. Berhema kollektîf ya ku bi hevkarîya Kendal, A.R. Ghassemlou, Ismet Chériff Vanly û Mustafa Nazdar pêk hatiye. Maspero, Paris, 1978, 354 rûpel.

Tevgera Neteweyî ya Kurd. Chris Kutschera. Flammarion, Paris, 1979, 393 rûpel.

Axa, Şêx û Dewlet. M. M. van Bruinessen. Rijksuniversitte, Utrech, Hollande, 1978, Chris Kutschera

Herwiha li van berheman binêrin:

- Guftugoya Mezin li ser Berxwedana li Y.K.S.S
- Îdeolojî û Rêxistina Berxwedana Afgan, Chris Kutschera

Wergera ji fransî: Baran Nebar

www.kurdistanica.com

TIRKIYE-AFRÎKA

Desthilata nerm û qada nû ya kar

ALAIN VICKY *

Muteşebisên Tirkiyeyê ji nû ve berê xwe didin Afrîkayê. Serokê TUSKONê, Konfederasyona Karsaz û Pîşesazên Tirkiyeyê, bi coşeke mezin dibêje: *"Daxwazên ketina nav bazara afrîkî her diçe zêdetir dibin. Em her roj bi dehan daxwaznameyan werdigirin, li ser vê parzemînê agahî ji me tên xwestin".*(1)

TUSKON a ku di sala 2005ê de hatiye damezirandin, nêzîkî 15 000 kes û 150 sazîyên bazirganîyê yên xwecih tîne cem hev. Ev dezgeh paceya nû ya muteşebisîya dewletekê ye, dewletek ku xwedî 75 milyon welatîyan e û 17. hêza aborî ya cîhanî ye.(2) Bîst bajarên mezin ên herî girîng ên Tirkîyeyê, îro di îxracatê de ji yek milyar dolaran zêdetir karên ticarî yên salane pêk tînin: Di serî de ***Stenbol***, lê bi taybetî jî bajarên mezin ên Anatolîya Navîn wek ***Kayserî, Konya*** û ***Entabê***.

Ji 1998ê û vir ve, Tirkiye ji nû ve derket ser sehneya aborî ya navneteweyî. Wezîrê Karên Derve yê hikûmeta koalîsyona ku ji alîyê serokwezîr **Mesut Yilmaz** ve dihat bi rê ve birin, Mîrza **Ismail Cem** hingê biryarê dide ku *"nasnameya navneteweyî ya Tirkiyeyê ji nû ve bê tarîf kirin da ku ew ji statuya hevalbendîya Rojavayê derbasî rola çalak û avakar a aktora global bibe"*. Lêkolîner **Mehmet Ozkan** û **Birol Akgun** eşkere dikin ku ev berîdanîya nû ya stratejîk *"hinek"* ji ber nepejirandina namzetîya Tirkiyeyê ya ketina nav Yekîtîyê (3) –ji alîyê Konseya Ewropî ya Luksembûrgê ya meha kanûna 1997ê ve– qewimî. (4) Parzemîna reş, ya ku rêjeya salane ya mezinbûnê ji %5ê derbas dibe, ji ***Enqere***yê re perspektîfên nû yên pêşketina aborî vedike. Ligel vê yekê, pirsgirêkên lojîstîk û tansîyonên di nav koalîsyona desthilatê de dibin sedem ku beşa afrîkî ya vê fetlaneka mezin di cih de pêk neyê.

Ji 2002yê û vir ve, hikûmeta ku ji alîyê *Partîya Edalet û Pêşketinê* ve (AKP, îslamparêz) tê bi rê ve birin, yekemîn întibaqên dîplomatîk di bin rayedarîya wezîrê karên derve **Ahmet Davutoglu** de pêk tîne. 2005 dibe "Sala Afrîkayê". Mîrza **Recep Tayyip Erdogan** diçe başûrê ***Ekwator***ê, ku tu kesî berî wî tiştekî wisa nekiribû. Ew bi taybetî diçe ***Pretoria*** (Afrîkaya Başûr) û paytextê Etyopyayê ***Adis Abeba*** ya ku navenda Yekîtîya Afrîkî ye. Di 2007ê de însîyatîfa nû pêk tê: Tirkiye zîrweya welatên herî hindik pêşketî (WKP) li dar dixe, ku 33 ji wan welatên afrîkî ne û soz dide ku ew ê heta 2011ê ji bo pêşketinê nêzîkî 20 milyon dolaran alîkarîyê bide.

Tirkiye bi dengên welatên afrîkî dibe endama ne daîmî ya Konseya Ewlekarîyê

Di dawîya 2008ê de, bi vekirina yekemîn Navenda Lêkolîn û Tatbîqkirina Xebatên Afrîkî ya Zanîngeha Enqereyê, saleke din a awarte bi dawî dibe: Berîya wê bi çend mehan, Stenbolê li ser hevkarîya Tirkiye û Afrîkayê yekemîn civîna navneteweyî pêk anî û hevdîtinên dualî yên bi 42 dewletan re mohra xwe li wê civînê da; di payîza 2008ê de, Enqereyê ji 53 dewletan bi saya piştgirîya 51 dewletên parzemîna reş, di Konseya Ewlekarîyê ya Neteweyên Yekbûyî de (ONU) peywireke endametîya ne daîmî bi dest xist.

Kêmxwînîya aborî ya Ewropayê û krîza sazûmanîya dawîya salên 2000ê kir ku tiştên mayî pêk werin û van tiştan ji pêleke nû ya muteşebisan –"Pilingên Anatolîyê"– re rê vekir ku ew piştî Rojhilata Nêz û Asyaya Navîn, li Afrîkaya binya Saharayê jî bikevin ser rêya ku ji alîyê dîplomasîya tirkan ve hatiye vekirin. Mîrza **Sedat Laçiner**, ji "koma bisporan" a USAKê *[Dezgeha Lêkolînên Stratejîk a Navneteweyî],* bi eşkere weha dibêje: *"Berevajî giregirên TUSIADê [Komeleya Pîşesaz û Karsazên Tirkîyeyê] yên ku bi giştî bi welatên pêşketî re ticaretê dikin û xwe nadin ber rîskan, karsazên TUSKONê, Afrîka kir yek ji herêmên xwe yên nû"*. Ji bo **Ihsan Dagi**, sernivîskarê *Insight Turkey*, ya nêzî AKPyê û mamosteyê beşa têkilîyên navneteweyî ya Zanîngeha Teknîk a Rojhilata Navîn a Enqereyê [ODTU], *"eger mirov aktîvîzma vê sektora taybet li ber çavan negire, mirov nikare polîtîkaya proaktîf a hikûmetê ya li herêmê wekî li tevahîya dinyayê fam bike"*. Serpêhatîyên wê yên serfiraziyê alîkarî kir ku gumanberî siviktir bibe, gumanberîya ku bi taybetî ji alîyê piranîya çavdêrên tirk ve hatibû zelal kirin. **Ozkan** û **Akgun** dibêjin: *"Dema Tirkîye da zanîn ku 2005 wê bibe sala Afrîkayê, wekî gelek rojnamevan û dîplomatan, hin rexneyên gelek karmendên payebilind jî hebûn. Ji bo wan, ev hem windakirina wext û enerjîyê bû, hem jî windakirina kaneyên mirovî bû. Yên ku bawerî bi vê însîyatîfê dianî û destek didayê, tenê Komele û hikûmeta AKPyê bûn. Lê dema ku ev tişt bi ser ket, hemû dengên dijber qut bûn.*

Têkilîyên dîplomatîk û bazirganî yên Tirkiyeyê bi parzemînê re bi temamî guherîn: Di nav deh salan de, Enqereyê hejmara sefaretên xwe sê qat zêdetir kir; îro 27 sefaretên wê hene –bi qasî Hindistanê– 15 ji wan jî di navbera 2009 û 2010ê de hatin vekirin. Bi statuya xwe ya çavdêrîyê ya li Yekîtîya Afrîkî, ev welat beşdarî pênc peywirên ji bo parastina aştîyê ya li Afrîkayê (5) dibe, duzîneyek firqateynên wî li hemberî korsanîyê li peravên Somalîyê di çarçoveya fîloya şer a navneteweyî de ewlekarîyê pêk tîne. Ji alîyê aborî ve, Enqere di nav endamên, ne herêmî yên Bankaya Pêşketinê ya Afrîkî (BPA)(6) de tê hesibandin û ew ê bifikire bi Civata Afrîkaya Rojhilat (CAR) re herêmeke bazirganîya azad pêk bîne. Civata Afrîkaya Rojhilat dezgeha navberhikûmetî ye û armanca wê ew e ku di navbera ***Kenya, Uganda, Tanzanya, Birûndî*** û ***Rwanda***yê de yekîtîya gumrikê pêk bîne.

Hecma bazirganîyê digihîje 20 mîlyar dolaran

Îca ***Turkish Airlines***, li dinyayê heştemîn şirketa hewayî, êdî li 14 bajar û 12 welatên parzemînê xizmetê dike, hecma danûstandinên bazirganî yên di navbera Tirkîye û Afrîkaya binya saharayê de –di serî de Afrîkaya Başûr û Nîjerya– sala 2009ê gihîştiye nêzî 20 milyar dolaran, ku ev hejmar sê qat zêdetirî sala 2003yê ye. Îxracatên ber bi başûrê Saharayê ve (di 2009ê de 10,2 milyar dolar) zêdetirî ji %10ê yekûna îxracatên Tirkiyeyê pêk tînin.

Made in Turkey (materyalên avahîyê, çandinî-qût, endazyarî, hemû cûre makîne, tekstîl, îmalata cilan, aletên tibbî, teknolojîya agahdarîyê, hilberînên hîjiyen ên şexsî û yên paqijîyê û her weha mucewherî), yên ku ji % 20 heta %30ê erzantirî hilberînên ewropî ne, ji reqîba xwe ya çînî zêdetir bi navûdeng e. Mîrza **Metin Demir**, rêveberê giştî yê şirketa *Pancar Motor* a ku ji pêncî salan zêdetir e traktor û haletên cotkarîya bi motorên mazotê hildiberîne, vê tesdîq dike û di civîna "Pira Ticarî ya Tirkiye-Afrîkayê (7)" de, civîna ku di gulana 2008ê de li Stenbolê hatibû organîze kirin, ji delegasyoneke çil karsazên ji Komara Demokratîk a Kongoyê (KDK) hatî re dibêje: *"Cotyarên parzemînê bi çavên girtî materyalên me nas dikin., eger hûn bizanin wan baş biparêzin, motorên me dikarin bi salan bi kar bên".*

Mîrza **Şeref Sayoğlu** û Mîrza **Serdar Sayoğlu**, ku şirketa ***Arzul Metal*** bi rê ve dibin, pir memnûn xuya dikin. Şirketa wan beroş û çaydankên alumînyûm hildiberîne. Hilberînên wan gelek tên ecibandin *"ji ber ku ew ji firaqên pola pir erzantir in".*

Piştî şirketên tirk ên dêwasa ên xanîyan, yên ku xebatên pir mezin pêk tînin (li bakurê Nîjeryayê rêya mezin a ***Kaduna***, li ***Khartoum***ê pira daleqandî ya ***El Mek*** û hwd…), zêdetirî çarsed şirketên biçûk û navîncî di 2010ê de bi veberhênana zêdetirî 500 milyon dolaran li parzemînê bi cih bûn. Di adara 2010ê de li ***Yaûnde***yê, di dema hevdîtina serokkomar **Abdullah Gül** de, serokê Tevgera Kargêrên Kamerûnê (TKKam) Mîrza **Toussaint Mboka Tongo** weha dibêje: *"Ez difikirim ku patronên herêmê yên ku pêdivîya wan heye maddeyên xwe yên xam bidin şixulandin, dikarin bi saya serê Tirkîyeyê gelek qezencê bikin".*

"Wê ji Tirkiyeyê bêtir bê hez kirin, eger ew piştgirîya filistînîyan bike"

Bi nîşandana heman prensîbên ***Pekîn***ê, Enqere xwe tevlî karên navxweyî yên welatên hevkar nake. Ev tişt rê li ber nagire ku hinek rastgoyîyê bike. Serokê Sûdanê **Omar El Beşîr,** ku çûbû zîrveya Tirkîye-Afrîka ya 2008ê, tam piştî ku ji alîyê Mehkemeya Cezayê ya Navneteweyî (MCN) ve hatibû tawanbar kirin, der barê **Darfour**ê de bi awayekî cidî ji alîyê serokwezîrê tirk ve hatibû îqaz kirin. Ligel vê yekê, Enqereyê, ku di heman demê de endama Lîga Ereb e, tu caran meſhûma qirkirinê bi kar neanî. Têkilîyên nav her du welatan kevin in, ji ber ku Sûdan, di navbera 1820 û 1855ê de, bi Împaratorîya Osmanîyan ve hatibû girêdan (heta, hatibû bi sînor kirin). Zêdetirî 80 şirketên tirk îro li wê derê bi cih bûne.

Li gor Mîrza **Omer Hidar Abu Zaid Idem**, sefîrê sûdanî yê li Enqereyê, Tirkiye, di hêrêma-binî de "stêrka hilhatî", wê bi temamî bê hez kirin eger ew piştgirîya filistînîyan bike, wekî piştgirîya xwe ya ji bo "fîloya ji bo Xezzayê" ya ku ji alîyê organîzasyonên mirovî ve di 2010ê de hatibû şandin. Wekî din, sala 2010ê, ew tevî ***Brezîlya***yê li dij derketibû ku Konseya Ewlekariyê cezayên nû bide ***Îran***ê.

Mîrza **Laçiner** dîyar dike ku guherîna fikra welatekî, ku heta dawîya sedsala 20emîn, *"di dema şerê sar de girîngîya Afrîkayê îhmal kiribû û li ser parzemînê nebûna hevalan bi awayekî eşkere bandor li ser frênkirina aborîya neteweyî kiribû û menfaetên wê yên polîtîk zeîf kiribûn",* ji ber çavên analîstên navneteweyî nefilitî; analîstên ku armancên *"osmanîyên nû"* yên Enqereyê yên li Rojhilata Nêz pir ji nêzîk ve dişopînin. Hin ji wan êdî li ser pêwendîya di navbera mezinbûna aborî û ya îslamê de pirsan ji xwe dikin. Organîzasyona zîrveyekê bi berpirsên misilman û afrîkî re, ku di 2010ê de ji alîyê Diyanetê -rêveberîya xebatên dînî ya dewletê- ve hatibû pêk anîn û her weha dawetkirina sêsed xwendekarên parzemînê ji bo perwerdehîya teolojîyê ya li Tirkîyeyê, bû sedema hin şiroveyên hêrsokî. **Peter Pham**, ji *National Commitee on American Foreign Policy* (8) (Komîteya Neteweyî ya li ser Polîtîkaya Derve ya Amerîkî) dîtinên xwe weha derdibire: *"Rola ku hêzeke Rojhilata Navîn a xwedî meyleke îslamîst li Afrîkayê pê radibe û roj bi rojê mezintir dibe, nikare neyê dîtin".*

Bilindbûna Weqfa ji bo Maf û Azadîyên Mirovan û Alîkarîya Mirovî (IHH: İnsan Hak ve Hürrîyetleri ve İnsani Yardım Vakfı) ku bûbû aktoreke girîng a "fîloya ji bo Xezzeyê" di nîşangehê de ye. Ev weqif ku ji nîvê salên 1990ê ve li Afrîkayê xwe nîşan dide û li 41 welatan xwedî îradeyek e, nuha kampanyayeke fireh a emelîyatên kataraktê dimeşîne. Li gor slogana wê, armanca vê kampanyayê ev e: *"Tirk çavên 100 000 afrîkîyan vedikin"* ji bo ku *"100 000 afrîkî bi Tirkîyeyê re bibînin"*. Berpirsên wê diyar dikin ku IHH *"diçe cem kesên ku tu kes neçûbû dîtîna wan".*

Têkilîyên bi Fethullah Gülen re: Sedema endîşeyan

Têkilîyên ku muteşebisên kevneperest û neteweperest ên TUSKONê, bi cemaeta **Fethullah Gülen** (9) re honandine jî, dibin sedema xurtkirina endîşeyan. Ev girêdan bi rêya alimekî tirk ê olî pêk tê, ku ew piştî seferberkirineke xurt a bawermendên xwe, di 2008ê de ji alîyê kovarên *Foreign Policy* û *Prospect* (Polîtîkaya Derve û Perspektîf) ve wek *"hizirmendê herî bi tesîr ê dinyayê"* hat hilbijartin. Di împaratorîya wî de navgînên medyayê, weqif û komeleyên mirovî cih digirin… Dibistanên ku ji alîyê *"îmamê global"* ve hatine ava kirin, ku bi kalîteya xwe ya perwerdehîyê bi nav û deng in, zanînên xwe li ***Afrîkaya Başûr***, li ***Uganda***, li ***Kenya*** û li ***Tanzanya***yê belav dikin. Ev sazî bi piranî ji alîyê muteşebisên tirk ve tên destek kirin, di berdêla vê destekê de ew jî ji defterên wan ên navnîşanan sûdê werdigirin. Bêguman, perwerdekar û berpirsên îdarî bi ketina nav çand û zimanê wan, di nav civakên xwecihî de dihelin.

Mîrza **Gülen**, ku ji 1999ê ve li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê penaber e, êdî ne mijara polemîkan e. Yek ji polemîkên dawîyê ji alîyê kevnerêveberê îstixbarata tirk Mîrza **Osman Nuri Gündeş** ve hat geş kirin: Dihat gotin ku têkilîya Gülen bi *Central Intelligence Agency* (CIA) re heye û di salên 1990ê de wî ji bo CIAyê li Asyaya Navîn kar kiriye. Di destpêka adara 2010ê de du rojnamevanên tirk ên navdar, **Nedim Şener** û **Ahmet Şik**, piştî bicîkirina cîhazekî guhdarkirinê ya dewletê ya ji alîyê endamên cemaeta **Fethullah Gülen** ve, bi sedema "teşwîqkirina nefretê", li Stenbolê hatin girtin.

Îro, hin nirxandinên li dijî tevgera *"nûrcîyên nû",* (10) ku piştevanên wê, wê wek *"di nav civaka tirk de elîteke alternatîf"* dibînin, carna ne dûrî teorîyên komploya antîsemît in, çawa ku rojnamevan **Suzy Hansen** (11) balê dikişîne ser vê yekê: *"Ew navgînên medyayê bi rê ve dibin. Ew dewlemend in. Ew bi hev ve girêdayî ne. Û ew bi tenê alîkariya kesên nêzî xwe dikin".*

Li Afrîkaya Başûr, a ku Împaratorîya Osmanî di 1863yê de bi daxwaza civata piştevanên CAPê îmam şandibûnê, serekpîskoposê katolîk ê teqawid ê ***Pretoria***yê, **Mgr. George Francis Daniel** rexneyan nerm dike: *"Fîlozofî û çalakîyên **Fethullah Gülen**, ku di serdaneke Tirkiyeyê de fersenda min a naskirinê çêbû, em gelek hejmetkar hiştin; em neçûn li îslamê bigerin, îslamê bi xwe em dîtin".(12)* Di vî welatî de, ku yekemîn hevkarê bazirgan ê afrîkî yê Enqereyê ye, pênc dibistanên *"tirk"* zanyarîyên **Gulen** di nav sê hezar şagirdan de belav dike.

Ligel vê yekê, wê tiştekî şaş be eger di mezinbûna tirkan de alîyê olî bêmubalexe kirin. Ajansa Hevkarî û Geşepêdanê ya Enqereyê, TİKA [Türk İşbirliği ve Kalkınma Ajansı], li gelek welatên afrîkî kar dike, ku hejmara misilmanan lê kêm e. (Etyopya, Rwanda, Madagaskar…). Ji bo **Ozkan** û **Akgun**: *"Bîrbirina tirkan a ji bo îslamê ne bi tenê bi nirxên rojavayî re hevgirtî ye, lê ew çareserîyeke alternatîf nîşanî welatên din -ên zêdetir radîkal- dide, yên ku li Afrîkayê veberhênanê dikin".* Tevî ku serhildanên heyî yên cîhana ereb-misilman ji bo Enqereyê bazara piştdar zeîf dikin jî –berê pêşîn li ***Lîbyayê***, ku piranîya ji 25 000 penaber û xebatkarên tirk jê hatin derxistin– Tirkîye wê baş bikare ji bo zêdekirina hebûna xwe ya li başûrê Saharayê, ji van rewşan sûdê wergire.

* Rojnamevan

1 "Africa as a savior for turkish firms (Afrîka ji bo firmayên tirk wekî xelaskerekê ye)", *Hurrîyet*, Stenbol, 4 adar 2011

2 John Feffer, "Pax Ottomanica ?", TomDispatch.com, 13 hezîran 2010, http://www.tomdispatch.com/blog/175260/tomgram%3A_john_feffer,_pax_ottomanica/

3 Konseya Ewropî wê statuya endametîyê di 1999ê de bide Tirkiyeyê; muzakereyên tesdîqkirinê yên ku di 2005ê de dest pê kiribû, rastî astengîyan tê ji ber bêdilîya hin dewletên endam, wek Fransa û Awusturyayê

4 "Turkey's opening to Africa (Vebûna Tirkîyeyê ber bi Afrîkayê ve)", *The Journal of Modern African Studies*, Cambridge, 4 mijdar 2010

5 Peywira Neteweyên Yekbûyî ji bo dengeya Komara Demokratîk a Kongoyê, Peywira Neteweyên Yekbûyî û ya Yekîtîya Afrîkî li Darfourê, Peywira Neteweyên Yekbûyî ya li Lîberyayê, Peywira Neteweyên Yekbûyî ya li Sûdanê, Operasyona Neteweyên Yekbûyî ya li Kersaxa Fîldiran

6 Yves Ekoué Amaizo, "Une banque entre finance et solidarité (Bankayek di navbera finans û piştgirîyê de)" bixwînin, *Le Monde diplomatique*, gulan 2010

7 "Anatolian firms explore african opportunities (Şirketên Anatolîy li dû fersendên afrîkî ne)", *Today's Zaman*, Stenbol, 16 gulan 2008

8 Peter Pham, " Turkey's Return to Africa (Vegera Tirkîyeyê ya li Afrîkayê)", *World Defense Review*, 27 gulan 2010, http://worlddefensereview.com/pham052710.shtml

9 Gabrielle Angey, "Une stratégie commune entre l'AKP et le mouvement de Fethullah Güllen en Afrique subsaharienne? (Di navbera AKP û tevgera Fethullah Gülen de li Afrîkaya binyasaharayê stratejîyeke hevpar?)", Venêrgeha jîyana polîtîk a tirk, 23 tebax 2010, http://ovipot.blogspot.com/2010/08/une-strategie-commune-entre-lakp-et-le.html

10 Fethullah Gülen mileke tevgera *nûrcî* ya ji alîyê Saîdê Nûrsî (1873-1960) ve damezirandî ye

11 Suzy Hansen, "The Global Imam (Îmamê Global)", *The New Republic*, Washington 10 mijdar 2010

12 Fethullah Gülen, "Catholic Church in South Africa Discusses Gülen Movement (Dêra katolîk a li Afrîkaya Başûr li ser Tevgera Gulen guftugoyan dike)", 5 sibat 2010, http://www.fethullahgulen.org/

Wergera ji fransî: Aynur Bozkurt

Di navbera dîroka demdirêj û dîmenên gelemperî de

Heta salên 1990ê, parzemîna reş ji bo tirkan ji du rûyan pêk dihat: Afrîkaya li binya Saharaya Dûr û Afrîkaya Bakur (Misir, Lîbya, Cezayîr, Tûnis, Sûdan) ku ji alîyê hîsî ve, ji ber ku ew heta derketina leşkerê dawîn ê osmanî ji Lîbyayê, di 1926ê de, bi temamî an jî qismî, girêdayî Bab-i Alîyê bû.

Di sala 1575ê de, **Siltan Mûradê III**. bi Împaratorîya **Kanem Bornû** re (erdê ji bakurê Nîjeryayê heta Çadê) peymaneke parastinê îmze kiribû. Herweha, wî jê re çek û şêwirmendên leşkerî jî şandibûn. Berîya ku îngilîzên **Lord Frederick Lugard** di van heman Sîte-Dewletên *haûssa* (*haûssa,* zimanê sereke yê Nîjeryayê ye) yên Nîjeryayê de bi cih bibin, diviyabû heta 1900ê bisekinin. Ev Sîte-Dewlet piştî demeke pir kurt di ser cîhada **Ousman Dan Fodio** re, ketibûn bin kontrolê.

Medyayên nêzî Partîya Edalet û Pêşketinê (AKP) van salên dawîyê civateke biçûk "afro-tirk" (1) ku bi taybetî li derdora Îzmîrê dijî, ji nû ve keşif dikin. Bavûkalên endamên vê civatê ji alîyê Împaratorîya Osmanî ve li sînorên başûrê Sûdanê û navberwelatê rojhilat-afrîkî (Kenya û Ûganda) hatine tune kirin. Lêkolînerê brîtanyayî **Murray Gordon** (2) bi bîr dixe ku vê bazirganîya koleyan di sedsala 16mîn de dest pê kiriye û bi deh hezaran koleyên reş di ser rêyên karwanîyên transsaharayî û embarên osmanî yên Behra Sor re, ber bi Sîrenayka, Misir û piştre jî bo Stenbolê hatine anîn.

Gordon dibêje eger projeyên antî-koledarîyê yên Londrayê pêşî bûbin *"rehîneyên polîtîkaya wê ya pejirandî ya parastina yekparetîya Împaratorîya Osmanî"*, îfadeyên giran ên civaka antî-koledar ya brîtanî, ku ji alîyê raporên hîndeker ên mirovan weke rênîşander **James Richardson** ve hatine tevdan, bûne sedem ku Stenbol di navîna sedsala 19emîn de bazarên xwe yên *"dara abenozê"* bigire. Lê belê *"bi tenê bi nemana daxwazê, piştî dawîlêanîna koletîyê ya ji alîyê hikûmeta tirk ve, di 1899ê de, ev trafîk vemirîye"*. Bi gelheya xwe ya reş, tirk bi vî rengî dest bi serdana vê rûpela tarî dikin, rûpeleke ku eynî wekî berebezîya wan a bi împaratorîyên kolonî yên portekizî û brîtanî yên li sînorê Okyanûsa Hindî, demeke dirêj di dîroka wan de veşartî mabû.

Bi saya serê zêdebûna lîstikvanên afrîkî yên fûtbolê di şampîyonîya tirkîyê de, îmaja parzemînê jî vediguhere ku vê şampîyonîyê heta hingê berê xwe dabû bi taybetî bi brezîlî û arjantînîyan. Piştî **Uche Okechukwu** û **Jay Jay Okovcha** yên nîjeryayî û **Ghanéen Stephen Appiah**, êdî **Mamadou Niang** û **Issar Dia** (Senegal) û **Joseph Yobo** (Nîjerya) ji alîyê kluba mezin a Fenerbahçeyê ve ji bo sezona nû hatin transfer kirin. Û wekî her tişt bi muzîkê diqede, divê em binê zêdebûna elaqeyê ya li Stenbolê jî xêz bikin, elaqeya ku ji bo albûmên stranbêja herî navdar ya afro-tirk, rehmetî Esmeray, tê nîşan dan.

1 "Turks with African ancestors want their existence to be felt (Tirkên ku bavûkal afrîkî, dixwazin hebûna wan bê hîs kirin)", *Today Zaman*, Stenbol, 11 gulan 2008

2 Murray Gordon, *L'esclavage dans le monde arabe, VII-XX siècle (Di cihana ereban de koletî, sedsala VII-XX)*, Robert Laffont, Parîs, 1987

A.V.

Wergera ji fransî: Aynur Bozkurt

Li Koreya Başûr li ser hev dersînorkirina mirovên qaçax

"Karkerên berdest" ên Koreya Başûr

Frédéric Ojardias *

29ê cotmeha 2010ê, gava Servîsên Karê Koçberan li Seûlê bi ser atolyeyekê de girt, karkerekî vîyetnamî yê 35 salî û bêdokument, xwest bireve û xwe di pencereyekê re avêt xwarê û piştî pênc rojan, li nexweşxaneyê jîyana xwe ji dest da. Ew, jineke wekî xwe bêdokument û kurekî çar mehî li dûv xwe dihêle. Wî ji 2002ê û vir de li Koreya Başûr kar dikir.

Ji 2008ê ve biryara Wezareta Edaletê ya ku ew ê, di pênc salan de, hejmara koçberên qaçax 220 000 heta 150 000an kêm bike, ev cûre operasyon di nav xemsarîyeke nisbî de zêde bûn. Wezaret jixwe hema bêje gihîşt armanca xwe: Dawîya 2010ê, bi tenê 168 500 ji wan mabûn. (1)

Jixwe *Amnesty Internationalê* sala 2009ê, raporeke rûreşkir derêxist (2), ku alozîya biserdegirtina kargeh û nivîngehan, rêzlênegirtina ji bo rêbazên girtinê, şertên xirab ên girtîmayînê û jêpirsînên li gor rû û rûçikên kesan, şermezar dike. Mînak hene ku di dema girtinê de hin kes bi giranî birîndar bûne û heta mirine jî.

Ji bo karên zehmet vizeyên taybet

Raffe yê bêdokument, ku ji Bangladeşê hatiye û bi şevê di kargeheke berhemên kîmyewî de dixebite, dibêje *"Bi rojê, ez ji ber tirsa biserdegirtinê newêrim biçim bazaran."*

Tuya, karkera tekstîlê ya ji Mongolistanê, pitika xwe hemêz dike û dibêje: *"Ez her dem bi tirs im"*. Piranîya van qaçaxan ji Çînê an jî ji Asyaya Başûr-Rojhilat hatine; û ew jî di bin metirsîya girtin û dersînorkirinê de dijîn.

> Hikûmeta Koreya Başûr berî sê salan nêçîra mirovên "qaçax" da dest pê kirin. Yên ku tên dersînorkirin – mesrefên wê jî li ser kesê tê dersînorkirin e - ji welatên din ên Asyayê ne û para bêhtir bi rengekî legal ketine nav erda Koreya Başûr; lê belê vîzeya wan a kar demî ye û ji bo dirêjkirina wê, şertên pêkanîna wan nemumkin, hene.

Ew bixwe pereyê vê dersînorkirinê jî didin: Heta ku diravê pêwîst ê ji bo bîleta vegerê bê kom kirin, carinan çend mehan li girtîgehê dimînin. Pirî caran, kes û karên van mirovan pereyî didin, hin caran jî kardêr li şûna meaşê karker ê lê mayî, vî pereyî xerc dikin. Bi tenê ji bo mînakên taybet (dersînorkirina bi lez û bez a birêveberên sendîkayî yên zêde çalak), hikûmet heqê bilêtê dide.

Paradoks ev e: Tevî ku hin kes pêşî bi xêra vîzeya turîzmê hatine Koreya Başûr jî, gelek ji wan bi awayekî qanûnî û bi saya vîzeyeke taybet a karkera/ê ne bispor ketine vî welatî. Sala 2004ê, Wezareta Kar xwest çûn û hatinên karkerên koçber bi sînor bike û ji ber vê yekê, ***Employment Permit System*** (Pergala Destûra Kar, EPS) bi cih kir (3). Karkerên EPSê di van îşên zehmet, xeternak û kêmmeaş de dixebitin ku koreyîyên Başûr bixwe êdî naxwazin bikin. Li 2008ê, ew % 77ê hêza xebatê ya pîşesazî û nebispor a van şirketan (Şirketên Piçûk û Navincî ku kêmtirî 30 kesan lê dixebitin) bûn.

Neçar mane îllegal bijîn

Lee Boo-Younga alîkara birêveberê wezaretê dide diyar kirin ku: *"Pergala EPSê zelal e û mafên karkerên biyanî misoger dike"*. Bi rastî jî, ev bername li nav hemû welatên asyayî, Japonya jî tê de, yek ji yên herî pêşverû ye: Wek prensîp koçber weke koreyîyên başûrî nemaze di warê qezayên xebatê de, xwedîyên heman parastina qanûnî ne. Lê belê, sînorên bernameyê teng dimînin: Anîna malbatê qedexe ye û temenê herî zêde 35 sal in. Mirov bi tenê dikare ji bo çar kardêrên li pey hev bixebite û bi tenê heke kardêrê berê destûrê bide, karker dikare şirketa lê kar dike, biguherîne. Vîze ji bo pênc salan e, ev jixwe îmkana daxwazên welatîbûnê ji holê radike.

Amnesty International di rapora xwe de, mînakên kardêrên bêwijdan jî dide: Meaşên nedayî, seetên zêde yên ferzkirî û bêheqdest û li ser karkeran êrişên devkî, fîzîkî an jî cinsî. Zehmetîya muraceatên hiqûqî jî pêşî li van rûreşîyan vedike. Parêzerê rêxistina ne hikûmetî ***Gongam***ê, ya ku alîkarîya qanûnî ya belaş dide karkerên biyanî, **Hwang Pill-Kyu** îşaret pê dike: *"Koçber naxwazin dozê vekin, ji ber ku zehmet e bedkarîyê bi delîlan piştrast bikin. Hin kesan mafê xwe yê manê bi pey vekirina dozeke weha re winda kir"*. Digel ku piştî xilasbûna vîzeya EPSê, perspektîvên wan ên qanûnî tunene û hin ji wan rû bi rûyî patronekî sûîstîmalkar dibin ku nikarin bi riyên qanûnî jê bifilitin jî, hejmareke mezin a koçberan biryara mayînê didin û dikevin rewşeke îlegal.

Piştî ku bêdokument dimînin, pirsgirêkên wan zêde dibin. Ji bo dozên muhtemel, tu îmkana wan a muraceatê nîne. Rêyên çaredîtinê bixwe jî vediguherin pirsgirêkên nû. Pir kes ji wan ji tirsa girtinê, zarokên xwe jî naşînin dibistanan. Liem Wolsan, lêkolînera Alternative Workers' Movements (Tevgerên Karkeran ên Alternatîv, AWM) li Seûlê vedibêje *"Hin ji wan ji deh an panzdeh salan ve li vir in. Gelekan jî malbatek ji xwe re çêkir, kardêr ji ber statûya wan û hêsanîya çavdêrîya wan, dixwazin van karkerên êdî bisporbûyî û koreyîaxêv li cem wan bimînin"*. Elektronîk, înşaat, otomobîl: Ew di hemû beşên kilît ên mezinbûna heybet a başûr-koreyî (2010ê % 6,1) de cih digrin.

Ev çend sal in ku Seûl dixwaze civakeke "pirçandî" bi pêş bixe. Ew di rastîyê de siyaseteke pişaftinê ye ku bi piranî jinên ji Çînê û başûrê rojhilatê Asyayê hatî û bi koreyîyên gundî re zewicî, dide ber xwe. (4) Ev siyaset karkerên EPSê li derve dihêle: Ji wan tê xwestin ku kar bikin û paşê welat biterikînin.

Koreya Başûr di warê demografîk de pir li xwe kêm dike, rêjeya zarokanînê serê jinê 1,2 zarok e; ji ber vê jî Koreya Başûr hewceyî koçberan e. Lê belê, ew aniha di nav meyla xwe ya vekirina ber bi cîhanê û refleksên xwe yên kevin û tecrîdkar de dudilî ye; weha xuya ye ku welat ne amade ye encamên koçberîyê bipejirîne.

* Nûçevanê taybet.

1 Sala 2009ê, sî hezar kes hatin dersînor kirin. Ji bo miqayeseyê, Fransayê heman salê bîst û neh hezar kes kirin der. Ji nifûsa Koreya Başûr a 50 mîlyon kesî, koçberên qaçax jî di nav de, 1,3 mîlyon kes biyanî ne

2 Disposable Labour [Karê berdest], Amnesty International, cotmeha 2009ê

3 Bangladeş, Kamboçya, Çîn, Îndonezya, Kirgizistan, Mongolistan, Burma, Nepal, Pakistan, Filîpîn, Srî Lanka, Tayland, Tîmora Rojhilat, Ozbekistan, Vîyetnam

4 Rêje 107 mêr ji bo 100 jinan e. Mirov bi taybetî li gundan bi vê nehevsengîyê dihese

Wergera ji fransî: Simko Destan



Ismet Polatli: **Doh, îro, sibê**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 70 x 100 cm

Nîqaşa li ser nukleerê

Piştî şoka tsunamiyê, dinya li gor rîtma dilê santrala nukleer a Fukuşîmayê û şeş reaktorên wê jiya. Nîqaşa li ser licihbûna nukleera sivîl û kontrola wê zindî bû. Lê belê weki mînaka fransî ya jihevxistina superphénixê jî nîşan dide, ji bo ku her tişt raweste, têrê nake mirov dezgehekê bigire.
Li Hindistanê li dijî bicihkirina reaktoreke ewropî ya bi ava di bin zextê de asta protestoyan bilind dibe (nivîsa li jêr bixwîne). Li Japonyayê hikûmet li gor agahiyên ku şirketa taybet Tepco dide, ku mirov dikare jêr e bibêje herî kêm derfehatî ye: geh li defa hewarê dixe, geh der barê vegirtina radyoaktîf de baweriyê dide mirovan.

Dirindetîya taybet û neçarîya dewletê

Xanîyên japonî diderizin

Harry Harootunian *

Japonyaya kevneşop dîyardeyên xwezayî yên mîna xela, şewb, fûrîna çîyayên volkanîk, an jî baranên meteorê û her weha hatina bîyanîyan, weke encamên xemsarî û bêserûberîya çînên serdest dinirxandin. Li demeke ku nîzama civakî xwe dispart ser xwezaya ku ji xwe re dikir nimûne û çav lê dikir, her serûbinbûn weke hişyarîyekê dihat têgihîştin. Ev rewş her weha dihat wateya pêşnîşaneya felaketên dijwartir û ev felaket bi xwe jî peyamnêrên hilweşîna rejîma heyî. Pîrejineke tokyoyî, roja 20ê adarê, ji bo rojnameya *New York Timesê* eynî wisa bi cezakirineke îlahî rave dikir: *Dema rêveber xirab û bêxêr bin, felaketên xwezayî jî rû didin"*. Li gel vê yekê jî di şiroveya wê de awirekî qedîm ya aqilmendîya di sîyasetê de veşartî, bala mirov dikşîne.

Hilweşîna berdewam a erdhej û tofana 11ê adarê karesata herî mezin e ku ji têkçûna 1945ê û vir ve bi serê Japonyayê de hatiye. Serokwezîrê Japonyayê **Kan Naoto**, binê vê tesbîtê bi taybetî wiha xêz dike: Trawmaya Japonya tê gerîya, pir dişibe ya şerê duyemîn ê cîhanê. Dîroka rabirdûya nêz a welêt helbet wekî din jî, bi gelek qonaxên kambax û kujer dagirtî ye: Erdhej û agirê di 1923yê de Tokyo şewitand û kavil kir, her weha bû sedemê mirina sed û çil hezar kesan; wekî din zelzeleya li ***Kobe***yê ya di 1995ê de ku tê de şeş hezar kesan jîyana xwe ji dest da û bû sedemê zirareke madî yê bêhempa, hê jî ji bîra mirovan neçûne. Fîlozofên japonî jixwe pirbarebûna erdhejan êdî weke yek ji egerên esasî û dîyarker ên nermbûna nasnameya neteweyî ya japonî (1) dinirxînin.

Tsunamî: *"Tolhildana îlahî"*

Di xîtabeteke xwe de, walîyê Tokyoyê, **Ishihara Shintaro** erdhej û tsunamî weke *"tolhildana îlahî"* (*tenbatsu*) şirove kirin. Li gor wî, bi awayek ji awayan hêza îlahî li *"ferdperestîya sînornenas"*, li *"materyalîzm"ê* û li *"diravê ku herkesî bawerî pê dianî"*, ceza dibirî û pêwîst bû ev dirav ji nuha û şûn ve ji bo *"maliştina"* vî awayê jîyana bêserûber û rizîyayî bihata bi kar anîn û gelê japonî bianîya ser rêya qenc û rast**.** (2) Lîsteya argumanan hê di dema erdheja 1923yê de hatibû bi pêş xistin û ji alîyê împeretor **Hîrohîto** ve di 1946ê de ji nû ve hatibû rojevê; dema dihat xwestin ku ew ji ber sûcên şer were mehkeme kirin**.** (3) Împeretor şer weke *"encama rizîna exlaqî ya gelê bi materyalîzm û berxwirîyê sermestbûyî" rave dikir***.** Bi heman awayî, rexneya walî **Ishihara** çîna sîyasî jî ji berpirsîyarîyên wê bêrî dike û wî pûrûpak nîşan dide, da ku sûc bixe ser stûyê gel. Daxuyanîyên tên dayîn qet jî nikarin ji bo vê felaketê bibin bersiv; ji bo aqûbeta bi hezaran felaketzedeyên ji alîyê exlaqî ve di rewşeke pir xirab de ne û li nav xirbeyan li nasên xwe digerin an jî li îşareteke têkildarî jîyana wan a jidestçûyî çavên xwe digerînin.

Wêdetirî bîlançoya mirovî ya hê jî zelalnebûyî û zêdewêrekîya wergirtina berpirsîyarîya çar sed hezar kesên ku êdî bêcihûwar in, santrala nukleer a ***Fukushima*** ye ku dibe sedema endîşeyên hê mezintir. Çizirîn û fûrînên radyoaktîf ber bi atmosferê ve, endîşe û gumanên pir erjeng û tirsnak bi mirovan re peyde dikin. Di dema xîtabeta xwe ya neteweyî de, serokê şirketa *Tokyo Electric Power Company* (Tepco), di heman demê de operatorê wargehê, li pêşîya kamerayan hêstirk ji çavan barandin. Bi îfadekirina hem poşmanîya xwe, hem jî dilovanîya xwe ya ji bo parvekirina êşên felaketzedeyan, wî bi awayekî ecêb da zanîn ku şirketa wî pir baş nizanibû tam çi dikir. Di 2007ê de jî navendeke nukleer a li bakur-rojavayê komegiravan û dîsa di bin rêveberîya Tepcoyê de piştî erhejeke bi mezinahîya 6.8 a pîvana Rîchterê zirar dîtibû. *(li nivîsa di çarçoveyê de binêrin)*. Tevî ku xebatkarên ewlekarîyê li himberî hejeke wisa bi hêz berê nehatibûn agahdar kirin, bi tesaduf û şansekî mezin, encamên karesatê dîsa jî di asteke biçûk de mabûn. Hê di demeke nêzîktir de, dengên dijber li himber rêveberên şirketê yên ku ketibûn nav rîskeke mezin, bilind bûn. Ji bo ku reaktoran ji hilweşîneke gengaz biparêzin, wan pêvajoyeke sarkirinê bi derengî xistibû. (4)

Baweriya japonîyan bi beyanên hikûmetê nayê

Tepco, yekane şirket e ku dikare li seranserî welêt qutbûnên dorveger ên elektrîkê eyar bike, her weha perdeya li ser nihênîya ku heta nuha têkilîyên navbera derdorên taybet ên bazirganîyê û dezgehên gelemperîyê bi rê ve dibir jî rake: Hevparîya bi hizûr. Gilîlêkirî ji demeke dirêj ve ji alîyê komeleyên ber-xwiran, di rewşa nukleerê de ew dibe xwedî serûberî û alîyekî taybet. Lewre di vê mijarê de, çi hewldanên ji bo kêmkirina xeteran, çi jî hewldanên ji bo ku qezayên berî demeke nêz neyên bihîstin, hemû delîlên înkareke di asta sûc de ne. Helbet nemana bawerîya bi dewlet, rêveberî û şirketan, ne tiştekî nû ye, lê belê ev bûyer wê karibin lezûbezê bidin vê pêvajoya bi geremol û aloz.

Biryarên têkildar ên ji alîyê hukûmet û Tepcoyê ve ji bo bicihkirina navendên nukleer li Bakur, hatine wergirtin, bersiv nedidan daxwaza geşkirina herêmekê ku ji ber sedemên dîrokî yên rehên wê digihîjin sedsala XIXê, ji texîrbûna karûbarên pêşxistina aborî gazin dikirin. Li devereke sabit bicihkirina şênîyan divîyabû her weha pêşî li ber belavbûna ber bi herêmên pêşketîtir ên Başûrê Girava bingehîn bigirta. Lê belê dema ku aborîya herêmî pêrgî erdhejê tê, encamên kambax ên tofanê tesîrê li tevahîya welêt dike û hejekê li aborîya cîhanê jî didin; hingê raya giştî -li dirêjahîya şerîdeke kevîya deryayî ya bi tsunamîyan bi navûdeng e, bi taybetî jî perava ***Sanriku***- li ser rêûrêbaza bicihkirina rêze-santralên nukleer dest bi pirsan dike.

Tevî nebûna agahîyên ji herêmên zerarlêbûyî, her tişt nîşan dide ku ji ber nebûna reaksiyonê, ji hukûmeta xwe bi endîşe ne û ne qayîl in. Hêdîbûna têkildarîyê, alîkarîyê û awayê anîna pêdivîyan ji bo erdhejzedeyan, rojên piştî erdheja Kobeyê tînin bîra mirov. Hingê, heta ku rayedaran xedarîya felaketê fêm kir gelek roj derbas bûbûn û ancax bi qasî heftîyekê şûn de, karûbarên çûna hawarê dest pê kiribûn; bûyereke ku dibe pêşagahî ji bo bersiva derenghiştî û kêm a ku Waşîngtonê wê piştî deh salan bida. Bersiva li ser rewşa perîşan û kambax a ji ber bagera Katrina ya li başûrê Dewletên Yekbûyî derketibû holê.

Tirsa epîdemîyeke radyoaktîf xewa japonan vedirevîne

Ji alîyekî ve lezgînîya çûna hawara şênîyên bêcihûwarmayî xwe ferz dike, ji alîyê din ve jî tirsa berbelavbûna şewbeke (epîdemîyeke) radyoaktîf, xewa japonan vedirevîne. Lê belê xetera nukleer her weha tehdîdek e li ser tevahîya çîna sîyasî ya zêdetirî şêst salan e li cihê xwe ye, herçendî ev cara pêşî ye ku hikûmeteke Partîya Demokratîk, Japonyayê bi rê ve dibe. Tevî ku dewletê bênavber gel der barê rîskên girêdayî hilberîna enerjîya nukleer de hişyar kir, ew di heman demê de jî bû sedema zêdebûna xeterê. Ji salên 1950yê ve, japonî ketine bin nîrê nîzameke sîyasî ya fazîletên xebat û dîsîplînê mezin dike, bîrbirina fedakarîyê, xweeyarkirina li gor şertûmercan, îstîqrar, sedaqet û serîtewandinê dipesinîne. Berevajîyê vê rewşê, ev sîyaset bû sedema bi gewdebûna civakeke yekcar xemsar, beramberî bêxemî û sistîya demokrasîyeke du partîtî ya ku tê de guherînên herî mezin jî ti caran nagihîjin asta guherînên siyasî. Ev yek jî nikare rê li vê gewdeya civakî bigire ku li hemberî rêveberên xwe bibe xwedî helwesteke pir rexnegir –û carna jî serî hilde.

Dema ku hikûmet bi taybetî li herêmên dûrî deverên ewlekarîyê ya li derdora santrala ***Fukuşîma I***, daxuyanîyên razîkirinê zêde dike, nerazîbûna derdikeve holê jî dibe îşareta bigewdebûna xembarîyeke kûr û kolektîf a li hemberî rîskên berbelavbûna şewba radyoaktîf. (5) Çi kesên derfetên wan hebûn, lêxistin û çûn, bi rêyên bejayî, an jî hewayî, bi trênê an jî bi otobusê, eynî çawa welatîyên çînî, fransî an jî brîtanî revîyan, wisa. Wêneyên dorên têra xwe dirêj ên li rawestgehên benzînê, yên trênên serdevde tijî, yên bi hezaran rêwîyên li ser rêyên gar û balafirgehan, ji hêstirkên çavên rêveberên Tepcoyê an jî ji dîmenê awarte yê împarator Akîhîtoyê li ser ekrana televîzyonê, der barê rewşa rasteqîn ya welêt de zêdetir tiştan tînin ziman.

Akîhîtoyê ku ji welatîyên xwe arambûnê û bi hevgirtina neteweyî, serbilindbûnê dixwaze, bivênevê axaftina bavê xwe împarator **Hîrohîto** ya 1945ê tîne bîra mirov. Hîrohîto di wê axaftina xwe ya radyoyê de xilasbûna şerê cîhanê îlan kiribû û ji japonan xwestibû ku *"bikevin bin barekî nehilgirbar"*. Berevajîyê selefê xwe, împaratorê îro xwe weke cewhera îlahî bi nav nake: Ew temsîla neteweyê dike. Ev xuyabûna wî ya di televîzyonê de ji bo gazîya aramî, sebir û hêvîyê, dibe weke olaneke pêşnîyarên hikûmeta ku ji japonan bêhnfirehî û fedakarîyê dixwaze.

Desthilat dixwaze pêşî li hêrsa japonîyan bigire

Bi bikaranîna rûçikê xwe yê parêzvan, împarator di heman demê de cihê xwe yê girîng ê ku hê jî di nav civaka japonî de diparêze, dest nîşan dike. Ev yek hem ramana tolhildana îlahî ya ji alîyê **Ishihara** ve hat bi bîr xistin xurt dike, hem jî rengekî rewa dide nîyeta xwe ya ku dixwaze pê berpirsiyarîya felaketê ji rêvebiran bêhtir bixe stûyê gelê japonî.

Herçendî japonî dezgeha qiralîyetê wekî dezgeheke modeya wê bihurî dibînin jî, balkêş e, ew hê jî pir girêdayî şexsê împarator û alîgirên berdewamîya xanedanê ne. Ev nakokî dihêle ku hikûmeta sedsala XXIê ji bo pêşîlêgirtina alozîyên gengaz ên li dijî nîzama gelemperî, axaftina împarator bi kar bîne. Împaratorê ku ji gel dixwaze plan û bernameyên heyî qebûl bike, ya rastî dikeve nav nakokîyê li hemberî gîyan û nameya Destûrnameya ku gel weke serdest dest nîşan û misoger dike. Bi vê rêûrêbazê tê xwestin ku hestên dilsozîyê yên ku japonî ji bo civak û nirxên xwe hîs dikin, veguhere têgihîştineke siyasî. Bi formên siyasî yên rêvebirinê, navnîşankirina komekê bi prensîba baviksalarî tê xurt kirin û împarator jî dîsa dimîne weke bavê neteweya japonî.

Deshilat bi vî awayî daxwaza xwe ya pêşîlêgirtina hêrsê nîşan dide, rê li ber pêlên nerazîbûn û serhildanan digire û pergala redeke hişk û dijwar diparêze û di encamê de jî xwe ji barê giran ê berpirsîyarîyê rizgar dike. Li gel vê yekê jî, lawazîya berbiçav a rayedaran a têkildarî, wergirtina biryarên agahdarkirin, destekkirin û razîkirina gel, dikare bibe sedema destpêkirina guftugoyeke dijwar li ser şemaya pênasîya navbera serdestîya gel û otorîteya sîyasî ya ku di nav nîv sedsalê de bi sebr û aramîyeke mezin sitewîyaye.

Rêzeke dirêj a şaşîyan, lê her weha etaletîya li hemberî buhran û lîstikên dijwar ên cîhana hemdem der barê avakirina paşerojê de, ne nîşanên xêrê ne. Dema jihevdeketina dezgeha dewletê jî li ber çavan tê girtin, bivênevê mirov jixwe dipirse ka rêveberên japonî wê karibin xwe bigihînin asta serkeftineke hêjayî destkeftên ku berê hatibûn bi dest xistin: Di salên 1920ê de jinûvesazkirina Tokyoyê, an jî piştî şerê cîhanê afirandina neteweyeke nû?

* Profesorê li zanîngeha Duke û li beşa Lêkolînên Asyaya Rojhilat a zanîngeha Kolombîya, nivîskarê berhema bi navê Têkoşîna di Navbera Dîrok û Bîranînê de: Hemdemîya Japonyayê Piştî-şer, Miszu, Tokyo, 2010.

1 Jean-Marie Bouissou, "Qîyameta japonî a ji bo rojavahîyan ravekirî" bixwîne, li ser malpera *Le Monde diplomatique*, **http://www.monde-diplomatique.fr/**

2 *New York Times*, 20 adar 2011

3 Bi taybetî Tetsuya Takahashi bixwînin, "Le sanctuaire Yasukuni ou la mémoire sélective du Japon (Perestgeha Yasukuni an jî hişbîra neqîner a Japonyayê)", Le Monde diplomatique, adar 2007

4 Ken Belson, Keith Bradsher and Matthew L. Wald, "Officials may have wasted time in reactor crisis, experts say (Pispor dibêjin, dibe ku rayedaran di dema krîza reaktorê de wext heba kiribe)", *International Herald Tribune*, Parîs, 21 adar 2011

5 Wargeha ku pêşî bîst kîlometre, û piştî çend rojên din sî kîlometre li dûrahîyê hat saz kirin

Wergera ji firansî: Baran Nebar

Tepco û hîssedarên wê

Şirketa ***Tokyo Electric Power*** (TEPCO)(1) a ku santrala nukleer a ***Fukuşîma***yê bi rê ve dibe, ji bo bawerîyê bide japonan, gelo bi rastî jî çi ji destê wê hat, kir? Di îlona 2002yê de, şênîyên komegiravan tê derdixin ku, ji dawîya salên 1980yê ve, şirketê bîst û neh raporên ku arasteyî ajansa ewlekarîya nukleerî hatine kirin, texrîf kirine. Şênî, wekî din, fêr dibin ku rayedarên japonî ji sala 2000ê ve xwedîyên vê agahîyê ne, lê belê berîya hingê pêwîst nedîtin li vê rewşê bikolin.

Kovara *The Economist* dide zanîn ku *"belgeyan cih nedida pirsgirêkên ku di heşt reaktorên cuda de derketibûn holê*. (2) Bo nimûne yek ji pirsgrêkan weha bû: *"Terk li lahîta polayî ketibûn, lahîta ku dora dilê reaktoran dipêçe û ewlekarîyê misoger dike"*. Ev îfşa dibin sedema îstîfayên serokê şirketê **Nobuya Minami** û serokê konseya wî ya rêveberîyê **Hiroshi Araki**, ku di heman demê de serokê Komîteya Etîk ya mezintirîn federasyona karsazê japonî, ***Japan Business Federation*** bû. Di tîrmeha 2007ê de, erdhejek TEPCOyê neçar dike santrala nukleer a ***Kashiwazaki-Kariwa***, a xisarlêbûyî bigire. Hatinîya aborî ya şirketê ji sedî 75 kêm bû, para qezenca li hîsedaran dihat parve kirin, ji sedî 7 daket. Ew digihîje wêdetirî asta di navbera adara 2003 û adara 2007ê de.

Piştî sê salan, **Masataka Shimizu** (serokê nû yê şirketê) îdîa dike *"ders wergirtiye* [ji erdheja 2007ê] *û hertişt kiriye ji bo ku santralên me, ne bi tenê yên nukleer, bi rastî jî têra xwe zexm bin"*. *(3)* Li gel vê yekê jî, karûbarên şirketê ji rabirdûya wê bi temamî qut nabin. TEPCOyê berî demekê qebûl kir ku di navbera 2001 û 2011ê de, wê pêwîst nedît ku kontrolên mecbûrî yên ewlekarîya kargehên xwe ferz bike. Van kontrolan ancax di dawîya sibata 2011ê de dest pê kir. Zêdebûna bistên ûranyûma bikarhatî li hewizên stokajê –sê qat zêdetirî hejmara ku destûra wê hatiye dayîn– heta roja erdhejê jî, weke ku zêde nebûye xaleke rojeva şirketê. (4)

Şansekî operasyonê hebû ku karibe ligel stratejîya teşwîqkirina qezencan bigunce; ew jî bi erzankirina fîyetan pêk tê. Rapora salane ya 2010ê nîşan dide ku stratejî her weha di warê venêrînan de jî (5) wê bibe mijara *"hewldanên bi înad"*.

Gelo ev bîrbirin û îdraq bû ya ku bû sedema biryara dirêjkirina temenê yek ji şeş reaktorên santrala deh salî û bi wergirtina destûra rayedarên japonî? Ew bîrbirin gelo dikare bibe îzahek ji bo dudilîyên komê yên têkildarî bi ava behrê avdana reaktorên Fukuşîmayê, tedbîra ku bi kêrî sarkirina wan dihat, lê belê santral jî ji kar dixist? Japon nuha van pirsan ji xwe dikin.

1 Di dema vekişîna dewletê ji sektora hilberîna elektrîkê de, sala 1951ê hat ava kirin

2 "A critical mass of disgust? (Asteke bi tehlûke ya hêrsê?)", *The Economist*, London, 5 îlon 2002

3 TEPCO, rapora salane ya 2010ê

4 *Cf.* Justin McCurry, "Japan nuclear firm admits missing safety checks at disaster-hit plant (Şirketa nukleer a Japonyayê li xwe mikur hat ku li reaktora felaketê lêxistî, kontrolên ewlekarîyê pêk neanîne)", *The Guardian*, London, 22 adar 2011

5 Rapora salane ya 2010ê

Wergera ji fransî: Baran Nebar

www.kurdishstudies.org

Nîqaşa li ser sedemên krîza fînansî

Dijberîya li Waşîngtonê

Gérard Duménil û Dominique Lévy *

Komîsyona lêgerînê ya li ser krîza fînansî, ku li gulana 2009ê ji hêla serok Barack Obama ve hat saz kirin, çîleya navbihurî rapora xwe pêşkêş kir. Peywira wê jî, nîşandana sedemên bobelatê bû, ku li tebaxa 2007ê dest pê kir û salek bi şûn ve, digel têkçûna çend sazûmanên fînansî yên amerîkî yên mezin gihîşt asta xwe ya herî bilind.

Komisyona lêpirsînê a der barê krîza malî de, ku di gulana 2009ê de, ji alîyê Serok Barack Obama ve hatibû damezirandin, di çileya 2011ê de rapora xwe pêşkêş kir. Wezîfeya wê ew bû ku, sedemên krîza ku di tebaxa 2007ê de çêbûbû derxîne meydanê. Tê zanîn ku heman krîza aborî, di mehên îlon û cotmeha 2008ê de, bûbû sedemê têkçûna pir sazîyên mezin ên malî yên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê. Ji dema pêşketina aborî ya mezin ve ev krîz du caran ji berê girantir bû, lê belê wezîfeya komisyonê ne ew bû ku mijarê lêbikole, an jî li ser dumahîka rewşê hukim bide û ji bo paşerojê pêşniyaran bike.

Bi mîlyonan rûpelên dokumanan, 700 şahid, 19 rojan rûniştina bo raya giştî vekirî, 600 rûpel rapor û 1100 dokumanan nikaribû nêrîna 10 endamên komisyonê, ku ji bo lêpirsîna krîza malî, ji alîyê Serok Barack Obama ve hatibûn dest nîşan kirin, bike yek. (1) Divê were gotin ku, şansê lihevhatinê bisînor bûn. Komisyon li ser hîmê beşdarîya endamên du partîyan hatibû çêkirin, şeş hilbijartîyên Partîya Demokrat, çar jî yên Partîya Komarxwaz di vê komisyonê de cih digirtin. Herweha, çar endamên partîya Komarxwaz jî nekarîn yekdeng bin. Rapor jî li ser sê beşan hatibû nivîsandin. Beşa yekem ya Demokratan bû, beşa duyem ya sê Komarxwazan, beşa sêyem jî ya Komarxwazê dawîyê bû.

Di çapemenîyê de îmaja heman raporê bi nakokîyên wê ve derketibû pêş. Hin derdor giringîya vê raporê di *"agahîyên balkêş"*, û *"dewlemendîya belgeyan"* de dibînin.… Belgeyekê *New York Times*ê dijwarîya nakokîyan dide xûyan: Rapor bi tenê "*tevlîhev*", "*belawela*" û "*gêrevêre*" ye. *(2)* Digel her tiştî, wêneyê ku ji heman xebatê derketiye û li gor cur be cur şîrovegeran, ev rapor rewşa bialoz ya siyasî xuya dike. Alîkarîya demokratan weke *"koma ceribandina çepgiran"* e, ya her sê komarxwazên destpêkê jî weke *"pêşandaneke PowerPointê ku meyila wê ber bi alîyê rastê ve"* ye. Her kesî li gor nêzîkatîya xwe di vî karî de cih girtiye.

Em ji beşa sereke ya piranîya demokrat dest pê bikin. Ji me re dibêjin, rewşa xirab li ser bingeheke fînansekirinê ya nedîtî pêk hatiye: Deynkirina zêde, sermayeguzarîyeke bixeter, kêmbûna zelalîyê, veşartina bîlançoya hin buroyên bankeyan, leystika li ser hin bazaran. Ev kiryar pir ne orîjînal in, lê belê hemû hatine bi belgekirin û dilê wan bi tu tiştî naşewite. Nêrîna navendî ji teqînê re amade ye. Krîz bi tu awayî veşartî nebû: *"Nîşanên hişyarker hebûn. Lê belê trajedî piçûk hate dîtin, an jî qet nehate dîtin.(3)"* Heman rewş dikaribû bihata asteng kirin ku pêk nehatiba: *"Em, nêrîna ku dibêje, kesên pêwendîdar xwedî desthilatdarîyê nebûne, ku sîstema malî biparêzin, qebûl nakin. Di pir qadan de ew xwedîyên desthilatdarîyeke mezin bûne, lê belê wan ev otorîteya xwe bikar neanîye"*. Hikûmet, bi neamadebûnê hatiye tewanbar kirin, tê gotin ku, qasî ku tê xwastin ew li dijî kiryarên nelirê tênekoşiye, herweha bersivên wê jî bê encam têne dîtin. Rêzerva federal neketiye nav hewldanan, da ku deyndayîna ku weke "bijehr" tê zanîn, asteng bike, bi taybetî deynên navdar yên ku dane subpriman [nota wergêr: Beşên civakê yên ku di bin çîna navîn de ne]: *"Mînaka yekem ew e ku, Rezerva Federal qels maye ku li dijî herikîna hîpotekên bi jehr astengan çêke. Rola vê yekê giranîyeke navendî çêkiriye. Rezerva Federal dikaribû hin norm çêkiribana ku heman rewş dernekeve holê. Rezerva Federal yekîneya bi tenê bû ku di vî warî de xwedîyê însiyatîfê ye, lê belê wê ev derfet bi kar neaniye"*. Serokê wê yê berê, **Alan Greenspan**, weke nav hatiye dest nîşan kirin. Berpirsiyarên payebilind yên hin sazîyên aborîyê, bi bikaranîna xirab a wezîfeyê hatine tewanbar kirin, bi taybetî birêvebirina rîskan. Gilîyê nêzîkatîya ajansên notdayînê weke faktora bingehîn ya krîzê hatiye kirin. Û kiryarên nelirê pir zêde ne.

Ya rastî, sektora malî, bi zexta ku wê li ser biryardaran de çêkiriye hatiye tewanbar kirin: *"Pîşesazîya malî di pêkneanîna rêbazan de li ser sazîyan bûye xwedî roleke giring. Herweha heman rolê li ser bazar û berheman jî giranîyek çêkiriye. Pişesazîyekê xwedîya ewqas dewlemendîyê û otorîteyê karibûye di ser biryargerên siyasî de giranîyê çêke û ev jî ji bo komisyonê nebûye tiştekê surprîz."* Tê zanîn ku bi milyaran dolar ji bo karê lobîyê û kampanyayên hilbijartinan hatine xerc kirin. Yek ji xalên êrişan jî, nebûna birêkûpêkkirinekê ye.

Li hemberî vê tewanbarîyê, komarger dikarin çi bersivê bidin? Daxwazên ji bo rêbaznameyeke baş her tim li guhê wan dikeve û wan nerihet dike. Serokê Komîteya Servîsên Aborî ya Meclîsa Nûneran daxûyanîyeke wiha dabû rojnameyekê: *"Li Waşîngtonê tê gotin ku, divê banke werin birêkûpêk kirin.*

Lê belê, li gor nêrîna min, Waşington û biryardar ji bo xizmeta bankeyan bikin, hene.(4)" Wusa tê gotin ku, her çar endamên komarxwaz xwestine dengê xwe bidin ji bo ku gotina "nepêwîstîya rêbaznameyê bikeve raporê. (Herweha *Wall Street* û yên din jî ev yek nivîsandine). (5) Lê belê, wusa xuya ye ku li ser lidûvhevhatina her du beşên din, ew di nav xwe de jî li hev nehatine.

Parastina destpêkê ya komarxwazan ew e ku, heman bûyerê tenê li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bandora neyênî çênekiriye, herweha, vê krîza malî û teqîna beşa kirîn û firotina milk, bandora xwe li dewletên pêşketî yên sereke jî kiriye. Di vê navberê de, kes nikare der barê "hêza" mezin ya DYAyê de, ku di qada krêdîyên xeter de tê bi kar anîn, biaxife. Awayê sedem nîşandanê berîya her tiştî bi roleke baş tê zanîn a lebikandinê radibe: Kêmasî weke kiryara welatên weke Çînê û dewletên ku niftê difiroşin tê dîtin. Ev welat roleke mezin dileyzin, ji ber ku ew pir difiroşin, lê belê zêde nakirin û dolaran xerc nakin. Di warê aborî de, ew di destên xwe de pere digirin û ji bo sermayeguzarîyê ji xwe re li cihê herî baş digerin. Ev pirbûna fonan bûye sedem ku faîz kêm bibe û kiriye ku awirên netêrbar yên deyndarîya malbatên amerîkî bizîvire ser wan: *"Ji dawîya salên 1990ê û pê ve, Çîn û hin dewletên din ên ku ji pêşketinê re vekirî ne û herweha dewletên ku niftê difiroşin, li welatên xwe kêm pereyan xerc dikin; ew li derve zêdetir qezenc dikin. Sermayeyên pir mezin û bi buhayekî piçûk ketiye Amerîkayê û krêdîya erzan bazar dagîr kiriye." (6)*

Ji alîyê komarxwazan ve hatiye xwestin ku mijara van welatan û herweha ya rêjeya faîzê li derveyî xebata komisyonê bê hiştin, ji bo vê, wan hewl daye ku hêza demokratan jî bi kar bînin: Karê diyarkirina norman ên ku deyndayîna bixeter li bankeyan qedexe dike, yê *Rezerva Federal* e.

Beşa dawî ya raporê, tîra bi jahr diweşîne, çekê li ber dilê rast ên siyaseta rastê ye. Pirsgirêk li Amerîkayê ye, lê belê ew di nav programên civakî yên hikûmetên ku hevdu dişopînin de jî cih digire. Ji salan û vir ve, programên ku dikin kesên xizan bi hêsanî bibin xwedîyên xanîyan, hatine qebûl kirin: *"Pir sedem hene ku em bawer bikin gayê* [kirîn û firotina milk] *di navbera salên 1997-2007ê de, di encama siyaseta hikûmetan de, yên ku bi awayekî lihevçêkirî bûne sedema zêdebûna daxwazên kirîna xanîyan, bala sermayeguzarîya aborî ber bi bazara xanîyan û milk ve kişandine. Eger normên dema bihurî hebûna û pêk hatibana, û hikûmet nebûya sedema zêdebûna kredîyên birîsk, hingê ev fond wê hê jî hebûna." (7)* Ajansên pirr mezin (8) û yên herî zêde hatine nas kirin *Freddy Mac* û *Fannie Mae* in. Van her duyan yekser di nav vê kiryarê de cih girtine, ji ber ku ev ajans ji berê ve weke ajansên tercîhkirî hatin dîtin ku wê ji sazîyên kredîyê, kredîyên li gor krîterên "civakî" bikirin. Ji ber vê sedemê, diviyabû alîkarîya ji bo xizanan hatiba sekinandin! Di destpêka raporê de, endamên demokrat dîqet kirin ku vê xalê pûç bikin, wan şerh danî ku deynên li gor van qanûnên civakî hatine dayîn parçeyekî pir piçûk yê tevahîya deynan e.

Der barê êrişên demokratan yên bi ser dînîtîya malî û nebûna rêbaznameyê de, divê em çi bifikirin? Ravekirina wan a krîzê, herweha pêşniyarên ku derdikevin pêş, dikin ku hin kes bibêjin "Obamayê destpêkê", yê berîya ku demokrat piranîyê ji dest bidin, hez dikir xwe bi îmaja *Rooseveltekî* nû nîşan bidaya. Wê demê me dikaribû hêvî bikira ku wê reformên pir giring çêbin –digel windakirina hilbijartinan, heman daxwaz hê jî heye. Digel hemû tiştî, hê jî pir zehmet e ku ew bikaribin bi demokratên endamên komisyonê re behsa lihevhatineke bi rastî bikin. Bê guman, berpirsyarîyên şexsî û yên sazîyan, bi awayekî dîrek hatine dîtin; lê belê, gelo mumkin bû ku pêşî li vê krîzê bihata girtin? Weke hemû şiroveyên der barê rewşa malî de têne kirin, ev analîz jî qismî ye. Bi taybetî du valahî hene. Di warê teknîkî de, ev teşxîs alîyên bingehîn ên rewşa aborî ya Amerîkayê li ber çavan nagire û ew dînamîkên dîrokî yên guhertina civakî yên ku berîya krîz bide der, di bingeha krîzê de bûn, nabîne.

Der barê xala yekem de, hinek makro-ekonomî pêwîst e. Di cîhaneke bazara serbest de û herweha li gor azadîya gera sermayeyê, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê taybetmendîyên luksa li dinyayê bêmînak e, daye xwe, ev luksa hevnegirtin û bêtewazinîya li ser hev a li hundir û ya li derve ye. Di warê reqabeta mezin a navneteweyî de, beşeke mezin a daxwazan ber bi hilberînerên cuda yên cîhanê ve diçe. (9) Bi armanca bersivê bide daxwazên ku ji fîrmayên li ser erdên wê re diçin, welat neçar ma ku siyaseteke krêdîya ji bo xizanan bimeşîne. Lê belê vê bi tenê karibû bersivê bide parçeyekî van daxwazan, yên mayîn ber bi welatên din ve çûne. Ev bûyereke pir naskirî ye. Li vê derê cudahî ew e ku, şûna ku ew li dijî qelsîyê têbikoşin, weke ku di salên 1983yê de li Fransa û li hin welatên din qewimîbû, hêza Amerîkayê û ya dolarê destûr daye ku heman siyaset, bi buhayê ku qelsîya tîcarî zêdetir bibe, heya sîh salan jî dewam bike. Piranîya dolarên ku ji welatên cîhanê ber bi DYAyê ve tên, bi armanca razandina malî ne; ev jî dibe sedem ku, bi awayekî din, em dikarin jê re bêjin *deynê derve*, yanê perê amerîkî li hemberî perê biyanî. Ji ber ku zêdebûna deynê malbatan û yê hikûmeta amerîkî bi qasî deynê wê yê derve ye.(10) Ev daxwaza ku ji alîyê krêdîyê ve derketiye pêş, bingeha xwe ji nêzîkatîya maceraperest a sazîyên malî digire ku şert û mercên felaketê afirandine û welat ber bi krîzê ve ajotine.

Der barê dînamîkên kûrtir yên dîrokî de, me nikarîbû em li benda endamên komisyonê yên demokrat bimana, ku ew destê xwe rakin û der barê rewşa civakî de nîzameke nû ya neolîberal, ku di salên 1980yê de hatibûn çêkirin, tiştekî bikin, digel ku ew behsa sîh salên lîberalkirina aborîyê dikin. Demokrat li vê derê pirsgirêka sereke ya ji *xwezaya* nelîberalîzmê û têkilîya wê bi krîzê re nabînin.

Baş e, neolîberalîzm çi ye? Tevahîya pratîkên civakî, aborî û siyasî ye; nîzameke civakî. Çawa herkes pê dizane, bi awayekî balkêş dewlemendan xwe dewlemendtir kirine û jixwe armanc ev bû. Ne yên şexsî, berpirsyarî yên "çînî" ne: *Çînên kapîtalîst* û hevalbendên wan, *derdorên payebilind* ên sektorên taybet û yên dewletê, (bi taybetî yên ku li derên bilind xwe bi cih kirine û yên qada aborî), herweha kadroyên partîyên rastgir û yên çepgirên kevin. Lihevkirina di navbera rêveberan û organîzatoran de bi xwe re alternatîvên keynes û yên sosyal-demokratên piştî şer derxistiye holê. Li dijî van çînan, bê guman, xizan, lê belê, bi awayekî giştî, çînên gel yên karkeran û memûran hene. Di analîza dawîyê de, krîzê ev nakokîyên vê nîzama civakî ya nû derxistine holê. Vê nîzamê bi armanca zêdekirina hatina dewlemendîyê û desthilatdarîyê biqasî ku êdî nikaribe were ragirtin, hewl daye astengan ji holê rake. Fînansekirin parçeyekî vê çalakîyê ye. Li vê derê, divê em vê jî bibêjin; krîz parçeyekî DYAyê ye, ji ber ku ev welat di vê riyê de yê herî pêşketî bû û hegemonîya wê ya navneteweyî destûr dayê, ku sîh salan vê riya xwe ya newekhewî û bêtewazûnbûnê bikudîne.

Lê belê dînamîkên dîrokî pêwîst dikin ku, bi awayekî kûr, em nakokîyên hundirîn ên di nav komisyonê de binirxînin û argumanên wê yên heyî yên cur bi cur bigirin dest. Ev ne tenê cureyekî diyarkirina nakokîyên di navbera du partîyan de ye: Herweha ew der barê cureyên îxtilafên siyasî, ên di navbera çînên kapîtalîst û kadroyên neolîberal de jî diyar dike. Herweha, sê komarxwaz daxwaza dirêjkirina neolîberalîzmeke bêguhertin dikin; argumanên wan xwe dispêrin parastina tund a berjewendîyên kapîtalîstan, weke lîderên bêniqaş ên hevgirtina li zîrweyê. Komarxwazê çaremîn, yê zêdetir rastgir bêniqaş li ber daxwaza hevkarîya partîyan radibe, bêşerm daxwaza xwe ya bikaranîna şert û mercên krîzê derdibire daku li ser çînên civakî zextê bi pêş bixe. Weke li Ewropayê, mijar ew e ku li pêşîya hemû lihevhatinên civakî ên piştî şer, astengan deynin. Ên ku herî zêde tinekirina bankeya nevendî diparêzin jî ev kom in, bêyî wan 2010 dikare bişibe sala 1933ê. (11) Piçûkdîtina gel û nefreta ji burokrasîyê bi hev re dimeşin.

Li gor demokratan, di çavê wan de, globalîzm parçeyekî pêşketinên, jê bêveger e. Weke sosyalîstên fransî ew *kapîtalîzmeke baş,* tevî sektoreke fînansorên bi rûmet û nerm dixwazin. Lê belê li gor teşhîsa wan, divê di hevgirtinan de hin xal li gor berjewendîyên fîrmeyên ne fînansor, bên çêkirin. Awirê van fîrmeyan li ser hilberînê û mezinbûna reel a aborîyê ye. Ev hemû di nav aborîyekê de dibe ku kadroyên dewletê wê pratîk û kirinên wê nerm bike; ev kadro aborîyê birêkûpêk dikin û kontrol dikin. Niqaşên wan bi awayekî şermokî behsa ***New Deal***ê dikin. Dema ku berpirsyarîya depresyonê li ser sektora fînansê tê bar kirin, serok **Roosevelt** hewl dida bi çînên gel re hevgirtinekê çêke, wî cesaret dikir *big business*ê bigire destê xwe û kadroyên dewletê jî li ser rewşê hakim bibin. Lê belê, di nav kîjan pîvanan de demokratên roja me dixwazin bi alîyan re hevkarîyê çêbikin?

* Aborîzan, nivîskarê *The Crisis of Neoliberalism* (Krîza Neolîberalîzmê), Harvard University Press, 2011



Ismet Polatli: **Bêkes**, (detay)
boyaxa rûnî li ser kartonê, 20 x 30 cm

1 The Financial Crisis Inquiry Report (Rapora Lêpirsîna Krîza Malî)", 2011, http://www.fcic.gov/report

2 Frank Partnoy, "A confusing and contradictory mess, part rehash, part mishmash" (Nelihevîyeke gêjker û nakok, hem nû germkirî, hem jî gêrevêre), *The New York Times*, 29 çile 2011

3 "The Financial Crisis… (Krîza Malî), *çavkanîya li jor behsa wê hat kirin*. Jibergirtnên din ji vê raporê ne

4 Daxuyanîya Spencer Bachus li *Birmingham News*, ji alîyê Paul Krugman ve hatiye nivîsandin, "Wall Street Whitewash", *The New York Times*, 17 kanûn 2010

5 Ji alîyê Paul Krugman ve hatiye nivîsandin, *çavkanîya li jor behsa wê hat kirin*

6 "The Financial Crisis… (Krîza Malî)" *çavkanîya li jor behsa wê hat kirin...*

7 "The Financial Crisis… (Krîza Malî)" *çavkanîya li jor behsa wê hat kirin*

8 "Agencies", an jî bi awayekî hişktir "Government sponsored enterprises"

9 Çîn tê gunehbar kirin, lê belê sedema ji sisiyan du beşên lihevderneketina budceyên welatên din in

10 Binêre: Pirtûka me *The Crisis of Neoliberalism*, Harvard University Press, 2011

11 Di navbera salên 1929 û 1933yêde, hilberîn % 25 kêm bû. Di sala 1932yê de sîstema malî dihele

Wergera ji fransî: Ahmet Dere

www.kurdishmonde.org

Peymana ji bo Euroyê, bandora li ser mûçeyan

Berfirehkirina qada regresyonê

Frédéric Lordon *

Di erefa civîneke Konseya Ewropayê de ya li ser krîza deynan, 23ê adarê, parlemana Portekîzê planeke armanca wê bi qutkirina mesrefên civakî, kêmkirina lihevderneketina budceyê bû, red kir. Hukûmetên qada euroyê ji ya xwe nayên xwarê û weke derman heba ta'l hişkbûnê didin.

Weke di xewnekê Naomi Klein de a ku wê şaşiyên teza xwe ya destpêkê telafî bike, neolîberalîzma ewropî îhtîmameke taybet pê dide ku xwe li "stratejiya şokê" bîne – lê belê şokeke ku ew bi xwe di çêkirina wê de bi rolekî mezin rabû.

Me bawer dikir, me li gel "bersiva" krîza (malî ya taybet) bi rengê planên kemberşidandinê (yên dewletê) yên nedîtî, êdî her tişt dîtiye. Lê belê dirêjkirina "peymana hevrikîbûnê" berê me da rêwîtîyeke din ku em êdî dawîya wê jî nabînin. Ka heta bi ku şaxberdanajêr a nûlîberal wê weke bersiva krîza nûlîberal biçe, ev pirsek e ku kurahîya wê êdî hew dikare were pîvan.

Di vê lipeyhevhatina ecêb de ku şokeke duyem nabe sedema tu sererastkirinên doktrînî, lê belê dibe sedema ji nû ve piştrastkirina berfireh a wî tiştê ku bi tevahî bi bin ketî, beşa "kêmkirina lihevderneketinên budceyan" bi awayekî mentiqî bû sedema yek ji "encamên" ecêb û sosret ku ji binketina dikare bê pêşdîtin a siyasetên kemberşidandinê ber bi pêdivîya bivênevê ve ya di destûra bingehîn de bicihkirina van siyasetan ve diajo. Tevî qamçîkirina ku *heta mirov bêje bes* tê dubare kirin ya dibêje hişkbûn stratejîyeke vegera mezinbûna aborî ye û her çend wê çend dewrên xweş weke "rilance" (1) a Christine Lagarde jî dan me, em baş nabînin ka siyasetên aborî yên ewropî –ku ev cara pêşî ye koordînekirî ne! Lê belê heyf û mixabin rewşa wê xirabtir bû –wê çawa karibin tam berevajîya wî tiştî neafirînin, ê ku ew weke ku lê digerin, xwe nîşan didin.

Lewma, heke dewrên sererastkirina budceyan berê karîbû hinekî bi ser kevin, ev girêdayî wî şertê zarûrî bû ku bi van tedbîran re kêmkirina rêjeya faîzê, dêvaluasyonekê yan jî jîngeheke tê de aborî mezin dibe jî pêwîst e, ango her tiştê ku em ji niha ve baş pê dizanin ku wê nebe. Ya dimîne, sînerjîya neyênî ya neçê ye ku hewldanên sînordarkirina budceyê ya di vê astê de û di vê firehîyê de (tevahîya Ewropayê) berê nedîtî, bi hev ve girêdide û xuya ye ku bêhtir wê bi "richute" [henekê xwe bi peyva "rilance" dike û peyva fransî "chute" ango ketinê weke peyva çêkirî "rilance" dinivîse] bi encam bibe. Di rewşa herî baş de kêmkirina lihevderneketina budceyê wê pêk bê, lê belê ew qasî hêdî ku leza zêdebûna deynî wê gelekî hindikî biguhere, bi wî awayê ku bi mezinbûneke şikestî, nisbeta deyn/Hilberîna Hundir a Nesade (HHN) – armanca dawî ya tevahîya van manovrayan û herweha pîvana ku ew li gor tê nirxandin –wê her xirabtir bibe.

Mekanîzmaya Îstiqrara Ewropî

Birêvebirên herêma euroyê di stratejîya xwe bixwe de ew qasî bi xwe bawer in ku wan bi rastî bawer kir Fona Ewropî ya Îstiqrara Malî (*European Financial Stability Facility*, EFSF) bi ser ve temam bikin. Armanca EFSFyê birêvebirina dewreke krîtîk (Yewnanîstan, Îralanda ...) e heta sala 2013ê, bi riya sazîyekê ku ew bixwe dewamîya wê ye, ango; Mekanîzmaya Îstiqrara Ewropî (*European Stability Mechanism*). Armanca vê mekanîzmayê ew e ku bi awayekî kolektîf derkeve pêşberî pirsgirêkên "muhtemel" ên siberojê yên deynên bi kefîl [kefîlên wan dewlet yan jî bankeyên navbendî]. Di vî karî de, pirsgirêka siyasî hemû razîkirina Almanyayê ye da ku bikeve nav mekanîzmayeke piştgirîya malî. Wê ev yek timî li ser navê sedemeke "rîska exlaqî" red kir: Dema ku zanibin "kefîlên wan hene" hin dewlet wê di mijara disîplîna budceyê de hê hindiktir xwe biêşînin... Çawa ku diviyabû, Fransa xwedîyê wê "fikra baş" bû, ev fikra baş berdêlek bû ku Almanya dikare qebûl bike û pê sazîyeke piştgirîya malî li şûna mekanîzmayeke disîplînê dihat danîn. Vê mekanîzmayê hêvî dida mirov ku wê tu carî lazim nebe mirov wê bi kar bîne !: Di destûra bingehîn de bicihkirina tewazûna maliyeyên dewletan.

Ev jirêderketina mezin tavilê bû mijara van şanoyên bêdeng ên bisporîya baş çêkirî da ku pîrozîya zanistê (yan jî ya zanetîyê) bide fikrên herî xirab, û Michel Camdessus timî hazir e da ku alîkarîyê bide, wî rapora ku mirov jê li bendê bû, bi awayekî bê kêmasî nivîsî. Qet nebe piştî bêhnvedaneke dirêj ya li pey veqetîna wî ji Fona Pereyan a Navneteweyî (IMF), ew bi tevahî li ser xwe, li me vegeriya! Sedem û argumanên ku dilşahîya bisporekî mentiqî ne, pê re hene. *"Heke [lihevderneketina budceyê û deyn] bi awayekî bi şidet pêrgî hev nebûyana, vê yekê wê îmkanên me bixistana tehlûkeyê, îmkanên parastina rejîmeke ewlekarîya civakî pir disitirînin û azadîya hilbijartîyên me ya diyarkirina siyaseta netewe. Siyaseta netewe ji alîyê hilbijartîyan ve tê diyar kirin û ne di bin zexta bazaran de... "* (2) Bi awayekî ecêb, ew ji nav pêşaneyên xwe yên xurt mekîneyekê derdixe, mekîneyeke bi kêr tê ku bi awayekî metodîk, bi hûrhûrkirina xwedkar, ewlekarîya civakî ji hev bê xistin. Ew herweha bi kêrî tunekirina tevahîya rastîya sererastkirina qanûnên malî tê, lewra plana wan wê bi awayekî bê kêmasî û hişk ji alîyê qanûneke organîk ve hatibe diyar kirin (3) û hemû neçar in li gor wê tev bigerin...

"Bawerîdan"di dawîyê de ji bilî "bidestxistina qebûla muteşebisan" pê ve tiştekî din nîne

Bê guman, rapor baş li îmaja jirêderketina giştîkirî ya peyva siyasî tê ku bi desthilatdarîya Sarkozy hat çespandin. Rapora ku dengê efendîyê xwe ye, heweseke têra xwe fahş nîşan dide ji bo ku nirxê herî bilind bide zanîn, nirxê ku ev pêşniyaz hemû paşê bi awayekî metodîk xiyanetê pê re dikin. Di nav mentiqekî "jihevxistina bi riya çeteyê" ku ji êrişeke ji bereyeke hember bêhtir bi kêr tê, nûlîberalîzmê fêm kir ku xasûktir û aqilanetir e ku dewleta civakî her bêhtir xizan bike, da bike ku çareyên beşa taybet hêsanîtir "xwe ferz bikin". Misoger e ku sererastkirinên mecbûrî yên mesrefên civakî, tevî qutkirinên budceyê yên korane hemûyan yên ku wê bi xwe re bîne jî, çawa ku ji niha ve tê serê AP-HP (Alîkarîya Xelkê –Nexweşxaneyên Parîsê), bi tenê yek bandora wan wê hebe: Çêkirina daxwaza xizmetên beşa taybet ku wê di demeke kurt de bi erzeke bi heman rengî bê razî kirin û ku her kes wê kêfxweş be û qebûl bike ku ew karê xwe ji perîşanîya dewletê bi "gelekî çêtir" dike. Bi her halî tiştek misoger e: Qanûnên fînansên civakî di bin otorîteya çarçove-qanûna nû "Sécu"yê de bi awayekî zelal û "li gor qanûnê" dikevin bin banê jihevdexistina eyarkirî –hin kes jê re dibêjin "rizgarkirina modela me ya civakî"...

Lê belê îronîya devqîç a raporê, heke mirov ne ehmeq be, bê guman di asta xwe ya herî bilind de ye bi daxwaza îdîa dike wê êdî girêdayî siyaseta budceyên bazarên malî nebe, heke ji bilî qebûlkirina her tiştê wan, tu armanceke din a mekanîzmaya destûrîkirinê nebe. Lewma destnedana li gor destûra bingehîn a tewazûna budceyê weke şêwaza havyara muteşebisan e: Êdî wê ji tu dudilîya parlemanî netirsin, êdî li ser derfeta muhtemel a seferberkirina budceyan ji bo xwegirtina li ber krîzan tu pirs wê nebe, kêrên hûrkirinê yên otomatîk wê xweber bixebitin. Mirov carinan ji xwe dipirse ka wê qanûneke organîk a tewazûna budceyî ya ku destpêka sala 2007ê ji bo 2012ê hat qebûl kirin, bibe çi ... ji bilî tercîha di navbera ne li gor destûra bingehîn bûn û ketina nav Depresyoneke Mezin a mîna salên 1929 - 1933ê. Lê belê rapor diviyabû mecbûrî "bawerîyê bide" ango qebûl dike bi tevahî serî bitewîne lewra "bawerîdan" di dawîyê de ji bilî ... "bidestxistina qebûla muteşebisan" pê ve tiştekî din nîne –ji bo azadbûnekê, em dikarin li hev bikin ku hesab bi tevahî hev nagre...

Lê belê Camdessus niha bi rehetî fêr bûye ku şaşîyeke dîrokî li pey şaşîyeke dîrokî bike –lê belê ji ber ku ew xirîstîyan e, paşê lêborînê dixwaze. Wî berê lêborîna xwe xwestibû ji ber ku bi lîberalkirina bi zorê û xirakirina her şêwazê dezgehên ku ji lîberalbûnê nerazî bûn, wî aborîya rûs bi tevahî rûxandibû. Em ji niha ve pêş dibînin ku ji niha heta çend salan wê ceza vegerin, dema ku tesîrên mirovan matmayî bihêlin ên kirasê dînan ê teng ê budceyî bên piştrast kirin. Her çend ew îdîa dike –ketina raporê ya mirovî heyranî xwe dike – ku tewazûna fînansên dewletan "*kilîta mezinbûneke aborî ya misêwa ye di nav edalet û serxwebûnê de*"– amîn. Sê salan piştî destpêka krîza bi tevahî encama lîberalkirina giştî ye, em li vê retorîka serhişkîyê ya ne asayî, matmayî dimînin.

Bêyî siyaseteke zindîkirina aborîyê, peydakirina navgînên mezinbûna aborîyê ne mumkin e

Heke em naxwazin ku "tiştên paşê bên" bêhnê li me biçikînin, divê em wê li dûv xwe bihêlin. Lewra di "kîsê berdêlan" de herweha "peymana heza hevrikîyê" (5) ku ji kemberşidandina budceyî û wê de tevahîya wate û delalîya "stratejîya şokê" didiyê. Weke bernameyên hişk ku êdî bi destûra bingehîn tên kontrol kirin, bes nebin, bi înîsîyatîva Merkel û Sarkozy, Yekîtîya Ewropayê hizirî ku derfeta "pêşketineke bi rastî" hebû û wê şaş bûya heke heta dawîyê ji vê sûd nehata wergirtin. Yekîtîya Ewropayê bixwe jî bi awayekî ne yekser li binketina muhtemel a bernameyên kemberşidandinê yên koordînekirî mikur tê. Li alîyê din stratejîya ewropî weke pêştedbîra cihguhastineke nû pêk tîne. Du avantajên vê cihguhastinê hene, ya pêşî ew e ku hinekî zêdetir bûyera destpêker –krîza malî ya taybet– bide ji bîr kirin û ya din jî heta ku mumkin e qada pêşketina mezin a lîberal mezin bikin. Lewma vê carê wê her tişt di ber destê wê re derbas bibe!

Weha xuya dike ku hikûmet xwe li ser bandorên fahş ên hişkbûnê agahdar dike, ew hişkbûna ku bixwe şertên xwe yên bikêrhatîbûnê xira dike, lewra ew ji kêmkirina mesrefan zûtir dahatên ji bacê qut dike. Ma mirov ji ku navgînên mezinkirina aborîyê peyda bike, bêyî ku siyaseteke zindîkirina aborîyê bi hewarê ve were? Tam jî di vî wextî de dezenflasyoneke jê tê hevrikîyê bike, vedigere. Hê di salên 1980 û 1990ê de wê xwe weke çareserîya xeyalî ferz kiribû. Ya ku vê çareserîya xeyalî disêwirand, yan bêyî mezinbûna aborîyê be jî vegera tewazûna bazara kar bû, yan jî pêkhatina vê tewazûnê bi tenê bi riya îxracatê û heta ya rastî kombînezona herduyan bû. Dibe ku em di vê gihiştibin: Di vî karî de guhêrbara stratejîk buhayê kar e. Ji ber vê yekê jêgerîna ji îndekskirina mûçeyan li gor buhayan (6) û ahengdarkirina ber bi jor ve (ango ber bi jêr ve...) ya temenê teqawîtbûnê heta 67 salan (ji bo kêmkirina beşa mûçe ya "prîmên civakî" di buhayê mûçeyî yê giştî de) tên plan kirin –û di vê navberê de em ê bibînin çawa dema Ewropa di "koordînasyonê" yan jî di "ahengdarkirinê" de bi ser dikeve, rewş her car xirabtir dibe...

Lê êdî du dehsalên dezenflasyonên rakabetker ên neteweyî têra xwe bêmentiqîya bê kêmasî nîşan da. Serê pêşî, lewma ji nû ve sazkirina tewazûna bazara kar bi tenê bi riya ku "buhayê" xwe –ango mûçe– kêm bike kelevajîyek e ku îdîa dike, der barê daxwazê de tu pirsgirêk wê çênebin – ya rastî tevî % 77ê rêjeya bikaranîna kapasîteyên hilberînê (7) jî ya ku em dikarin bibêjin ew e ku ev îdîa ne rast e... Bi ser de jî, ji ber ku di tercîhên xwe yên ecêb de bi israr e, Ewropa difikire ku me rizgar dike dema ku ew me hemûyan vediguherîne Almanîyên ji wan tê reqabetê bikin. Lê belê, xuya ye nabîne ku stratejîyên rekabetkerî-buha ne kooperatîv in û bi tenê heke yekalî bin kar tînin û herweha nabîne ku giştîkirina van stratejîyan betalkirina bandora wan a li ser herkesî ye.

Lê ev hemû zêde girîng nînin: Ya herî girîng ew e mirov bibêje "hêza reqabetê". Ev jî destûrê dide ku mirov hem êrişê bibe ser mûçeyan û hem jî berdarîyê, ango bi awayekî potansîyel tevahîya şertên –darayî, huqûqî, peymanî, hevrikî û maddî yên– karî. Vê hemûyî êdî di hewayekî misêwa ya kontrola piralî (8) de bi bahaneya "hevkarîyê" dikin. Bi zimanê daxuyanîyên ewropî yê nû çi qasî hatibe bê alî kirin jî, êdî jê nayê ku niyeta xwe ya bi rastî zêde veşêre. Şirove zelûl in ji bo fêmkirina hevokên weha: "*Buhayê karkerekî wê bibe mijara kontrolekê";* "*ji nû ve di ber çavan re derbaskirina mekanîzmayên diyarkirina mûçe û heke hewce bike ji nû ve di ber çavan re derbaskirina asta navendîkirina pêvajoya hevdîtinan û herweha mekanîzmayên îndekskirinê*"; "*çavdêrîya tiştê ku peymanên diyakirina mûçe di beşa dewletê de destekê didin hewldanên rekabetkerîyê yên di beşa taybet de*"; "*lihevkirina li ser hewldanên taybet ên ji bo başkirina pergala perwerdeyê*"; "*Qabiliyeta pêkhatinê ya teqawîtbûnê, guhdana tenduristîyê û xizmetên civakî*". Di bin niyeta wan a têra xwe qelp re ev hunerên bi peyvan veşartina rastîyê jî nikare asteng bike ku dinyayeke bi tevahî zelal li ber çavên me be.

Fînansên dewletê û hêza rekabetê: Fikrên sabit yên paşveçûna aborîyê

"Fînansên dewletê" –yên ku destûrê didin dewleta civakî pêk were– û "hêza rekabetê" –ya ku bandorê li qadên jîyana mûçegirîyê tevan dik –, timî du girrên (fikrên sabit ên) paşveçûna aborî ne. Di vê raporê de danezana Eurogroupeyê ya 11ê adarê dibe ku nivîsa herî êrişkar be ya ku me ji mêj ve nedîtibû. Ka em bi dorê behsa pirsgirêkan bikin. Girêhişka "ji nû ve danîna tewazûnê bi riya hişkbûnê" bixwe li ser mirovî ferz dike ku li çareyên din bigere. Di dema kurt de, pêşî bi îpoteza nehiştina deynî heye ku divê bê guman di nav alternatîvên mirov dikare pêş bibîne de cih bigre. Tehlûkeya teqîna beşa bankeyan a ku wê piştî kêmasîyekê yan jî gelek kêmasîyên girîng ên bi hev re bide der, bi awayekî misoger rast e. Hemin, vê carê, piştî ku beşa bankeyan ket, dibe ku mirov derfeta desteserkirina bi riya dewletîkirinê bibîne (9). Ev operasyon wê hîç zirarê li fînansên dewletê neke (Camdessus wê jê razî be) û ya rastî bi tenê ew dikare pêvajoyeke nûkirina bi tevahî ya tevnên bankeyan-fînansê bide dest pê kirin, ya ku êdî xuya ye ne xema tu kesî ye. Lê belê krîza ewropî ya deynên bi kefîl [dewlet yan jî bankeyên navendî kefîl in], bi taybetî vê pirsa dema navîn derdixe pêş: Veguherîneke kûr ya navgînên fînanskirina lihevderneketinên budceya dewletê, weke ku statuya bi rastî ya "pirsgirêka" ajansên notdayînê bi bîr dixe.

Tevahîya hestên skandalan ku ew bi awayekî rewa dikin ku derkevin holê, ev dîsa jî pirsgirêkeke bi awayekî mutleq talî ye. Em pê dizanin ka biryarên ajansan ên kêmkirina notan çiqasî destekê didin bêserûberbûnên bi tehlûke yên bazarê, ku muheqeq di pey re bernameyên kemberşidandina aborî bêhtir tên şidandin. Lewra nîqaşa li ser ajansan hê nîqaşa di çarçoveya mentiqê bazaran û fînanskirina bi riya bazaran de ye. Heke bazar bi bawerî û fikra mirovan dixebite, ajansên notdayînê wê timî mexlûqên pêwîst bin –yanî: Yên ku bivênevê wê derkevin holê. Lewma ev mentiqê dabeşkirina karê finansorîyê bixwe ye ku dike aktorên di hilberîna hukman de bispor derkevin holê ji bo civakeke ku bi van hukman (yên li ser nirxê hisseyan ê siberojê) dijî. Heke em biryarê bidin sê "mezinan" (10) bigrin, berîya şeş meh di ser re derbas bibûna wê hin ajansên din şûna wan bigirtana. Lê belê biryarên ajansan (bê guman) tesîrên xirab dikin bi tenê ji ber ku ew tavilê vediguherin tevgerên bi destê operatorên *bazaran* piralîbûyî.

Ango pirsa ajansan hema hema bi qasî ya pîvanên hesabdaran talî ye. Her du jî bi tenê di nav mentiqê bazarê de xwedî wate ne, tevî ku ev mentiq bixwe ye yê ku divê mirov lê dudil bibe û bixe ber jêpirsînê. Çawa ku em li awayên din yên fînanskirina dewletê bifikirin, pê re ev pirsgirêkên qelp ji holê radibin. Ya ku em behsa wê dikin tam jî babeta bi rastî ya rewşa heyî ye. Vê jî diviyabû têra xwe sergêjîyên tirsnak ên fînanskirina lihevderneketinên budceyî -ev fînanskirin ji alîyê bazaran ve tê miso-

gerkirin û kontrolkirin- piştrast bikira da ku em karibin li çareyeke din bifikirin –weke mînak çalakkirina fînanskirina darayî (ji alîyê bankeya navendî ve) û/yan jî seferberkirina danehevên xaneyan, lê belê bi riya tevnên dezgehî yên derveyî bazarê. (11)

Almanya ji ber ku aborîya wê mezin nabe, mesrefa deflasyona mûçeyî bi hevalên xwe yên ewropî dide dayîn

Em vegerin ser babeta hêza reqabetê, bi rastî jî divê mirov xwedî mentiqekî berteng be da ku hêza reqabetê bi tenê ji alîyê buhayê mûçeyî ve bibîne û tu caran ji alîyê kura dovîzan ve nebîne. Dîsa jî divê alman xwedîyên fikrekê bin, lewra ew baş pê dizanin ku derketina ji herêma euroyê ya muhtemel wê bike ku nirxê markê wan ê nû pir biguhere... û avantaja reqabetkerîya dehsala wan a xweş a deflasyona mûçeyî jî wê bi carekê ji holê rabe. Li alîyê din, John Maynard Keynes bi projeya xwe ya "Yekîtîya tezmînê ya navneteweyî" (*International Clearing Union*, ICU) şemayeke bi mentiq a birêvebirina dahat û lêçûnên bazirganîyê û kurên dovîzan ji zû ve pêşkêş kiribû. Şertê bingehîn ê vê şemayê ew e ku bazarên malî bixwe ji wan nayê ku sererastkirinên *bi rêk û pêk* bikin –heyf û mixabina serdemekê ku tercîh kir her tiştî bispêre wan. Lewma divê li şûna bêserûberîyên ku bi awayekî pergalî bazaran bê îstîqrar dikin, mirov pêvajoyên sazûmanî û siyasî yên rastkirina newekhevîyan tercîh bike.

ICUya keynesî awayekî fînanskirina dahat û lêçûnên lihevderneketî yên balansên peredanê pêşniyaz dikir. Lê belê, wê herweha mekanîzmayên *sazûmanî* yên sererastkirinên kurên dovîzan jî pêşniyaz dikir. Kotayeke lihevderneketina budceyê yan jî mayeyê bazirganîyê didin her welatî. Heke çaryeka vê kotayê bê bihurandin, hingê welatekî budceya wî li hev derneketî, mafê wî hebû ku nirxê pereyê xwe % 5 û heta jê û wê de jî, kêm bike. Lê belê, nûbûna mezin a ICUyê ew bû ku bike welatên budceya wan li xwe zêde dike, destekeke yekser bidin. Qamçîkirina bi reqabetkerîyê ya tevlî bermahîyên merkantîlîst dikarîbû lixwezêdekirina bazirganîyê weke nirxekî guman jê neyê kirin, bide qebûl kirin. Lê ya rastî lixwezêdekirin para bêhtir encama stratejîyeke nekooperatîv, ya avantaja hevrikîya yekalî ye ku ji kîsê yên din tê bi rê ve birin –çawa ku Almanya ji ber ku aborîya wê mezin nabe, mesrefa deflasyona mûçeyî bi hevalên xwe yên ewropî dide dayîn. ICU li welatên budceya wan li xwe zêde dike pergaleke backirinê ya her diçe zêde dibe, tetbîq dike. Ev pergal li gor sînorê lixwezêdekirinan yê diyarkirî ye da ku stratejîya wan a yekalî paş ve biçe û wan ji bo zindîkirineke aborîyê teşwîq bike da ku dahat û lêçûnên wan ji nû ve ahengdar bike û di heman demê de rewşa lihevderneketinên budceyî (û mezinbûna aborî) ya hevalên wan baştir bike.

Em ê îtîraz bikin ku her projeya dêvaluasyonê muheqeq bi bahozeke darayî bi dawî tê

Em ê li ber rabin û bêjin, ne sererastkirinên bi armanc ên biryara wan li buroyên hikûmetan hatine dayîn, belê êdî bazar in ku kurên dovîzan diyar dikin. Em ê herweha îtîraz bikin ku her projeya dêvaluasyonê muheqeq bi bahozeke darayî bi dawî tê. Ji ber vê yekê divê sererastkirinên li bazaran bên kêm kirin! ICU qet nikaribe bikeve şûna bazara global a pêvguherînan jî ew dikare modela xwe pêşniyazî eurozonekê [herêmeke euroyê] bike ku wê li gor şemaya pereyekî hevpar ê du qonaxên wî hene, bixebitiya (12): Pereyê hevpar ji bo têkilîyên darayî yên bi derve re, lê belê wê li hundir destûrê bide binavkirinên pereyên neteweyî yên ku parîteya [nirxê li gor pereyê welatekî din] wan êdî ne mecbûr e sabit be, belê parîteya wan dikare li gor mekanîzmayên *bi tevahî siyasî û sazûmanî* yên weke ICUyê bê sererast kirin. Em bi awayekî aşkere bibêjin, pereyekî wisa yê hevpar bi tena serê xwe wê nikaribe mûcîzeyên mezinbûna aborî bi riya îxrackirinan çêke: Bi tenê 120 mîlyar dolarên ku budceya alman li xwe zêdekirî hene (13) yên ku dikarin li tevahîya herêma euroyê bên belav kirin... Lê belê qet nebe di vê pêvajoya em tê de, ev pereyê hevpar diviyabû hin qadên azadîyê yên xweş pêşniyaz bike, ango derfeta dêvaluasyonê û peydakirina alternatîvên mezinbûna aborî –yên ji wan tê ku bikin deynê dewletê bê hilgirtin (15) –bide welatên ku krîza ewropî li wan destpêkirî: Yewnanîstan, Portekîz û Îrlanda, bazirganîya her sêyan jî li hev dernakeve [kirîna wan ji firotina wan bêhtir e] (14). Xulasa, berîya her tiştî, wê dê destûr bidaya guhertinên bikok ên awayê fikr û birêkûpêkkirina hêzên reqabetker ên nisbî yên di nav Yekîtîyê de. Bi vî rengî, wê dê em *bi rastî* ji nexweşîya vegir a paşvebir a "peymanên ji bo euroyê" rizgar bikira.

Senaryoyeke parçebûna herêma euroyê weke di kanûna bihurî de mumkin e

Mirov wê bibêje qey ev pêşniyaz hemû di xewn û xeyalên li ser piyan de ne û di şertên îroj de tu şansê wan nîne ku pêk bên. Ev rast e jî! Lê belê dibe ku şert bixwe jî biguherin. Jê re dwanzdeh yan jî hijdeh meh divên ku ev kelevajîtîya Hişkbûna Giştî derkeve holê û ku hayê bazaran bi tevahî jê çêbe, lewra rêjeyên deynan/HHN (Hilberîna Hundir a Nesade) wê zêdebûna xwe ya kes nikare xwe li ber bigre, dewam bike. Hingê, EFSF wê bi derfetên pir jî nikaribe kêmasî û şaşîyên di heman demê de derdikevin holê, telafî bike. Ev kêmasî û şaşî encamên rêjeyên faîzê yên bê serûber in. Ji bo bloka (herêma euroyê) ku wê ji girrên (fikrên sabit ên) alman rizgarbûyî be, rûpelê dîrokê ji nû ve wê nereşkirî be û derfeta wê çêbe ku *bi awayekî din* ji nû ve ava bike.

* Aborînas. Nivîskarê hewldana bi navê D'un retournement l'autre (Ji berepaşbûneke din). Komediyeke/Şanoyeke ciddî li ser krîza malî, çar perde ne û bi wezna 12 kiteyî (alexandrin) hatiye nivîsîn, weşanên Seuil, Parîs, wê 5ê gulana 2011ê çap bibe.

1 Pevkelîna peyvên *rigueur* (hişkbûn) û *relance* (ji nû ve zindîbûn)

2 "Réaliser l'objectif constitutionnel d'équilibre des finances publiques " [" Pêkanîna armanca destûrî ya tewazûna finansên dewletê"], rapora Koma Xebatê ya ku Michel Camdessus ew bi rê ve dibir, 21ê hezîrana 2010ê, rûpel 4

3 Di pêşniyaza Camdessus de, li gor Destûra Bingehîn a ku di statuya qanûna organîk de ye, Qanûna çarçoveya programasyona finansên dewletê (LCPFP) di ser qanûnên finansê yên besît re ye, dikare armanca wan a zarûrî ya tewazûnê ji bo demekê diyar bike

4 *Heman çavkanî*,rûpel 36

5 Guhertoyeke hindikî nermkirî ya vê peymanê di civîna bilind a Eurogroupeyê ya 11ê adarê de di bin navê "Peymana ji bo Euroyê" de hat pêşkêş kirin

6 Li deverên ku hê lê heye: Li Portekîz, Belçîka û Luksembûrgê

7 Dawîya 2010ê. Di 2007ê de % 85.4 bû (Daneyên Înstîtûya Neteweyî ya Statîstîk û Lêkolînên Aborî)

8 "Çarçoveya nû ya kontrola makroekonomîk", danezana Eurogroupeyê, 11ê adara 2011ê

9 Der barê vê fikra ku bi awayekî hişk li vir behsa wê hat kirin, ji bo agahîyên zêdetir li çavkanîya jêr binihêrin: "Sauver les banques: jusqu'à quand?" ["Bankeyan rizgar bikin: belê heta kengî?"], *La pompe à phynance*, http://blog.mondediplo.net

10 Standard&Poor's, Moody's, Fitch

11 Binihêre li "Commencer la démondialisation financière" ["Destpêkirina Jihevxistina Globalbûna Malî"], *Le Monde Diplomatique*, gulana 2010ê

12 Li gor pêşniyazeke ku Aurélien Bernier jî kir, *Désobéissons à l'Union européenne [Guhnedana Yekîtîya Ewropayê]*, Mille et une nuits, Parîs, 2011, û Jacques Sapir, *La démondialisation [Jihevxistina Globalbûnê]*, Seuil, Parîs, 2011

13 Daneyên *Eurostat* 2009

14 Li gor hesabên carî yên sala 2009ê her yekî %11, %10.31 û %2,94ê HHNyê (Hilberîna Hundir a Nesade)

15 Berevajî vê, weke ku bi sedema "mezinbûna nekafî" li pey hev kêmkirina nota portekîzî jî nîşan dide.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê



Ismet Polatli: **Ronahîya geş**, boyaxa rûnî li ser kartonê, 50 x 70 cm



Ismet Polatli: **Şanaz**, boyaxa rûnî li ser kartonê, 50 x 70 cm



Ismet Polatli: **Nîvxewî**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 70 x 100 cm

www.kurdishmedia.com

Serhildanên ereban, alozîya li lîbyayê

Davikên şerekî

Serge Halimi

Saeteke xerabe jî rojê du caran demê rast nîşan dide. Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, Fransa û Qralîyeta Yekbûyî ya Brîtanyayê herçendî ketibin nav hewldana wergirtina biryarnameyekê ku destûrê dide wan ku li dijî rejîma Libyayê zorê bi kar bînin, dîsa jî ev yek têrê nake ku hê ji serî ve hewldana rojavayî red bike. Tevgereke gel a bêçek û li dijî rejîmeke terorê carna neçar dimîne ku xwe bavêje himbêza polîsê navneteweyî yê ku mirov kêm dikare salox bide. Tenê ji ber ku polîsê navneteweyî guh nedaye bangên qurbanên li welatên din, bi taybetî jî yên filistînî û bahreynî, ev tevgera bi derdê xwe de ketî, wê alîkarîya jê re bê pêşkêş kirin, red neke. Ew ê ji bîr bike ku polîsê navneteweyî ji komeleyeke alîkarîyê bêhtir hêzeke zextûzorê ye.

Lê belê, tiştê, bi awayekî mentiqî ji bo serhildêrên lîbyayê yên di xeterê de bûye rênîşandêr, têra rewabûna vî şerê hêzên rojavayî yê li ser xaka ereban nake. Desttêwerdana welatên endamên Rêxistina Peymana Atlantîk a Bakur NATOyê ne rêyeke mafdar e ji bo xwegihandina encama tê xwestin (ji desthilatdarîyê xistina Mûammer Qedafî). Eger bi vê rêyê statuyeke diyar hatibe bi dest xistin –li ser her kesekî bi awayekî tê ferz kirin ku di navbera bombebaranên rojavayî û perçiqandina serhildêrên lîbyayî de "tercîhekê" bike, ji ber ku rêyên din ên ji bo çareserîyê – desttêwerdana artêşên Neteweyên Yekbûyî, misirî an jî welatên ereb ve– hatine berkevî kirin.

Lê belê bîlançoya berê ya artêşên rojavayî nahêle ku mirov ti îtîbarekê bide bahane û îdîayên wan ên mezin ku xwe pê dipesinînin. Ma jixwe kî bawer dike ku dewlet, kîjan dibin bila bibin, çavkanî û artêşên xwe dixin bin xizmeta pêkanînên xwedî armancên demokratîk? Dîroka nêz jî jixwe bi me dide zanîn ku şerên xwe dispêrin bahaneyeke wisa, serkeftinên pir zû û mezin ên medyatîk bi dest bixin jî, qonaxên wan ên duyem pir aloztir, xetertir û meçhûltir in. Li ***Somalî, Afganistan*** û ***Iraq***ê ti caran dawî li şer û pevçûnan nehat, herçendî paytextên wan ***Mogadîşo***, ***Qabîl*** û ***Bexda*** bi salan e "ketibin" jî.

Serhildêrên lîbyayî wê hez bikirana bi tena serê xwe deshilata zalim hilweşînin, eynî weke cîranên xwe yên tunîsî û misirî. Desttêwerdana eskerî ya franko-anglo-amerîkî gefan li wan dixwe ku ew bikevin ber bextê hêzên ku qet jî ne xemxwirên azadîya wan in. Lê belê berpirsiyarîya vê istîsnaya herêmî bêhtir di stûyê **Qedafî** de ye. Bêyî zordarîyeke wisa giran a rejîma wî ya çil salên dîktatorîya dij-emperyalîst û despotîzma hevalbenda rojavayî, bêyî axaftinên wî yên hişk yên ku hemû muxalîfan dadixe asta *"ajanên El Qaîdeyê"*, *"sîxurên kirêkirî yên xizmetê ji îstîxbaratên bîyanî re dikin"*, qedera serhildana lîbyayî jî wê bi tenê di destê gelê vî welatî de bûya.

Biryar stargeha govendeke durûyan e

Biryara 1973yê ya Konseya Ewlekarîya Neteweyên Yekbûyî ya destûrê dide bombebarandina bi ser Lîbyayê de dibe ku nehêle serhildana ji ber nebûna derfetên eskerî xitimî ye û bi pêş nakeve, biperçiqe. Lê belê ev biryar herwiha stargeha govendeke durûyan e. Çunkî ne ji ber ku **Qedafî** xirabtirîn dîktator, an jî xedartirîn kujer e, ku artêşên wî hatin bombaran kirin; ji ber ku hem ji dîktatorên din qelstir e, û bêpar e ji çekên nukleer û dostên xurt ên karibin wî ji êrişeke eskerî biparêzin û li qadên navneteweyî piştevanîya wî bikin; ew rastî vê desttêwerdanê hat. Desttêwerdana li dijî wî weke biryar hatiye wergirtin, piştrast dike ku hiqûqa navneteweyî prensîbên zelal ên ku ceza li binpêkirinên li herderê bibire, ferz nake.

> Bi mehan e ku serhildanên li welatên ereban, kartên siyasî, dîplomatîk û îdeolojîk yên herêmê ber bi îstîqameteke demokratîk ve rê dikudînin. Zexta lîbyayî ev dînamîk tehdît dikir. Û şerê rojavayî yê ji alîyê Neteweyên Yekbûyî ve jî pêşî lê hat vekirin, berî çendekê li vê dîmenê daneyeke ku encamên wê şolî ne, zêde kir.

Ji purûpakkirina dîplomatîk bigire heta purûpakkirina diravî ev wisa ye: Fezîleta esasî dikare dawîyê li dehan salên bêrûmetîyê bîne. Serokê fransî ji ber vê yekê bombeyan dibarîne ser serê hevparê xwe yê qedîm yê kar ê 2007ê li cem xwe kiribû mêvan; tevî ku her kesî xwezaya rejîma wî baş nas dikir -divê spasîya **Nicolas Sarkozy** bê kirin, ji ber pêşniyarnekirina li **Qedafî** *"pêzanîna hêzên xwe yên ewlekarîyê"* a ku di meha çile de ji bo serokê tunisî **Zeynel Abidîn Alî** hatibû pêşkêş kirin… *"Dostê taybet"* ê rêberê lîbyayî yê ku yazdeh caran çû Romayê, **Silvio Berluskoni** jî, lingê xwe bi erdê ve bixişikîne jî dawîya dawî tevlî koalîsyona fezîletê dibe.

Piranîya kal û ixtiyarên ji ber pêlên demokratîk hatine red kirin, li navenda *Lîga Erebî* bi cih dibin; ev lîg jî dikeve nav livûtevgera Neteweyên Yekbûyî berîya ku xwe nerazî bide xuya kirin gava ku fuzeyên pêşî yên emerîkî tên avêtin. ***Rûsya*** û ***Çîn*** bi hêza xwe dikaribûn dijberîya biryara Konseya Ewlekarîyê bikin, û ji bo zirar û xeteran kêm bikin guherînan di biryarê de pêk bînin. Eger wan tiştekî wisa kiriba, ew ê, qet nebe, ji bikaranîna hêzê, paşî *"poşman"* nebûna. Nîhayet, ji bo pîvana heqîya "civata navneteweyî" di vî karî de, divê bê dîtin ku biryara 1973 ya Neteweyên Yekûyî ji ber *"desteserkirinên kêfî, windakirinên bi darê zorê, êşkence û komkujîyan"* Lîbyayê gunehbar dike û ev tiştên ku Lîbya pê tê sûcdar kirin, helbet ne li ***Guantanamo***, ne li ***Çeçenistan***ê ne jî li ***Çîn***ê hene… !

"Parastina sîvîlan" ne daxwazeke ji rêzê ya bêqusûr e. Ew her weha, di serdemên pevçûnên çekdarî de, bombebarana armancên eskerî, ango bombekirina eskeran jî (gelek caran sivîlên unîforme li wan kirî ne …) ferz dike, esker bixwe jî tevlî xelkê bêçek dibin. Li alîyê din, kontrola *"herêmeke ji firîna balafiran re qedexekirî"* tê wê wateyê ku balafirên li ser wê herêmê dewriye digerin, dikarin bên hingaftin û pîlotên wan bên girtin, û ev jî wê maf bide komandoyên bejahîyê yên ku ji bo rizgarkirina wan wê bikevin nav livûtevgerê. (1) Mirov dikare li gor dilê xwe ferhengeke pak bi kar bîne, lê mirov nikare hertim şer bi edebî kelam bîne ziman.

Halbû ku di tahlîla dawî de ne kesên ku xeyal dikin ku şer wê kurt û xweş be û ji ber wê yekê wî pêşniyar dikin, lê belê kesên biryara şer didin û wî dimeşînin xwedîyên şer in. Mirov dikare planên şahane yên şerekî bê kîn û nefret û bê "bela" li cem xwe amade bike, lê belê hêza eskerî ya ku bicihanîna vê wezîfeyê lê tê spartin, wê vê wezîfeyê li gorî şêwaz, rêbaz, xuy û daxwazên xwe bimeşîne. Ango mirov dikare bibêje ku cesedên eskerên lîbyayî yên di dema vekişînê de hatine gulebarankirin jî, eynî weke qelebalixên bikêf ên ***Bîngazîyê***, encamên biryara 1973 ya Neteweyên Yekbûyî ne.

Hêzên pêşverû yên tevahîya cîhanê li ser mijara Lîbyayê li hev nekirin. Hinan bal kişand ser pêwîstîya piştgirîya ji bo gelekî li bin zilmê, hinên din jî dijberîya şerê rojavayî girîng nirxand. Nirxandinên her du alîyan jî rast û biheq in. Lê belê mirov nikare îdîa bike ku di herduyan de jî ti kemûkasî tunene. Ya dimîne ew e ku dema mirov neçarî tercîhekê bibe, ku were dest nîşan kirin ka etîketa "dij-emperyalîst" a di qada navneteweyî de hatiye bi dest xistin, wê li qada hundir gel bi kîjan pêkanînan re rû bi rû bihêle.

Li gel bêdengîya gelek hikûmetên çep ên Amerîkaya Latîn (***Venezuela, Kuba, Nîkaragua, Bolîvya***) a têkildarî zexta ku **Qedafî** fermana wê daye, mirov matmayî dibîne ku dijberîya rêberê lîbyayî ya li himberî rojava, ne jidil e. **Qedafî** piştî ku temînatê dide hêzên berê yên kolonyal ku *"em hemû li dijî terorîzmê di nav heman şer û têkoşînê de ne. Servîsên me yên îstixbaratê hevkarîyê dikin. Me di salên dawî de gelek alîkarî da we*" (2), niha jî îdîa dike ku ew dibe mexdûrê *"komployeke kolonyalîst"*.

"Êrişa li dijî Lîbyayê dilbijîna kontrola petrolê ye"

Dîktatorê lîbyayî eynî weke **Hugo Chavez**, **Daniel Ortega** û **Fidel Castro**, îdîa dike ku êrişa li dijî wî, tê wateya dilbijîna *"kontrolkirina petrolê"*. Halbû ku ev petrol ji alîyê şirketên amerîkî-rojavayî yên weke BP û îtalî ENI *(li ser vê mijarê nivîsara Jean-Pierre Serenî bixwînin, rûpel XXX*) ve ji mêj ve jixwe tê kontrol kirin. Berî çend hefteyan, Fona Diravî ya Navneteweyî (IMF) jî silav dida *"hêza performansa makroaborî ya Lîbyayê û pêşketinên wê yên ji bo xurtkirina rola sektora taybet". (3)* Li dostê **Qedafî, Ben Alî** jî di mijdara 2008ê de îltîfatên bi heman rengî hatibûn kirin, lê belê yê ev îltîfat kirî gerînendeyê giştî yê IMFê, **Dominique Strauss-Kahn** bixwe bû, ê ku hê nû ji Trablusê vedigeriya. (4)

Kirasê kevnare yê şoreşgerî û dij-emperyalîst ê Qedafî, yê li ***Karakas*** û ***Havanayê*** venûkirî, ji alîyê **Anthony Giddens**, teorîsyenê "rêya sêyem" blairîst ve, nehat dîtin. Ev kesê di 2007ê de îlan dikir ku Lîbya wê pir di nêz de bibe *"Norwejeke Afrîkaya Bakur: Halxweş, wekhevîxwaz û xwedî paşerojeke ron". (5)* Eger ew bi lîsteya pir pînekirî ya mexdûrên xwe dûrî bîrûboçûnên gel pêk tê. Gava ev dîplomasî, weke ku li Konseya Ewlekarîyê hat dîtin, xwe bi parastina demokrasîyê bi rêya şer, dipesinîne, nakokî hê beloqtir dibe.

Piştî bikaranîna, ne bêserkeftin, damarê jeopolîtîk yê dijrojavayî, palpişta pêşverû ya parastina çavkanîyên xwezayî, rêveberê lîbyayî li himberî hewldana tehdîda karta dawî ya pevçûna navbera olan, nekarî demeke dirêj li ber xwe bide. Wî di 20ê vê adarê de ev rewş wiha îzah kir: *"Hêzên mezin ên xiristiyan li dijî gelên misilman, bi taybetî jî li dijî gelê Lîbyayê şerekî duyem ê seferên xaçperestîyê daye dest pê kirin û armanca wan jiholêrakirina îslamê ye"*. Balkêş e ku hê sêzdeh rojan berîya vê daxuyaniyê, Qedafî zextûzora xwe li gel ya hukûmata Telavîvê ya li dijî filistînîyan muqeyese kiribû û gotibû: *"Îsraîlî bixwe jî li Xezeyê neçar man ji bo têkoşîna li dijî radîkalên wisa tank û topan bi kar bînin. Em jî bi heman rewşê re rû bi rû ne..* [...] *Yekîneyên artêşa Lîbyayê jî neçar man li dijî komikên piçûk ên El Qaîdeyê şer bikin". (7)* Helbet ev yek bi kêr nehat ku rêber li cîhana ereb zêdetir were destek kirin.

Ne dijayetîya Rojava, ne jî xizmetkarîya ji bo Rojava

Lê belê di vê nakokîya dawîyê de qet nebe fezîletek heye. Ew bi awayekî bala mirov dikşîne ser xirabîya siyasî ya nîqaşa ku, bi berevajîkirinê, mijarên neo_mihafezekar yên seferên xaçî û împaratorîyan ji nû ve hildiberîne. Serhildanên ereban, ji ber ku laîk û oldar di nav hev de ne –û dîsa ji ber ku laîk û oldar tê de dijberîya hev dikin– dibe ku bibin sedema lêxistina zengilê nîqaşeke ku xwe dij-emperyalîst îlan bike, tevî ku di eslê xwe de ew bi tenê dij-rojavayî ye. Û ew di nefreta xwe ya li himberî "Rojava" de li şûna tercîha herî baş, – elsefeya ronahîyên ji bo ewlekarîya civakî–, tercîha herî xirab dibijêre –siyaseta darêzorê, biçûkxistina gelên "xwecih", şerên navbera olan.

Du salan piştî şoreşa îranê ya 1979ê, ronakbîrekî tundrew ê sûrî Sadik **Celal El-'Ezm** rewişt û xuyên *"orîyantalîzmeke berepaş"* hûr û kûr îzah dikir. Li gor vî ronakbîrî, orîyantalîzma berepaş rêya neteweperestîya laîk û komunîzma şoreşgerî red dike û bi vegera nav xweserîyeke olî têkoşîna li dijî Rojava datîne ber xwe.

Bi kurtî ravekirina, weke ku **Gilbert Achcar** ew kir, prensîpên bingehîn ên vê orîyantalîzma berepaş dihêle ku mirov tê derxe ku pêla şokê ya li ***Tunis***ê xwe da der, nêrînên heta niha serûbinî hev kirin: *"Radeya rizgarkirina Rojhilat nabe û divê nebe ku bi nirx û pîvanên "rojavayî" yên weke demokrasî, laîsîzm û azadbûna jinan were dest nîşan kirin; nabe û divê nebe ku Rojhilatê misilman bi amûrên epîstemolojîk ên zanistên rojavayî bê nirxandin; ti analojîyeke li gel diyardeyên rojavayî,*



Ismet Polatli: **Razber II**, boyaxa rûnî li ser kartonê, 50 x 70 cm

www.kurdishmonde.com

ne darizîneke li cih û maqûl e; ji ber ku egera ku girseyên misilman dixe nav coş û heyecanê çandê, ango olî ye, û girîngîya wê wêdetir e ji ya van egerên aborî û civakî yên ku dînamîkên siyasî yên rojavayî weke şert dertînin pêş; yekane rêya welatên misilman ber bi ronesansekê ve di îslamê re derbas dibe; herî dawîyê jî, tevgerên ku ala "vegera li îslamê" hildigrin, ne kevneperest, ne jî paşverû ne, berevajîyê ku bi berçavka rojavayî tên dîtin, bi berxwedana xwe ya li himberî serdestîya çandî ya rojavayî ew pêşverû ne". (8)

Vîzyoneke wisa radîkal û tundrew a siyasetê dibe ku hê gotina xwe ya dawî negotibe, lê belê tevî vê yekê jî mirov pê dihise ku guncîna wê ji alîyê gelên ereb ve hatiye nîşan dan. Gelên ereb nema dixwazin bikevin rewşa *"ne dijîtîya Rojava, ne jî xizmetkarîya ji bo Rojava" (9)* û vê yekê geh bi hedefgirtina hevalbendekî ***Dewletên Yekbûyî (Misir),*** geh jî bi hedefgirtina yek ji dijberên ***Dewletên Yekbûyî (Suriye),*** îspat dikin. Hê jî pir dûr ji xem û gumana parastina azadîyên şexsî, azadîya bîrûbawerîyê, demokrasîya siyasî û sendîkaparêzî ku pir girîng in ji bo prensîbên "rojavayî" yên boyaxkirî bi unîversalîzma rizgarker, gelên ereb bêhtir ketine nav livûtevgereke nîşandana helwesta xwe ya redkirina desthilata ororîter, bêedaletîya civakî, rejîmên polîsî yên ku ji alîyê ixtiyaran ve tên bi rê ve birin û gelên xwe biçûk dikin. Ev rewşa ku pêlên din ên mezin ên şoreşgerî tîne bîra mirov, ev rewşa ku roj bi rojê ji bo bidestxistina mafên civakî û demokratîk zemînekê diafirîne ku li deverên din êdî bi piranî dev jê hatiye berdan, *(nivîsa di çarçoveyê de bixwînin*), gelên ereb bi coşeke mezin, zendûbendên xwe badidin, hem jî li demeke wisa ku ji mirov kirî ku "Rojava" parve bûye; di navbera tirsa xwe ya hilweşînê û tiralîya xwe ya li pêşberî pergala siyasî ya rizîyayî de ya ku tê de şibihîn li pey eynîbûnê tê û timî xizmeta heman kesan dike.

Tu delîleke berbiçav tuneye ku ev coş û cesareta ereban, wê bi hêsanî û berdewam serkeftinan bi dest bixin. Lê belê ew ji niha ve derfetên venedîtî, ji bo me dertînin holê. Xala 20ê ya biryara 1973 a ***Konseya Ewlekarîyê ya Neteweyên Yekbûyî***, bo nimûne, misoger û ferz dike ku ev xal *"bi biryardarî dide xuya kirin ku desteserkirina hebûnên* [lîbyayî] [bi pêkanîna biryareke din a ku berê hatibû wergirtin] *wê di qonaxeke din de bê bi cih anîn, û demek ji ya din zûtir, ev hebûn wê ji bo gelên komara ereb a libyayî werin terxan kirin û ji bo berjewendîyên wan wê bên bi kar anîn"*. Bi vî awayî, mumkin bû ku hebûnên diravî bên desteser kirin û radestî welatîyên welatekî bên kirin… Ev çend meh in, cîhana ereb carna du dersên wiha gerdûnî tînin bîra mirov: Hêza gelan heye ku li dijî dewletan rabin; hêza dewletan heye ku gelan kêfxeş bikin.

1 Der barê mijarê de, *nivîsa* Philippe Leymarie *bixwîne*, "Libye, les enjeux d'une zone d'exclusions aérienne (Lîbya, kozên herêmeke ji firînên balafiran xalîkirî)", http://blog.mondediplo.net/2011-03-07-Libye-Exclusion-disent-ils

2 Hevpeyvîna di *Journal du dimanche* de, Parîs, 6 adar 2011

3 "Le FMI tresse des lauriers à Kadhafi (IMF ji bo Qedafî xelatên defneyan dihone), *Le Canard Enchaîné*, 9 adar 2011)

4 Binêre li http://www.dailymotion.com/video/xgkt4x_strauss-kahn-ou-le-genie-du-fmi-soutient-ben-ali_news

5 Anthony Giddens, "My chat with the colonel (Sohbeta min bi Albay re)", *The Guardian*, London, 9 adar 2007

6 25 sibat 2011. http://www.aporrea.org/actualidad/n175812.html

7 France 24, 7 mars 2011, http://www.dailymotion.com/video/xhey3a_interview-de-kadhafi-07-03-2011-pour-france24-part-2-2_news

8 Gilbert Achcar, "L'orientalisme à rebours : de certaines tendances de l'orientalisme français après 1979 (Orîyantalîzma Berepaş: Hin meyilên orîyantalîzma fransî piştî 1979ê) ", *Mouvements*, n°54, 2/2008, La Découverte, Parîs

9 *Cf.* Alain Gresh, "ce que change le réveil arabe (tiştê bi hişyarbûna ereban diguhere)", *Le Monde diplomatique*, adar 2011. Di axaftineke 19ê adara bihurî de sekreterê giştî yê Hizbullaha libnanî Hasan Nasrallah hizir dike ku "tevahîya îdîayên dibêjin Amerîka van şoreşan (yên ereb) çêdike, bi rê ve dibe, provoke dike yan jî dide dest pê kirin, niheqîya li van gelan e û şaş in

Wergera ji fransî: Baran Nebar

Huner çi ye?

Evelyne Pieiller

Platon, gava Bajarê Îdeal teswîr dike, dixwaze ku helbestkar tê de nebin, ji ber ku ji bo tehrîqkirina hestan behreyeke wan ya nebixêr heye, lê ne ji bo bihêzkirina mentiqê. Jean-Jacques Rousseau, teorîsyenê *Contrat social* [*Peymana Civakî*] ya berî şoreşê, di *Lettre à d'Alembert sur les spectacles* [*Nameyek bo d'Alembert Derbarê Numayîşan de*] ya xwe de piştgirîyê dide qedexekirina şanoyê li Cenevreyê û pêşniyaz dike ev hunera gendel nemîne ku *"ruhên xayîn pîj dike"*. Di her du nimûneyan de, hewl ew e ku rola hunerê li gor bikêrîya wê ya siyasî an jî exlaqî bê dest nîşan kirin. Bê guman di cîhana îro de ev fikir dê gelek reaksîyoner û bê palpişt bêne dîtin: Kî dikare azadîya tekmîl a hunerê bixe jêr pirsiyaran, çawa dê were qebûlkirin ku krîterên derveyî krîterên hunerî nirxê berhemekê dest nîşan bikin? Nirxandin û hukimpêdana hunerê li ser bingehê peyama wê û qencîyên wê yên civakî, ne tenê dê bibe sebebê jêstandina azadîya wê ya bingehîn, belkî dê wê ji rih û binetarên wê ve xerab bike: Huner hesabê bi tenê dide xwe, wekî din tu hesabên wê yên danê nîne.

Di zahir de ev munaqeşe bi dawî hatiye, lê qet wisa nîne: ji bilî sansûra vir de û wê de ji bo gihiştina bi bawerîyan, gihiştina bi exlaqekî qenc û hwd., pirsiyarên li ser rola hunerê hene û bi awayekî kêmrengtir di wan daxwazan de xuya dibin ku arasteyî wan sazîyên "çandî" têne kirin ku heta duhî, piştgirîya li wan, ji ber rola wan a di bidestxistina azadî û demokrasîyê de meşrû dihate dîtin û îro bendewarî û rêya meşrûkirina wê piştgirîyê kartêkerîya wan a li ser "têkilîya civakî" ye, êdî tiştê em ji vê çemkê fam dikin her çi be. Helwêsta "elîtîst" an helwêsta "popûlîst"? Huner bo hunerê, an huner bo yê din? Tenê tercîhên mumkin di vir de ne. Lê belê ewqas ron û teqez nîne ka ev delîl û têgihiştina dualî ji mentiqekî qetî û bê reqîb tê, an berhemê avakirineke tarîxî û lêkdaneke îdeolojîk e.

Gengeşeya li dora berhemên Gustave Courbetê bû sebeb ku Emile Zolayê ciwan dijayetîyê li berhema (ku piştî mirina nivîskarî çap bûbû) Pierre-Joseph Proudhon bike, gelek alîyan dixe ber ronahîyê. Courbet ji Proudhon dixwaze ku jê re deqa kataloga pêşangeheke wî binivîse. (1) Di katalogê de pesnê Courbet hatiye dayîn û hunermend hatiye pîroz kirin ku huner aniye nav amê: bi gotinên Aragon zêde "realîst" û "materyalîst"e. Proudhon berê xwe dide pênaskirina huner û hunermendîya rastî. Bê tirs û bisteh e di gotinên xwe de. Gêzikekê dide ser dijîtîya di navbera realîzm û îdealîzmê de, lewre cextê lê dike ku mirov nikare rastîyê ji îdealê, objeyê ji nêrîna ku maneyê dideyê cuda bike. Ew pê de jî diçe ku hunermend "*pêwîst e di avakirina cîhana sosyal de beşdarîyê bike*", bi rêya pêşkêşkirina temsîleke îdealîst a xweza û mirovî, "*bi armanca duristkirina mukemelîya fîzîkî, entelektuelî û exlaqî ya mirovatîyê, meşrûkirina wê ya ji wê bi xwe û axirî pesindan û berzkirina wê*". (2) Bi pênavê sosyalîzma şoreşger, bi dilniyayî raya xwe dide ku têgihiştina huner-bo-hunerê ne tu tişt e. Pêwîst e bedewîya berhemê xeyala hunermendan xemil û xêzê li mirovî bike, û behre tu caran malê ferdan bi xwe nîne, belkî "*berhemê aqilekî cîhanî û zanisteke gişti ya danheva hejmareke mezin a hosta û şarezayan e, ku herweha xwe dispêre hejmareke warên din ên afirandinê yên xwartir*". (3) Hunermend jî, herçend xwedî wesfên cuda be, bi tu awayî ji karkerekî sertir nîne. Bê guman ev awayê bîrkirinê seyr û tûj e. Bersiva Zola qure ye, bi hêz e û bê guman pirtir nêzîkî seqaya roja me ye: "*îdeala me bi xwe, evîn û hestên me ne*" (4), ya girîng orîjînalî û derbirîna azad a ferdî ye, neku bikêrîya wan. Théophile Gautier ji mêj ve, di pêşekîya "Mademoiselle de Maupin" de diyar kiribû ku *"di rastîyê de tu tişt bi qasî wî tiştî xweş nîne ku bi kêrî tu tiştî nayê –devera herî kêrhatî di malekê de qedemgeh e"*... Dima dest nîşan bike ka orîjînalî di çi cîhetekê re dibe xisletekî hunerî. Di vê bareyê de cextê lê dike ku nabe nêrîn û nirxandina nîgarê bi mijara wê re bê bi sînor kirin. Lê, di wê heyama dawîya sedsala nozdehê de ku kapîtalîzmê şax vedidan û nirxên bûrjuwazîyê û tirsa cemaweran berbelav dibû, berî her tiştî ferdperwerîyê dide pêş. Lê belê, dixwast çi biçespîne gava beyan dikir ku ew, wek hunermend, hatiye ku "*[ya] herî berz bijî*"? Mafê rewnaq ê takîyê, ku beramber yeksanîperwerîyê dê meşrûiyetê bide hunerê, an bikêrîya nihênî ya krîstalîzasyona jiyanekê ku xemgînî û mezinîyan, hesas bidêre? Gelo ev neyartîyeke mutleq e, an jî, bîr û delîlên nivîserê wê her çi dibin bila bibin, berhem bi xwe nikare vê dijberîyê derbas bike? Lewre, her wekî Baudelaire digot, her estetîk di heman demê de exlaq û siyasetek e, cîhanbînî û hiyerarşîyeke nirxan e...

1 *Courbet Proudhon, l'art et le peuple [Courbet Proudhon, Huner û Gel]*, Sekoya, Besançon, 2010, 131 r., 24 euro

2 Pierre-Joseph Proudhon, "Du principe de l'art et de sa destination sociale (Extraits)" ["Ji Rêbaza Hunerê û Hedefa Wê ya Civakî (Nivîsên Bijarte)"], di *Pierre-Joseph Proudhon, Emile Zola, Controverse sur Courbet et sur l'utilité sociale de l'art [Pierre-Joseph Proudon, Emile Zola, Nîqaşa li ser Courbet û Feydeya Civakî ya Hunerê]* de, Mille et une nuits, Parîs, 2011, 175 r., 3,50 euro

3 Pierre-Joseph Proudhon, *Qu'est-ce que la propriété? [Mulkiyet Çi ye?]*, Le Livre de Poche, Parîs, 2009, 448 r., 7, 50 euro

4 Pierre-Joseph Proudhon, Emile Zola, berhema li jorê dest nîşankirî

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn



Ismet Polatli: **Mane**, boyaxa rûnî li ser kartonê, 30 x 50 cm



Ismet Polatli: **Lîstika rengan**, (detay) boyaxa rûnî li ser kartonê, 20 x 40 cm

Vejen, faktora herî girîng a pêşketina dinyayê

Christophe-Alexandre Paillard *

Krîza aborî û diravî ku dinya daye ber xwe carinan tiştên bingehîn dide ji bîr kirin: aborîya sedsala 21ê dê herdem û her ku biçe bêhtir girêdayî jêderên xwezayî be, ji ber ku di bin taqîb û giranîya, herçend bi sînor be jî, pirbûna nifûsa dinyayê û her weha jî hatina bi berdewamî ya hêzên nû û çînên navendî yên bi mesref a nav bazara dinyayê de ye.

Hîdrokarbur ango petrol, gaz û yên mayî, motora bivênevê ya aborîyên hevdem e…

Çil salan piştî Şerê Sar ê ji ber serdestîya tirsa pevçûneke Amerîka û Sovyetê, biheq neheq, gelek kes difikirin ku di dehsalên pêşîya me de, ji bo kontrola jêderên serekî yên vejenê, dinya dikare bibe şahida şerekî ku dê di navbera Amerîka û Çînê de derkeve. Hîdrokarburan ango petrol, gaz û yên mayî, motora bivênevê ya aborîyên hevdem, ger em giştbi hev re riyên kêmkirina para welatên mezin ên îro yên serfkerên wê ya di bilançoya vejena dinyayê de nebînin û rezerv an jêderên nû peyda nekin, ew ê bibe navenda nelihevkirineke weha.

Ev hejmara *Manière de voir* mezinahîya rîsk û tehdîda heyî, lê her weha jî şans û hêvîyên ku di salên bê de derkevin meydanê nîşan dide. Çi di warê têkilîya herêmên mezin ên serfker (bi taybetî jî Çîn, Japonya, Yekîtîya Ewropa yan Amerîka Bakur) ên jêderên gaz û petrolê yên Rusya û Asya navîn de be, çi jî di yê belavbûna berfireh û hesas a sîstemên nukler an di yê pêşketina aborîyeke global a kêmxur de be, vejen dê tam di navenda mijarên bi rîsk ên serekî yên vê sedsalê de be.

Beşdarîyên cihê nîşan didin ku serfkerên mezin bi rastî jî ne ew in yên em bawer dikin. (Internet beşekî mezin ê elektirîkê dixwe), ku ardûyên biyolojîk hîn ji dermanbûna her derdî pir dûr in, heta ku belavbûna wan dewam bike ji bo demeke dûr û dirêj tedarikkirina pêdivîyên kiştûkalî yên dinyayê tehdîd dikin. Her weha li cihê ku mirov dibêje qey tiştek naguhere, çawa ku devjêberdana hêdî hêdî ya nifûsa amerîkî ji awayê bikaranîna jêderên xwe yên vejenî jî nîşan dide hêvi heye. Anîna ber çavan a grafik û kartografîkan derfetê dide ku mirov rewşa pirsekê bi awayekî giştî, jeopolîtîk, darayî û civatî jî bibîne. Mirov tê digihîje ku tu mijareke rojane ya aborî yan dîplomatîk dê ji destê amadebûna çi bigire bi rik a vejenê rizgar nebe.

Rûsya hevalbenda ku nebe nabe ya Ewropa, Çîn û Japonyayê ye; lê Rojhilata Navîn navenda dinyaya petrolê ye

Fransa bixwe jî di vî warî de bi gelek kêmasîyên di vê hejmarê de pêşkêşkirî re rû bi rû ye: nûkirina bendavên wê yên hîdroelektrîkê, hebûna şirketên wê yên petrolê yên li Afrîka jêrsahrayî, li hemberî dijberên xwe yên çînî û amerîkî, tercîha bê tawîz a ji nû ve destpêkirina bernameyên nukleerî: tevî ku dizane dê reaktora ezmûnî ya termonukleer a navneteweyî (ITER) berî demeke dirêj nekeve bazara endustriyê jî, ji reaktora bi press a ewropî (EPR) wê de dikare çi bike? Entegrasyona wê ya di hîpotezeke siyasî ya ewropî ya hevbeş a vejenê de, dê hinekî jî girêdayî lihevkirina miheqeq netetmînker a bi saya serê Komisyona Ewropî û hevalbendên wê bidestxistî be. Ji sînorên şeşkuçî wê de, hin pirs dê bi berdewamî mijara vejenê rêk û pêk bikin: Rûsya hevalbenda ku nebe nabe ya Ewropa, Çîn û Japonyayê ye; lê Rojhilata Navîn navenda dinyaya petrolê ye.

Ev hejmara nû derketî ya *Manière de voir* him bilançoyekê, him tesbîtekê, him jî çarçoveya şiroveyekê pêşkêş dike ku di vî warî de bibe bingeha gotûbêjeke dûr û dirêj.

* Doçent Li Enstîtuya Lêkolînên Siyasî ya Parîsê û li Dibistana Netewî ya Birêveberîyê, lêkolînerê hevkar ê Unîversîteya Bernardo O'Higgins (UBO, Santiago, Şîlî) e.

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademir

www.aramekurdi.com

Dîmenê nepixandî yê elîta desthilatdarîyê

François Denord, Paul Lagneau-Ymonet û Sylvain Thine *

Georges Bérard-Quélin (1917-1990), rojnamevanekî sosyalîst ê radîkal, sala 1940ê berî bibe dildarê doza berxwedanê [Résistance a fransîyan li dijî nazîyan] sekreterê demî yê redaksîyona La France au Travailê, rojnameyeke Hevkar [a nazîyan] bû.

Di nav şerê sar de, sala 1956ê weşandina pirtûka Charles W. Mills a bi navê *Elîta Desthilatdarîyê* li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bû sedema niqaşên mezin ên fikrên dijber. Ya rastî vê pirtûkê aşkere dikir ku welatê diviyabû pirrengîya demokratîk bi gewde bike, di rastîyê de ji alîyê hindikahîyeke piçûk a ji ferdên li ser erk û wezîfeyên fermandarîyê yên sazîyên herî hêzdar ên civaka modern (dewlet, şirketên mezin, artêş, çapemenî û hwd.) rûniştî ve tê kontrol kirin. Vî civaknasî tê derxist ku "elîta desthilatdarîyê" nahêle ango pir zehmet dike ku mirov wê bi sînor bike: "*zilamên qadên jor di nava komeke 'çeteyan' de ne ku dikevin nav hev û di nav 'klîkan' de ne ku bi girêdanên tevlihev dibin yek.*" (1)

Di mehekê de rojeke çarşemê saet ber bi 20an ve, li holên dewlemend ên Klûba Otomobîlan a Fransayê elît ji bo şîva Le Siècle [Sedsal] li dora maseyê rûdinin.

Li Fransaya roja me ya îro, tişt bi awayekî zelal, hêsantir xuya dikin: Di mehekê de rojeke çarşemê saet ber bi 20an ve, li holên dewlemend ên *Automobile club de France* (Klûba Otomobîlan a Fransayê) elît ji bo şîva *Le Siècle* [Sedsal] li dora maseyê rûdinin. Li gor yek ji serokên berê yê vê komeleyê, şîva li wir nexweş e.(2) Jixwe, xwarin û germî ne xema tu kesî ne. Kesekî fêrî van şîvan bûye, serokê berê yê Saint-Gobainê Jean-Louis Beffa yê bû şêwirmendê bankaya Lazard, dibêje "*em ji bo desthilatdarîyê diçin şîva Le* Siècle".(3) Ne desthilatdarîya hilbijartî, ya din – ya rastî pireke fireh her duyan bi hev ve girê dide: ziyafetên pîroz li Place de Concordeyê (Meydana Concordeyê) pêk tên, Meclîsa Neteweyî jî hema li alîyê din ê çemê Seinê ye.

Le Siècle sala 1944ê hat damezrandin û ne komeke fikir û hizrê ye û ne jî klubeke civakî ye. Ji bo ku dîyalogeke birêkûpêk di navbera patron, rojnamevan, siyasetvan, rayedarên payebilind û di asteke kêmtir de akademîsyenên zanîngehê yan jî hunermendan de teşwîq bike, ji berdêla dijberîyên siyasî biafirîne, ev komele hewl dide konsensusekê çêke. Ew mirovên "girîng" ji bo tiştên ku dikin, tîne cem hev û ne ji bo nêzîkatîya wan yan jî tamên wan ên hevpar.

Insîyatîva damezirandina vê derdorê ya rojnemevanekî radîkal-sosyalîst Georges Bérard-Quélin (1917-1990) e. Georges Bérard-Quélin berî bibe dildarê doza berxwedanê [Résistance a fransîyan li dijî nazîyan], sekreterê demî yê redaksîyona rojnameya hevkarê [nazîyan] *La France au Travail* (Fransa bi kar radibe) bû. Weke navê mirovan lê dikir, zilamê tevna "BQ" di heman demê de patronê weşanxaneya *Société générale de presse*ê ye, ajanseke ku tîpên destpêkê yên peyvên navê weşana ku sembola wê bû (*Bulletin Quotidien [Bultena Rojane]*) û yên navê wî weke hev in. Damezirênerê Le Siècle û Société générale de presse (Civaka Giştî ya Çapemenîyê) ji xwe re kire erk û wezîfe ku bi van herdu amûran "*pirekê di navbera dinyayên li Fransayê yên haya wan pir ji hev nîne (siyasetvan, karmendên dewletê yên payebilind, rojnamevan, pîşesaz, bankevan)*" ava bike.

Li alîyekî ji komeleyê hat ku bike mirovên hêzdar hev bibînin û ji sazî û dezgehên pîşesazî û malî, ji hîyerarşîyên îdarî yan jî payeyên sazîbûyî serbixwe, beşdarî nûkirina wan a nifşan bû. Li alîyê din armanca bultena rojane ew e ku xulaseyeke rewşa rojane ya aborî û siyasî bide van birêveberan. Li ser vî hîmî *BQ* xwe weke rojnameya buha (di sala 2011ê de buhayê wê rojê 25 euro ye) ya komeke piçûk a hişk, ferz dike, berî ku xwendevanên wê her diçe bêhtir di nav redaksîyon, birêveberîya îdarî û konseyên siyasî û karsazan de çêbibin.

Hema piştî şer, ji nav qelşên kûr ên tebeqeyên çîna serdest: kesên li dijî Hevkarê [ên nazîyan] yan jî alîgirên hukûmeta Vichyê li ber xwe dan; karsazên – liberal yan jî korporatîst – bawerîya wan bi rayedarên payebilind ên plansazîyê nemaye; partîyên siyasî yên ku li dijî Partîya Komunîst ya ku rêjeya xwe ya dengan a herî bilind di hilbijartinan de bi dest xist. Bérard-Quélin û hevbendên wî hewl dan ku ji bilî komunîstan, elîtan li hev bînin. Di vê yekê de hinekî bi ser ketin. Tevî ku di nav refên hukûmetên destpêka Komara Pêncê de rêjeya endamên Le Siècleyê %20 bû, ev rêje di salên 1960 û 1970yê de misêwa zêde bû û sala 1958ê gihişte %58.(4) Niha ev rêje li derdora %40 bi îstîqrar bûye, ev rêje him ji bo gelek hukûmetên çepgir (1997-2002) him jî ji bo dema ku bi hilbijartina Sarkozy (2007) dest pê kir jî wisa ye.

Bi rasthatina bîranîna damezirênerê *Correspondance de la presse*, di dema wefata wî de, hevalê wî Pierre Moussa, mufetişekî malî yê ku li bankeyan vegeriya (yê ku pê navdar e ku sala 1982ê hewl da bankaya Parisbas ji dewletîkirinê xilas bike), ji hingê ve bi rêya li pey xwe hiştî serfiraz bû. Civata piçûk a salên 1940-1950ê hêdî hêdî kesayetîyên sereke yên siyaseta Fransayê (ji François Mitterand ê dostekî Bérard-Quélin heta bi Georges Pompidou û Pierre Mendès France) girte nav xwe û jê hat ku karsazên mezin û rayedarên dewletê yên mezin di nav tevnekê de bîne cem hev. Encama Moussa gihiştiyê weha ye: "*îroj, hemin ne bi tenê bi xêra Le Siècleyê, lê belê herweha –ez ji dil wisa difikirim– qismî bi xêra wî rewş hinekî bi tevahî guherî; êdî ya divê were kirin ew e ku ev danûstandina di navbera sektorên kar de li ser piyan were girtin; wezîfeyeke din a divê berdewam bike heye, divê bike ku nifşên cihê bi hev re bidin û bistînin.*"

***Le Siècle* ji hingê ve nêzî heft sed endam û mêvanên ku bi baldarî ji alîyê konseya wê ya îdarî ve tên neqandin, tîne cem hev. Ev konseya îdarî bixwe ji panzdeh kesan pêk tê û nîvê wan jî her ji sê mehan carekê ji nû ve tên hilbijartin**.

Navê kesê karê zêde yê komeleyê dike Etienne Lacour e. Lacour serredaktorê *Société générale de presse*yê ye, cihê ku ji çil salan ve lê kar dike. Wî wekî din şûna Jacqueline Bérard-Quélin jî di sazkirina plana sofreyê de girt. Di organîzasyoneke ku tê de bi tenê şîv tê xwarin, ev wezîfeyeke gelek girîng e: bi awayekî ku tevahîya sektorên kar li ser maseyekê werin temsîl kirin û bêyî ku hestiyarîyên ferdî werin zivêr kirin, li maseyên heft yan jî heşt kesî dabeşkirina bi sedan mirovan, simyayeke xwerû ya civakî ye. Mirov nikare muracaetî Le Siècle bide da ku bibe endam: mirov bi sponsorîya herî kêm du endaman tê vexwendin. Konseya Îdarî bi dengê piranîyê endametîya dawî erê nake, bi tenê endametîya demî ya salek yan jî du salan erê dike. Ji ber vê yekê jî armanca dîplomgirê siberojê ew e ku xwe di şîvan de mîrane, zane, baldar, dostane, weke kesên ji peyvên biaqil fêm dikin û mutewezî nîşan bidin –axaftinên li ser sofreyê nabe ku li derve werin bihîstin.

Lewma endametîya *Le Siècle*yê berî her tiştî bi rengekî serkeftî ketina nav çîna serdest îfade dike. Li cem karsazên CAC 40ê [Borsaya Parîsê], berpirsîyarên burokrasîyên dewletê û derewînên navdar, komele tijî ye ji kesayetîyên rastgir ên mîna Nicolas Sarkozy, François Fillon, Jean-François Copé, yek ji wan serokdewlet, yek serokwezîr û yê din sekretêrê giştî yê partîya piranîyê ye. Çepa parlemanî jî xwe jê nahêle. Martine Aubry weha dibêje: "*ez pirr hez ji* Le Siècle *dikim. Dema sala 1997ê ez bûm wezîr, min dev jê berda, êdî ez hew çûm. Gelekî balkêş bû. Ez li ser sofreyê her carekê bi mirovên ji hev pir cihê re dihatim cem hev* […]. *Mirov dikare însîyatîvê weke bi tevahî elîtîst bibîne. Lê belê ew weke cihekî bi rastî yê hevdîtinê dimîne. Ez jê fêrî gelek tiştan bûm. Lewra ji bo min aqilê rastî ew e ku mirov hewl bide mirovên xwedî mentiqeke cihê ne, fêm bike*." (5) Milê rastê yê Jacques Delors ê berê û midûrê niha yê Rêxistina Bazirganîyê ya Cîhanê (RBC) Pascal Lamy amadebûna xwe li *Le Siècle*yê bi rengekî entrîzmê rave dike: "*girîng e ku çepgir nehêlin ku mirovên biryaran didin bi tenê bi rastgiran re bidin û bistînin*." Yên din, yên mîna Pierre Moscovici, bêyî ku dirêj bikin, qebûl dikin ku Le Siècle weke "*tevneke civakî ya gelekî bibandor*" derdikeve pêş. (6)

Bêhtîr ji rastê, navendê yan jî çepa navend? Sala 1995ê çend mehan berîya pirsgirêka civakî ya herî girîng a piştî 1968ê bi serê Fransayê de hat, *Konseya Îdarî ya Le Siècle*yê weke saloneke bêserêş dihate bi kar anîn. Aubry xanim û karsazê mezin ê bi nêzîkatîya xwe ya bi Jacques Chirac û Alain Juppé re navdar, Jérôme Monod cîranên hev bûn; kevneteorîsyenê Konfederasyona Demokratîk a Kar a Fransî (CFDT) Pierre Rosanvallon yê bûyî sekreterê giştî yê Weqfa Saint-Simon li wir bi pêşengê naweste yê giscardo-barrîzmê (7) Jean-Claude Casanova re sohbet dikir; profesorê mafê gelemperîyê yê medyatîk Olivier Duhamel li wir pêrgî serok û midûrê giştî yê şirketa Schneider Didier Pineau-Valencienne ê pir lîberal dibû.

Piranîya endamên Le Siècleyê mêr in (% 85), temenê wan ji 55an mezintir e (% 80), zarokên karsaz, karmendên payebilind û pîşekarên liberal (% 55), dîplomayên xwe ji înstîtûyeke lêkolînên siyasî stendine (% 50) û gelek ji wan jî li dibistana elîtên siyasî yên Fransayê ENAyê xwendine (% 40), hemin heke di kursîyên dibistanên mezin ên muhendisî û bazirganiyê re (% 25) derbas nebûbin.

Mirov elaqeyê nîşanî etîketa siyasî ya endamên Le Siècle nede, belê nîşanî xisletên wan ên civakî bide, hingê mirov di reng û wêneyekî bi tevahî ji ya ku bi rengekî fermî tê teşwîq kirin guhertî, digihije. "*Ji bo hêmanên jîr ên ku jidayikbûn an jî derdor ji destpêkê ve tevneke têkilîyên di hola ber derîyê desthilatdarîyê de ji wan re amade nake, tramplenek* " (8) nîne, komele berîya her tiştî dike ku lîderên kar ên dewletê û yên sektora taybetî hev bibînin. Mirov li vir bi tesbîtkirina Rachida Dati yan jî Fadela Amara serfiraz in, yan jî bi pêhisîna pir zû ya bi jêhatîbûnên patronê Endemol Franceyê Stéphane Courbit, yên ku weke mêvanên din neçûne dibistanên prestîja wan zêde. Lê belê dîsa jî yekîtîya cins, wekhevbûna temen, dîplomayên dibistanan, yekrengbûna kok û orijînan û lihevkirina çînî pir zêde ye. Piranîya endamên *Le Siècle*yê mêr in (% 85), temenê wan ji 55an mezintir e (% 80), zarokên karsaz, karmendên payebilind û pîşekarên liberal (% 55), dîplomayên xwe ji înstîtûyeke lêkolînên siyasî stendine (% 50) û gelekan ji wan jî li dibistana elîtên siyasî yên Fransayê ENAyê xwendine (% 40), hemin heke di kursîyên dibistanên mezin ên muhendisî û bazirganiyê re (% 25) derbas nebûbin.

Di vê navberê de Le Siècle ne bi tenê cihekî hevdîtinê ye yê ku ev *happy few* (çendekên bextxweş) gavekê diavêjin da ku ji dinyaya xwe derkevin û biçin rex hevpîşeyên xwe yên li desthilatdarîyê. Ji *Société de Cour* (Civaka Qesrê) heta bi Komîserîya Giştî ya Plansazîyê, "elîtê" sazî û dezgehên koordînasyonê meşandin. Lê belê têkilîya pêk tê tu carî dualî nîne; ev têkilî girêdayî peywendîyên bi zorê yên di navbera beşên çîna serdest de ye. Dema diçin *Le Siècle*yê, hin ji wan li gor yên din bêhtir dijber in: sendîkavanên seyr yên ku bi karsazan re li ser heman maseyê rûdinin; rojnamevan bi wan siyasetvanan re ku karsazên wan hez ji wan dikin, nan dixwin (û qebûl nakin raya giştî li ser van hevdîtinan agahdar bikin...); mêr û çend jinên siyasetvan bi tesadifî ligel dijberên xwe yên di hilbijartinan de li ser yek maseyê rûdinin. Li hemberî vê pîşesaz û bankevan ên ku bi rojnamevanekî navdar re dipeyivin, bi kesayetîyekî piranîyê herweha yekî muxalefetê re diaxivin, bi sendîkavanekî re didin û distînin û heta bi karmendekî payebilind ê dewletê re sohbetê dikin, yê ku wê di nav çend salan de dibe ku bibe yek ji hevkaran, ku pîşesaz û bankevan li xwe danayînin bi wan re bin. Ew kes tu fedakarîyê nake. Hewandina nûnerên dinyaya civakî yên ku bi awayekî dîrokî li dijî hêza pereyan in (sendîka û derdorên entelektuel) yan jî derdorên, heke mirov ji danezanên wan ên prensîpê bawer bike, divê serbixwe bin (rojnamevan, karmendên payebilind ên dewletê û yên siyasetê), ji bo wî hemû kar e.

Tevî nûra sirê ya li ser van hevdîtinan jî, Le Siècle komcivîneke komplogeran nîne. Tu tiştê heyatî naqewime û di navbera çend parîyên xwarinê de mînakên danûstandinên bazarên ku li ser wan hatî li hev kirin, ewqasî kêm in ku çapemenî sereqet wan dubare dike: "*dibêjin […]sedema şoreşa guhertina birêveberekî ku Franz-Olivier Giesbert ji* Nouvel Obs *derbasî* Figaro *bû, biryara wê di îlona 1988ê de di dema şîveke Le Siècleyê de hat dayîn. Dema ev qewimî jî Philippe Villin ê ku hingê milê rastê yê Robert Hersant bû, amade bû. Mirov hê dibêjin, ketina nav sermayeya* Liberation*ê ya Edouard de Rothschild li Meydana Concorde pêk hatiye*". (9) Biryarên dîyarker ên welatekî li sazî û dezgehên navneteweyî yan jî civakî, li Meclîsa Neteweyî û Senatoyê, li Konseya Wezîran û Konseyên Birêveberîyê tên dayîn. Li hemberî vê, ev biryar piştî hevdîtin û sohbetan tên. Ew şêwazekî hevpar yê peyivîna li ser pirsgirêkên siyasî yan jî fêmkirina bazarên şirketên taybet bi kar tîne ku Le Siècle li derveyî sazî û dezgehên rewa yên biryardayînê yên demokrasîyeke aborî û civakî, derfeta wan diafirîne.

Di payîza 2010ê de nûçeyên kurt ên di rojnameyan de dan zanîn ku Nicole Notat wê li şûna Denis Kessler bibe seroka Le Siècleyê. Şirketên mezin ji nû ve kevnesekretera giştî ya CFDTê xistin konseyê û bi vî rengî kete şûna yek ji kevnebirêveberên *Mouvement des entreprises de France* (Medef – Tevgera Şirketên Fransayê), yê ku weke xirakerê fethên civakî yên ku Konseya Neteweyî ya Berxwedanê (CNR) wan teşwîq dike, tê qebûl kirin.(10) Rasthatina rêgehên wan, fonksîyona sereke ya Le Siècleyê radixe ber çavan: komkirina elîtan da ku ji bo jinûveçêkirina nîzama civakî, koordînekirî tev bigerin. Denis Kessler jî, bi rengê henekan weha dibêje: "*Nicole Notat şûna min digire. Piştî karsazekî, sendîkavanek. Ev pêşîlêvekirinekê piştrast dike, ne wisa?*" (11)



Ismet Polatli: **Nûwaze**, boyaxa rûnî li ser tuwalê, 40 x 60 cm

* Civaknas

1 Charles W. Mills, L'élite du pouvoir (elîta desthilatdariyê), weşanên Maspéro, Parîs, 1969, rûpel 16

2 Denis Kessler, "Le Siécle face à ses injustes critiques (Le Siècle beramberî rexneyên neheq yên lê tên girtin", Le Monde, 16ê kanûna 2010an

3 Jean-François Polo, "Les patrons et l'opéra, une relation particulière (Patron û Opera, peywendiyeke taybet)", Le Echos, 19-20ê çiriya paşî ya 2010an

4 Jean Bothorel, La République mondaine (komara dinyewî), Grasset, Parîs, 1979, rûpel 54

5 Les Echos, 2'ê adara 2008an

6 Le Parisein-Aujourd'hui en France, 22yê tebaxa 2010an

7 Jêrenota wergêr: Giscardo-Barrîzm tevgera fikr e ku xwe disipêre Raymond Barre û kevne serokkomarê Franseyê Valéry Giscard d'Estaing

8 Broşura konseya birêveber a ku Le Siècle'ê bi dîrokzan Agnès Chauveau da çêkirin, 31ê kanûna 2000î, rûpel 14, ev broşûr ji aliyê Anne Martin-Fugier ji nû ve hat amadekirin, "Le Siècle (1944-2004), un exemple de socialibilité des élites (Le Siècle (1944-2004), mînakeke civaktiya elîtan)",Vingtième Siècle, hejmar 81, çile-adar 2004, rûpel 21-29

9 Stratêgies, 14ê nîsana 2005an

10 Challenges, 4ê çiriya pêşî ya 2010an

11 L'Expansion, 1ê kanûna 2010an

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

ÇAND Û HUNER

Lûtkeya Kurmancî

Hingêya Rojen Barnas

Salihê Kevirbirî



Hingê navê berhemeke Rojen Barnas e, di sala 1997ê de, li Stokholma Swêdê ji hêla Weşanxaneya Nûdemê ve ronahî dîtiye û gihaye ber destê hezkiriyên kurmancîyê. Min bi xwe di sala 2000ê de, gava ku yekem car ez çûm Swêdê, ev kitêb peyda kir. Bi ya min **Hingê** yek ji wan berheman e ku mirov çend caran jî bixwîne, ji xwendina wê têr nabe. Ji bo min **Gundikê Dono** ya rehmetîyê Mehmûd Baksî jî wiha bû. Destpêka salên 90ê bû û yekem berhema kurmancî bû ku min xwendibû.

Bêyî mubalexe û nepixandin Rojen Barnas bi vê berhema xwe bi me dide peyitandin ku ew efsûnbazekî kurmancîyê ye. Helbestvanîya wî ya mezin li alîyekî, di nav nivîsandina "kurmancîya gewr" de, nexasim di qada kurteçîrokên bîranînî de "şahekî qelemê" ye. Ji ber vê yekê ye ku şeş serpêhatî-kurteçîrokên di berhema navbihurî de, dike ku em bibêjin "Hingê, lûtkeya kurmancîyê ye."

'Te vî zimanî ji ku derê anî?', 'De were binivîsîne', 'Heft xwezil bi wan roja', 'Şîfa bi Xwedê ye' û *'Ka merivatî maye?'* ew kurteçîrok in ku di kitêbê de cih ji xwe re terxan kirine. Mêjûya nivîsandina van pênç kurteçîrokan diçe 30 sal berîya niha. '*Te vî zimanî ji ku derê anî?'* di sala 1979ê de, di hejmara 1ê ya kovara *Tîrêj*ê de, *'Ka merivatî maye'* di sala 1983ê de, di hejmara 1ê ya kovara Hêviyê de hatiye weşandin. Her sê kurteçîrokên din jî, di navbera salên 80-81ê de di kovara Tîrêjê de ronahî dîtine.

Herçî '*Hecî Mihemed Eliyê Qelşo'* ye, kurteçîrok nîne. Li gor ku Barnas di pêşeka kitêbê de jî gotiye, ew bi temamî bîranîn e ku di hejmara yekem a kovara **Çira**yê (1995) de hatiye weşandin. Barnas di heman pêşekê de diyar dike ku ew bi saya hevalê xwe yê kevin gihîştiye bextewarîya nasîna Hecî Mihemed Eliyê Qelşo.

Şayanê gotinê ye ku nivîskar van kurteçîrokên xwe, di kovarên navbihurî de ne bi navê Rojen Barnas, lê bi navê Flît Totanî nivîsandiye. Ji xwe Barnas di pêvajoya kovara Tîrêjê de, ku di sala 1979ê de hejmara wê ya yekem derdikeve, di nivîsên xwe de ji bilî navê 'Rojen Barnas'; navên 'Flît Totanî', 'Serxas Arda', 'Mihemed Qasim' û 'Ferîdûn Salar' jî bi kar tîne. 'Flît Totanî' îmzeya nivîskar a kurteçîrokên mîzahî ye. Rojen Barnas diyar dike ku wî piştî kovara Tîrêjê, dev ji îmzeyên xwe yên din berdaye, lê belê îmzeya 'Flît Totanî' maweyekî din jî bi kar aniye. Barnas 'xatirxwestin'a xwe ya ji vî navî jî, bi riya 'Hingê' ji me re radigihîne: *'Bi vê berhevokê wek îmze êdî wezîfeya Flît Totanî bi temamî diqede*.'

Her wekî nivîskar di berhema navbihurî de jî gotiye, hejmarên **Tîrêj**ê êdî bi dest nakevin. Lewre jî ew li benda me dihêle ku em asta kurteçîrokên Flît Totanî binirxînin: *"Çîrokên Flît Totanî çiqas hêja ne, çiqas ne hêja ne ez bixwe pê nizanim. Hûn ê li gorî jêhezkirina xwe biryarê bidin. Lê ez bi vê dizanim ku qenc-xerab ew mêweyên çanda me ya nivîskî ya demekê ne. Hêvîdar im ku bi kêr hatibin û bikêr bê."*

Helbet nivîskarê hêja bi van hevokan nefspiçûkîya xwe pêşkêşî dêhn û bala me dike. Ligel ku dizane tevahîya peyv/hevokên di 'Hingê' de derbas dibin, nimûneyên kurmancîyeke balaberz û herikbar in jî, ew nirxandin ango helsengandina edebiyata xwe ji me xwendevanan re dihêle.

Bi rastî jî Barnas, di van kurteçîrokên xwe de, bi zimanekî sade û herikbar nakokçyên heyî yên civaka me kurdan zelal û eşkere dike. Herçî şêwaza wî ya mîzahî ye, şayanê pesindanê ye. Serpêhatîya Hecî Mihemedê Eliyê Qelşo, 'bilindcîya edebiyata mîzahî' ye û di vî warî de 'sertacek' e.

Bifermin ji 'Serpêhatiya Hecî Mihemedê Eliyê Qelşo', bala xwe bidin van hevokan, ku mirov jê têr nabin:

"...Hecî Bişirî û got: 'Camêr tu merivên berê û niha dikî yek? Xortên zemanê me bi şipil bûn, jêhatî bûn, bi destekî bangeran radikirin. Yên niha sistopisto ne, zilhimokî ne. Serê sibê hetanî evarê di kuçe û poxangê qesebê de wek hevîrê tirş bi hev de tirş dibin. Di wextê me de ref û nêçîr hebû, kevirê qewetê hebû, topenanê hebû... Ka tebatî bi me diket?' Fikrî xoce bi teqilandin jê pirsî: *'Nêçîrvanekî çawa bûy Hecî?'* Hecî pirsa wi li cî nehişt. Bêî dudiliyekê bike bersîv da: *'Elî axa - ev Elî axayê me- nêçîrvanekî bêhempa bû, di wextê xwe de. Em jî gundiyê wî bûn. Hema wextê ko nêçîr hebiya ewê ji bajêr bihata , tevî gundiyê ko bi nêçîrê emel dikirin biçûna nêçîrê. Êh... qoce Elî axa ye... Mêrikê mezin e, bi tena serê xwe diçe derekê? Himin ewê pê re ji maqûl û hakiman çend kes hebin. Dîsa bi wî awayî carekê hat gund. Bi xwe re jî uzbaşî û çend mamûr û efendî anîne. Êvarê li dîwanê gote me: " Karûbarê me bikin emê sibê herin nêçîrê." Wele serê sibê ji wî serî de ez jî rabûm, min hespê xwe hazir kir û çûm ber deriyê koşkê. Elî axa û mêvan jî rabûbûn. Piştî ko xurîniya xwe kirin, nêçîrvan bi rê ketin. Êh... nêçîrvan jî bera nêçîrvan bûn; bi tifingên desta herî baş, bi dûrebîn... Xulam tajî berdan û em ketin rê. Ez jî dûredûr li pey wan im. Te dî eyb e ko meriv şerefa mezin û maqûlan û nexasim a mêvanên wisa bişkêne. Wele ji serê siba Xwedê heta piştî esira dereng Elî axa û mêvan û qewta nêçîrvanan; ha ew newal li min ha ew gaz li te, ha ev mit li min ha ev mesîl li te bi gera li pey nêçîrê efter bûn, betilîn. Betilînê jî li wê derê bihêle, li ber xwe jî dikevin. Ewçend nêçîrvanên bi navûdeng ko bê nêçîr bizivirin ser kevaniyan, de dûrî jî Axê rûreşî ye, rûreşiya giran e. Êh... çi bikin? Rebena sihêtiya xwe kirin. Wele tam qewlê xwe dan ko bizivirin gund bi siwarî kişiyam pêş û çûm li ber Elî axa sekinim, min patekî dayê û got: "Ez xulam we dora xwe kir, vêca dora min e. Bi Rebê izetê kim herçî bê nêçîr em îşev nezivirîn bi ser kevaniyan de. " Elî axa gote min: 'Kuro lawo te ne tifing e, ne çek û sîlahekî ye, tu yê bi çi nêçîrê bikî?" Min gotê: "Ez xulamê haziran im, Mihemed Eliyê delûdîn im. Ev karê min e, îşê we pê neketiye." Wele min berê serê hespê xwe li ba xist û da xarê. Di destê min de şivekî heye ko serî digihîje erdê. Wele min şiva xwe rakir û geh li rastê geh li çepê, geh li vê tûmikê geh li wê kemê dixim, bi her daweşandina şiva min re ya cotekî kew hema dibêjin pirr bi hewa dikevin û dikevin erdê ya jî kîroşkekî hildipetike û li ser piştê dikeve. Ko tajî pejn hilanîn dane dû min û nêçîrvan jî dan pey tajiyan. Wele di nava bîskekê de êdî xurcên serpiştê hespên siwaran ji nêçîra min a ji kew û kîroşk û rawiran nehat hilanîn. Êdî min got: "Axa! ji min ew qas, êdî îro ew çend bes e." Wele em zivirîn gund, zariyan ew şev kêfa gurê pîr kirin...' "*

Herçî kurteçîroka *'Te Vî Zimanî Ji Ku Derê Anî'*, mînakeke wisa ye ku behsa nakokîya kesên li ser ziman têdikoşin, lê nikarin bi hevokên rast û tekûz bi zimanê xwe mijûl bibin, dike. Tevî ku ev kurteçîrok 32 sal berîya niha hatiye nivîsandin/weşandin jî, bi awayekî eşkere civaka me ya îroyîn jî di nav xwe de dide hewandin. Di bikaranîna hevokan de, peyv û gotinên 'tirkmancî' rewşa trajî-komîk dispêre hiş û bîra me:

"...Min ji efendî pirsî:
'Çawa, danûstandina we çawa ye? Firotina we dibe, na be?'
Îsmet efendî lêvên xwe çilmisand, bi nîv mirûzqusandî got:
'Sayin abêcixim, ê me emegekî lizûmsiz e, em pê re dibînin. Hiç yoksa çar-pênc milyon eşya di hundir de heye, lê satiş nabe. Efendim însanê vî memleketî alişmîşê sefaletê, pîsîtiyê bûye. Îmkansiz efendim îmkansiz e. Ji me re medeniyet lazim e. Mêrik ber pîreka xwe nakeve, yaxut bi pîreka xwe înanmîş nabe, ku çamaşir makînesîkî bikire, çamaşirê malê pê yiqamîş ke. Min sê muzîk dolabî anî, şeş meh wisa li dikanê ma efendim. Yekî jê jandarma qomitanî kirî, me yekî da doqtor, yek mabû, ew jî rojek xanima qeymeqam hat çav pê ket, me da wê. Bay Selîm, ekmek aslanin axzindadir, ekmek qazanckirin gûç bûye. Qezanca min î rojê yirtmiş bike rojê ji bîstî berjor naçe, lê eloxlî di rojê de çarsed, pêncsed hezarî qazanc dikin. Min ji bayîyekî taniş ra dûrima xwe şikayet kir li İstenbolê, çi bêje begenmîş dikî? Got "qardaşim çurumuş dibî." Gêrçekten jî em çurumuş dibin li vê derê. Sayin bay Selîm, tîcaret îşekî qolay nîne birê min. Ellah wekîlin olsin niha sed hezar alacaxê min heye di nav xelkê de. Bavo kes çabûq çabûq borcê xwe nayîne nade. Gerek tu îstek bikî ku hê bîne. Du roj berê sed û pêncî û çar hezar bonoyê min hebû, min çû li yabanciya, ji esnafa borc stend û udemîş kir. Banqa mudurî rojek ertelemiş kir, li min beklemîş kir. Babam bû însaf degil... '"

We got kurteçîrok û serpêhatîyên din?
Bila ew jî bibe barê ser pişta we...
Kesên xwendî ji xwe xwendiye û ji kêfeke mîna 'kêfa gurê pîr' mehrûm nebûne!
Vêca hûn jî xwe ji kurmancîya şêrîn a nivîskarê Deşta Farqînê mehrûm nekin û di zûtirîn demê de 'Hingê'yekê peyda bikin, 'hingê' hew we dît, hûn li 'civat û dîwan' a Hecî Mihemedê Eliyê Qelşo ne.

Mam Rojen Barnas!
Xwedê hibir û pênûsa te ji gulbexçeya kurmancîyê kêm neke!
Malî ava ji bo 'Hingê' û şi'rên ku li ser birc û serayan têne kolandin...

Hingê, Rojan Barnas,
Weşanên Nûdem, Sockholm,
88 Rûpel, Kurdî


KOVARA WÊJEYÎ ÇANDÎ HUNERÎ
W 36
ISSN: 1309-1476
Rejemî - Adar 2011
Sal: 7 Buha: 5,00 TL
Dosye:
Têkiliyên wêje û politikayê; wêjeya politik
Dosye
Medenî FERHO
Sîdar JÎR
Berken BEREH
Sînan SUTPAK
Fatma SAVCI
Çîya MAZÎ
Feratê DENGIZÎ
İsmail DINDAR
Hevpeyvîn bi Muhsin OSMAN re
Serwet DENÎZ
Du helbest
Kawa NEMÎR
Inka BACH
Tengezarê MARÎNÎ
Teoriya aboriya nûjen
Rênas JIYAN
Galaya xwekuştinên qewmekî
Janbijan AR
Elektrik
Sevger ÇIYA
Ji "evindaren celadê xwe" re
Sîno JÎLÎK
Sfînksa be raz
Oscar WILDE
Hesreta dîn
Zeki AKDAG
Xaçepirsa helbesta kurdî ya nûjen
Elisan LORAN

Tîpen qedexekirî: Kovara W

Kejo Bajâr

Têkilîya edebiyat û polîtîkayê; edebiyat û îdeolojîyê her dem bûye babeta gengeşeyên gur û germ. Encam bi piranî bûye du helwêstên dijberî hev: Helwêsta ku têkilîya polîtîkayê û edebiyatê piştguh dike û helwêsta ku têkilîya edebiyat û polîtîkayê dipejirîne. Lê ligel vê piştguhkirina têkilîya edebiyat û polîtîkayê jî, em baş dizanin ku *sazîya edebiyatê* li welatên Ewropayê di nav kîjan şert û mercan de û ji bo bicihanîna kîjan *mîsyonê* hat *damezirandin*. Loma jî ev helwêsta piştguhkirinê bixwe jî bi me baş dide xuya kirin ku ev yek desttêwerdaneke polîtîk û îdeolojîk e, li ser edebiyatê.

Gengeşeya têkilîya edebiyat û polîtîkayê bi awayekî gur, bi derengî be jî hêdî hêdî di nav civaka kurd de jî dest pê dike

Belê. Mîna ku di nav hemû civakan de heye, gengeşeya têkilîya edebiyat û polîtîkayê bi awayekî gur, bi derengî be jî hêdî hêdî di nav civaka kurd de jî dest pê dike.

Kovara wêjeyî û çandî, Kovara **W**yê bi hijmara xwe ya dawî ev gengeşeya derengketî da dest pê kirin û berê wêjevan û wêjehezên kurd da têkilîya wêje û polîtîkayê.

Kovara Wyê di hijmara xwe ya dawîn de cih dide *"Têkilîyên wêje û polîtîkayê; wêjeya polîtîk"*

Kovara **W**yê di hijmara 36ê de, bi dosyaya: *"Têkilîyên wêje û polîtîkayê; wêjeya polîtîk"* ket destên xwendevanên xwe. Nivîskar **Medenî Ferho, Sîdar Jîr, Sînan Sutpak, Fatma Savci, Çîya Mazî, Feratê Dengizî** û **Îsmaîl Dîndar** her yekî/ê ji hêla xwe ve li ser têkilîyên polîtîka û edebiyatê nêrîn û ramanên xwe derpêş kirin.

Di nivîsara xwe de **Medenî Ferho** piştî ku dagirkerîya hovane ya li ser kurd û Kurdistanê dest nîşan dike, dehfekê li *"bêalîtî"* ya wêjevanên kurd dide û wiha dibêje: *"Eger nivîskarên kurd, nebin **Vîctor Hugo**, zarok û xizanên Amedê nenivîsin; nebin **Balzac**, bûyerên rojane nenivîsin û sosyolojîya civaka kurd nekin romanên xwe, eger nebin **Romaîn Gary** û têkoşîna li çîyayên Kurdistanê nenivîsin, gelo wê hêza emperyalîzm û dagirkerîya faşîzane çawa were şikandin?"*

Sîdar Jîr jî di nivîsara xwe de li ser têkilîya wêje û polîtîkayê dipeyive û bi nêzîkatîyeke troçkîst, edebiyatê wekî afirînerîyeke piştî şoreşê dipejirîne û bala me dide ser êşa estetîzekirî ya di berhema edebî de.

Edebiyat, di her serdem û civakê de di qadên desthildatdarîyê de, li hewşên perestgeh, qesr û dêr û medreseyan de zîl daye û bişkivîye

Baş tê zanîn ku edebiyat di her serdem û civakê de di qadên desthildatdarîyê de, li hewşên perestgeh, qesr, dêr û medreseyan de zîl daye û bişkivîye. **Berken Bereh** jî bi nivîsara xwe balê dikişîne ser têkilîya desthilatdarîyê û edebiyatê û wiha dibêje: *"Serdema ku kurd li ser axa xwe azad û serbixwe dijîyan, berhemên wêjeyî li gor wê civakê, rengîn û têra xwe navdar in. **Melayê Cizîrî** û berhema wî vê rastîyê diselimînin."*

Sînan Sutpak di nivîsara xwe de rola neynikê li wêjeyê bar dike û dibêje ku wê neynikê dahurandinên pirsgirêkên civakî, derbirîna kul û kovanan, rêbaza teşedan û raberkirina birîna civakî heye. Sutpat têkilîya wêje û polîtîkayê ya rasterast datîne û helwêsta wêjeya ji polîtîkayê dûr wekî helwêsta polîtîk dibîne û dibêje ev feraset piştigirîya desthilatdarîya siyasî dike.

Bi giştî dema ku mirov bala xwe dide nivîsarên li ser mijarê mirov rastî helwêsteke polîtîk a edebî tê. Lê ev helwêsta *"Edebiyata Polîtîk"* berê me nade edebiyateke propagandayî, sloganîk. Di van nivîsaran de wêneyê li ber çavê xwendevan zindî dibe *"edebiyateke polîtîk lê estetîzekirî"* ye.

Ji bilî nivîsarên li ser dosyayê jî, **Rênas Jîyan** bi nivîsara xwe ya *"Teorîya Aborîya Nûjen"*, bi me dide çespandin ka kurdîya kurmancî ji bo teorîya aborîyê çiqasî guncan û lihevhatî ye.

Di kovarê de herwiha hevpeyvîneke ku **Serwet Denîz** li ser şanoyê bi **Muhsîn Osman** re kiriye cih digire.

Ji bilî van jî, di kovarê de çîrokên **Inka Bach, Oscar Wilde** bo kurdî hatine wergerandin. Û gelek navên din: Kawa Nemir, Avjen Lîs, Îlhamî Ozer, Şenger Çîya, Janbijan Ar, Xort Bajarvan, Nesrîn Navdar, Dilşêr Bêwar, Fahrî Karakoyunlu, Înan Eroglu, Berfo Barî, Kamran Simo Hedilî, Rêdûr Dîjle, Arda Janxwar, Sîpan Xizan, Zekî Akdag, Marîn Rehman, Hasîp Yalniç, Tewfîq Hêja, Faysalê Ûsiv, Xecê Omerî, Şengul Ogur, Îsmaîl Hacanî, Peya Suvarî, Mîrza Ronî, Elîxan Loran bi helbest, çîrok, pexşanên xwe. reng dane kovarê.
Kovara **W**yê hê jî bi tîpên qedexe dilîze.

www.kurdiyaka.org

Kovarên Kurdî

Jiyan bi kurdî xweş e



Kovar di pêşvebirina çand û zimanan de xwedî roleke girîng in. Lêkolîner, hunermend, nivîskar, helbestvan, wênekêş û gelek kesên ji beşên din yên perwerdehîya gelemperî, piranîya caran bi rêya nivîsekê, danasînekê yan agahdarîyeke ji kovarekê derdiçe, tê nasîn, peyda kirin ûwd.

Şêwe û beşên kovaran pircûreyî ne, amadekirin û derxistina wan ji rojname û pirtûkan pratîktir e, ji alîyê form jî dikare dûredirêj refên pirtûkan bixemilîne û arşîvkirina wan hêsan e. Ji bo hin kovarên çandî zêde nivîskar, hunermend û mesref ne pêwîst in, ev yek dibe sedem ku derxistina kovaran ji ya rojnameyan zêdetir dibe û di nav her şert û mercî de jî dikarin bên amade kirin û weşandin. Em kovarên girtîgehan bînin bîra xwe; di hin girtîgehan de kurdan hin kovar bi destnivîsan amade kirine û bi çend hejmarên jibernivîsê bi dest pir kirine û di wê çarçoveyê de belav kirine; xwe bê agahdarî yan jî, ji zewqa hunerane bê par nehîştine. Hin kovar hene ji alîyê kesekî bi tenê ve tên amade kirin û derxistin. Kovar ne tenê ji bo kurdan nefesek e, herwiha di cîhanê de jî derbarê derxistina kovaran de mînakên balkêş hene. Hin kovar di derketina xwe de armancên mezin dananîne pêş xwe, lê peyderpey, bi daxwaz û alîkarîyê berfireh bûne û gihîştine asteke encamdar.

Kovar mîna nîv-pirtûk, nîv-rojname ne û dikarin li ser her tiştî, her beşî agahdarîyê bidin, bibin bingeha sûdwergirtina gelemperî yan jî xwe kûr bikin û li ser pîşeyekê bi tenê bên weşandin: Kovarên pîşeyî û bisporî. Di vê dema dijîtal de jî hîn kovar xwedî roleke mezin in, hema her sazî, dezgeh, rêxistin, beşên zanîngehan, beşên huner, nivîskarî; fîrma, gund, tax, bajar, meqam, dibistan, bisporîyên cûrbicûr hemû xwedîyên kovaran in.

Rewşa kovarên kurdî di roja me de, bi çavlêgerîna dîroka pêşveçûna kovaran, ji dema berê gelek zêdetir e û her diçe xurt û têrnaveroktir dibe û ber bi dabeşbûneke pîşeyî û bisporî ve dimeşe. Herçiqas înternet rê li ber zû sûdwergirtina agahdarîyan vekiribe û beşekî mezin ji nivîskaran bi rêya dîjîtal xwe digîhînin xwendevanan jî, dîsa ev cîyê kovaran nagire û pêwîstîya wan ji holê ranake. Heta her diçe kovarên kurdî zêdetir, bi naverok û form berhevtir û bedewtir dibin.

Di vê hejmarê de ***Le Monde diplomatique kurdî*** çend mînakan ji kovarên kurdî bi nav dike, lê ev nayê wê maneyê ku li vê derê hemû kovar hatine dest nîşan kirin, yan jî hatine bi nav kirin. Armanc ew e ku mirov balê bikişîne ser medyaya çapkirî û çend mînakên van salên dawîyê bîne ber çavên xwendevanan; ji ber ku kovar bi xwendevan, bi alîkarîya madî û manewî hîn geştir û xweşiktir dibin. Me li ser dîroka kovaran yan jî kovarên dîrokî li vê derê agahdarî nedaye. Em bi tenê çend salên dawîyê dest nîşan dikin.

Berê kovar bi piranî li derveyê welat derdiketin, niha piranîya wan li Kurdistanê çap û belav dibin. Em dev ji Başûrê Kurdistanê ku hejmara kovar û rojnameyan li ser sedê ye berdin, bi tenê li Amedê û li bajarên din hejmara kovaran ji dehan bihuriye; ev jî pêşveçûna bikaranîna zimanê nivîskî şanî dide.

Kovarên girîng pir in; ger mirov bixwaze ji wan hinekan bi nav bike, mînak kovarên *W* û *Çîrûsk* ji alîyê wêje, kovarên *War* û *Zend* ji alîyê lêgerîn û lêkolîn, kovarên *Bîr, Hinar, Nûbihar* ji alîyê çand, kovara *Bîrnebûn* ji alîyê windanebûna kurdên derveyê sînorên Kurdistanê, kovarên *Vate* û *Kurmancî* ji alîyê ziman û zaraveyan ve manîdar in; mîna kulîlkên rengîn baxçeyê Kurdistanê dixemilînin. Hin xwendekarên zanîngehan jî kovaran derdixin, wek kovarên *Spartek* (Bilgi), *Pêngav* (Stenbol), *Keskesor* (Boğaziçi).

Êdî dem hatiye ku kovarên pîşeyî û bisporî zelaltir û têrnaverok bin, bibin bingeha afirandêrîya çand û zanistîyê, alîkarîya hîmê pêşketina perwerdehîyê bikin û di gihîştandina ciwanên siberojê de payîdar bin. Rast e ku xurtkirina kovaran karê xebatkar û birêveberên wan e, lêbelê ev yek ewqas jî erkek e li ser şanê xwendekaran; ew dikarin bi xwendin û rexneyên xwe rêya wan hîn berfirehtir û temenê wan dirêjtir bikin.

Naverok

NÎSAN 2011

Nasname û Netewe
Prof. Dr. Ilhan Kizilhan
▶ R. 1

Nasname û Herêm
Munzur Çem
▶ R. 1

JI ÇAPEMENÎYÊ
▶ R. 2

Hizrên nû li ser koçberîyê
Smain Laacher
▶ R. 2

Herêmeke ku dikele
Georges Corm
▶ R. 6

Petrola Lîbyayê dest diguhere
Jean-Pierre Séréni
▶ R. 8

Şoreşa li dijî bedewînokratîyê û lîderê wê
Rachid Khechena
▶ R. 9

Û li Fasê melik peyivî…
Ignace Dalle
▶ R. 10

Serhildana ji bo bêhtir dewlet û kêmtir desthilatê
Samir Aïta
▶ R. 11

Lawazîya berxwedaneke parçebûyî (2)
Chris Kutschera
▶ R. 12

Desthilata nerm û qada nû ya kar
Alain Vicky
▶ R. 14

"Karkerên berdest" ên Koreya Başûr
Frédéric Ojardias
▶ R. 15

Xanîyên japon diderizin
Harry Harootunian
▶ R. 16

Dijberîya li Waşîngtonê
Gérard Duménil û Dominique Lévy
▶ R. 17

Berfirehkirina qada regresyonê
Frédéric Lordon
▶ R. 18

Davikên şerekî
Serge Halimi
▶ R. 20

Huner çi ye?
Evelyne Pieiller
▶ R. 21

Vejen, faktora herî girîng a pêşketina dinyayê
Christophe-Alexandre Paillard
▶ R. 21

Dîmenê nepixandî yê elîta desthilatdarîyê
François Denord, Paul Lagneau-Ymonet û Sylvain Thine
▶ R. 22

ÇAND Û HUNER
▶ R. 23

Forma Abonetiyê

Nav:
Name

Navnîşan:
Address

Koda Postayê:
Postcode

Bajar:
City

Telefon:

E-Mail:

Abonetiya salane (12 hejmar!)

☐ Almanya (50 €) ☐ Derveyî Almanyayê (60 €)

☐ Abonetiya dîjîtal (20 €)

Independent Kurdish Media Group GmbH (IKMG)
Carnotstr. 4 - D-10587 Berlin

Berliner Volksbank - Hesab/Account/Konto: 2284 1230 10 - BLZ: 100 900 00
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 10 - BIC/SWIFT: BEVODEBB

www